# JINEOLOJÎ

## DILZAR DÎLOK

**JINEOLOJÎ**

**DILZAR DÎLOK**


**Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê:**

**Rêvan Mehmûd**

**Weşanxana Şilêr**

**Qamişlo 2017**

**weshanashiler@gmail.com**

**weje.vejin@gmail.com**

# NAVEROK

PÊŞEK ........................................................................ 5
LÊGERÎN Û LÊPIRSÎNÊN JINEOLOJÎ......................... 9
RASTIYA ONTOLOJÎK A JINÊ ................................ 123
Jin Enerjiya Herîkbar a Jiyanê ye............................................ 123
Jin Hevsengiya Mejiyê Hestiyar û Analîtîk e ............... 131
Pirs û Nîqaş .................................................................. 136
DÎROKA BERXWEDANIYA JINÊ Û ZAYENDPERESTÎ...................................................... 155
Di Şoreşa Neolîtîkê de Rista Jinê Û Xwedawendî........ 157
Şerê Çanda Xwedawendî û Xwedatiyê ......................... 160
Şikestina Yekemîn a Zayendî........................................ 174
Şikestina Duyemîn a Zayendî ....................................... 177
Pirs û Nîqaş .................................................................. 184
BERXWEDANIYA JINÊ Û MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST...................................................................... 239
Di Felsefeyê û Zanistperestiyê De Jin........................... 239
Şewitandina ‘Caziyan’ .................................................. 244
Di Têkoşîna Şikestina Seyemîn a Zayendî De Femînîzm û Jineolojî ...................................................................... 255
Pirs û Nîqaş .................................................................. 267
ENCAM.......................................................................... 339

# PÊŞEK

Jin, di dîrokê de diyardeya ku herî zêde li ser tê axaftin, nivîsandin û nîqaşkirin e. Ti felsefe, zanist, mîteolojî, pêlên fikrî, ol, pêximber, serok û feylezofên ku li ser jinê nêrîn diyar nekirine tune ne. Her wiha di roja me de jî, kesekî ji nava civakê bigre heya serokwezîrekî her kesek li ser jinê xwedî nêrîn û biryar e. Lê tevî vê yekê jî, weke Rêber Apo diyar dike ne dîroka koletiya jinê, ne jî dîroka azadiya jinê hatiye nivîsandin. Ger em ji rastiya ku dibêje "jin cewhera civakê ye" derkevin rê, em dikarin bibêjin heya niha ne dîroka koletî û bindestbûna civakê, ne jî dîroka azadî û komînalbûyina civakê hatiye nivîsandin.

Ew yek jî nîşanî me dide ku risteke jinê ya çawa di nava civak û jiyanê de heye. Ger jin, di pêşketinên civakî û jiyanî de ew qesî ne xwedî rist bûya, bi vî rengî nediket rojeva her kes û derdoreke. Bi taybetî ew rista jinê ji aliyê deshilatdaran ve baş tê dîtin. Ji ber vê, dizanin ku heya jin naye xistin û hemû nirxên wê ji dest nayen girtin, li ser civakê ferzkirina koletiyê ne gengaz e. Jixwe Serokatî despêkirina serdema koletiyê û şaristaniya navendî bi ketina jinê digre dest. Her wiha di nava hêrikîna dîrokê de hin rawestgahên ku deshilatdarî dubare sebare li ser civakê hatiye ferzkirin hene. Di van cihan de jî em her dibînin ku heya jin bê nirx nebe, vîna wê naye şikestin zeftkirin û tepisandina civakê ne gengaz e.

Dijberî vê yekê, ji aliyê tevgerên azadîxwaz û demokratîk ve jî, jin di pêşxistina şoreşan de hebûneke diyarker e. Di destpêkê de divê mirov balê bikşîne ser ku di nava dîroka şaristaniya navendî de têkoşînên dijwar yên jinê hene. Di nava hemû tevgerên civakparêz, ekolojîk, demokratîk, azadîxwaz û sosyalîst de risteke pêşengtiyê ya jinê heye. Her wiha tevgerên femînst ku di van sedsalên dawî de pêş ketine û pêş dikevin, bi serê xwe mijara lêkolînê ne. Ji aliyê azadiya jinê ve gelek rê, rêbaz û amarên têkoşînê û di encama wê de jî gelek nirxên civakî afirandine.

Li ser vê mîrateyê Tevgera Apoger jî, ji destpêka xwe ve di têkoşîna azadiya civakê de rista pêşengtiyê li ser milên jinê bar kiriye. Ji Azîmeyan heya Berîtan, Zîlan û Semayan; ji Sarayan heya Arîn û Doxayan gelek lehengên ku bi zanebûna "*jina azad civaka azad e"* bi awayekî fedaiyana têkoşîn meşandine û gihêştine mertebeya Xwedawendiyê hene. Di pêşengtiya van hevalên leheng de li Kurdistanê pêşketina arteşbûyin û partîbûyina jinê, di destpêkê de li Rojhilata Navîn, li ser hemû jinan û mirovahiya azadîxwaz tesîreke mezin kiriye. Li gel ku dost û dijmin ti kes nikare di nava Tevgera Azadiya Kurdistanê de tesîra ev têkoşîna zayendî înkar bike, ti kes nikare di pêşketina xeta azadiya jinê ya cîhanê de jî rista vê têkoşînê înkar bike.

Jineolojî jî li ser mîrateya ev têkoşîna dijwar, weke qadeke nû ya şoreşê derdikeve pêşberî me. Çawa ku ji aliyê têkoşîna azadiya jinê û civakê ve nunertiya lutkeyeke dike, em dikarin weke mûdaxeleyeke li ser zanistên heyî ya Rêber Apo jî binirxînin. Hem wê ji aliyê felsefî û zanistî ve rastiya jin, jiyan, xweza, gerdûn û civakê derxîne holê û di lêgerîna me ya heqîqetê de bibe diyardeyeke hîmî; hem jî wê dîroka berovajî bûye sererast bike û li ser esasê cewhera jinê û nirxên Xwedawendiyê, civakê ji nû ve vegerîne cewhera wê û jiyaneke alternatîf pêş bixe.

Ew pirtûka di destê we de jî, mirov bi kûrtasî dikare bibêje kûrkirin û berfirehkirina van mijaran e. Beriya her tiştî ew dîroka berovajî, ji her alî ve lêpirsîn dike. Hemû nêrîn, pêşderazîbûn, dîtin û biryarên ku dervayî vîna jinê, li ser wê hatine pêş xistin lêpirsîn dike û di şexsê jinê de dikeve nava lêgerîna jiyan û civakbûneke nû. Hem weke mîlîtanên PKK û PAJK’ê, hem jî weke civak, îro jineolojî ji bo me çi îfade dike? Wê di kesayet û jiyana me de guhertinên çawa bike? Dê pirsgirekên civakî ku tên jiyîn re çareseriyên çawa pêş bixe? Em ê çawa jinê fêm û hîs bikin? Em ê çawa xwe û zayenda dijberî xwe nas bikin? Ya herî girîng jî li ser esasê jineolojiyê dê hevjiyana azad çawa were pêş xistin?

Ev pirtûk hewil dide ku van pirsan û zêdetirî wê bibersivîne. Vegotinên ku hatine kirin di her mijareke de mirov dide fikirandin û dixe nava lêpirsînê. Her wiha nîqaşên pêş dikevin jî, hem ji aliyê hevalên jin ve hem jî ji aliyê hevalên xort ve, asta me ya azadiyê nîşan dide. Bi taybetî hevalên xort, çiqasî di bin tesîra zayendperestiyê de ne? Bi awayekî giştî lewaziya lêgerînên me ya azadiyê nîşan dide. Ji ber vê yekê li gel lêgerîn û lêpirsînên jineolojiyê dahûrandina pergala deshiltadar li ser xwe kirin jî, pir girîng e. Ji vî alî ve jî em bawerin, ev pirtûk dê ji bo her hevalekî/ê bibe wesîleya xwe dahûrandinê û dê di pêkanîna şoreşa kesayet de risteke bilîze.

Ji ber girîngiya van mijarên jiyanî, me pêwîstî pê dît ku em ev waneya jineolojî ku di Dibistana Navendî ya PKK'ê ya Mazlum Doxan de hatiye dayin vegerînin xebateke pirtûkê û bigihînin hemû hevalan. Em bawer dikin ku hem di têkoşîna me ya zayendî û çînî de, hem jî ji bo lêgerînên jineolojiyê û li ser wê esasê avakirina hevjiyana azad de wê kêrhatî be.

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**

**Ragihandina PKK'ê**

# LÊGERÎN Û LÊPIRSÎNÊN JINEOLOJÎ

**Hevala Dilzar**: Waneya jineolojî ev demeke di rojevê de ye. Ger em weke têkoşîna Tevgera Jina Azad bigirin dest, ya rast ne mijareke nû ye. Lê weke jineolojî sazîkirin û girtina dest nû ye. Di destpêkê de em vê yekê bibêjin, armanca vê waneyê bi awayekî kûr fêmkirina paradîgmayê û li gorî wê xwe nû kirin e. Mirov wisa nêzik bibe baş e. Divê tene weke li ser mijara jinê agahiyên xwe kûrkirinê em negirin dest. Fêmkirina me ya parazname û paradîgmaya Serokatî ve girêdayî ye. Ji xwe me belgeyên encamnameya konferansa jineolojî ji xwend. Ew belge jî bere me di pir milan da dide diyar kirin. Bi vê waneyê jî em dixwazin vê yeke kur bikin.

Weke şiyar jî em dibêjin, "*jin jiyan e.*" Girêdana mijara jin û jiyanê kirin û fêmkirineke wisa pêş xistin, armancek e. Serokatî dibêje, fêmkirin ji bo jiyanê ye; ger tu rast fêm bikê, tu dikarê rast jiyan jî bikê. Li ser vê esasê em dixwazin di fêmkirina jiyanê de kûrbûyineke ava bikin. Ji ber vê yekê heval weke mijareke nû ku qet nehatiye bihîstin, an jî weke mijareke ku agahiyan negirin dest wê baş bibe.

Jineolojî, zanista jinê ye. Weke têgeh Serokatî, di sosyolojiya azadiyê de cara yekem bi lev kir. Ji bo me destpêkek bû. Dema pêvajoya Îmraliyê destpê kir, Serokatî ji bo azadiya jinê got, "*projeya min a nîvço*

*mayî.*” Mirov perspektîfa jineolojiyê, weke ji aliyê Serokatî ve timamkirina vê projeye jî dikare bigre dest. Di guhertina paradîgmayê de jî, alaqayeke mezin a Serokatî hebû. Dizanî ku ger jin were tehlîlkirin û di pirsgireka jinê de çareserkirinek çêbibe, dê di civakê de jî guhertinek çêbibe û şoreşa esasî jî ew e. Şoreşa jiyanî û civakî ye.

Ev nêrîn, Serokatî dem bi dem derxist pêş; bi teoriya qutbûna zilam, bi bîrdoziya rizgariya jinê, bi hevberdana bê dawî, bi projeya guhertin û veguhertina zilam Serokatî ew mijar her di rojeva me de hişt. Lê di guhertina paradîgmayê de, azadiya jinê girtina dest ji bo serdemeke nû bû. Bi peyva jineolojî ve jî, dê ew lêgerîn zêdetir bi pergal bibana. Bi vî rengî em mijarê digirin dest.

Jineolojiyê jî, em hem weke zanista jinê, hem jî weke zanista jiyanê digirin dest. Di nîqaşên ku heya niha hatin kirin de jî hat lêpirsînkirin; gelo jineolojî wê bibe beşeke girîng a zanista me ya civakî, an bibe zanista me ya civakî? Hem di konferansa jineolojiyê de, hem jî amadekariyên ku beriya konferansê hatine kirin de nîqaşên pir kûr hatin pêşxistin. Di encama xwendina paraznameyên Serokatî de, em gihêştin vê encamê; jineolojî zanista me ya civakê ye. Di nava civakê de tenê weke beşeke em nagirin dest.

Em vê yekê weke formûl dikarin bibêjin, jineolojî zanista me ya civakî ye. Tenê li ser jinê lêkolîn û lêgerînan pêş naxe. Dema ku Serokatî got, mirovbûyin û civakbûyin

bi jinê re pêş ket, bi vê sedemê got. Ji ber ku jiyan li derdora jinê tê honandin, dema ku em weke nasname, zayend û hebûneke jinê digirin dest civakbûn li ser vê esasê saz dibe û pêş dikeve. Weke rîçik em wisa digirin dest.

Rojane jî em bifikirin wisa ye. Di waneya Modernîteya Demokratîk de em dibînin, rexneyên me ji bo sosyolojiyê hene. Sosyolojî weke qralîçeya zanistan tê dest girtin û ji bo me zanisteke esasî ye. Lewma bi mirov û civakê ve mijûl dibe. Lê rexneyên me li ser vê zanistê hene. Cara ewil di sedsala 19'emîn de weke zanisteke derdikeve holê. Ya rast ji bo ku pirsgirekên di serdema kapîtalîzmê de derdikevin holê re bibe bersiv pêş ket. Lê pirsgirekan re nebû bersiv. Em vê weke rexne û tehlîleke datînin holê. Ger nikaribe van pirsgirekan çareser bike, pêwîst e ev zanist jî bi bingehê ve were lêpirsîn.

Di nêzikatiya jineolojiyê de jî, divê li hemberî hemû zanistan bi guman nêzik bibe. Lewma derketina piraniya zanistan, bi piranî di bin tesîra şaristanî û Modernîteya Kapîtalîst de pêş dikevin. Em li hemberî her tiştê ku bi şaristaniya navendî ve pêş ketiye guman jiyan dikin. Weke rêgeza yekemîn, mirov dikare bibêje jineolojî ev e. Lêkolînkirin û lêpirsînkirina hemû zanistan e. Li ser vê esasê jî avakirina ya nû û xwe gihandina rastiyê ye. Em vê weke rêbazeke derketina Serokatî jî dikarin bigrin dest.

Em derketina Serokatî binêrin, bi vî rengî ye. Ya heyî guman dike, lêpirsîn dike û di nava wê de ya rast digere.

Ya dîtir jî weke me got, zanistên ku pêş ketine bi şaristaniya navendî ve girêdayî ne. Ji ber ku di şaristaniya navendî de tebaqebûn û koletî pêş ketiye, cihê ku çînayetî hebe azadî pêş nakeve. Jineolojî dixwaze hêza şîroveya azad û fikrandina azad a mirovahiyê pêş bixe. Ji bo em bi guman nêzîkî zanistên heyî dibin. Li hemberî wê; bi qalib, nêzikbûn û fikrandinên heyî em nikarin bigihêjin rastiyê. Pêwîst e, em xwe ji wan qut bikin û dûr bixin. Bi vî awayî jî fikirandineke nû ava bikin. Niha nêrîn û fikrandinên her hevalekî/ê me heye, lê da ku em jineolojîk binêrin, divê ya heyî em lêpirsîn bikin. Me ew nêrîn û fikrandinên xwe ji kû girtine, bingeha wê çi ye? Divê lêpirsîna vê çêbibe. Carna heval dibêjin, *“me nexwendiye, ji ber vê yekê tesîra dibistanan li ser me tune ye.*” Lê ne wisa ye. Mirov tesîrên wê ji dibistanan jî digre, lê pergal dervayî dibistanan jî di nava civakê de xwe dide jiyîn. Ew pergal di me de xwe dide rûnişkandin.

Li ser vê esasê em dixwazin dervayî berovajîbûnên heyî gaveke biavêjin. Mesela di zanistê de civak parçekirin heye. Ew yek encamên rast bi xwe re nayne. Zanista herî pêşketî, Marksîzm e. Lê em dibînin ku bi wê jî, di nava civakê de tebaqebûn û çîniyatî tê ava kirin. Jineolojî ji bo wan jî rexneyek e.

Armanca pêşxistina jineolojî ya ewil, pirsgirkeke jin û jiyanê heye. Em dixwazin ew pirsgirek were dîtin, were fêm kirin. Ya duyemîn jî, em dixwazin vê pirsgirekê çareser bikin. Pê ve girêdayî em zîhniyeteke nû ava bikin û di jiyanê de pratîze bikin.

Dema ku mijara jinê tê destgirtin, jin weke laşekî dîtin heye. Ew me hemûyan de pêş dikeve. Ew nêrîn di zilaman de zêdetir şênber e. Beriya her tiştî dema ku jin tê gotin, divê laşek-bedenek naye bîra me. Divê em jinê di nirxên destpêkê yên ku civak ava kirine de bigrin dest. Di jiyana Kurdan de û zimanê Kurdî de, gelek daneyên xweşik li ser vê mijarê hene. Mesela jin û jiyan bi hev re têne destgirtin. Zimanê Kurdî bi xwe mê ye. Girêdanbûna civaka ku li hemberî axê, hinek nêzikatiyên wê yên jinê jî nîşan dide. Bêguman pir zêde bandorên baviksalariyê li ser me çêbûne, lê aliyê wê yê din jî heye. Em bi vî awayî gerdûnî digirin dest, lê her hevaleke jin jî di rastiya xwe de lêpirsîna van tiştan dike. Di heman demê de qadeke têkoşîna şexs e.

Weke mîlîtanên PKK'ê em nava civakeke derketine, lê di heman demê de em jî civakeke biçûk in. Dervayî me jî civakeke ku bi milyaran mirovan pêk tê heye. Dema ku em ev civaka dervayî xwe dinêrin, li hemberî bûyerên rojane tên jiyîn, em şaşwaz dimînin. Divê em vê tespîtê bikin, jiyan xitimî ye. Weke tespît zanîna vê jî zêditir, divê em vê rastiyê hîs bikin. Di jiyan û civakê de

xetimandineke pir mezin heye. Ji milê aborî, şer û aştiyê; demografî, konevanî, zanist, uslûb û xîtabetê ve, têkiliya herdu zayendan de xitimandinek heye. Xitimandina ku di navbera herdu zayendan de heye jî, bingeha hemû xitimandinan e.

Em niha li giştî Kurdistanê têkoşîne dimeşînin, li Rojava şoreşek pêş dikeve. Em ji milê aborî, tendûrîstî, konevanî ûhwd de çiqasî pêşketinan bikin jî, ger di navbera zilam û jinê de em rastbûn û başbûyineke ava nekin, dê ew xitimandina civakî ji holê ranabe. Divê em xwe bi vê yekê qaneh bikin. Lewma pirsgireka yekemîn di wê derê de destpê dike. Serokatî dibêje, afirîneriyên herî balkeş û xweşik, yên xwezaya jin û zilam in. Lê ew herdu afirînerî, îro dijminên hev in. Di cewhera xwe de ne li dijberî hev in, hev û din timam dikin û jiyanê ava dikin. Lê îro dijberî hev in.

Mesela em rojane bûyerên tundî û kûştinên jinê dibihîzin. Ew hemû, ji aliyê kesên nêzikî jinê ve tên kirin, an na ji aliyê kesên biyanî ve ew kiryar pêk nayen. Ango yên ku qaşo wan hez dikin, wan dikûjin. Em gelek caran van weke  bûyerên spontanê digirin dest û derbas dikin. Lê em hinekî bi kûrûhî bifikirin, jiyan bi vî awayî tê jehrkirin. Lewma ew herdu hebûn, hatine dijberî hev. Divê em bi nêrîneke ku ev mijarên felsefî, fikrî û zanistî ne, lê mezî dikin û bigirin dest. Weke hevalên jin, em li hemberî van bûyeran pir hêrs dibin, pir xemgîn dibin û hew… Dibe

ku jin, li gorî zilaman vê yekê baştir hîs bike; lê hîsên xwe vegerandina fikirekî û ji şoreşeke re kirina bingeh tune ye. Ev bi jineolojîk mezînekirinê ve girêdayî ye. Jineolojî dixwaze vê pêş bixe. Ango jiyan, bi zanistê pêşwazîkirin pêwîst dike.

Bi Jineolojiyê em dixwazin zanista jiyanê pêş bixin. Em dixwazin zanista jiyaneke ku jin di navenda wê de ye pêş bixin û azad jiyan bikin. Armanca me bi awayekî azad bi hev re jiyankirina jin û mêr e. Ger ew yek naye zanîn û hîskirin, di vê mijarê de lêgerîneke şoreşgerane çênebe, çareserî jî pêş nakeve. Ger em bizanibin ku em ê sibê jiyana xwe dest bidin jî, divê îro em hewildanên ku ew xetimîna jiyanê derbas bike nîşan bidin. Jixwe lehengtiyên mezin ji wir derdikevin. Mijareke ew qesî girîng e. Ger em bikaribin, bi zanebûn kêliyeke azad ava bikin, em dikarin hemû kêliyan azad bikin.

Hem di hevalên jin de, hem jî di hevalên xort de nêzikbûnên seranser derdikevin. Hevalên xort vê qadê aîdî xwe nabînîn, hevalên jin jî tenê aîdî xwe dibînin. Mijareke aîdî me ye û jiyan ji wir ava dibe, ger em nikaribin di wê de sererastkirineke çêbikin, jixwe jiyan bi vî awayî nadome. Divê weke zanista bingehîn a jiyanê were dîtin.

Ya dîtir jî, ji bo me Kurdan tegîna zanistê pir dûr e, em aîdî xwe nabînin. Divê em dev ji vê nêzikbûnê jî berdin. Zanist çi ye? Bi zanebûn jiyîn e, jiyan tê hîskirin, lê bi zanebûn tê jiyîn. Mirov xwe ji zindiyên dîtir çawa qut

dike? Bi rêka zanistê dike. Dema ku mirov dikeve ferqa xwe, bêyî ku mesafeyeke mezin vebike, di navbera xwe û zindiyên din de cudabûneke dibîne. Wê demê mirov dibe mirov. Li ser wê esasê jî civakbûn ava dibe. Ji ber vê yekê divê em xwe zanistê jî dûr negrin. Bi pêşxistina jineolojiyê, em dixwazin van nêzikbûnan jî derbas bikin.

Nêzikatiyeke me ya din jî, pir zû tişt girtin û xistina qaliban e. Ew rêbazeke deshilatdariyê ye. Di paraznameya Sûmeran de, Serokatî gotibû "*divê em çanda şer û deshilatdariyê tehlîl bikin. Ger em vê tehlîl nekin, em nikarin wate bidin şerê ku em dimeşînin jî*." Hevalên nû tevlê dibin, hestên pir baş û xweşik, bi awayekî fedaî tevlê dibin; lê pir zû qaliban digirin, forman digirin û cemidandineke dijîn. Ew jî rêbazeke deshilatdariyê ye, bi kurtasî pozîtîvîzm e. Bêyî ku jiyanê bibîne, danehevan çêke û li ser wê esasê biryaran bigre, dikeve nava qaliban. Bêguman her mirovekî/ê jiyanek û kombûyineke wan heye, lê em di nava herîkandineke de ne. Em pir caran kêliyên herikandinê derbas dikin û cemidandinê esas digirin. Mesela me beriya 5 salan tiştek girtî ye, me xwe re kiriye qalib û em bi wê dimeşin. Ger em bi vî awayî mezîkirin û lêhûrbûna jiyanê derbas nekin, bêguman fêmkirina jineolojiyê jî pêş nakeve. Xitimandinên ku di jiyanê de hene jî, em nikarin derbas bikin.

Ya dîtir, di têkiliyên me de pirsgirek hene. Di têkiliyên jin û mêr de pirsgirekên pir mezin hene. Jin û mêr, li gel zayenda xwe jî pirsgirekan jiyan dikin. Ya din jî dema ku em dibêjin, di navbera jin û zilam de pirsgirek hene, em tenê ji bo civaka xwe nabêjin; em giştî mirovahiyê digirin dest. Niha mirov nizanin, çawa têkiliyan daynin, nizanin ka çawa bi hev re bijîn. Modelên ku pergala deshilatdar pêş dixin, di nava civakê de her ku diçe ketinên pir mezin pêş dixin. Ne di nava malbatê de, ne jî di nava civakê de têkiliyeke asayî ku dimeşe tune ye. Tesîra vê yeke li ser me jî heye; bi hev û din re danûstendin, hev û din fêmkirin pir zêde pêş nakeve.

Mesela li vê derê tekmîlên waneyan tên girtin, pirsgirekên jiyanê hemû heval di komînên xwe de dinirxînin, encamên wê jî di rêveberiyê de kom dibin û sererast dibin. Berê di çanda leşkerî de li ser piyan 2 deqayan veguhestina wan tekmîlan çêdibe, lê niha bi seatan diajo. Ev pirsgirek e, pirsgirekên me yên hev û din fêmkirinê hene. Hevalek kêmasiyeke jiyan dike, lê bi seatan îzaha wê dike. Ger wisa be em ê pirsgirekên xwe çawa çareser bikin. Tiştên ku hatine veguhestin, cardin heval bi xwe dibêjin. Lewma ya ku hevalê wî/ê gotiye, aîdî xwe nabîne. Em hev û din guhdar nakin.

Pirsgirekên me yên têkiliyê pir kûr in, lê em li ser wê lêhûrbûn nakin. Divê em van tiştan bixin navenda lêhûrbûnên xwe. Çavkaniya xwe ji kû digre? Jixwe

têkiliyên di navbera hevalên jin û xort de, pir xirab in. Weke mirov di navbera me de pirsgirekên têkiliyê tên jiyîn. Me pergala deshilatdar red kiriye û em tevlî Tevgera Azadiyê bûne, lê em jî zarokên vê serdemê ne. Ango em zarokên Modernîteya Kapîtalîst in, divê xwe ji vê serdemê derxînin û bibin zarokên serdemeke nû ku em ava bikin.

Pirsgirekên têkiliyê, pirsgirekên zîhniyetê ne. Ne ku du heval ji hev nayen, ji ber wê pirsgirek derdikevin. Di çanda klanê de çi heye, hev û din hîskirin heye. Mesela ji bo koma bîrdozî ya partiyê, em dibêjin "*klana Apo.*" Di wê derê de beriya ku  Serokatî biaxife, hevalê Kemal Pîr fêm dike ku wê çi biaxife. Lê niha em heman gotinan jî dikin, lê nabin yek.

Di bingeha hemû pirsgirekên têkiliyê de jî, mijara jin heye. Lewma em jiyanê bi awayekî pirsgirek digirin dest. Jiyan çawa ava dibe, di avabûna jiyanê de rista jinê çi ye? Em çawa dikarin jiyaneke ava bikin, weke hebûneke ku di nava xwezayê de ferqa xwe derxistiye holê em ê çawa jiyaneke ava bikin? Ew jî mijareke Jineolojî ye.

Ya dîtir jî, di zanistên heyî de zilam navendê de ye. Di hemû zanistan de, ji ziman bigre heya fikirandinê di navenda her tiştî de zilam heye. Jixwe piraniya zanistên îro, di serdema ronahîbûnê de pêş ketine, ew jî li ser esasê çînayetî û deshilatdariyê pêş ketine. Bi awayekî xwezayî dema ku çînayetî hebe, jin dikeve nava çîna jêrîn. Ziman, fikirandin, nêzikbûn û sazbûna jiyanê jî li gorî van

zanistan tê sazkirin. Ango weke Adorno dibêje, *"jiyana şaş, rast naye jiyîn.*" Di ew jiyana şaş de jî, jin di bin de dimîne û pê ve girêdayî civak jî di bin de dimîne. Jixwe xapandineke mezin jî, tenê jin bindest û çîna jêrîn dîtin e. Weke çîn jin di bin de dimîne, lê deshilatdariya navîn a zilam giştî civakê jî di bin de dihêle. Ji bo vê yekê bi rêka jineolojî em dixwazin, li ser zanistan lêpirsîneke çêbikin û zanistan ji navendîbûna mêr û deshilatdariyê derxînin.

Di bingeha hemû zanistan de tesîra serdema ronakbîriyê heye, di wê derê de jî aqliyet heye. Ew jî berhemeke pêşxistina pergala deshilatdarî ye. Kesên ku ew yek pêş xistine jî, Descartes, Newton û Bacon e. Jixwe felsefeya Descartes dubendî ava dike. Rih û beden ji hev qut dike. Bi vê zîhniyetê beden weke bireser-nesne, rih jî weke kirde-özne diyar dike. Jinê jî weke bireser digre dest. Mantiqa ku jinê weke pîrhevok û hov dibîne û komkûjiya jinan pêş dixe jî, ji vê ne cudatir e. Jixwe ji aliyê dîrokê ve jî, hema piştî pêvajoya serdema navîn a tarî, ev mantiqê ronakbîriyê pêş dikeve. Kapîtalîzm jî, li ser zemîneke wisa pêş dikeve. Karkertiya ku di kapîtalîzmê de tê pênasekirin jî, bi ew mantiqê bireser çêdibe. Di serdema kapîtalîzmê de li gel karker, birêsera herî mezin jin e.

Lê dema ku em kapîtalîzmê digirin dest, em ew aliyê wê kûr nakin. Em dibêjin, şoreşa pîşesaziyê çêbûye, makîne çêbûne û mirov bûye karker. Serokatî dibêje, "*di*

*nava vê pergalê de karker, koleyê nûjen e.*” Em van tespîtan rast dibînin, lê em kûr nakin. Her wiha em nebaşiyên kapîtalîzmê jî pir dijmerin, lê di felsefe û zîhniyeta di bingehê wê de heye, em lêpirsîn nakin. Mirovekî/ê ku ji bo karkeriyê hatiye qaneh kirin, ji aliyê zîhniyetê ve kole xirabtir e. Herî kêm kole bi darê zorê dike, lê di karker de qanehbûyin û bedena xwe firotin heye. Mesela di hinek tevgeran de fûhûşê jî, weke karkeriya seksê bi nav dikin. Weke sifateke digirin dest û xwezayî dibînin. Di bingeha wê de felsefeya Descartes ku rih û beden ji hev qut dike heye. Ger di zîhniyeta mirov de parçebûn çêbe, tu dikarê her tiştî ji wî/ê mirovî/ê bidê kirin.

Di mijara jineolojî de, divê em hinekî ji vî alî ve jî lêhûrbûna xwe çêbikin. Tesîrên vê li ser me jî hene, em beden û mejî bi hev re nagrin dest. Em pir caran ne di wê zanebûnê de ne ku fikirandina me li ser laşê me tesîr dike. Bi kuantomê em hinekî ketin ferqa wê, lê cardin weke ku agahiyeke dervayî me ye, em nêzik dibin. Lê bi awayekî xwezayî, ew di me de heye. Mesela şîroveyên Serokatî yên ji vî milî ve pir xurt in; hevalên ku porê wan spî dibe, an jî diweşe didahûrandin. An jî dema ku li qada Serokatî, di laşê yekî de pûzik çêbibe, Serokatî digot “*tu qirêjiya di hundirê xwe de diavêjê.*” Ango tevî ku ew qesî êrîşên kapîtalîzmê di vê qadê de hene, dîsa jî rih û bedena me ji hev ne cuda ye. Tevî ku em ew rastiya xwe ya civakî pir dûr ketine, em hê jî bi awayekî giştî ji wê rastiyê qut

nebûne. Weke civaka PKK'ê jî, ji ber ku em di nava xwazayê de jiyan dikin û ji pergalê dûr in, em zêdetir di zanebûna wê de ne.

Ger bedena me li vir be, divê rihê me jî li vir be. Bêguman hin tiştên ku kuantûmê derxistine holê hene, herikbarî di mirov de heye. Ew taybetmendiyên me yên xwezayî ne. Lê pergala deshilatdar, van taybetmendiyan parçe parçe dike. Mesela pergal dibêje, heya êvarê bixebitin, lê xwe azad hîs bikin. Dema mirov vê dibîze şaşwaz dibe. Lê piranî mirov ne di ferqa wê de ne.

Di bedena xwe naskirinê de jî, em pir lewaz in. Em biyolojiya xwe jî nas nakin. Lewma tabû ye. Bi taybetî biyolojiya jinê nîqaşkirin tabû ye, lê bi awayekî balkêş ya mêr zêdetir tabû ye. Ger em niha bibêjin jin çi ye, dê hevalên xort jî gelek tiştan bibêjin. Lê em bibêjin, zilam çi ye; pir caran hevalên xort bi xwe jî nikarin hebûna xwe pênase bikin. Lêhûrbûna me li ser hebûna me pir lewaz e. Hebûn yekpare ye, rih û beden di nava vê yekparebûyinê de ye. Dibêjin hundirê mirov çi be, teyisandina xwe ya derva jî dike. Em vê hîs dikin, lê weke jin û mêr li ser hebûna xwe lêhûrbûna me pir kêm e. Lewma em raste rast difikirin. Em nikarin bibêjin, ez dîroka milyaran sal a gerdunê, milyonan sal a mirovahiyê di xwe de hîs dikim. Lewma em pir parçeyî difikirin. Yekpare fikirîn, armanceke sereke ya jineolojî ye. Ew jî rexneya herî mezin a li ser sosyolojiya heyî ye.

Ew pir girîng e. Bila heval nebêjin, di pratîkê de ev mijar kêrî me naye. Yekpare fikirîn, dê bihêle ku em di pratîka xwe de jî serkeftî bin. Ji ber ku em bi hev ve girêdayî nafikirin, piraniya plansaziyên me vala derdikevin. Em nikarin valatiyên xwe dagirin. Piştî wê jî em serneketinên xwe bi hincetan îzah dikin. Jixwe waneya jineolojî ne waneyeke wisa ye ku em ansîklobediyeke vekin û jê fêr bibin e. Divê em nêzikatiyên xwe biguherînin.

Di vê mijarê de, em dixwazin mêzêkirina xwe ya sosyolojiyê hinekî kûr bikin. Serokatî got, "*jin tîrbûyin û kombûyina têkiliya civakî ye.*" Em tenê ji aliyê biyolojiyê ve nagrin dest. Ne ku jin tenê dayik e, têkiliyên civakî li derdora wê ava dibin. Pêwîst e em weke hebûneke civakî bigirin dest. Nirxên ku civakbûyin li ser esasê wan pêş dikevin çi ne? Divê em bi van ve girêdayî bigrin dest.

Ya din jî em dixwazin vê mijarê ve girêdayî, jineolojiyê weke zanisteke bidin domandin. Lewma zanistake jiyanê ye. Tenê ji bo çareserkirina pirsgirekên demekê bi awayekî textîkî em nagirin dest. Serokatî jî bi vî rengî pêş nexist û got, "*paradîgmaya me ye.*" Ji ber vê divê em jiyanî û bêdawî bifikirin. Pirsgirek ji holê rabin jî, divê em wisa bigrin dest. Serokatî got, *"bi sosyolojiya azadiyê pênaseya me ya dîrokê guherî."* Mezîkirina me ya dîrokê jî bi paraznameyan çêbû. Jixwe Dîroka Kurdistanê jî, ji aliyê Serokatî ve ji nû ve hate dest girtin. Bêguman hin lêkolîn û lêgerînên arkeolojiyê jî, zemînek ava kir; lê

ya esas di mezîkirina me tiştekî diyar dike. Ango di çareserkirina pirsgirekên civakî de Serokatî asteke nû ava kir.

Em dîrok û civakê weke hev digirin dest; dema ku em dibêjin dîrok, divê civak were bîra mirov; dema ku em dibêjin civak, divê dîrok were bîra me. Serokatî got, “*divê em dîrokê civakî bikin.”* Civakbûyin, di kêliyê de îfadekirina tiştên ku di dîrokê de hatine jiyîn e. Di mijara jineolojiyê de jî, em dixwazin ev nêrînan Serokatî kûr bikin. Em dixwazin jinê bixin navendê û li ser esasê civakbûyinê dîrokê ji nû ve bigrin dest. Ji vî alî ve xebatên jineolojiyê çêbûn, jixwe lêkolînên me berdewam jî dikin. Di kovara Jineolojiyê de, ew xebat her tên weşandin jî.

Serokatî di dîrokê de çar serdemên esasî digre dest. Yek, dema herî dirêj; dudu, dema bînyatî (yapisal); sê, dema navîn û kûrt; çar, kêliya afirandinê, ango sosyolojiya azadiyê. Bi nêrîna jineolojiyê, li ser esasê van çar deman em dixwazin mezîkirinên xwe yên civakî pêş bixin.

Di çarçoveya dema herî dirêj de, em dixwazin di avabûna civakê de rist û wateya jinê, girêdana jinê bi çêbûyina çand, huner, bawerî û ziman ve bigrin dest. Têkiliya jinê bi ev nirxên ku hatine avakirin re çi ye? Bi van ve girêdayî em dixwazin lêkolînên xwe kûr bikin. Hemû têkiliyên di navbera herdu zayendan de, di vê mijarê de tên lêkolînkirin. Mesela derketina xebatên aborî, têkiliya jin û civakê bi xwezayê re di vê beşê de tê nirxandin.

Ya duyemîn jî, dema bînyatî (yapisal) ye. Di jineolojiyê de em weke beşa duyemîn a lêkolînê ya dîrokê digirin dest. Ew jî sazîbûyina civakî ku jin di navenda wê de ye vedike. Her wiha pêvajoyê ku bi şaristaniya navendî destpê kiriye û heya niha pêşketinên ku çêbûne, di nava wê de jî reng û rista jinê digre dest. Di destpêkê de çandeke xwedawendiyê heye, lê pişt re çanda xweda û şaristaniyê pêş dikeve, em van jî di vê beşê de digirin dest. Antîteza civakbûnê jî di vê serdemê de derketiye holê, ji ber vê em sedem û rêbazên wê jî di vê beşê de lêkolîn dikin. Mesela derketina olên yekxwedayî, zêdebûna berheman, çînayetî hemû di vê serdemê de pêş dikevin. Pê ve girêdayî derketina dewletê, avabûna deshilatdariyê, binxistin û kolekirina jinê di vê beşê de tê destgirtin. Girêdanbûna jinê bi konevaniyê re, bi aborî û saziyên ku di nava dewletê de sazbûnê ve girêdayî em digirin dest.

Ew beş ji bo me pir girîng e, lewma xistina jinê di vî pêvajoyî de ye. Her wiha pêşketina çînayetî di vî pêvajoyî de ye. Çavkaniya hemû pirsgirekên ku îro di nava civakê de tên jiyîn, di vê pêvajoyê de ava dibin.

Ya seyemîn, dema navîn û dema kurt e. Ew jî piranî ji aliyê zanista pozîtîvîst ve tê destgirtin. Jixwe di çarçoveya bûyeran de tê destgirtin. Dema ku hin bûyer çêbûne û şoreş pêş ketine, hene; di nava van de rista jinê em digirin dest. Di vê beşê de jî zayendperestiya civakî tê destgirtin.

Ya çaremîn jî, di çarçoveya sosyolojiya azadiyê de destgirtina jineolojiyê ye. Di vê mijarê de jî, em bi piranî îroyîn û sibêroja xwe digirin dest. Ji ber ku mijar sosyolojiya azadiyê ye, di azadiya jinê de pengav û xebatên ku pêş ketine, pêşketinên jinê û girêdana wê ya bi civakê ve di vê beşê de tên destgirtin. Pê ve girêdayî, di vê beşê de kêliya azadiyê tê destgirtin. Ji ber vê şêwaza fikirandina jinê; mejiyê hestiyarî û analîtîk, girêdana navbera wan de û qutbûyina di navbera wan de di vê mijarê de tê dest girtin. Di vê beşê de em bersiva pirsa dê çawa jiyaneke azad were avakarin digerin.

Mijareke din jî têkiliya zanistê û paradîgmayê, ango jineolojiyê ye. Têkiliya paradîgmaya me ya bi zanistê ve pir kûr e, mirov ji hev û din nikare qut bigire dest. Zanebûn, zîhniyetê ava dike; zîhniyet jî feraseta jiyanê bi şêwe dike. Li ser vê esasê nirxên civak, mirovî û xwezayî pêş dikevin û kom dibin. Zanebûn weke tiştekî şexsî û tekîl girtina dest, encamên rast dernaxîne holê. Ger mirov bi civakbûnê bigire dest, dê di şexsê wê civakê de jî wateyeke bigire û li ser kesan tesîr bike.

Zanebûn, heqîqeteke ku mirov pê hebûna xwe didomîne û her didome ye. Ji aliyê ontolojîk ve civakî ye. Her zanist û zanebûnek, bala xwe dide ser xwe parastin, zêdekirin û domandina civakê. Ev zanebûn, encameke jiyanê ye, lê di heman demê de jiyanê dixe armanca xwe. Ya her kesî/ê ye. Di civaka xwezayî de jî, her kesek diafrîne. Ji ber vê yekê milk-kirina zanînan tune ye. Piştî

ku şaristaniya dewletperest derdikeve holê, zanîn dikeve tekele hinekan û bi vî rengî dibe amûreke deshilatdariyê. Bi vî rengî ji zanistê bê par hiştina civakê, rê li pêşiya şaristaniya hiyerarşîk û xwedabûnê vedike. Zanebûna ku bi destê xwedawendiyê bûye milkê hemû civakê, êdî taybetmendiya xwe ya xwedabûn û xwedawendiyê winda dike û tiştekî sunî çêdibe. Her ku zanebûn di destê deshilatdaran de pêş dikeve, qarekterê zalim, gadar û dagirker yê xwedatiyê tê parastin. Deshilatdariya di zanistê de jî, bi tekelkirin û milk-kirina zanistê pêk tê. Bi vî awayî xwedabûna zanistê, weke kelameke xweda, bi riya pirtûkên olî û qanûnên dewlet neteweyan, êdî bê nîqaş e û naguhere. Her ku xwedatî aîdî derdorên serdest û zilaman hatiye dîtin, ji jinê re jî dijberî wê evdbûyin maye. Li gel piraniya civakê kolebûna jinê, bi dizîna zanistê ji civakê dest pê dike.

Li gorî efsaneyan Promete ji xwedayan agir didize û ji ber vê yekê tê cizakirin; wî bi latan ve bizmar dikin û her roj ji aliyê têyran ve tê xwarin. Heqîqeta ku di agir de tê ziman, ronahî û zanebûn e. Zanebûna ku weke taybetmendiya xwedayan tê pênasekirin, di cewhera xwe de aîdî civakê ye. Xwedayan dest daniye ser ev zanebûna ku aîdî civakê ye. Ji aliyê xwedayan ve dizîna zanebûnê, dest danîna ser hemû nirxên jinê, qanûn û afirîneriyên wê îfade dike. Ew nirx û afirînerî ji aliyê xwedayên zilam ve tên yekdestkirin. Efsaneya Promete jî, li hemberî ev deshilatdariya xwedayên zilam ku bi dizîna zanebûnê destpê dike, çalakiyek e.

Ji ber ku di hîmê deshilatdariyê de dizî heye, deshilatdar îro jî vê yekê ji xwe re rewa dibînin. Her wiha vê diziyê, bi xwe re rûxandina rêgezên exleqî jî aniye. Di vê derê de tiştê ku ne exleqî ye, ne tenê dizî ye; bêyî ku kedê bidê bûyina xwediyê tiştekî, dest danîna ser tiştekî, tiştên aîdî civakê kirina yên xwe, bêrêziya li hemberî jinê, înkarkirina jinê û hemû nirxên wê, avakirina çîn, tabaqa û deshilatdariyê, yekdestî û milk-kirin ûhwd… Gelek taybetmendiyên ku aîdî şaristaniya navendî ne, mirov dikare weke bê exleqiyê binirxîne.

Îro jî ev bê exleqî berdewam dike. Yekdestiya zanebûnê gihêştiye lûtkeyê, li ser esasê şer û deshilatdariyê pergala metîngehiyê li ser piyan digre. Derewa herî mezin jî, bi riya amarên danûstendinê zanist gihandina hemû civakê ye. Tiştên ku didin civakê bermahiyên kêr nehatî ne. Îro di asteke wisa de zanebûn, ji civakê hatiye qutkirin ku êdî rewa bûye. Zanist tiştekî ji ser civakê re ye, ji civakê qut e û dijbewî civakê ye. Wisa digirin dest. Ji ber ve îro mirov nikare qala zanisteke ku pirsgirekên civakê re dibe çareserî û pêwîstiyên civakê dibersivîne. Îro gelek pirsgirekên civakê hene, weke encama hemûyan jî pirsgireka azadiyê heye; ji bo çareserkirina vê pirsgirekeke ti zanyar serê xwe naêşînin. Lewma zanist êdî dijminê civakê ye.

Îro hemû diyardeyên aîdî mirov û civakê, di asteke pir mezin de bi pirsgirekan re rû bi rû dimînin. Ji ber vê jî divê ev pergal bi awayekî kûr were lêpirsînkirin. Di bingeha hemû parçebûyinên civakî, deshilatdarî, şer û îxanetên dijberî mirovahiyê de, avakirina zîhniyeta şaristaniya navendî ku îro bi Modernîteya Kapîtalîst nûjen bûye heye. Di serdema vê pergalê de her ku zanist pêş dikevin, pirsgirekên civakî jî zêde dibin; ew jî nîşan dide ku ev paradîgma û pergal ne civakî ye û hemû mirovahiyê diavêje nava nexweşiyan. Tevî ku zanist, teknîk û tip ew qesî pêş dikeve, mirov zêdetir nexweş dibin, zêdetir birçî dimînin û zêdetir nezan dibin, ango civak zêdetir zehmetiyan dikşîne û zêdetir dûrî azadiyê dibe.

Ewropaya ku nunertiya xelekeke şaristaniya navendî dike jî, di lutkeyê de nunertiya zanista navendî dike. Têkiliya di navbera deshilatdarî, sermaye û zanistê de, her ku diçe dizivire deshilatdariya şer. Ji ber ku deshilatdarî bi şeran ava dibin û bi şeran tên parastin, zanist jî yekser bi şer ve têkildar e êdî. Di encamê de jî kiryarên weke Hîroşîma derdikevin holê. Ya ku deshilatdaran diparêze amûrên ku vê zanistê derxistine û derdixe holê ne. Ger îro îcatên teknîkî yên şer , çekên qirima civakî tunebana, ne gengaz bû ku deshilatdarên roja me xwe li ser piyan bigirtana. Ji kêliya ku deshilatdariyê diafrîne ve, zanist bê exleq e. Divê naye hêvîkirin ku zanisteke amûrên şer yên deshilatdariyê diafrîne, mirovî û civakî be. Yên ku zanisteke bi vî rengî ava dikin re jî, mirov nikare bibêje zanyar.

Civaknasiya ku weke beşeke vê zanistê tê destgirtin jî, çînîbûnê teqez dibîne. Ji ber vê di destpêk û hîmê wê de şaştî heye. Giştîbûna civakî, giştîbûna heqîqetê ye. Her nêrîn, teorî, zanîn û zanista ku giştîbûna civakê parçe dike, ji heqîqetê qut dibe. Civakbûn bi vê nêrînê birîndar dibe. Di heman nêrînê de bi parçe mezîkirina gerdûn, dûne û xwezayê jî heye. Bi heman nêrîna determînîst, mirov jî tê destgirtin.

Tevî ku navê wê civaknasî ye, ji civakê qut bûye. Daneya vê ya herî mezin jî, di civaknasiya îro de tunebûna jin û mîsyona wê ye. Ji wê jî wêdatir jin tê retkirin û mer weke kirdeya esasî tê dîtin. Civaknasiya heyî, zayendperest e. Aliyê wê yê herî şaş jî, jina ku ji zêdetirî civakê pêk tîne nake mijara zanistê. Her wiha heqîqeta jinê ku civakbûna ewil pêk aniye, weke zanist nagire dest. Paradoksa herî mezin a zanistê, ev e. Ew ne xeletiyek e, lewma zayendperestî ne xeletiyek e, ji aliyê zilam ve hatiye înşakirin. Dijberî vê ger civaknasî dixwaze bi civakê ve bibe yek, divê xwe ji zayendperestiyê rizgar bike.

Ew nêrîna deshilat ku bi Darwînîzmê gihêştiye lûtkeyê û bi pergal bûye, zanistên civakî jî jehrî kirine. Qraltiyê weke şêrtiyê pênase dike û dibêje “divê di her maleke de şêrek hebe.” Gotinke trajî-komîk e. Komkûjiyên ku îro pêş dikevin jî, zîhniyeta xwe ji vê derê digirin. Li gorî vê teoriyê her cureyeke hebûnê, li ser esasê hebûna xwe

parastinê, bi hebûnên din re di nava pêşbirkê û şer de ye. Dibêje, dê kî bi hêz be ew ê bi ser bikeve. Ev yek jî weke cewhera mirov girtina dest, kûştina civakbûnê ye.

Civakbûnê, mirov ji hemû hebûnên din cuda kiriye. Civakbûn, bi exleqê mirov pêş ketiye. Mirov, ew hebûna ku di herikîna gerdûnî de, derketiye dervayî qalibên xwe û sînorên xwe derbas kirî ye. Lewma rêgez û qanûnên exleqî pêş xistine û li derdora vê exleqê rêbazên çareserkirina zehmetiyan honandine. Bêyî ku mirov di navbera hebûnan de hiyerarşiyê ava bike û mirov jî di nava vê hiyerarşiyê de dîne serê; divê mirov ev pêşketina mirov û heqîqetê fêm bike. Ji ber vê yekê rêbazên heqîqetê û rêbazên civaknasiya îro jî ji hev û din cuda ne. Ji ber vê yekê nêzikatiyên determînîst şaş in. Hin tevgerên dijî pergalê jî, xwezayê weke cihekî esasî yê rizgarbûnê dibînin û jiyana mirov jî yekser dadixînin heman şêwazê. Ev jî dijberî xwezaya mirovahiyê ye.

Xwezaya mirov, xwezaya civakî ye û mirov nikare bi jiyana hebûnên din ve bike yek. Xweserbûna her hebûnekî heye. Xwezaya mirov jî, bi exleqîbûn û polîtîkbûnê ve girêdayî ye. Hin rêgezên gerdunî ku pê xweza tê destgirtin hene. Lê ev rêgez daxistina jiyana mirov civaknasiyê jehrî dikin. Her wiha vê nêzikbûnê nêrîna şoreşê ya sosyalîst û şoreşgeran jî kêm hiştiye. Xwezaya mirovan, bi rêgezên hişk yên gerdûnê naye fêmkirin. Lê ger em jiyana azad ya mirov, bi şênberbûyina cudabûna mirov a gerdûnê bigirin dest, dê hêza me ya fêmkirina mirov jî zêde bibe. Ji aliyê

hejmarê ve hatina gel hev a gelek mirovan, civakê ava nake. Dema mirov dibêje, mirovahî divê diyardeyeke hejmarî naye bîra me. Mirovbûyin, bi xweserbûyin û taybetmendiyên mirov; ango bi rastiya civakî ku heqîqetê pêş dixe gengaz e.

Di şênberbûyina sosyalîzma ku weke lûtkeya civaknasiyê tê pênasekirin de, rista mûhendîsiyê li ser şoreşê bar kirin jî, şoreş weke xwedayê nû dîtin e. Risteke wisa li şoreşan barkirin û ji têkoşînên şoreşgerî hêviya avakirina civakeke nû kirin, nêzikbûneke ku divê were lêpirsînkirin e. Ji ber vê yekê tevî ku têkoşînên şoreşgerî darbeyên mezin pergalê dane û serkeftin bi dest xistine, di asta ku tê xwestin de ser neketine û alternatîf pêş nexistine. Lewma rista ku divê bidana mirov û civakê, dane şoreşeke ku li ser şênberbûyineke bi vî rengî.

Marksîzma ku lûtkeya civaknasiya navenda wê Ewropa ye jî, ev nêzikbûna şoreş û sosyalîzma Ewropayî esas girtiye. Ji ber vê gotina şoreşê, Îsa’yê 2 hezar sal berê ve yek e. Şoreş, mesîh û rizgarkerekî nû ye. Ya ku civak divê bike jî, li benda wî mesihî sekinîn û ji bo wî dua kirin, an jî xwestina wî ye. Feraseta ku mirovan dixe nava qederperestiyê û ji rista avaker ya civakê qut dike jî, ev feraseta şoreşê ye. Divê mirov şoreşê, weke ji nû ve avabûnê-înşayê bigire dest. Lê îro şoreş bi piranî weke rûxandin tê pênasekirin. Lê ji bo înşaya civakî, jiyana demokratîk û azad, guhertina vê nêzikbûnê pêwîst dike.

Ger tu rista Mesîhtiyê bidê şoreşê, dê tuyê rista xwedatiyê jî bidê şoreşgeran. Lê şoreşger, da ku civak jiyana xwe ya xwezayî bijîn, astengiyên ku derdikevin pêşiya civakê ji holê radikin. Divê civak xwe nû bike û ji nû ve biafrîne. Ger tu rista xwedatiyê bidê şoreşgeran, dê şoreşger hem derkevin dervayî rastiya dîrokî, hem jî nikarin di nava civakê de, di jiyankirina rastiya xwe ya civakî û înşayê de rista xwe ya pêşengtiyê bîlîzin. Rista şoreşgeran, ne bûyina xwedayê civakê ye. Divê di têkoşîna ku astengiyên pêşiya civaka exleqî û polîtîk radike de, rista pêşengtiyê bîlîzin.

Têkoşîna Azadiya Kurdistanê ku di dîroka Rojhilata Navîn de xwediyê wateyeke mezin e, di civaka Kurd de şoreşên mezin çêkirine. Van şoreşên zîhnî, di feraseta giştî ya Rojhilata Navîn de tesîreke mezin kiriye. Bi taybetî Şoreşa jinê, di destpêkê de li Kurdistanê, ji hemû herêmê re pêşengtî kiriye. Vê yekê weke di nava şoreşê de şoreş pênase dikin. Ji ber vê yekê civaka Kurdistanê jî, rista avakirina civakê dide gerîlayên Tevgera Azadiyê. Lê ji ber ku gerîla di demên borî de risteke wisa li xwe bar kiriye, civak cihê ku îro sazîbûn û înşaya xwe pêk bîne, her tiştekî ji gerîla hêvî dike. Bêguman gerîla di înşaya ziman, çand, exleq û civakbûna Kurdistanê de berdelên giranbiha dane û risteke mezin lîstiye. Lê divê êdî civak bi xwe, civakbûyina xwe ava bike û bimeşîne. Divê şoreşger, astengiyên ku derdikevin pêşiya têkoşîna înşaya civakê ji

holê rakin û ji bo domandina vê civakbûnê piştgirî bidin. Li ser vî hîmî, ji aliyê civaknasiyê ve jî, wê rista xwe ya dîrokî bîne cih.

Ger zanista civakî, bi rastî jî dixwaze civakî be divê vegere paradîgmayeke şaristaniya demokratîk. Bi vî rengî dikare pêşengiya avirîneriya şoreşê û jiyana azad jî bike. Di rewşa heyî de zanista civakî, ji paradîgmaya şaristaniya demokratîk pir dûr e. Hê jî xwe ji daneyên teqûz, gerdûniya tîr, nêzikatiya rast bi rast pêş ve diçe û determînîzmê xwe qut nekiriye. Ango xwe ji paradîgmaya şaristaniya navendî rizgar nekiriye. Ger dixwaze mirovahî ji ew kendalê ku kêm maye jê bikeve rizgar bibe, divê xwe ji paradîgmaya şaristaniya navendî rizgar bike; divê bi hêz û hêvî, bi angaşt û bi biryar ber bi paradîgmaya şaristaniya demokratîk ve gav biavêje.

Determînîzma ku ji aliyê ontolojîk ve yekalî diherike jî, bîrdoziyeke zilamtiyê ku rê derketî ye. Weke me got, yek alî ye. Ew yekalîbûna xwe ebedî dîtin jî, wê ber bi dogmatîzmeke hişk ve dibe. Her tiştî dike yek û bi yekdestiya faşîzmê, korbûyineke ji civakê dide jiyîn. Ji pir-rengiya ku taybetmendiya sereke ya gerdûnê ye tehemûl nake. Lê ger em şert û mercên îro jî li ber çavan bigirin, da ku bi hev re jiyanek pêş bikeve, pêwîstî bi çandeke demokratîk û kombûyineke zanistî heye. Ger mirovahî, rastiya hebûnî ya gendûnê fêm bike, dê di xwesertiya xwe de, pê ve girêdayî xwebûna xwe jî nas

bike. Bi vî rengî dê tê bigihêje ku cudabûn, dewlemendî ne. Bêyî ku ew yek were fêmkirin, di xeta raste rast û yekalî ya mejiyê teng de hewildanên fêmkirina gerdûnê jî vala ne.

Cihê dogmatîzmên olî, qanûnên gerdûnî, raste rast pêş dikevin yên zanistê girtine. Ev yek tenê dogmatîzmê bi zanistê rûpoş dike û cemidandina zîhniyetê îfade dike. Kiryar û mînakên ku rojane bi vê mantiqê pêş dikevin hene. Bi taybetî kiryarên dij-mirovî ku di dewlet neteweyê de şênber bûne û li ser jinê tên meşandin, bingeha xwe ji vê zîhniyetê digirin. Di paradîgmaya şaristaniya navendî de, hemû dane ji berê ve hatine diyarkirin. Weke nîşaneya vîna azad, rê li pêşiya nirxandin û guftogoyê hatiye girtin. Zanist jî tenê van dane û agahiyên şaristaniya navendî, berfireh û kîte dikin. An jî di çarçoveyê de tînîn ziman û dixwazin her kesî/ê pê qaneh bikin. Tevî ku metafîzîka olî tê rexnekirin, bi metafîzîka zanistî, careke dîtir heqîqeta civakî ji holê tê rakirin. Ji ser her tiştî re girtina zanistê jî, deshilatbûyina zanistê bi xwe re tîne û her tiştê ku bûye deshilat jî, dijî civakê ye.

Çawa ku rêbaza mîtolojiyan ava kiriye, ji aliyê olan ve vegeriyaye dogmayan; rêbaza zanistî jî ev dogma di formeke nû de li ser civakê ferz kiriye. Her çiqasî zanist li dijî rêbaza ol xwe gerdûnî pênase bike jî, ya rast ne pirsgireka heqîqetê ye, di navberê de şerekî deshilatiyê heye. Her çiqasî hewildana fêmkirin û naskirina xwezayê,

nûbûyin û îcat pêş xistin bi wate bin jî; rêgezên zanistê ku xwezayê dikin bin serweriya xwe û destdirêjiya li ser xwezayê weke rêgezeke zanistê pênase dikin, bi F. Bacon gihêştine lûtkeyê û îro gelek hevkarên wî hene. Ji komkûjiyên civakî zêdetir, ev zanist û zanyar zirarê didin civakê. Pîşeya van kesan jî kûjeriya zîhniyetê ye.

Heya ku civaknasî xwe ji vê kûjeriyê rizgar neke û da ku hemû zanist ji vê kûjeriyê rizgar bibin nekeve nava hewildanan, ne dikare civakî be, ne jî dikare bibe rastî û heqîqet. Lewma bi gotina Serokatî, “civaknasî, qralîçeya dayik a hemû zanistan e.” Bêyî ku mirov û civak hebe, ti wateya zanist û zanyariyan tune ye. Gerdûn jixwe di nava xwe de, xwediyê zanistiyeke mezin e. Ev zanistên ku di mirov de bi wate dibin jî, tenê ji bo ku jiyan zêdetir wate bigire û jiyana azad were jiyîn pêwîst dikin.

Ger zanist, mirovan ber bi azadî, jiyana bi wate û xweşik ve nebe, dervayî heqîqetê ye. Pêwîstî bi civaknasiyeke ku civakê parçe dike û tebaqayan ava dike tune ye. Pêwîstî bi civaknasiyeke ku li her cih û demeke de, giştîbûn û heqîqeta civakê diparêze heye. Her wiha divê hemû xebatên xwe bispêre civakê û li dijî yekdestbûyina zanistê bisekine. Divê zanistê bike ya civakê.

Li gorî zanista serdest, her tiştek bireser û amûr e. Lewma da ku deshilatdar bibini kirdeya esasî, divê hemû civak, xweza û hemû hebûn bibin bireser. Ger civaknasî

xwe ji vê nêzikatiyê rizgar neke, dê nikare heqîqeta civakê jî derxîne holê û dê rastiya civakê her perde bike û wê her xizmetî deshilatdaran bike.

Parçekirina civakê, parçekirina hemû nirx û afirîneriyên civakê ye. Her wiha bireserkirina civakê ye. Her wiha cudakirina mejiyê analîtîk û hestiyar, di pênasekirina pêkhatina şêwe de xwediyê wateyeke be jî, cudakirineke tûj û dijwar ne rast e. Bi taybetî ji bo jinê dibêjin, xwediyê mejiyeke hestiyar e û vê yekê weke paşverûtiyeke digirin dest. Dijberî wê mer jî xwediyê mejiyê analîtîk e, dikare bi pêşbinî nêzik bibe û plansaziyan çêbike. Bi kurtasî ev berovajîkirinek e. Mînak, şoreşa neolîtîkê ku jinê pêşengtiya wê kiriye, bilindbûyina bi wate ya mejiyê analîtîk e. Exleqa ku encama mejiyê analîtk e, pergalbûyina qûnûnên ku li derdora jinê hatine honandin  û ji aliyê hemû civakê ve hatine hembêzkirin e. Mejiyê analîtîk ku aîdî zilamê afîrînerê pergala çînî, dewletî û hiyerarşiyê ye jî rêderketinek e. Pêşketina ezezî, ajo û destdirêjiyê ye. Di mejiyê analîtîk de aliyekî berovajîbûnê heye. Ger baş were karanîn dikare şoreşan jî ji mirovahiyê bide kirin, lê dema ku şaş were karanîn, dê mirovan pergaleke metîngeriyê ku hezaran salan berdewam bikeve ve rû bi rû bihêle. Jixwe pergala heyî jî, di encama berovajîbûneke wisa de derketiye holê.

Ji aliyê din ve mejiyê analîtîk azadiya mirovahiyê ye. Li dijberî mejiyê hestiyar, taybetmendiya rêderketinê ya mejiyê analîtîk, dikare azadkirinê jî di nava xwe de bihewîne. Ger mirov bikaribe hilbijêre, hilbijêreke azadiyê heye. Ger ev hilbijêra xwe li ser esasê rastiyê, tiştê ku bi xwezaya xwe ve di nava ahengiyê de ye bike û encamê jî li gorî wê bigire, ango ger heqîqet hatibe hilbijartin, dê azadî jî teqûz be. Di mejiyê hestiyar de ev yek tune ye. Mejiyê hestiya ya heyî hildibêjêre, bê nîqaş û ji rêderketinan re ne vekirî ye. Ji dibêtiyan re ne vekirî ye. Jin jî bi hêz e, lewma jin hebûneke jiyanê didomîne ye. Ji ber ku hebûna gerdûnî ava kiriye û domandiye, mejiyê hestiyar di jinê de xurt bûye. Di heman demê de qesî ku ji mirovahiyê şoreşan bide kirin, di jinê de mejiyê analîtîk heye. Ger îro jin bûbe bireser, keda jinê hatibe talankirin û înkarkirin, nirxên jinê her di bin gefa destdirêjiyê de bin, ji ber berovajîbûna mejiyê analîtîk e. Ger civaknasî di navbera van herdu mejiyan de hevsengiyeke ava bike û kirdebûn-bireserbûnê ji holê rake, hebûna azad li hemû civakê bide fêmkirin, dê wê demê bibe civaknasiya rasteqîn û wateya zanistan, ango heqîqetê derxîne holê.

Ji bo civakan nirxê zanistên ku di nava têgeh û diyardeyên nediyar de tê fetisandin, tune ye. Pergalên dewletî, ji ber ku nikarin ti nirxan biafrînin, civakan bi van zanistên kêrnetahî ve rû bi rû dihêle. Qetilkirina jinên şîfager-bijijk û cihê wan bi zilamên xwedî bawername tijîkirin, mînakeke biçûk ya vê rasityê ye. Ji zimanê van

jinên şîfager her kes fêm dike, lê zimanê bijîjkên xwedî bawername tenê kesên weke wan fêm dikin. Pir balkeş e, ji bo ku nivîsa wan ti kes fêm neke, di bin navê "nivîsa bijîjkan" de, cureyeke nivîsê ku dûrî estetîkê ye pêş xistine. Armanca me ne suçbarkirina bijijkan e, em dixwazin yekdestiya zanista îro diyar bikin. Zanist di asta ku ji civakê qut dibe de, yekdest dibe û dikeve xizmeta deshilatdaran.

Zanisteke ku civakê parçe neke dikare azadîxwez be. Gava yekemîn ya parçekirina civakê jî, deshilatdariya zilam ku li ser jinê tê pêşxistin e. Li ger xweserbûna wan, di nava gerdûnê de weke jin û mer dûbendiyek heye. Lê ew dûbendî, weke jina kole û merê serdest hatiye berovajîkirin. Civaknasiya ku nikare ev dûbendiya berovajî ku hezaran sale didome ji holê rake, nikare bibe civaknasî. Hemû çalakî, sazî, pergal û saziyên ku şaristaniya navendî xwe dispêrê, zayendperest in. Hemû jî li ser hîmê zayendperestiya di zanistê de pêş ketine. Îro her kêliyeke jiyanê, bi van mînakên zayendperest dagirtî ye. Di rewakirina vê zayendperestiyê de, risteke mezina a dadgerî û tipa îro jî heye. Zanista ku ev zimanê mêrane neguherîne, nikare civakî bibe. Zayendperestiya di zanistan de derbaskirin, tê wateya azadkirina hemû zanistan. Tenê zanista ku xwe ji zayendperestiyê rizgar kiriye, dikare azad be û tenê wê demê dikare heqîqetê derxîne holê.

Azadiya civakê, ji aliyê exleqî û polîtîk ve bi hebûna wê ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê heya ku civak hebe, dê exleq û polîtîka jî hebe. Ger mijara gotinê civak be, exleq û polîtîka ebedî ne. Ji ber vê yekê şaristaniya navendî ku li dijî civakbûnê pêş dikeve, li gel exleq û polîtîkayê tên beramberî hev. Qûral û rêgezên exleqî ku ji aliyê civakê ve tên diyarkirin û polîtîkayên ku ji bo domandina ew jiyana bi exleq hatine diyarkirin, azadiya civakê îfade dikin û hîmê pergala şaristaniya demokratîk jî datînin. Tevî dewlet, împaratorî, kraltî û despotan civakan hezaran salan karîne jiyana xwe ya azad bimeşînin. Civakên ku nikarîne van xweserbûnê xwe biparêzin jî, ji holê rabûne. Lê tevî komkûji û qirkirina jî, civakan di jiyana xwe ya azad de israr kirine.

Tê zanîn ku îro li Rojhilata Navîn gelek civak li hemberî hemû siyaset, bîrdozî û olperestiyên serwer û zayendeperestiyê bi parastina bawerî, çand û zimanê xwe ber xwe didin. Ev yek sekneke li dijî pergalê ye û bi zanebûna hatiye hilbijartin. Li ser vê esasê dûrûşmaya “berxwedan jiyane” jî, ji aliyê dîrokê ve wateyeke mezin digire. Ger divê jiyan, li gorî xweserbûna civakan divê azad were jiyîn û ji bo vê berxwedan pêwîst bike, jiyana civakê bi berxwedanê ve dibe yek. Li ser vê esasê dîroka civaka exleqî û polîtîk, em dikarin weke dîroka pergala şaristaniya demokratîk jî pênase bikin. Dîroka berxwedanê ya hemû bawerî, kewm, jin, çand û civakan, dîroka şaristaniya demokratîk ava dike. Lewma şaristaniya

demokratîk, exleq û polîtaka ye. Li dijî her cureyê hegemonyayê, milk-kirinê, yekdestiyê, zayendperestiyê, tepisandin û metîngehiyê ye. Her wiha lêkolînên û lêgerînên exleq û konevaniyê, hîmê feraseta civaknasiya nû jî diavêjin.

Li dijî qanûnbûyin û sazbûyina nêzikatiyên dervayî civakbûnê, civak bi paradîgmayeke nû dikare bigihêje wateya xwe ya rasteqîn û ger mirov, bi civaka xwe re bibe yek dikare azad jiyan bike. Ger em bikaribin li ser vê esasê dîrokê ji nû ve bigirin dest, em dîrokê ji dewlet, împaratorî, qirkirin, komkûjî, şer û deshilatdaran rizgar bikin, em dikarin li derdora şaristaniya demokratîk civaknasiya nû ava bikin. Jixwe armanceke sereke ya jineolojiyê jî ew e. Her wiha divê em bizanibin ku dîrok li ser keda jin û bindestan pêk hatiye. Paradîgmaya nû, ew e. Ev nêrîn, bingeha herî mezin a paradîgmaya şaristaniya demokratîk e.

Gelo em çima di bin navê paradîgmaya Şaristaniya Demokratîk de pêwîstî bi paradîgmayeke nû dibînin? Bêguman, da ku em azad bijîn. Ew sedsalê dawî her hate gotin ku paradîgmaya kevn pûç bûye. Rast e, lê heya ku em paradîgmayeke alternatîf pêş nexin û pratîzê nekin, em ê her neçarî ew paradîgmaya pûç bûyî bimînin. Her wiha pirsgirekên ku di pênaseyên şaristaniya heyî de derdikevin, pêwîstiya pênaseya şaristaniyeke nû derdixînin holê. Jiyana civakê ku di encama hemû

afirîneriyên mirovahiyê de heya roja me hatiye, hemû kombûyina hêza fikrî û fîzîkî ji aliyê şaristaniya serwer ve hatiye xespkirin. Bêyî ku ew qesa ked û afirîneriyên mirovahiyê û civakê hebin, şaristaniya navendî jî nedikarî xwe li ser piyan bigire. Lê hem van ked û afirîneriyan xesp dike, hem jî înkar dike. Ji ber vê yekê divê paradîgmayeke alternatîf pêş bikeve. Jixwe pergala şaristaniya demokratîk ku em weke paradîgmaya alternatîf destnîşan dikin jî, pênaseya jiyana civakî û mirovahiay azad ku heya roja me kariyê hebûna xwe bidomîne ye. Ger bi awayekî ku ji hemû cureyên dewlet û deshilatdariyê hatiye paqijkirin, ji nû ve pênasîya şaristaniya demokratîk were kirin, dê di civaknasiyê de şoreşek pêş bikeve.

Dîroka fermî (history) ya împaratorî, dîktator, dewlet û zilaman demogojiyeke şaristaniya navendî ye. Fêmkirina şaristaniya demokratîk jî, bi rûxandina vê demogojiyê û bi nêrîneke azad a dîrokê destpê dike. Dîrok weke dema derbasbûyî girtina dest, hêleşaşiyeke bi vê mijarê ve girêdayî ye. Kesên ku nikarî xwe ji bin tesîra şaristaniya navendî derxînin, dîrok û dem bi seatan tê pîvîn. Seat, amûreke ku şaristaniya navendî bi karanîna wê kesan dixe nava pergala xwe ye. Di vê pergalê de dervayî seata û reqaman, pênasyeke demê tune ye. Di çavê hin kesan de jî, dem weke diyardeyeke ku li keleka wî/ê diherike û derbas dibe ye.

Wê demê dem çi ye, çima em demê weke rûbarekî herikîna jiyana xwe pênase dikin? Dem, di cewhera xwe de mirov e. Jiyan, dem e. Ger mirov gavan diavêje, diaxife, hin tiştan jiyan dike, dibêje û dikeve nava çalakiyê; ew yek dem e. Ger ev gava ku tê avêtin, nûbûyin û îcadên nû ava dike, ew jî dibe dîroka nivîskî. Ango tiştên ku di kêliyeke de ava dibin û ava dikin, di kêliyeke din de dibin dîrok. Civakbûyina dîrokê jî ev e. Pênaseya "dîroka civakî" jî hîmê paradîgmaya şaristaniya demokratîk diavêje.

Ger mirov xwe weke biresereke nebînin, dê pirsgireka dîrok û demê jî were çareserkirin. Demên ku tên kûştin, an jî vala diçin tune ne. Lê jiyanên ku vala diçin û tên kûştin hene. Ger mirov bi wate jiyan neke û dema xwe berhewa bike, ev yek kûştina jiyanê ye. Mirovên ku bi demê re dikevin nava pêşbirkê jî, bi xwe re dikevin nava pêşbirkê. Rastiya ku dibêje mirov dem e, rastiya civak dîroke ve girêdayî ye. Bûyina dîrok a mirov jî, bi derbaskirina sînorên xwe û bi civakbûnê ve gengaz e. Dîrokîbûyin jî, mirov nêzikî heqîqetê dike.

Li ser vê esasê em dixwazin xwe, hev û din û hemû mirovahiyê û jiyanê fêm bikin û jiyanê azad bikin. Jixwe di çarçoveya van pênaseyan de em dikarin bibêjin, tiştê ku hêvî dide me, xeyala jiyana azad careke din dixe rojeva me jineolojiya zanista jin û jiyanê ye.

Em, xwe weke alternatîfa hemû zanistên serdestiyê dibînin. Ji ber vê em weke tez van her çar beşên ku me anîn ziman digirin dest. Bi vî awayî mirov dikare pênase bike. Her wiha di nava herikîna waneyê de em ê weke beşeke cuda mejiyê hestiyar û analîtîk jî bigirin dest. Li ser vê esasê em di destpêkê de dixwazin hinekî nêrînên hevalan yên li ser jineolojiyê bigirin. Ger em li ser lêgerîn û lêpirsînên jineolojiyê nerîneke hevpar derxînin holê, dê beşên dîtir yên waneya me jî, bi awayekî giştî jineolojiyê timam bikin.

**Hevalê X…:** Jineolojî, ne tiştekî wisa ye ku mirov di çend rojan de û salekê de nîqaş bike û derbas bike ye. Pirsgirekên ku jineolojiyê girtine dest, 5 hezar salin berdewam dikin. Pirsgirek jî ne tenê ya jina Kurd e, pirsgireka hemû civakê û cîhanê ye. 5 hezar salin berdewam dike û heya roja me hatiye. Vê yekê li ser fêrbûyin, orf û adetên me jî tesîr kiriye. Ji aliyê nêrîna jinê ve di kesayet û feraseta me de hin tişt hatine rûniştin. Ne tiştekî wisa biçûk e ku mirov bibêje bi nîqaşa çend salan em encam bikin û bi hin tevdîran ji holê rakin e.

Pirsgirekeke esasî ya civakê ye. Ger pirsgireka jinê were çareser kirin, weke ku Serokatî jî dibêje, dê hemû pirsgirekên civakê çareser bibin. Mesela di nîqaşeke me de hevalan got, “*hûn jinê, an jî mêr çawa dibînin?*” Hevalekî jî got, “*jin, mirov e.*” Dibe ku wisa xwezayî jî hate bersivandin, lê têgihiştin û nêrînên me nîşan dide.

Mesala di nava civakê de carnan jin piştî sewalan tê destgirtin. Ango carna weke mirov jî nayen destgirtin. Em van tiştan hinekî henekî digirin dest, lê rastiya me ye.

Dewlet û pergala heyî, di zarokatiyê de serê mirovan de nêrînan ava dike. Di dibistanê de keçan li rêza pêş dide rûnişkanidin û zarokên xort piştê dide rûnişkandin. An jî di dibistanê de jî ji bo jinê hin qalibên jiyanê ava dike, ji bo xort jî qalibên cuda ava dike. Tu nikarê derkevê dervayî ev sînorên hatine diyarkirin. Di malbatê de jî wisa ye, di civakê de jî wisa ye. Ango feraseteke mayinde ku bi awayekî hişk di serê civakê û mirovan de hatiye rûnişkandin e. Ji ber vê ne pirsgirekeke ku mirov bi çend nîqaşan derbas bike ye.

Li hemberî vê dema ku mirov rastiya têkoşîna me û di nava têkoşîna me de rastiya jinê dimezîne, asta ku hatiye girtin di nava ti tevger û civakan de tune ne. Jin bi sekna xwe, bi têkoşîna xwe, bi şoreşgertiya xwe, bi keda xwe gihêştiye asteke pir xurt. Îro hemû cîhan jinên Kurdistanê ji xwe re mînak digirin. Mesala Şoreşa jinê, ji ber ew qarektera xwe di hemû cîhanê de olan dide. Em dikarin bibêjin, PKK jî partiya jinê ye.

Du armancên sereke yên jineolojiyê hene. Ya yekemîn, divê rewşa jinê û pirsgirekên ku îro dijî dayne holê û pênase bike ye. Ya duyemîn, pirsgirekên wê çareserkirin e, ji bo wê yekê têkoşîn dayin e.

Îro ne tenê zilam, jin jî ketiye nava qaliban; an jî rewşa tê de pêjirandin, jê re sûtî tewandin û weke qeder girtina dest heye. Mesela di nava partiyê de jî tevî ku em gihêştine asteke mezin, hê jî di nêrîna jinê de hem di hevalên xort de, hem jî di hevalên jin de hêleşaşî hene. Mesela hê jî akademiyeke me ya rêk û pêk ku jin û jineolojiyê digre dest tune ye. Mesala li Bakur, di bin navê jinê de hin akademî hatine vekirin, lê perwerdeyeke bi naverok tune ye. Her wiha divê tenê hevalên jin, di wan akademiyan de perwerdehî nebînin, divê hevalên xort di wan akademiyan de werin perwerdekirin. Lewma pirsgirek ne tenê pirsgireka jinê ye, pirsgireka civakê ye. Civak jî tenê ji jinan pêk naye. Jixwe di vê mijarê de qalib, nêrîn û nêzikatiyên xortan xetertir in, ji ber vê divê di destpêkê de ew werin perwerdekirin. An na dahûrandinên me yên jinê, ji asta sosyalîzma pêkhatî derbas nakin.

**Hevala X…:** Ev mijar ji bo me hemûyan nû ye. Ji 2005’an ve bi riya paraznameyên Serokatî ket rojeva me û tê nîqaşkirin. Em nikarin bibêjin, bi awayekî giştî me ev mijar fêm kiriye. Lê hewildanên me hene ku em fêm bikin. Ji bo ku em bikaribin fêm bikin jî, pirs, nîqaş û kûrbûyin pêwîst dike. Lewma pêjeroja me hemû bi vê mijarê ve girêdayî ye. Ne karekî ku di çend rojan de were çareserkirin e.

Di hemû paraznameyên Serokatî de, netew, dewlet, jineolojî heye. Lê her ku diçe Serokatî di van mijaran de kûrbûyinê dide çêkirin. Serokatî negot, *“em mijarên netew, dewlet û demokrasiyê çareser bikin û pişt re dest bi vê mijarê bikin.*” Hemû bi hev re girtin dest û bi hev re nîqaş kirin. An jî Serokatî ti pirsgirek taloqî serdemeke cuda nekirine. Yên ku vê guhertinê bidin çêkirin jî, şagirtên riya azadiyê ku me pê baweriya xwe anî ye. Yên ku ev têkoşîna Serokatî bigihînin lutkeyê jî ev kes in.

Ango mijareke rojane ku di nava têkoşînê de were pêşxistin e. Di vê mijarê de divê em kêlî bi kêlî lêhûrbûn çêbikin, da ku em bikaribin guhertinan jî çêbikin. Weke têgeh heval carna dibêjin, “*me ji ku winda kiribe, em vegerin wê derê.*” Ji vê yekê tiştê ku teye angaştkirin, tenê ne weke sal û cih girtina dest e. Cihê me winda kiriye, mijara jinê ye. Di binketin û ketina xwedawendiyê de me winda kiriye. Ew e ya ku ew qesî afirînerî çêkirine, ew qesî mirov anîne dûnê. Ya ku qolincên zayinê yên mirovahiyê kişandiye. Ne ku bi awayekî teng jin dibêje, me deshilatdarî ji mêr girtiye, em jî mafê xwe dixwazin.

Em jî weke jin dixwazin ew çanda xwedawendiyê xwedî derkevin. Ne tenê çanda jinê ye jî, mîras û çanda mirovahiyê ye, em dixwazin li wê xwedî derkevin. Em nabêjin, weke jin heqeret li me hatiye kirin û em jî dixwazin tola xwe bigrin. Em jî weke jin, ji texrîbet û xirabiyên ku di nava civaka kevneşop de çêbûne rizgar

nebûne. Em dixwazin vegerin cewhera xwe, çanda xwedawendiyê. Li ne tenê weke jin, weke civak em dixwazin vegerin cewhera xwe. Da ku em bikaribin tiştên ku me winda kirine, dîsa dest bixin. An na tiştê ku em niha jiyan dikin, ne cewhera jina xwedawend û afirîner e.

Serokatî jî dixwaze di me de vê yekê ava bike. Ji ber vê jineolojiyê weke zanisteke digre dest. Mesala dibêje, *"zanistiyên ku pêş ketine çi ne, li ser wan kîjan texrîbat hatine pêş xistin*?" Van tiştan yek û yek vedike. Dibêjin, "*ger kevir biaxife, wê bibêje her tişt derew e."* Ango her kesekî/ê li gorî xwe şîrove kiriye. Ger her kesek rastiyê li gorî xwe bîne ziman, wê demê li holê rastî namîne. Ji ber vê tiştê ku Serokatî dixwaze bike, ji nû ve vegerandina cewher û pelên nirxên mirovahiyê ye. Di nava van pêlan de gelek tişt hene. Hevalan digot, *"ger ew felsefeyek be, em çima dîrokê nîqaş dikin?"* Jixwe ger em rastiyên dîrokê fêm nekin, em nikarin têkoşîna wê jî bimeşînin, felsefeya wê jî pêş bixin.

Çima Serokatî pêwîstî bi jineolojiyê dît? Bi rastî jî wateya azadiyê lê bar kir û barekî wisa da ser milê me. Ango dê jineolojî barê azadiyê rabike. Azadî jî çêbûyina civakê ye. Mesala Serokatî dibêje, "weke jin hûn ê 9 hezar sal lêkolîn bikin, li ser esasê encamên ku ji wê derê derdikevin hûn ê vê têkoşînê berdewam bikin. Li gorî vê jî heqîqetê derxînin holê." Ji bo vê yekê jî ne tenê jin,

hemû civak berpirsyar e. Lewma armanca me ne tenê azadiya jinê ye, avakirina civakeke exleqî û polîtîk e.

Akademî jî tenê ji bo jinê nayen vekirin, dê hezaran mirovên ji zayend û temenên cuda di van akademiyan de wane bibînin. Lê di encamê de ya ku ji vê yekê re serkêşiye bike, dê jin be. Ango pêşxistina civakeke exleqî û polîtîk û pêşxistina azadiyê li ser milê jineolojiyê dimîne.

**Hevala X…:** Hevalan got, "hê jî mirovbûn û ne mirovbûna jinê tê nîqaşkirin." Jin ew zayende ku berhemdarî û afirînerî pêş xistiye û pêşkeşî hemû civakê kirî ye. Ya rast, jin ew diyardeya ku mirov kiriye mirov e. Divê mirov wisa bigre dest. Mesela di hemû mijarên me yên paradîgmayê de em bi neolîtîkê destpê dikin. Ew jî pêvajoyekî jinê daye destpêkirin e. Cihê ku zanista azadiyê û jineolojiyê destpê kiriye jî, ew pergal û serdema ku jinê derxistiye holê ye.

Dema ku em jineolojiyê digirin dest, divê mirov jinê weke şaneya bingehîn pênase bike. Lewma cihê despêkê ye. Ji destpêkirina mirovahiyê ve, ji rabûna ser piyan ya mirovahiyê ve jin risteke wisa dîlîze. Afirîneriya ewil, berhemên ewil, zanista ewil, komkirin û cotkariya ewil; li ser vê esasê civakek honandin karê jinê ye. Ango divê mirov weke diyardeyeke ku civakê çêdike ye bigire dest.

Serokatî dibêje, “divê em, li cihê ku me winda kiriye heqîqetê bigerin.” Dema ku mirov ji vî alî ve digre dest, sê pêvajoyên şikestina civakî hene. Sedemên sereke ku jin îro nikare rabe ser piyan jî, di van pêvajoyên şikestinê de hatine jiyîn. Jin weke xwedawend, ango afirînera her tiştî tê pênasekirin. Ango her tiştî diafrîne û pêşkeş dike, lê îro di destê wê de tiştek nemaye. Wê demê ger em ê jineoliyê bigrin dest, divê em dîrokê rast şîrove bikin û li ser wê esasê riya xwe diyar  bikin. Ew yek tenê ji ber pêşxistina zanistê ya jinê ye jî.

Piştî ew qasa afirînerî û xwedawendiyê, ji ber hiyerarşiyê û deshilatiyê şikestina yekemîn jiyan kiriye. Li gorî vê zanist û felsefe jî hatiye berovajîkirin û li gorî ev zîhniyeta deshilat hatiye nivîsîn. Sedama esasî ku em zanist û felsefeya îro napêjirînin ew e. Ji ber wê Serokatî dibêje, divê dîrok ji nû ve were destgirtin û sererastkirin. Ger îro em weke partiyeke jinê dixwazin zanistê ji nû ve li Rojhilata Navîn bigrin dest, wê demê divê em şaneya bingehîn destpê bikin û li derdora jinê vê yekê pêş  bixin.

Em bi awayekî giştî civak in. Bi taybetî jî di nava Tevgera Azadiyê de divê em vê yekê kûr bikin. Îro jî sedema esasî ku jin azadiyê xwedî dernakeve, dîwarên ku di serê jinê de hatine lêkirin e. Jin xistine rewşeke wisa ku nikare hêz û vîna xwe derxîne holê. Mirovên zanyariyê jî dibêjin, rêjeya fikirîn û mejiyê jinê li gorî ya zilam xurtir e. Mesela gelek karan dikare bi hev re bimeşîne. Lê ji ber

ku îro bi karekî ve hatiye sînordar kirin, karê malê dane pêşiyê, sînorên fikirandin û mejî jî teng bûne. Tenê dikere ber bi karê hevserê xwe, zarokên xwe û mala xwe re bigihîne.

Dê rojeke ev tepisandin û tengavkirin, di cihekî de biteqe. Lê teqîneke çawa be? Da ku ev teqîn li ser esasê xeletiyeke û hêleşaşiyeke çênebe, divê li ser cewherê jinê û heqîqeta wê xwe gihandin û têkoşîn kirin pêwîst dike. Li ser vê esasê divê çerçoveyeke zîhnî û mejî hebe. Bi taybetî weke jin û xort, weke kadro û mîlîtanên PKK û PAJK’ê divê em bikaribin vê yekê bikin. Divê ev yek jî li ser esasê jineolojiyê, ango zanisteke nû çêbibe. Dê ev yek çawa pêş bikeve, em bi vê yekê çi armanç dikin, em ê vê yekê çawa biteyîsînin ser mirovahiyê? Ger bi vî rengî be, em ê azadiyê baştir bigrin dest û pênase bikin. Dê perspektîfa me ya azadiyê berfirehtir be.

Îro ji ser jinê re gelek lêkolîn û lêhûrbûyin hatine kirin. Bi taybetî li ser bedana jinê vê yekê dikin. Lewma jin bûye metîngeheke sereke. Serokatî dibêje, “jin kirine qiralîçeya metayê.” Îro ev yek rastiyeke diyar dike, lê divê ew were guhertin û sererastkirin. Bi taybetî jî divê li ser esasê mejî ev yek were kirin. Pêşketina zîhniyetê û civakê jî bi vî awayî dibe. Serokatî qala, “evîn û mejiyê civakê dike.” Ji bo vê yekê divê li ser esasê afirînerî û jiyana hevpar, em bikaribin xwe kûrtir bikin.

Dê pêşengtiya vê jî bi akademiyan û perwerdehiyan çêbibe. Lê beriya ku em vê civakê bidin pêjirandin, divê di serî de em fêm bikin û têbigihêjin. Mesela di nava me de ew qesa hevalên kevn hene, lê piraniya me mijara jineolojiyê cara ewil digre dest. Ez weke jin ji vê yekê şerm dikim. Lê rastiya me ye. Mesela divê sekna jinê, jiyana jinê, nêzikatiya jinê çibe? Hê jî di van mijaran de tengmayin heye. Ji ber vê divê em ji xwe dest pê bikin. Ger wisa bibe, dê jineolojî watedartir û nirxtir bibe. Wê demê em nêzikatiyên qaşo zanistî ku li hemberî jinê pêş dikevin dikarin zêdetir biguherînin. Jixwe nêzikatiya felsefî û zanîstî ya heyî jî, ev rastiyên dîrokî û civakî ku em qala wan dikin zêdetir berovajî dikin. Heya ku em nikarin di mejî de guhertina vê çêbikin, em ew rewşa dagirkerî ser bedana jinê tê meşandin, nikarin ji holê rakin.

Mesala di dîroka Kurdistanê de me gelek mînak dan, dema ku pêwîst dike jin radibe ser piyan û ber xwe dide. Hesta wê ya parastinê û serî rakirinê heye. Ne ku ew derketin û sekin qet tune ne, lê bi parçe ne. Sedema vê parçebûnê çi ye? Ne tenê li ser esasê diyardeyeke fîzîkî ye. Ya esas parçebûna mejî ye. Ji bo vê yekê, da ku em bikaribin van parçeyan bikin yek û têkoşîne giştî bidin meşandin; divê xebatên zanebûnê û zanekirinê werin kûrkirin û berfirehkirin.

**Hevala X…:** Em li vê derê zanista Modernîteya Demokratîk nîqaş dikin. Her wiha me got, zanista hevjiyana azad e. Me hewil da di cewher de jin û zilam pênase bikin. Bi ya min divê em zanistê jî binirxînin. Dema ku zanist tê gotin, di serê me de hinek tişt çêdibin. Têgînên ku çêbûne jî pênaseya xwe ji serdeman û pêvajoyan digirin. Dema ku em behsa jineolojiyê dikin, divê em pênase û asta xwe ya zanistê jî lêpirsîn bikin. Tegîna zanistê îro çi tîne bîra mirov? Yekser em dizanin ku zanist di bin venerîna deshilatiyê de ye. Em dikarin bibêjin ku zanist ji deshilatdariyê dizê. Deshilatdariyê çêdike. Rêbaza zanista serdema me ya sereke, ango pozîtîvîzmê parçekirin e. Ji serî heya binî parçe dike, di navenda wê de civak tune ye. Di bin pença deshilatdariyê de ye. Ji civak û heqîqeta jiyanê qut bûye.

Dema ku tabloyekî wisa pêşiya me be, zanista jinê jî di serê me de bi awayekî giştî rûnane. Dema ku zanist tê gotin, labaratuarên girtî, camekan û bînayên mezin tên bîra mirov. Li hemberî vê dema ku em behsa jineolojiyê dikin, ger ew tişt werin bîra mirov pirsgirekeke mezin e. Ji ber vê yekê divê jineolojî beriya her tiştî têgihiştina zanistê sererast bike. Zanista ku ji cewhera civakê qut bûye û bûye biyaniya civakê, li gorî deshilatdariyê zanînê înşa dike, heqîqetê berovajî dike divê di despêkê de were sererastkirin. Divê zanist dewrî civakê bibe.

Tiştê ku me digihîne heqîqetê zanist e, gihêştina agahiyan e. Ger bi awayekî rast em dikarin xwe bigihînin agahiyê, wê demê em dikarin bigêhêjin heqîqetê. Di paradîgmaya Modernîteya Demokratîk de, ew jî weke jineolojî tê pênasekirin. Ji ber vê yekê pênaseya jineolojiyê girîng e.

Me behsa rêbazê kir. Hevalan jî got, "jineolojî nûbûneke çawa tîne, wê rêbazeke çawa pêş bixe?" Yek, jineolojî wê heqîqetê yekpare bigre dest, parçe nake. Zanist û têgihiştina zilam, an jî hemû zanistên ku xwe di 5 hezar salan de ceribandine, da ku jiyanê pênase bikin her yekî rêbazeke pêş xistiye. Mirov dikare her yekî wan weke rêbaz binirxîne. Hemûyan jî jiyan sererast nekirin, her ku çû jiyan parçe kirin û bin ketin. Her ku çû pirsgirek mezin kirin, mirov zêdetir ji rastiyê dûr xistin û kirin biyaniyê cewhera xwe. Îro jî em li ber felaketeke pir mezin in. Serokatî dibêje, "jiyan li ber lingan diçe, wate tune ye, aloziya jiyan û wateyê heye." Van rêbazên zanistê, ji mîtolojiyê bigre heya pozîtîvîzmê em gihandin rewşeke wisa.

Ji ber vê jî dema ku em behsa zanistê dikin, em dikarin bibêjin qesî kesên ku bombeya atomê teqandine, yên ku ew afirandine jî berpirsyar in. Ango zanist û entelektûelîzm ji rewşa heyî berpirsyar e. Mirovekî ku di labaratûarê de dixebite û van tiştan diafrîne, herî kêm qesî ew kesên ku van tiştan kar tînin û rê li pêşiya felaketan

vedikin, ji vê yekê berpirsyar in. Pîvana exleqê di zanistê de winda bûye. Ji ber vê têkiliya wate, jiyan û civakê bi zanistê re nema ye.

Di vê derê de tiştê ewil ku divê jineolojî bike, berovajîkirina vê yekê ye. Divê vê parçebûn û biyanîbûnê ji holê rake. Di navenda xebatên jineolojiyê de jî wê civak hebe. Wê sade be. Jineolojî di labaratûaran de û di nava çar dîwaran de pêş nakeve. Mesela tiba xwazayî, pir nêzikî jineolojî ye. Di nava jineolojiyê de tib, bi afirîneriyên xwe yên ewil tê dest girtin. Beriya wê jî, jixwe jineolojî ji pêwîstiyên me yên jiyanî re dibe bersiv. Ger wisa bibe, dê bibe zanist. Bêyî ku teknîk û agahiyên roja me jî red bike, dê sade û xwezayî be. Ango me weke nexweşan nebîne. Mesela ev nexweşxaneyên ku em weke baskeke kapîtalîzmê pênase dikin, divê ji holê rabin. Dê ji bo vê yekê jineolojî jî rê û rêbazê nîşan bide.

Di warê civakî de jî wisa ye. Têkiliya di navbera sosyolojî û jineolojiyê de em ê çawa bigrin dest? Bêguman dê di cewherê sosyolojiyê de jineolojî hebe. Wê hemû beşên xwe li ser esasê civakê ava bike. Dê hemû tişt xizmetî jiyana civakê bike. Wê xizmetî hevjiyana azad bike. Tiştê ku xizmetî jiyana civakî neke, divê jineolojî red bike. Çawa ku di warê bîrdozî de pîvanên red û qebûlê hene, divê di warê civakî de jî hebin. Tiştê ku civakê ji heqîqeta wê dûr dixe û parçe dike, divê rast fêm bike û wan red bike. Lê divê ya ku bê înşakirin jî, baş dayne holê.

Sosyolojiya Ewropa digre navenda xwe, herî zêde civakê dîzayn dike. Ango mihendîsiya civakê dike. Parçe dike. Mesela em çend beşên sereke yên sosyolojiyê pênase dikin, lê gelek beşên sosyolojiyê hene. Ew qesa parçe kiriye û li ser wê esasê jî mihendisiyê dike. Her beşeke ji nû ve li gorî xwe înşa dike. Tiştê ku divê jineolojî bike, divê ji sedî sed ji vê yekê dûrketin be. Li hemberî vê jî, ne ku civakê bixe xizmeta deshilatdariyê û înşa bike, divê zanistê bixe xizmeta civakê. Ger jineolojî bikaribe vê yekê bike, dikare ser  bikeve.

Divê jineolojî nehêle ku agahî û zanyarî deshilatiyê çêbike. Dema ku agahî komî ser hev dibin, sermaye û deshilatiyê çêdike. Dê jineolojî jî xwedî navend be û agahiyan kom bike. Lê wê kîjan rêbazê kar bîne ku, ew agahî deshilatî û dewletan çênekin? Ji bo vê jî girînge ku agahî bigihêje her kesî/ê. Agahiya ku kom dibe, divê di heman demê de bikaribe belav bibe. Da ku civakê bigihîne heqîqetê, divê agahiyan kom bike. Ji vî milî ve jî xwe rast vesazkirin heye.

Alozî di qada zîhniyetê de ye. Ev qrîza di zîhniyetê de, di heman demê de qrîza hevjiyanê ye. Ji ber vê qadeke ku jineolojî li ser bisekine jî hevjiyan e. Loma divê rastiya jin û zilam ku bi hev re ji nû ve jiyanê ava dikin, pênase bike. Ger jineolojî van pênase neke, nikare xwe bigihîne heqîqeta jiyanê. Bi nêrîn, pênase û paradîgmaya jinê, ji nû jiyanê nêrîn û gihandina cewhera wê girîng e. Ew naye wê wateyê de ku xebatên jineolojiyê, tenê jinê alaqadar dikin.

Dibe ku di destpêkê de rûnişkandin û avakirina paradîgmaya wê de jin pêşengiyê bike, lê zanista Modernîteya Demokratîk e. Ji ber vê jî divê hemû kadroyên Modernîteya Demokratîk, vê zanistê înşa bikin û bijîn. Ger ne wisa be, em ê bibêjin, "bila tenê jin bike." Di vê mijarê de em nikarin zayendperestiyê bikin.

Bes ji ber ku  nêrînên me pir berovajî bûne, bi taybetî ji ber ku di zîhniyeta zilam de berovajîbûn di asetke pir mezin de ye û jin zêdetir nêzikî vê yekê ye, dê jin pêşengtiya vê bike. Di vê çarçoveyê de girînge ku jin, guhertina zilam jî bigre ser xwe. Divê guhertina zilam jî weke projeyeke bigre dest û sererastikirineke çêbike.

**Hevala X…:** Em dibêjin, jineolojî zanist e. Zanist ne tenê ji bo zilam, an jî jinê ye. Ji ber vê yekê jineolojî aîdî hemû civakê dîtin girîng e. Wê demê sererastkirina zanistê, di navbera herdu zayendan de wê çawa pêş bikeve?

**Hevala X…:** Deshilatdariya ewil, li ser dîzîna zanista jinê çêbûye. Jinan di jiyanê de zanistek pêş xistibû û ji bo berdewamiya jiyanê û civakê kar tanî. Jiyan pê dida dohandin. Lê dema ku zilamê qûrnaz fêrî vê agahiyê bû, wê demê bi xwe hesiya. Pê hesiya ku ew agahiya li gel jinê, bi awayekî din jî dikare bi kar bîne. Ango bi rengekî din jî dikare jiyanê vesaz bike. Dema ku gihêşt encameke wisa deshilatdariyê dest pê kir. Pişt re jî heya roja me, jin dervayî zanistê hate hiştin. Ji bo zanistê jin êdî nebû kirde, bû bireser.

Dema kapîtalîzmê jî, ne tenê ji milê zanista fîzîkî û biyolojiyê ve, zanista civakî jî xwe li ser bedana jinê ava kir. Pêkanînên wisa hovane hene ku ev zanista em îro li dijî wê derdikevin xwe li ser wan pêkanînan vesaz kiriye. Xwe li ser esasê qirkirina civakê û jinê vesazkiriye. Ger di destpêkê de em li ser vê yekê qaneh nebin, em ji bo jineolojiyê jî nikarin derketineke çêbikin. Îro jî di nava zanistê de tiştên ku Modernîteya Demokratîk kar bîne hene, jixwe ew berhemên şaristaniya demokratîk in. Lê belê îro deshilatdariyê zanist çawa kar anî, çawa jin dervayî zanistê hişt û kir amûreke kûştina jinê? Divê em vî alî bibînin.

Di jinê de rewşeke wisa heye. Sedî sed mirov dikare bibêje jin dervayî zanistê hatiye hiştin û jin bûye biyaniyê rastiya xwe û bûye bireser. Jin heya şaneya xwe ya herî biçûk hatiye parçekirin. Hinek hewildan û derketinên dijî wê jî hene. Lê piranî weke me gotî ye. Ne qadeke wisa ye ku jin tê de xwe îfade bike û bîne ziman e. Mesala heya îro jî em dibêjin, “*zilamê zanistê.*” Ew pênasekirina me bile têrî fêmkirina rewşê dike. Piştî ku hin pêlên femînîzmê pêş ketin, karîn pêşî li hinek sifatan bigrin. Serê me de jineke ku bi zanistê re mijûl dibe û weke jina zanistê tê pênasekirin tune ye. Dema ku zanyar tê gotin, zilam tê bîra me. Têgihiştina zanista zilam de jî zayendperestî û deshilatî heye. Ji bo guhertinê jî, divê di destpêkê de înşaya mejî çêbibe. Em jî niha vê nîqaş dikin.

**Hevalê X…:** Ez dixwazim nakokiyeke di serê xwe de bînim ziman. Mirovahî, dema ku xwazeya xwe digre dest, bi awayekî giştî windakirineke heqîqetê û biyanîbûneke dijî. Jixwe pirsgirekên ku di nava civakê de tên jiyîn, pirsgirekên ekolojî û aboriyê, rastiya komkûjiyan ûhwd bi awayekî giştî dema ku em rewşa xwe ya heyî dinêrin, em fêm dikin ku li cihekî me xeletiyeke mezin kiriye. Em vê jî weke windakirina heqîqet û wateyê ya 5 hezar salan pênase dikin. Li ser vê esasê kesayet û civakek derketiye holê.

Ev jî çavkaniya xwe ji mejî digre. Di mejî de xwe girtina dest de pirsgirekeke mezin heye. Felsefe tînin û dispêrin Descartes, ew jî her tiştî dispêre zindîbûn û nezindiyan. Her wiha pênaseyên fîzîkî yên Newton hene. Piştî wê jî tesîrbûneke ji van heye û di mejî û girtina dest de, seqetiyek heye. Her wiha ew yek dihêle ku em ev hêleşaşiyên xwe bibînin. Ango dema ku em van pirsgirekan digirin dest û pênase dikin jî, em jî parçeyekî vê biyabûnê ne. Lewma dema ku em van pênaseyan dikin, em çiqasî li ser xeta rast in. Ez bi xwe di vê mijarê de nakokiyan jiyan dikim. Ango bi mejiyekî şaş, heqîqet dernakeve holê. Ji ber vê yekê divê pênaseyên me ew qesî ne hêsan bin.

Mesela dema ku em jineolojiyê digirin dest, bi awayekî giştî di felsefe, zanist û bîrdoziyê de şoreşeke pêwîst dike. Ger her lêpirsîna ev şoreşa mejî çênebe, em ê kêm bimînin. Bi taybetî di şexsê hevalên xort de dikarim vê bibêjim.

Niha em ji aliyê aborî, tendûrîstî, civakê û hwd de jineolojiyê digirin dest. Lê ya rast divê em ji aliyê mejî ve bigrin dest û di despêkê de di wê derê de sererastkirineke çêbikin. Dema ku Serokatî jî vê mijare vedike, li ser vî alî disekine. Dema ku sosyolojiyê jî weke bingeha hemû zanistna digre dest, tenê qadên jiyanê yên civakê de nagre dest, bi awayekî giştî di mejî de înşayeke pêş dibîne. An na ger em bi mejiyekî seqet, dest biavêjin her tiştekî û hewil bidin ku sererast bikin jî, di encamê de em ê careke din bigihêjin şaştiyê û ya berovajî. Ew jî xwe xapandin e.

Ango em van tiştan tînin ziman, lê em jî di nav de ne. Em jî vê biyanîbûnê dijîn. Ger wisa nebe, dê nirxandinên me çiqasî polîtîk û exleqî bin. Pir zêde bi guman nêzikbûyin jî ne rast e. Lê divê em her vegerin xwe û şoreşa mejî her pêş bixin. Dema ku em jineolojiyê digirin dest, divê em ji xwe destpê bikin.

**Hevalê X…:** Li gorî axaftinên heval yên ewil, nêzikatiyên heval hinekî qederperest in. Ango dibêje, *“em çiqasî nîqaş bikin jî, ev yek di hundirê me de rûniştiye, em nikarin biguherînin.*” Niha jî dibêje, em çi bikin jî em nikarin xwe bigihînin asta Serokatî, ji ber vê jî pêwîst nake ku em nîqaş bikin. Heval nakokiyên xwe jî di vê derê de anîn ziman. Lê çareserî çi ye, weke alternatîf çi pêşniyar dike?

**Hevalê H…:** Ez rewşê weke qeder nanirxînim. Ez dibêjim rewş pir kûr e, di asteke mezin de li ser me tesîr kiriye, li hemberî vê divê têkoşîneke kûr were dayin. Her wiha di bingeha hemû têgeh û axaftinên me de tesîra ev biyanîbûna heqîqetê heye. Ji ber vê jî divê em ew qesî rehet nêzik nebin. Ji ber ku ez vê rehetiyê di kesayeta xwe de dibînim, hinekî weke rexnedayin jî min xwest bînim ziman. Ango heya ku em mejiyê xwe nedahûrînin û tesîrên li ser xwe ji holê ranekin, tenê anîna ziman û bi têgehan diyarkirina hin tiştan sererastkirinê çênake. Divê em xwe bixin navenda wê, wisa pênase û şîroveyan bikin.

**Hevalê X…:** Rehetiya me ji ber çi ye? Îro têkoşîna me weke kêrê qut bibe û hemû deskeftiyên tevgera me ji holê rabin jî, vê tevgerê nêzikatiyeke jinê derxistiye holê. Hem giştî kadroyên jin û xort yên tevgerê de, hem jî di civakê de guhertineke wisa kiriye. Dibe ku beriya 20 salan em ew qesî rehet nêz nebana, lê ew rihê ku hatiye afirandin, di me de rehetiyê ava dike. Em gihêştine asteke wisa ku em li gel hevalên jin dikarin her tiştî nîqaş bikin û çareseriyên hevpar pêş bixin. Ew jî bi serê xwe şoreşek e. Ger di asteke wisa de em ne rehet bin, em ê kengê rehet bin û çi bikin?

**Hevala X…:** Niha jiberkirina agahiyan heye û yek jî pê re jiyîn heye. Mesela agahî û zanistên pozîtîvîzmê ku hatine jiberkirin, nexweşxane, timarxane ûhwd pêş xistine. Lê di nava tevgera me de zanîna heyî hatiye bawer kirin û

di oxira wê de can hatiya dayin. Her wiha gelek mînakên feylezof û pêximberan hene. Gotinek kirine, zanîne ku bi wê gotinê di kêliyê de serê wî tê jêkirin, lê di ew gotina xwe de gaveke jî paş ve navêje. Em jî weke jin û xort, şervanê vê heqîqetê ne. Di jiyana me de jî wisa jiberkirinê axifîn hinekî heye. Zanîn û teoriya ku ji jiyanê qut e, wê me bike oportînîst. Jineolojî jî dixwaze ew kendala ku di navbera gotin û jiyanê de heye ji holê rake. Mirov dikare ev kendala di navbera gotin û jiyanê de ji aliyê jineolojiyê ve jî veke.

**Hevalê X…:** Jiberkirin aliyekî meseleyê ye. Ango di ew kendala navbera gotin û jiyanê de heye de jiberkirin aliyê wê yê herî biçûk e. Mirov bi awayekî dikare van tiştan derbas bike. Lê tiştê xetertir, bi hêleşaşî xwe girtina dest heye. Bi taybetî di mijara azadiya jinê de, heqîqeta xwe baş tehlîlnekirin û şaş girtina dest heye. Em ne di ferqa vê de ne. Ez dixwazim binê vê yekê xêz bikim.

Ne ku ez têkoşîna hatiye dayin û asta ku hatiye girtin biçûk dibînim. Lê rexneyên esasî ku Serokatî dike, çênebûyina şoreşa mejî ye. Ew yek di serê min de dibe nakokî, ger em gihêştibin wê zanebûnê, divê em gelek tiştan derbas bikin û sererast bikin. Bi taybetî jî ez di şexsê xwe de vê yekê dibêjim, ji bo xwe qebûl nakim. Dixwazim rast tehlîl bikim û xwe sererast bikim. Da ku em bikevin giraniya vê mijarê û em hêsanî negrin dest, ez bi vî awayî dinirxînim.

**Hevala X…:** Jineolojî, zanista civakê ye. Ne tene jinê, giştî civakê digre nava xwe. Serokatî bi paradîgmaya Modernîteya Demokratîk, dixwaze naveroka wê tijî bike. Çawa ku civak ji cewhera wê hatibe dûrxistin, jineolojî dixwaze wê cewherê ji nû ve derxîne holê. Hem ji aliyê zîhnî ve, hem jî ji aliyê hemû beşên jiyan û civakê ve di lêgerîna vê de ye. Jineolojî dixwaze di çar beşan de xwe vesaz bike; aborî, tendûrîstî, etîk û estetîk, perwerde. Saziyên ku herî zêde pergal pê lîstine jî ev in. Mesela perwerdeya ku pergal dide li ser esasê jiberkirinê ye. Lê aliyê wê ku pergala xwe ya deshilatiyê ava dike jî heye. Amûreke bişavtin û kes dûrî rastiya xwe dike ye. Ger saziyeke wisa tuneba, em nedihatin asteke xwe bi xwe bişavtin dikin.

Em jî bi têkoşîna xwe, di gelek beşên civakê de ji nû ve avakirineke pêş dixin. Lewma bi jineolojiyê jî ew beşên têkoşînê giştî dibin. Ango encamên ku di têkoşîna 40 salî de derketine holê tên vesazkirin. Heya niha di astekê de jinê reng, vîn û hêza xwe derxistiye holê. Ji milê şer û siyasetê ve xwe îspat kiriye. Lê piştî vê bi awayekî pergal li ser esasê van tiştan xwe ji nû ve înşa dike. Mejiyê jineolojiyê jî, bi riya van saziyan, bi riya akademiyan pêş dikeve. Di destpêkê de mejiyê wê ava dibe û pişt re dikeve pratîkê, civakî dibe.

Mesela di qada tendûristiyê de ew qesa dermanên ku tên pêş xistin, di nava civakê de weke wîrûseke tên belavkirin. Nexweşiyeke di nava civakê de belav dikin û tekelên ku dermanan çêdikin jî, bi riya vê kar bi dest dixe. Ango li ser jiyana mirovan pere qezenç dikin. Tendûrîstî ji armanca xwe ya rast derketiye. Em jî di tibê de li hemberî wê alternatîfê datînin. Mesela hevalên me li çiyê dermanên xwezayî pêş dixin. Ew mînakeke sererastkirinê ye. Di hemû beşên din yên civakî de jî, wisa ye.

Ji aliyê etîk û estetîkê ve jî, di pergalê de piranî şêwê û dûrivê mirov re mijûl dibin. Lê di paradîgmaya me de cewherê mirov girîng e. Sadebûyin û paqijbûyin esas e. Di ev pergala 5 hezar sal de bi riya aboriyê jî koletî pêş ketiye. Jin kiriye obje û amûreke ku tê kirîn û firotin. Lê di jineolojî de lêgerîna aboriyeke ku pêwîstiyên civakê dibersivîne û bi ekolojiyê ve di nava hevsengiyeke de ye pêş dixe. Zîhniyeta van tiştan jî bi akademiyan pêş dikeve. Gavên ku îro di pêşengtiyê de derdikevin holê jî, wê bi têkoşînê di nava civakê de belav bibin.

Em ê pênaseya jin û mêr bikin û cudabûnên herdu zayendan danynin holê. Li ser vê esasê da ku jin bibe vîn û têkoşîna xwe pêş bixe, rêxistinên xwe yên xweser pêş dixe. Wê di demên pêş de jî li ser vê esasê di nava civakê de sekneke xweser pêş bikeve. Ji aliyê perwerdehiyê ve jî wisa ye, ji aliyê jiyanê ve jî wisa ye.

**Hevala X…:** Serokatî dixwaze, ked û xebatên xwe yên di mijara jinê de pêş xistine, bi jineolojiyê bigihîne lûtkeyê. Ne tenê ji bo jinê, ji bo têkoşîna hemû civakê ew yek derbasdar e. Rast e, pêşengtiya vê jin dike. Lê berpirsyarê vê yekê ne tenê jin e. Lewma di warê bîrdozî û teorî de jî gelek pirsgirek hene.

Serokatî dibêje, "*min di kesayeta jinê de civaka Kurd winda kiriye, ez ê jî di kesayeta jinê de şoreşa gelê Kurd ser bixim.*" Civak, li hemberî jinê çiqasî bêbawer bibe, jin jî ew qesî li hemberî xwe bêbawer bûye. Lê ew bêbawerbûyin çavkaniya xwe ji kû digre, divê mirov baş tehlîl bike. Em dîroka cîhanê binêrin, jinê lehengtî û afirîneriyên pir mezin pêş xistine, lê ev nirxên wê jê hatine dizîn. Yê ku dizî kiriye kî ye?

Ez dixwazim mînakeke şoreşa Vîetnamê bidim. Di nava gerîlayên wan de jin jî hene. Da ku parlemontoya xwe hilbijêrin kom dibin. Di wê derê de jinan re dibêjin, pêşnûmeyeke ji bo jinan amade bikin. Mesela xalek heye, jin dibêjin dema ku kûrtaj çêbibe, pêwîstî bi îmzaya zilam tune ye, divê jin biryara xwe, bi xwe bide. Lê ew şoreşgerên Vîetnamê ku bi salan li gel jinan di heman çeperê de şer kirine, li dijî vê derdikevin. Lewma ew jî çiqasa şoreşger bin jî, ew zîhniyeta deshilatiyê derbas nekirine. Mînakên wisa li gel me jî tên jiyîn. Lê em bi piranî ji rewşa xwe razî ne, em lêhûrbûneke kûr di vê mijarê de nakin. Em piranî jî pirsgirekê weke ya jinê dibînin. Lê zilam bi xwe çavkaniya van pirsgirekan e.

Em piranî qebûl dikin û dibêjin jin afirînera her tiştî ye. Lê ji milê vînê ve, dema ku jineke zane û bi hêz hebe, ji aliyê zilam ve sedema hemû qeyran û pirsgirekan e. Qebûlnekirinek heye. Di nava me de jî tesîra nêzikatiyên wisa hene. Jixwe di nava civakê de û cihên cuda yên cîhanê mirov dikare gelek mînakên trajîk jî bide. Lê divê tesîra van tiştan, ji aliyê mejî û nêzikbûnê ve hem ji aliyê jinê, hem jî ji aliyê hevalê xort ve baş were dahûrandin ku em bikaribin veguhertineke mayinde bikin.

**Hevalê X…:** Civaka exleqî û polîtîk ku em di lêgerîna wê de ne, ne tiştekî ku em ji nû ve çêbikene ye. Zemîn û bingeha wê di nava civakê bi xwe de jî heye. Hin nîqaşên me ji bo neolîtîkê jî çêdibin, em dibêjin gelo niha zilam deshilat e, lê wê demê jin deshilat bû? Ya yekemîn divê wisa naye destgirtin. Ya din em piranî nêzikatiyan weke şexs digirin dest, lê zîhniyeteke nîşan dide. Ew yek nahêle ku em xwe bi awayekî rast bigrin dest û sererast jî bikin.

Di dema civaka xwezayî de deshilatî tune ye. Jin, mêr, zarok hemû di bin sîvaneke de û li ser esasê zîhniyeteke komînal meşiyane. Ev zîhniyet jî di navendîbûna jinê de bûye. Ji aliyê hest, exleq, pîvanên jiyanî û nirxên civakî ve jinê pêşengtî kiriye û bi wê yekê civak meşiyaye. Di meşa wan de jî astengiyên ku hev û din red dike ûhwd tune ye. Bi awayekî giştî civakeke parveker û komînal heye.

Lê pişt re bi hest û ajoyên deshilatdariyê bi destê zilam pergaleke cuda çêbû. Bi taybetî jî di zîhniyetê de cudabûn

çêdibe. Mesela dema cewherê civakê de komînalbûyin esas bû, di ew pergala nû de ezezî heye, her tişt ji xwe re xwestin heye. Sedî sed dijberî hev in. Kîjan alî ve digrê dest bigre, pêşketinên civak hemû beriya van 5 hezar salan, ango di dema civaka xwezayî de çêbûne. Pêşketinên ku demê re çêbûne û heya roja me hatine jî cewhera xwe ji wê serdemê digirin. Mesela em nirxên civakê ku wê demê bi destê jinê hatine avakirin weke 104 M'yan digirin dest, ger em qiyas bikin di nava van 5 hezar salan de herî zêde 2-3 M çêbûne.

Dema ku civak biguhere cewhera xwe û wê exleqê careke din di xwe de ava bike, dê pêşketinên ku wê demê çêbûne, pir pir zêdetir wê îro çêbibin. Lewma her tişt tekelkirina deshilatan, nahêle ku tu pêşketineke bixê xizmetî civakê. Her tişt di destê derdoreke deshilat de kom dibe. Mesela hevalan mijara tendûristiyê girtin dest. Gelek nexweşiyên fîzîkî hene, dermanê wê jî heye, lê deshilatî ji ber ku feyde jê nagre, nahêle ku bikeve xizmetî civakê.

Jineolojî jî cewhera civaka exleqî û polîtîk e. Ya ku ew exleqa civakî ji nû ve zindî bike jî jineolojî ye. Ger civakeke bi vî rengî pêş bikeve, ji milê derûniyê û manewiyatê ve jî rehetiyek çêdibe. Weke ku gulek careke din vedibe. Nexweşiyên îro heyî jî piranî yên derûniyê ne, ger civakeke ku ji aliyê derûniyê ve rehet hebe, tib jî ew qesî nakeve rojeva me.

Em gelek tiştan îro weke zanist û lojî digirin dest. Lê di yekê de jî cewherbûyin û heqîqet tune ye. Dê jineolojî wê heqîqetê û giştîbûnê derxîne holê. Her wiha gelek tiştên nû derkevin holê. Hezkirina me jî pir kêm bûye. Dev ji hezikirin û hatina gel hev a du kesan berde, mirov êdî hev û din hîs nakin. Lê di civaka xwezayî de dayikek û zarokek li kû dibin bila bibin hev û din hîs dikin. Lê îro du mirov beramberî hev û din rûdinin jî, hev û din hîskirin tune ye. Zîhniyeta zilam a îro derewan dike, derewa xwe bawer dike û dide bawerikirin jî.

Di nava me de jî gelek caran nakokî derdikevin û li ser van mijaran tê nîqaş kirin. Mesela li hemberî sekna xweser a jinê çima bertek heye? Her tişt ne wekheviya çort e. Divê nêzikatiyeke pozîtîf li hemberî jinê hebe. Weke hevalên xort bi awayekî kûr xwe girtina dest û tesîra pergalê li ser xwe avitinê de em lewaziyan jiyan dikin. Bi taybetî di demên wisa de qutbûyin û xweserbûyin pêwîst dike.

Mesela dema ku em kuantomê jî digirin dest, gelek aliyên wê nêzikî jinê ne. Lê kesê ku ev zanist pêş xist, Einstein jî bi xwe baweriyê pê nîne. Weke min got, ji ber ku me derewên xwe bawer kiriye, êdî em tiştên rast jî bawer nakin, em bi guman nêzik dibin. Bi kurtasî weke hevalan jî got, ji gelek aliyan ve pêwîstiya me bi lêpirsîna xwe heye. Bi taybetî jî di mijarên ku îro weke nakokiyên me yên sereke derdikevin pêş de divê nîqaşên me kûrtir

bibin, da ku em tehlîla xwe bikin. Bi pîvanên Serokatî xwe bigrin dest. Divê em asta heyî ji bo xwe bes nebînin, xwe pîvanên Serokatî bidin. Her wiha gelek mînak tên dayin, em pir ne dûrî wan tiştan e. Lewma yên ku wan kiryarên ne baş pêk tînin û em di bin tesîra heman zîhniyetê de ne.

**Hevalê X…:** Demeke dirêj e ku jiyana xwezayî ya ku li derdora jinê hatiye honandin û pergala 5 hezar sal ku bi deshilatdariya mêr tê rêvebirin tê nirxandin. Her wiha em qala ketina civaka exleqî polîtîk û ji nû ve bi eksen girtina jinê zindîkirina vê civakê nîqaş dikin. Ji bo vê jî têkoşîneke zayendî tê dayin. Qesî ku min fêm kiriye jî, jineolojî ji bo vê têkoşînê rê û rêbazan digere.

Di vegotina me de jî, me piranî têkoşînên jinê yên di dîrokê de û aliyên wê yên kêm mayî girtin dest. Jineolojî ew aliyê kêm mayî timam dike û li ser wê esasê têkoşîneke nû dide pêşiya me. Wan rojên hanê min nivîseke hevaleke jin a şehîd xwend. Di wê derê behs dike ku jin di şerên rizgariyê yên netewî de paş mane, her wiha piştî ku şerên netewî ser ketine jî jin dîsa weke kole hatine dîtin. Ew hevala şehîd dibêje, heya ku jin parastina xwe ya cewherî pêş bixe û di şerên netewî de ger di nava şerê çekdarî de cih negre, dê piştî şoreşê careke din weke kole bimîne. Mesela di tevgerên din yên femînîzmê de parastina cewherî bi awayekî mîsoger naye dest girtin, lê jineolojî vê yekê jî weke mijareke sereke digre dest.

Me di gelek cih û perwerdehiyan de perwerdehiyên xweser dîtine, di vê perwerdehiyê de ji hevalê herî nû bigre heya hevalê herî kevn, tiştê ku hevpar tê ziman; em dibêjin, "*min têkoşîna zayendî di xwe de daye sekininandin, cemidandin.*" Pirsgirekên me yên din jî piranî bi vê mijarê ve girêdayî ne. Ji bo hevalên xort mirov vê yekê bi rehetî dikare bibêje. Ji bo hevalên jin jî, cemidandin û tepisandin heye. Piştî ew qesî dem ji vî alî ve pirsgirek jiyîna me jî, ji ber cemidandin û tepisandinê ye. Ango me têkoşîna xwe her nedomandiye.

Dervayî vê, divê têkoşîna zayendî em tenê weke têkiliya zayendî jî negirin dest. Mesela em jinê çiqasî weke hêz û vîn dibînin. Em di teoriyê de hin tiştan qebûl dikin, lê di pratîkê de em vê yekê çiqasî qebûl dikin. Mesela weke xort, dema ku em li gel hevaleke jin diçin peywirê, bê pirsgirek em wê peywirê çiqasî digihînin armancê. Pirsgirekên me jî bi piranî ji ber vê ne, heya windahiyên bê wate jî ew nêzikbûn tesîra xwe dike. Mesela mirov pratîka Garzanê ji bo vê yekê weke mînak dikare binirxîne.

Ango jineolojî, girtina rê û rêbaza rast a di têkoşîna zayendî de ye. Hem ji bo jinê, hem ji bo zilam ev yek derbasdar e.

**Hevalê X…:** Serokatî dibêje, "*pêwîstiya armancên paqij, bi amûrên paqij heye.*" Ger armanc û hedefeke me ya paqij hebe, divê rê û rêbazên me jî paqij bin. Em

dixwazin pirsgirekên civakî û sedemên wê tehlîl bikin. Li gorî wê jî, şaştî û rastiyên wê diyar kirin e. Mesela em dibêjin civaka exleqî û polîtîk nehatiye tunekirin, lê rengê wê hatiye windakirin. Di bin venerîna pergaleke din de maye. Ev pergala dîtir jî, her roj bi xwe re pirsgirekeke nû ava kiriye û heya roja me ya îro hatiye. Roja me ji vî alî ve lûtke ye. Hatiye sînorê dawî. Dê mirovahî gihêştiye asteke wisa ku dê an tevahî xwe vê cîhanê birûxîne, an jî pirsgireke rast  tehlîl bike, dermankirineke rast bike û di encamê de sererastikirinek çêbibe.

Di cewhera paraznameyên Serokatî de jî ew heye. Pirsgirekê di dîrokê de ji kû destpê kiribe, ji welat wir digre dest û bi nav dike. Her wiha rê û rêbazên tedaviya vê pirsgirekê jî datîne holê. Serokatî dibêje, "*divê cihê ku hatiye windakirin, mirov li mirovahiyê bigere, li ser rîçikên wê lêkolîn bike. Mirov nikare li Emerîqa û Sîbîryayê mirovahiyê bibîne*." Lewma bingeha şaristaniya deshilatî û dewletî, li Rojhilata Navîn hate avêtin. Bi talankirina nirxên civaka xwezayî, zîhniyeteke berovajî pêş xist û heya roja me hat.

Îlmên ku hene jî, di bin navê çareserkirina pirsgirekên civakî de bi rê ketin. Lê dema ku mirov encamê mezî dike, dev ji holê rakirina pirsgirekan berde, du qatî wan pirsgirek ava kirin. Mesela Marksîzm, dîrokê çawa digre dest. Ji civaka xwezayî derbasbûyina şaristaniyê weke pêşketineke digre dest, her wiha civaka xwezayî weke

tune digre dest. Feodalîzmê jî ji koletiyê pêşketîtir dibîne, kapîtalîzmê ji feodalîzmê pêşketîtir dibîne. Di vê derê de mirov parçekirinê dibîne. Tu dibêje qey cuda cuda civak tên avakirin. Lê Serokatî dibêje, “civak yek e.” Yek civaka exleqî û polîtîk heye, yek jî pergala dewletî û deshatî heye. Dibe ku îro reng û dengê civakê hatibe tepisandin, lê tune nebûye. Ji bo vê yekê di dîrokê de ew qesî berxwedan û serhildan çêbûne.

Lê zanistên heyî di van mijaran de nêrîneke şaş didin mirov. Dema ku mezîkirin û nêrîn şaş be, dê têkoşîna ku tu bimeşînê jî, wê xizmetî vê pergalê bike. Jixwe pratîka sosyalîzma pêkhatî li ber çav e. Îro kapîtalîzma herî çort, ew dewletên ku xwe weke sosyalîst pênase dikirin, jiyan dikin. Mînaka Soveyatan, Çîn’ê ûhwd li ber çavan e. Îro ew dewlet kapîtalîzmê li ser piyan digirin.

Ji ber vê yekê jî dema ku tu li hemberî tiştekî têkoşîn didê, rast tehlîlkirin û rê û rêbazên wê baş diyarkirin pir girîng e. Ez di armanca jineolojiyê de vê yekê dibînim. Dema ku mirovekî tu bibê gel bijîjkekî, nabêje hema em ameliyat bikin, di destpêkê de nexweşiya wî tehlîl dike. Pişt re li gorî nexweşiyê rê û rêbazên mûdahaleya nexweşiyê tespît dike û li gorî wê mûdahale dike. Mesela tu hebên mîdê bidê yekî nexweşiya pençeşêrê ketiye, ew derman nabe, dê nexweşiya wî girantir bike. Ango tu nagihêjê encamê. Ez jineolojiyê jî wisa fêm dikim. Îlmê li ser esasê pêdîviyên civakê, tehlîlkirin û dermankirina

nexweşiyên ku di nava civakê de hatine pêş xistin e. Vê yekê jî bi rêbazên rast dike û encamên baş digre. Ji bo civakê, jin û zilam ev rastî derbasdar e. Dibe ku di jineolojiyê de rista jinê zêdetir derkeve pêş, ew jî xwezayî ye. Lewma şaneya bingehîn a civakbûnê ye. Zanistên herî zêde hatine berovajîkirin jî, nikarin ev şaneya bingehîn ji nedîtî ve werin.

An na mînaka Sovyetan, Çîn, Vîetnam û Kûba'yê li holê ye. Ne ku van mirovan bi niyeteke nebaş ew şoreş dar xistin; lê ji ber ku nikarîn tehlîleke baş bikin, rê û rêbaz, amûrên ku hatine karanîn şaş bûn, gihêştin encameke wisa. Serokatî dibêje, *"argûmana ji pergala îro rizgarbûyinê, di destpêkê de ji bin tesîra zîhniyeta wê derketin û pişt re jî civaka xwezayî ya gund mezî kirin girîng e.*" Lewma em bi argûmûn û zîhniyeta heyî civaka xwezayî û gundan mezî dikin. Wê demê jî ji me re paşketî tê û em jê şerm dikin. Ger em xwe ji ew mejiyên pergalê rizgar bikin, wate, mezinbûn û nirxên di nava wê civakê de em dikarin baştir bibînin. Ji ber vê yekêk paqijiya rê û rêbazan, paqijiya amûran girîng e. Jineolojî ji aliyekî ve jî van rê û rêbazan derdixîne holê.

**Hevalê X…:** Jineolojî ne tenê ji bo jinan, ji bo hemû civakê ye. Ew zanistî jî di pêşengtiya jinê de xizmeta hemû civakê esas digre. Di vê derê de jî wate girîng dibe. Jixwe wateya civakê, jiyanê, dîrokê çi ye; hevalan hinek anîn ziman. Jineolojî jî wateyê dide jiyanê. Ev civak, jin û

zilamê heyî naye qebûlkirin. Alternatîfa wê diafrîne. Bingeheke wê jî heye, lê hatiye tarîkirin û tepisandin. Bîr bûye. Bingeheke wê ya jiyanî, mirovî, dîrokî û civakî heye.

Serokatî dibêje, têkoşîna jinê bi femînîzmê tarîfkirin têrê nake. Divê girêdana wê bi civak, siyaset û dîrokê re çêbibe. Femînîzm milek e, lê têrê nake. Divê were berfirehtir kirin û di hemû beşên civakê de weke zanisteke were dest girtin.

Da ku zanistek çêbibe, divê di nava civakê de pêwîstî bi wê hebe. Mesela fîzîk, tip, biyolojî hemû li ser esasê pêwîstiyên civakê derketine pêş. Îro jineolojî jî pêwîstiyeke pir girîng e. Divê were pêş xistin. Lê divê jin pêşengtiya vê bike. Bawerim dewlet û mêr, zanistiyeke bi vî rengî pêş naxe. Ew zanistî jî, weke rojeke de tiştekî lêkolîn bike û bigihîne encamê divê naye destgirtin. Serokatî dibêje, akademî pêwîst dikin, profesyonelî pêwîst dike, divê beş bi beş li ser kûrbûyin çêbibe. Da ku em bikaribin wateyê bidin jin, jiyan, xweza, civak û dîrokê. Ji bo vê yekê jî lêkolîneke kûr pêwîst dike.

Îro di nava civakê de her tiştekî zanista wî heye, lê zanisteke jin û wateya jiyanê derxîne holê tune ye. Nakokiya herî mezin a pergalê ew e. Ev nîqaş û kûrbûyina li ser jineolojiyê jî bi tenê me nabe, ji bo hemû jinên cîhanê û mirovahiyê pêwîst dike. Jineolojî tenê ji bo PKK’ê û civaka Kurd ne pêwîst e. Li ser vê lêkolîn kirin,

tez pêşxistin, bi dîrokê re girêdana wê çêkirin pêwîst dike. Ew jî xebateke kûr û domdirêj dixwaze. Divê weke komale û mijareke mirov negre dest. Lêkolîn û daneyên teqûz pêwîst dikin.

Ya din jî, ne ku em nikarin vê yekê bi ser bixin. Nêrîneke weke ku tenê dewlet û derdorên ku zanist di destê xwe de kirine tekel dikarin bikin heye. Ne wisa ye. Asta civakê ku bikaribe her tiştî fêm bike, xwe rêxistin bike, civakbûnê ji nû ve zindî bike ye. Ew jî bi wate dayina jinê, civakê û dîrokê dibe.

Dibe ku ew di despêkê de weke xebata jinê were nirxandin. Lê divê li gorî dane û zanyariya heyî, mêr tiştên heyî lêpirsîn bike. Divê bi guman nêzikî tiştên heyî bibe. Lewma olan ji aliyekî ve kişandiye, zanistê ji aliyekî ve kişandiye, di encamê de di nava civakê de texrîbatên mezin hatine çêkirin. Ger jin, dixwaze mêr ve jiyan bike, hevjiyana azad pêş bixe; divê ev taybetmendî û nêzikbûnên mêr jî nayen qebûlkirin. Çawa ku jina heyî naye qebûlkirin, zilamê heyî jî naye qebûlkirin. Divê tesîrên pergalê û taybetmendiyên ku di zilam de çêbûne ji holê werin rakirin. Divê pîvan û qalibên hatine avakirin birûxin. Lewma armanca jineolojiyê xizmeta civakê ye.

Ji bo vê jî divê zilam jî bi çalak tevlî vê lêgerînê bibe. Jixwe bê jin jî nabe. Ji bo wê xebatek pêwîst dike. Niha em nikarin mejî, nêzikatî û taybetmendiyên ku pergala deshilatdar a mêr li ser me ava kiriye derbas bikin. Li gorî

xwe em lêpirsîneke dikin, lê encamên ku Serokatî derdixîne, di azadiya jin û civakê de em nikarin derxînin. Di navbera me û Serokatî de kendal hene. Da ku em jiyaneke baş li gel jinê pêş bixin, divê her gaveke me tiştên nû biafrîne û ava bike. Lê em vê yekê bi awayekî xurt nikarin pêş bixin. Mesela hevalan got, “dê şikestina seyemîn çawa çêbibe?” Ger em bikaribin civakê li ser cewherê wê ji nû ve zindî bikin û bigihînin nirxên wê, em dikarin bibêjin şikestina seyemîn bi awayekî erenî ji aliyê jinê ve çêbûye. Lê bi sekin û nêzikatiya heyî nabe. Divê mejiyekî me yê hevpar û yekgirtî çêbibe.

Di nava rêxistinê de jî em dibêjin, xebatên me pêş ketine, lê hevparbûyina me pir lewaz dibe. Dîsa yekîtiya fikir û biryaran pir kêm dibe. Em li ser xatirê Serokatî û rêxistinê hev tên û hev û din îdare dikin. Lê ger paradîgmaya me yek be, em li ser heman armancê têkoşînê dimeşînin; divê nêrînên me, nêzikatiyên me, refleks û bertekên me, pîvanên qebûlkirin û redkirinê yek bin. Divê mijarên me yên hevpar her ku çû xurt bibin.

Em di nîqaşan de dibêjin, jixwe zilam e. Zilam jî sextekar e, qûrnaz e ûhwd. Wê demê wateya mîlîtantiya me namîne. Em van tiştan nîqaş dikin ku em pê re çareseriyê bibînin, her wiha nêrîn û nêzikatiyên me hevpar bibin. Meş û têkoşîna me yekgirtî bibin. Lê bi piranî em hev û din îdare dikin û nayen hemberî hev. Em di asteke de tevlî nirx û têkoşîna ku hatiye avakirin dibin û vê yekê

jî bes dibînin. Ji bo vê jî avabûn pir kêm dimîne. Ne ku cudabûn û rengîniya mirovan nabe, lê hin tiştên rêxistinî, jiyanî û civakî hene divê hevpar bin.

Ango hê jî gelek pirsgirekên me yên kûr hene. Ew jî bi tehlîlkirina pirsgirek û mejiyê xwe yê kevn û afirandina ya nû tên çareser kirin. Divê rojene di kes de ew tişt werin afirandin. Lê em bi ferzkirin û fermanên rêxistinê pê re dimeşin. Ger wisa be di mejiyê Modernîteya Demokratîk de pêşketinên me çênabin û ew jî dibin pirsgirek.

**Hevala X…:** Heval R… tabloyekî wisa derxist ku mirov dibêje zilam maxdûr e. Mirov wisa pê dihese. Weke neçarbûn û mecbûriyeteke hatina gel hev girt dest. An jî li ser esasê xatirê Serokatî û Tevgera Azadiyê girt dest. Ew tiştekî pir cîdî ye. Yek jî dibêje, zilam qûrnaz e, sextekar e ji ber vê jî mirov nagihêje hev. Ev yek jî weke nêrîna jinê danî holê. Bi giştî jî di nêrîna hevalên xort de tiştekî wisa heye. Lê heval çima ji aliyê jinê ve bûyerê mezî nake. Ger em behsa şikestina seyemîn dikin, em dibêjin divê li dijberî feraseta zilam pêş bikeve. Pir behsa van nekir, an jî pir gilover qala wan kir. Mirov tam nagihêje ku ka çi dibêje. Divê em hinekî din van mijaran zelal bikin. Ya din jî sedema ev nêzikatiya zilam çi ye?

**Hevala X…:** Pê ve girêdayî em qala newekheviya jin û zilam ku 5 hezar salin berdewam dike dikin. Lê xalên hevpar wê çawa pêş bikevin. Rast e Kurdistan bindest e û rizgariya wê têkoşîn dixwaze. Lê Serokatî weke bingeha

jinê û civakê jin girt dest û têkoşîna di navbera herdu zayendan de derxist pêş. Pîvanên red û qebûlê danîn holê. Wê demê di nava ew newekheviya hezaran salan de xalên me yên hevpar dê çawa çêbibin? Paşverûtiyeke jinê jî heye, lê dîsa ya ku ev feraset û pergal pêş xistiye zilam e. Di vê mijarê de pîvanên Serokatî û weke jin û zilam yên me cuda ne. Çima? Hê jî hevalên me ku 15-20 salin di nava rêxistinê de ne, vîn û hêza jinê qebûl nakin. Çima? Dema em nêzikatiyên xwe û yên Serokatî mezî dikin, çima ew qesî kendal di navberê de hene?

**Hevalê R…:** Ez tam wî tiştî dibêjim. Aliyê me yê hevpar em PKK'î ne û ji bo armanceke têkoşîn didin. Lê tiştên ku em dixwînin encamên cuda derdixînin. Sedama vê ne ku jin pir şoreşger in, zilam ne şoreşger in. Pirsgirek ne ew e. Ger di jiyanê de, têkoşînê de, wate dayina dîrokê de, bi hev re jiyankirin û hevaltiyê de heman tiştan fêm nakin, pirsgirek hene. Rast e, piranî çavkaniya xwe ji nêzikbûnên zilam digre. Lê nêzikatiyên jinê jî tesîr dikin. Em nikarin bibêjin, em bûn şoreşger û hemû pirsgirekên me çareser bûn. Ne ew qesî hêsan e. Jixwa aliyê rêxistinî û bîryarên polîtîk ve hevparî heye. Lê weke kes pêjirandin û ji dil girtina dest de hevparbûyin çênabe. Ne ku em feraset û nêzikatiyên ku di encama van 5 hezar salan de pêş ketine qebûl dikin. Lê em ê van tiştan çawa holê rakin û tiştên nû daynin cihê wê. Divê hevparbûyin û yekbûyin di vê mijarê de çêbibe.

Niha em qala jineolojiyê dikin, ger tiştekî hêsan be dê rêxistin fermaneke derxîne û wê bi xwe ava bibe. Lê ne wisa ye. Têkoşîn, kûrbûyin, guhertin û tevlêbûna mirov dixwaze. Ger zilam vê yekê weke zanista xwe nebîne, nabe. Ger bibêje, bê jineolojî ez nikarim siyasetê pêş bixim, bê vê ez nikarim xwe nas bikim û civakbûneke rast pêş bixim tê wê wateyê ku qebûlkirin û hevparbûyin çêbûye. Lê em wisa nabêjin. Zîhniyeta hezimkirina wê û avakirina şexsî di vê mijarê de pêwîst dike. Ji ber vê tiştên ku ez dibêjim ne gilover in. Ger wisa nebe, em ne dikarin jineolojiyê pêş bixin, ne jî dikarin paradîgmaya nû û civakbûna demokratîk pêş bixin.

Serokatî dibêje, divê hûn ji cihê rast despê bikin. Divê ew jî giştîbûna heqîqetê be. Ger nêrînên me yên şer, jiyanê, dîrokê, jinê, civakê ne yek bin; em nikarin heqîqetê jî ser bixin. Lê em piranî bi parçe digirin dest. Serokatî dibêje, “ez bi piranî ji pratîkê encaman derdixînim.” Lê em pratîka xwe pir lêpirsîn nakin. Ji bo vê jî avabûneke pir xurt çênabe. Ya ku dixwaze vê yekê sererast bike û di hemû mijaran de kesayeta me de nûbûneke çêbike jineolojî ye.

**Hevala X…:** Têkoşîna ku em hem li hemberî pergala deshiltdar didin, hem jî li hemberî aliyên xwe yên paşverû didin, di asta şer de ye. Ji ber vê divê biçûk naye dîtin. Di dîroka tevgera me de jî astên vî şerî hene. Cih bi cih şaş hatiye destgirtin û weke şerê deshilatiyê hatiye dîtin. Lê şerê azadî, demokrasî û wekheviya jinê digre navenda xwe ye.

Her wiha em li hemberî zanista heyî jî têdikoşin, lê em zanisteke alternatîf jineolojiyê datînin holê. Dê ew têkoşîn her bidomo. Lewma jineolojî lêgerîneke heqîqetê ye. Divê mirov wisa bigre dest. Heya ku em hebin, em ê her têkoşîna bîrdoziyê bidin. Em nikarin bibêjin, di falan cihî de em gihêştin azadiyê û divê êdî em bêhna xwe bidin. Lewma dijberiya te jî her heye. Diyardeyên dijberî xwe ji holê ranakin. Her tişt bi dijberiya xwe heye. Ji ber vê dijberiya azadiyê jî wê her hebe û têkoşîna li hemberî vê jî dê her bidome. Di têkoşîna jinê de jî wisa ye. Ji bo vê em dibêjin zanista kuantomê nêzikî jinê ye.

Her wiha em dahûrandinên xwe ji bo kes nakin, ji aliyê zîhniyeta ku tesîr li ser wî kesî/ê de kiriye de em digirin dest. Mesela em hemû ji bo têkoşîna azadiyê hatine vê derê, kes ji bo ku pergala deshilat biparêze nehatiye vê derê. Lê tiştên ku divê em derbas bikin û tesîrên wan li ser xwe biavêjin hene. Ji ber ku em her belav dikin, ava nakin rêxistin her bi me re mijûl dibe. Nîqaşa me jî li ser vê esasê ye.

**Hevalê C…:** Ev mijar ji aliyê gelek hevalan ve nû tê nîqaşkirin. Ji aliyê tevgerê ve jî mijareke nû ye. Lê ji aliyê têkoşînê ve hemû nakokiyên me di vê derê de kîlît dibin. Dema ku jineolojî pênase dike, dixwaze ew xeleka nakokiyan hinekî bidahûrîne û çareser bike. Divê bi vê yekê gelek tişt werin guhertin û sererastkirin.

Li ser esasê koletiya jin û mêr civakeke ku hatiye ava kirin heye. Di nasname û bîrdoziyên cuda de ew asta koletiyê diguhere, lê di hemûyan de jî dûrketina cewherê heye. Di ew talankirina cewherê de jî, piranî her tişt li dijberî jinê pêş dikeve. Di roja me de zanist, dîrok, felsefe, ol, malbat, civak, exleq hemû diyarde li ser vê esasê şêwe girtine. Ji vê derê derketin û ber bi azadiyê gavek avêtinê de têkoşîneke cîdî pêwîst dike. Em hemû dane û mînakên heyî mezî dikin, di dîroka deshilatî de cihê jinê tune ye.

Mînak, Haypatîa û hin jinên ku li hemberî vê pergalê serî radikin û têkoşîn didin hene. Lê di nava dîroka deshilat de ew tişt nehatine diyarkirin. Ango jin nexistine nava vê dîrokê. Mejiyê me yê heyî jî xwe li ser dîrokeke wisa ava kiriye. Em dibînin ku bi vê zîhniyetê em nikarin bigihêjin tiştekî nû jî. Serokatî li hemberî vê dibêje, “*divê çi were kirin, çawa were jiyîn û ji kû were destpêkirin?*” Dîsa di heman mijarê de divê di destpêkê de mirov hesabê neheqiyên ku hatine kirin bipirse. Ew qesa neheqî hene ku em ê bi kîjanê dest pê bikin, ne diyar e.

Em nikarin bibêjin em gaveke biavêjin, dê ya din bi xwe çêbibe. Divê di her mijareke de em hev û din teşvîqî hesabpirsîn û têkoşînê bikin. Gelek tiştên me xirab bûne, ji berzbûna dengê me li hemberî hev bigre heya henekên me tesîra vê xirab-bûyinê tê dîtin. Mesela li Rojhilata Navîn, bi piranî di navenda henekan de jin heye. Em jî bi van henekan dikenin û derbas dibin. Mînakên wisa mirov

dikare zêde bike. Weke tiştên biçûk tên dîtin, lê piranî mejiyê me rawe dike û jiyan li ser kîteyên wisa tê avakirin.

Hin diyardeyên ku bi jinê ve bûne yek hene; namûs, exleq, qeder ûhwd. Dibêjin qedera te de ew heye, felekê wisa nivîsandiye. Bi van tiştan jinê jî ew yek qebûl kiriye, ango sînorên xwe pêjirandin e. Ji bo zilam jî hin qalib û diyardeyên ku pêş ketine hene. Mesela em li vê derê nîqaş dikin, dema ku hevalekî xort tiştekî îtîraf dike, hewil dide ku xwe bidahûrîne. Em dibêjin, "tu zilamê, çawa tiştekî wisa dibêjê?" Ew ji aliyê felsefî ve ji bo me mirineke diyar dike. Ne ku falan hevalî wisa gotiye û bêvan heval wisa dibêje, kêm zêde em weke hev in. Mejiyê me hemûyan de jî ji vê yekê re bingehek heye. Ji bo vê ew pênaseyên ku ji bo jin û zilam hatine kirin û vegeriyane nasname û taybetmendiyan divê biguherin.

Her wiha li ser vê esasê divê zanist, dîrok, civak, exleq ûhwd ji nû ve werin pênasekirin. Di vê derê de pîvan jî azadî ye. Ger armanca me jiyana azad be, divê pîvanên me jî li ser wê esasê pêş bikevin. Ji vî alî ve rêhevaltiyeke rast jî pêwîst dike. An na wateya xebatên me yên leşkerî, siyasî, bîrdozî û civakî jî tune ye.

Mesela li R... me qala akademiya jinê dikir. Li gel me akademîsyenekî Îngîlîz hebû, got "hûn çi dizanin ku hûn tiştekî jî bidin jinê?" Hevaleke me jî got, "rast e em tiştekî wisa pir teorî nadin. Em lêgerîna azadiyê û mafperweriyê

nîşanî wan didin. Piştî wê ew jin bi xwe dikeve nava lêgerînê." Dema vî akademîsyenî ew gotin bihîst, şerm kir. Her wiha Akedemîsyenekî Norveçî, bi hevalên YPJ'î re nîqaş dikir. Piştî ku ew guhdarî kirin, got, "sê keçên min hene. Ez niha baştir fêm dikim, hûn li vê derê tenê li hemberî DAIŞ'ê şer nakin, di heman demê de hûn pêşeroja keçên min nîqaş dikin û ji bo wê têkoşîn didin. Dibe ku hûn bibêjin jixwe mirovên li Norveç'ê azad in, lê ne wisa ye. Dê nîqaş û têkoşîna we ya li vê derê li ser jiyana wê derê jî tesîr bike."

Ango hem pirsgirekên ku ji vî alî ve tên jiyîn pir kûr in, hem jî gav û encamên ku ev têkoşîn derdixe holê pir berfireh û encamgir in. Ji ber vê yekê jineolojî ne tiştekî ku mirov bi nîqaşa çend rojan û mehan têbigihêje û bi encam bike ye. Ew jî hin tiştan li ser me bar dike, divê em ji xwe fedakariyê bikin û ji milê azadiyê ve pengavan biavêjin.

**Hevalê X…:** Serokatî dibêje, "*heqîqet evîn e, evîn jiyana azad e."* Qesî ku min jê fêm kir, jineolojî jî xwe ginadina wê jiyanê ye. Rê û rêbaza wê ye. Wê demê jineolojî heqîqetê digere. Heqîqeta ku hatiye parçekirin, tiştên ku berovajî weke heqîqet hatine pênasekirin lêpirsîn dike. Wê demê jineolojî cewhera paradîgmaya Modernîteya Demokratîk e. Mirov çiqasî heqîqetê fêm dike, digihêje jiyana azad; mirov çiqasî digihêje jiyana azad jî, wateya heqîqetê xurt dike.

Îslam, di despêka xwe de pir komînal e û her tiştê xwe nîqaş dikin. Xwedê jî nîqaş dikin. Wê demê ti kes nabêje bila li ser xwedê nîqaş çênebe. Lewma xweda tiştekî nû bû. Digotin, “*ger ew peykerên hene, ne xweda bin wê demê xweda kî ye, li kû ye, çi dike, sifatên wî çi ne?*” Bi vî awayî digihêjin heqîqeta xwe. Lê dema ku hin pirs bê bersiv dimînin û hinek tişt li ser wan tên ferzkirin, bi taybetî piştî Hz Muhamed ew yek çêdibe. Bi wê yekê re kesayetek çêdibe, jê re dibêjin durû û mûnafiq. Tiştên ku jê bawer nakin, dibêjin me bawer kiriye, tiştên ku fêm nekirine re dibêjin me fêm kiriye. Bi wî awayî ew şexsiyet dibe tîpek û pişt re dibe çînek. Çîneke mûnafiq di Îslamê de pêş dikeve. Pişt re civaka Îslamê bi piranî dikeve bin tesîra mûnafiqiyê. Tiştê ku Îslam ji cewherê derxist û di nav de deshilatî pêş xist jî ew bû.

Divê jineolojî beriya her tiştî pêşiya vê mûnafiqtiyê bigre. Divê bibe zemîneke azad ku em bikaribin nîqaşan çêbikin. Divê rûpoş û durûtiyên me biavêje. Ez nabêjim em hemû mûnafiq in. Lê ez dibêjim, divê mirov bê fikar û bi wêrekî nîqaş bike. Divê jineojî ji aliyekî ve bibe zanista nîqaşkirin û lêgerînê. An na dê jineolojî an ber bi dogmatîzmê ve biçe, an jî ber bi pozîtîvîzmê ve biçe.

Di Îslamê de gelek mezheb pêş ketin. Lê teolojiyê pêşiya mezhep-reolon girt. Lewma gelek pirs hebûn nedikarî bersiv bide. Ji bo ku nikarî bersiv bide, pêşî li pirsan girt. Vê yekê bi xwe ew şêwegirtina mûnafiqiyê zêde kir. Niha aloziya ku di nava Îslamê de tê jiyîn, aloziya durîtiyê ye.

Em tevgereke şoreşger û mîsoger in. Jineolojî jî zanista me ya esasî ye. Rê û rêbaz jê re pêwîst e. Nîqaş û lêgerîn jê re pêwîst dike. Divê ti nîqaş guneh nayen dîtin, bi bertek nêzikbûn çênebe. Şoreşa mejî ku Serokatî qalê dike jî, dê di jineolojiyê de çêdibe. Lê dema ku jineolojî wêrekî di me de ava bike û bihêle ku em bê fikar biaxifin. Berê jî gelek nîqaş û teorî pêş ketin. Lê niha ew ast bi jineolojiyê gihêştiye lûtkeyê. Ji ber vê di encama ked û têkoşîneke mezin de derketiye holê. Ne hêsan e. Ger em weke pireke jineolojiyê di navbera heqîqetê û jiyana azad de ava bikin, dê ew qesî cihê xwe bigre û ji pêwîstiyan re bibe bersiv.

Mesela gumanên min çêdibin. Em dîrokê, psîkolojiyê, perwerdehiyê, civakê çawa digirin dest? Mesela ji bo ku perwerdehiyên me ber bi erdnezyariya civakê ve neçin, divê jineolojî çi bike? Jineolojî, coş û kelecaniya heqîqetê û jiyana azad çawa dikare biafrîne? Tenê bi avakirina çend saziyan dibe? An dibe çavkanî û bingeha kelecanî, coş, evîn û watedayina jiyanê? Tiştê ku îro di jiyanê de herî zêde bêwate ye mirov û jiyan e. Dê jineolojî ji vê yekê re çareseriyeke çawa bibîne?

Divê em her tiştî li ser milên jineolojiyê jî bar nekin. Ew jî fêmnekirina jineolojiyê ye. Bêguman pîvan, rêgez û prensîbên wê hene. Ji vî alî ve dibêjim. Bi ya min jineolojî tevdîra herî baş li hemberî deshilatdariyê ye. Tenê ne karê çend hevalên jin û xort e jî. Paradîgmaya me ve girêdayî ye, bi xwe jiyanî ye. Ango ne tenê tiştekî pirtûkî û teoriyê ye.

**Hevalê H…:** Di mejiyê min de hin tiştên zelal nebûne hene. Em dibêjin, jineolojî ya jinê ye, divê zilam jî xwe tê de bibîne. Lê li hemberî vê rastiyeke civakê jî heye. Di pirsgirekên di nava civakê divê jineolojî çawa çareser bike? Li Kurdistan'ê pirsgireka jinê pir kûr e. Mesela li Bakur îro ensest û destdirêjî pêş dikeve. Dê jineolojî çawa pêşiya vê bigre? Rast ,e bi akademiyê di mejî de wê guhertin çêbibe, lê ne kadroyek e ku tu hemû civakê bînê çiyê û perwerde bikê. Me ji bo zimanê Kurdî çend dibistan li Bakur vekirin, dijmin tehamûlî wan nekir. Me pergala xwe jî ava nekiriye, dibe ku hin qadên meyî têkoşînê hinek tişt guherîbin, lê li bi giştî Kurdistanê wê çawa bibe? Pergal destûr nade ku em li van deran akademiyên îlma jinê vekin. Ango ger tenê bi akademiyan mabe, em nikarin ava bikin.

**Hevala X…:** Heval hinekî tiştên şêwazî vekirin, lê li ser esasê şêwaz ketina nava gumanan, ne rast e. Guman tenê li ser vê esasê ye, an na tiştên dîtir hene? Mesela em dibêjin, gelo jin dixwazin deshilatdariya xwe ava bikin, wê dîrokê li gorî xwe ava bikin? Heval H… dikare ew nakokî û gumanên xwe hinekî din kûr veke?

**Hevala X…:** Mirov dikare van nakokiyan hinekî jî di kesayet û mejiyê xwe de çareser bike. Mesela em van perwerdehiyan weke kesayeta xwe dahûrandinê digirin dest. Lê di nirxandinên heval H… de, ez xwe xapandineke dibînim. Ya giştî gilover kirin û xwe di nav de negirtina dest heye? Mesela hevalan şikestina seyemîn û zayendî

pirsî, ti hevalan bersiv neda. Her wiha pirsgireka heyî de para zilam çi ye, li hemberî derdora xwe, malbata xwe, hevalên xwe yên jin, zilam çawa nêzik dibe, wê guhertineke çawa çêbe? Em hinekî van tiştan binirxînin dê baş bibe.

**Hevala X…:** Heval jineolojiyê weke paradîgma digre dest, an weke zanista paradîgmayê digre dest?

**Hevalê X…:** Ez dibêjim, jineolojî tenê bi pêşxistina akademiyên di nava çar dîwaran de pêş nakeve. Zanisteke jiyanê ye. Mesela Xiristiyanan, 300 salî bêyî ku navendeke wan a perwerdehiyê hebe, di şikeft û daristanan de xwe perwerde kirin û felsefeya xwe jiyanî kirin. Li her cihî jî rastî komkûjiyan hatin. Piştî Hz Îsa hat kûştin jî, 12 hawariyên wî Xiristiyanî belav kirin û îro xîtabî milyonan dikin. Her wiha Îsa, weke Muhamed ti pirtûk jî nehêliştibûn. Lê bi felsefeya Îsa bi milyonan mirov tevdigerin. Ya me ne wisa ye. Hezaran pirtûkên me hene, dahûrandin û paraznameyên Serokatî hene, têkoşîna 40 salî heye. Ji ber vê yekê ez dibêjim, ew ne tenê karê akademiyan e. Akademî jî beşeke zanistê yên deshilatdariyê ne. Her tişt jî bi akademiyan naye fêm kirin. Divê jiyanî bibe.

Mesela li B… akademiyeke me heye, bi tîpên mezin jî "*Akademiya Jina Azad*" hatiye nivîsîn, lê tenê hevalek tê de ye. Car caran heval êvaran diçin û civîn çêdikin. Tê de perwerdehî jî tune ye. Ango ew kar bi bînayetan çênabe, karekî zîhnî ye.

Gumanên min, ne li ser esasê paradîgmayê ne. Zanisteke nû heye, em ê vê çawa fêr bibin û di nava civakê de belav bikin. Mesela me mînakên jinê yên dîrokî dan; Haypatîa û Zenobya jî di nava deshilatdariyê de bûne. Lê em tenê milê wê yê jinbûnê digirin dest. Tiştên ku ez tînim ziman, ez ji bo şexsê xwe jî digrim dest. Dê fikrandinên min, nêzikatiyên min, axaftina min û jiyana min çawa be? Mirov van tiştan hemûyan di wê çarçoveyê de dikare bigre dest.

Pirsgireka azadî ya zilam jî heye. Ez carna dipirsim, Serokatî çima navê wê kiriye jineolojî? Di hemû zanist û felsefeyah de weke "pirsgireka jin" pênase dikin. Weke ku jin pirsgirek be digirin dest. Lê ne wisa ye, pirsgirek ji bo jinê çêkirine. Ev navlêkirin jî ji aliyê zilam ve çêbûye. Jixwe pirsgirek di zilam de destpê dike, lewma mejiyê wî pergal û pirsgirekek wisa pêş xistiye. Di encamê de îro hem jin, hem jî mêr pirsgirek e. Herdu jî kole ne.

Bi nêrîna min, mirov tenê bi şoreşa zîhnî dikare şikestina seyemîn çêbike. Ger mirov tiştê ku divê pêş bikeve dernexîne zanebûnê, bi axaftinê encam naye girtin. Di girtina dest a pirsgirekan de jî pirsgirek heye. Her wiha xwe girtina dest de pirsgirekên me hene. Mesela hevalan tarîfa zilam pirsîn. Min ji hevalan re jî got, cara yekemîn e ku ez pirseke wisa li xwe dikim. Wê demê ez pirsgirekê di xwe de nabînim, di jinê de dibînim. Ango ne jinê, ez xwe nas nakim. Parçeyekî jineolojiyê jî ew e, dê zilam xwe çawa bigre dest û bidahûrîne?

5 hezar sal ûmrê min tune ye, lê danehevên 5 hezar sal di mejiyê me de kom bûye. Di şexsê me de pergalek hatiye avakirin. Ango wisa ne rehet e. Mesela nivîskarekî bi navê Dûzgûn Gokan li ser Serokatî, tezeke bi navê “*Parastina Serokekî*” nivîsandiye. Tiştekî pir balkeş dibêje; *“Serokatî tiştên ku di mejiyê wî de dane rûnişkandin sîl kirine, jê birine. Cihê wê zanîn û mejiyekî azad ava kiriye.”* Lê di bin mejiyê me de tesîra feraseta 5 hezaran sal heye. Jêbirin û ji holê rakirina vê yekê ne rehet e. Ez weke qeder nagrim dest. Lê kombûyineke şaş çêbûye. Niha di vê derê guhertineke wê çawa çêbe, ew karekî jineolojiyê ye.

Ew peyva zanist û lojî jî bi nîqaş in. Niha di Soranî de nabêjin Jin-olojî, dibêjin jin-nasî. Yanî em çawa zanist û lojiyan mezî dikin, ew jî pirsgirek e. Ez jin-nasiyê weke zanista paradîgmaya me digrim dest.

**Hevala X…:** Ez dixwazim tiştekî sererast bikim. Nêzikbûna hevalan ya akademiyan şaş e. Tevgera me her tiştî li ser esasê perwerdehî û akademiyan pêş dixe. Têkoşîna me jî li ser esasê Akademiya Mahsum Korkmaz pêş ket. Wê Akademiyê bi hezaran Zîlan û Egîd gihandinê. Dîsa di vê derê de nêzikbûn û feraseta me derdikeve holê. Ango çawa mezîkirina kes derdikeve pêş. Lê weke tevger em akademiyan wisa pênase dikin û risteke girîng didin wan.

**Hevala X…:** Divê mirov ji kû ve dest bi jineolojiyê bike û pêşniyarên me yên çareseriyê çi ne? Min nivîseke PAJK'ê xwendibû, behsa taybetmeniyên azadiya jinê dikirin; melektî, xwedawendî û Afrodîtbûyin. Ez li ser van tegînan lêhûrbûm. Di civakê de beramberî vê çi te, di olan de çawa tê destgirtin. Mesela di olan de melek, weke kesên ku naxwe, venaxwe, raneza û her xizmet dike ye. Teyisîna vê ya di nava civakê de jî, melek jina ku her zarok û hevserê xwe re xizmet dike ye. Ev tîpolojiya jinê baş tê destgirtin. Jinên wisa re dibêjin, melek.

Di nivîsa PAJK'ê de melekbûyin, di rih û mejî de safbûyin û paqijbûyin digirt dest. Bi kedê ve girêdayîn heye, ne koletî ye. Em îro civakbûyina jinê digirin dest, lê pir caran şaş tê fêm kirin. Serokatî kedê û karkertiyê ji hev û din cuda dike. Em pir caran li ser navê kêdê karkertiyê pêş dixin. Ew jî bi xwe re koletî û neheqiyê tîne.

Ya duyemîn, Afrodîtbûyin e. Xwedawendeke Yewnan e. Bi xweşikbûyin û evînê tê naskirin. Kapîtalîzm îro van têgehan jî li gorî xwe kar tîne. Jin xistiye rewşa metayeke û bi firotina bedana jinê, ketina herî dijwar jinê dide jiyîn. Jixwe li gorî mêr pênase dike. Parçe jî dike. Mesela li gorî hevser jin cuda ye, li gorî xwoşewîstê wê cuda ye, li gorî bavê wê cuda ye. Afrodîtbûyin jî, di kapîtalîzmê de li gorî birêsereke tê dest girtin. Xweşikbûn û estekîbûyina jinê, rih û jiyan estetîk kirin, reng dayin e. Lê ew têgeh jî di pergalê de û civakê de hatiye berovajîkirin.

Xwedawendî jî; di cewhera xwe de jin, ew e. Di nava jiyana civakî de Xweda pir derbas dibe, lê xwedawendî ji me re pir biyanî ye. Lewma me xweda her weke mêr dîtî ye. Ev yek li ser zarokan jî pir tesîr dike. Mesela dema ku ez zarok bûm, di gund de yê ku herî zêde li hemberî wî rêz dihat girtin û gotina wî dikir mêr bû. Min jî mêr weke xweda digirt dest. Her wiha mêr qral e, ewliya ye.

Lê çima xwede ne jin e, mêr e. Divê ew tiştê ku di serê me de hatiye avakirin, di destpêkê de mejî de were rûxandin û ji nû ve were tarîfkirin û pişt re jî em dest bi înşayê bikin. Mesela me akademî girtin dest, dê di akademiyan de jin li ser kîjan esasî xwe perwerde bike. Serokatî jî, ji bo jinê qadên azad yên jiyanê pêşniyar dikirin. Ango divê pergal û jiyana heyî qut bibe. Heya ku xwe nas bike. Ew qutbûyin jî, tenê ne fîzîkî ye, rihî û zîhnî ye. Li gel naskirina xwe, dê jin mêr jî nas bike. Di vê de guhertina mêr jî girîng e.

Serokatî dibêje, divê em jinê re bijîn û hevaltiyê bikin. Divê hezkirina me ne parçe be. Ango em dayika xwe cuda hez bikin, hevsera xwe cuda hez bikin, xûçka xwe cuda hez bikin, hevala xwe cuda hez bikin. Ango bi vî rengî parçekirina jinê xeterî ye. Yek jî Serokatî dibêje, “*divê evîn civakî bibe*.” Mirov dikare vê yekê jinê ve girê bide. Divê hezkirina jinê jî civakî be.

**Hevala X…:** Heval hem ji aliyê dîrokî ve, hem jî ji aliyê têkiliya jin û mêr ve girt dest. Her wiha pênaseya herdoreke ku li ser jinê dike jî vekir. Mirov di vê derê de dikare rista jineolojiyê binirxîne?

**Hevalê X…:** Jineolojî hevalan jî weke karekî dûv û dirêj girtin dest. Lê mirov bi pênasekirina têgînan dikare dest pê bike. Mesela hin têgîn di mejî de rûniştine. Mesela em gelek zîhniyetan li ser mêr pênase dikin. Lê ev çi ne, divê werin vekirin. Ev rastiya mêr di her qadeke jiyanê de heye. Her wiha di her qadeke jiyanê de jin jî hatiye sînordar kirin û naye dîtin. Bê vîn û hêz hatiye hiştin. Ew jî bi deshilatdariyê ve girêdayî ne. Ji ber ku van têgîn û qalibên ji bo jinê û mêr hatine diyarkirin, teyisandina xwe li ser jiyanê dikin. Jineolojî dikare di destpêkê de vê yekê biguherîne.

**Hevalê X…:** Berê jî em li ser jineolojiyê sekinîbûn, di paraznameyê de hatibû xwendin û li ser nîqaş hatibûn kirin. Îro bi awayekî berfireh di vê waneyê de em digirin dest. Bi vî rengî berfireh girtina dest û kûrkirinê de weke kes lewaziyên me hene.

Weke zanist dema ku tu li ser jineolojiyê disekinê, ne ku her tiştê jinê ji nû ve tê pênasekirin û têkoşîna wê jî nû destpê dike. Dîrokeke jinê heye, ew jî li ser esasê zanisteke pêş ketiye, ne bê zanist bûye. Lê di jineolojiyê de vesaz dibe, form û şêweyeke nû digre. Ger di şêweya wê de jin hebe, dê pêşketina wê jî jin bike. Divê hest, fikir

û rihê jinê de astek derkeve holê ku mêr jî tevlê bibe. An na bi taybetmendiyên mêr were dest girtin, guhertinek ya kevn de çênabe. Ango rengê jin û civakê nagre.

Bêguman ne hêsan e. Zemîneke wê heye, kombûyin û danehevek heye. Lê dîsa jî ne tiştekî rehet e. Lê dema ku jineolojî lêgerîn û pêşketina xwe bigihîne astekê, dê gelek tişt jî çareser bibin. Mesela zanistên heyî dîrokê cuda digirin dest, lê ger jineolojî dîrokê bigre dest wê pir pir cuda be. Her wiha divê kêmasiyên ku femînîzmê jiyîne, jineolojî nejî. Da ku tesîra xwe li ser hemû civak û jiyanê bike. Ger bi rastî jî jineolojî pêş bikeve û rastiya wê were fêm kirin. Mesela ji aliyê jinê ve xwebûn wê çêbibe. Dê tesîrên xwe li ser qadên din yên civakê jî bike.

Mesela di dîrokê de Lîlît û Tîamat weke şeytan tên destgirtin. Weke pevçûna di nava zayendan de tê destgirtin, weke şerê deshilatdariyê tê nirxandin. Lê divê mirov weke şerê di navbera deshilatî û civakê de bigre dest. Mesala li ser civakê zayenperestî serwer e, divê ew were guhertin. Lê hêzeke guhertinê pêwîst dike. Mesela îro jî pevçûneke zayendî heye, têkoşînek heye; lê asta wê ya guhertin û veguhertinê pir kêm e. Serokatî jî, di hevdîtina xwe ya dawî de digot, *“ne azadiya zayendê, azadiya jinê derxînin pêş.”* Lewma zêdetir berfireh e. Lewma azadiya jinê, hem tê wateya azadiya mer, hem jî tê wateya civakê.

Mesela em li ser hevsengiya xwazayê nîqaş û lêhûrbûnan dikin. Dê azadiya jinê di vê mijarê de jî zelalbûneke çêbike. Lewma em dibêjin di destpêkê de jin, piştre xwaze, piştre jî civak hatiye xistin. Azadiya jin, xweza û civakê jî bi hev ve girêdayî ye. Em gelek tegîn û diyardeyên deshilatdariyê rêz dikin; lê di nava hevsengiya azadiya jin, xweza û civakê de ew hemû dê werin çareserkirin. Her wiha dikare bi xwe re gelek encaman derxîne holê.

**Hevalê X…:** Divê mirov şoreşa siyasî û zîhnî cuda bigre dest. Ji bo şoreşa siyasî, mirov dikare di nava 20-30'î salî de şoreşan çêbike û gelek guhertinan çêbike. Lê şoreşa zîhnî karê bîrdoziyê ye û domdirêj e. Şoreşeke çandî ye. Ji jin û mêr bigre heya zarokan û extiyaran, ji avê bigre heya hewa û axê, guhertina van guhertineke çandî ye. Ev  tişt bi careke re nabin. Lê her çalakiyeke ku pêş dikeve, ji xwe re guhertineke tîne. Ew 42 sal in têkoşîneke PKK'ê heye. Jinên Kurd jî bi awayekî çalak û xurt tevlî vê têkoşînê bûne û berxwedaneke wan heye. Vê têkoşînê bi xwe re çandek ava kiriye, di mejî de guhertinek çêkiriye. Kesên ku derva ve dişopînin jî carna vê yekê bi nav dikin. Ango îro em li Kurdistanê qala şoreşeke civakî dikin.

Her çalakiyeke siyasî, bi awayekî serbixwe tesîrên zîhnî dike. Îro li Rojava di pêşengtiya jinên Kurd de têkoşîneke xurt û bi tesîr heye. Di dema xwe de

berxwedaneke siyasî ye û encamên wê yên siyasî hene. Ew yek hem ji bo Kurdistanê, hem ji bo herêmê, hem jî ji bo cîhanê derbasdar e. Bi taybetî bi berxwedana Kobanê û Şengalê ev encamên siyasî şênbertir bûn. Tevî vê tesîreke vê ya çandî jî heye. Ew jî hinekî demdirêj derdikeve holê. Mesela îro jinên Ereb çiqasî xweziya xwe bi jinên YPJ'î tînin. Ew destpêkêk û lêgerîneke ji bo jinên herêma Rojhilata Navîn.

Li ser me jî tesîreke çandî û zîhnî heye. Lê ya ku em îro li ser disekinin, asta ku derketiye holê ji bo me têr nake. Di vir de jî nîqaşek heye; hevalên jin dibêjin, bila hevalên mêr me biguherînin; hevalên mêr jî dibêjin bila hevalên jin me biguherînin. Bi awayekî objektîf ev encam derdikev holê. An jî hevalên xort dibêjin, bila jin xwe biguherînin, jixwe em ê biguherin. Em di avakirina civaka nû de pêşeng in. Em mîlîtanên Rêber Apo ne. Wê demê di nava civakê de hevbeş avakirinê de û pêşxistina azadiya jinê de, divê em destpêkê di nava xwe de ava bikin û pişt re biteyisînin ser civakê. Rêxistina me tiştek ava kiriye û pîvanek jî daniye. Lê ji wê jî  zêdetir weke kes di zîhniyeta xwe guhertinê de em pirsgirekan jiyan dikin.

Heya niha di nava rêxistina me de jî, dema ku pirsgirekek tê jiyîn, ji aliyê hevalên xurt ve ya gunehbar jin e. Mesela li Ewropa du kesan xeletiyek jiyan kirine, tu mezî dikê ev mêr di nava civakê de digere, lê jin nikare serê xwe ji derî re derxîne derva. Ango jin tê

mehkûmkirin. Ev di nava rêxistina me de çêdibe. Jixwe di nava civakê de jî wisa ye. Pirsgirekên civakî ku hatine rojeva rêxistina me de jî, teqez neheqiyek derketiye holê. Mesela keçek hatiye û xwe sipartiye me, lê em wê keçê radestî malbata wê dikin û ew jî bi awayekî hovane dibin û wê keçê dikûjin. Em dibêjin, derdorên me ne, welatparêz in, divê em meseleyê mezin nekin. Qûsûrê mezî nekin, lê hinek derdor hene jinan difroşin, lê hevalên me di bin navê welatparêz in de diçin aîdatê jê digirin. Dema ev tişt tên rojevê jî, hema ser tê girtin. Divê di van mijaran de mezîkirineke me ya rêgezî û pîvanî hebe.

Tişt her ku biçûk dibin zirav dibin û nayen dîtin. Di nava vê partiyê de ew qesî perwerde û têkoşîn tê dayin, aliyên me yên çort û ber çavan dikevin ji holê rabûne. Lê bi awayekî zirav hê jî tên jiyîn. Ya girîng, dîtina wê ziravêyê û bi awayekî mayinde û zîhnî çareserkirin e. Ji ber ku aliyên me yên çort ji holê rabûne, em xwe têr dibînin. Hem ji bo hevalên jin, hem jî hevalên xort wisa ye. Lewma têgihiştina me kêm e, em têrê nakin ku wan ziraviyan bibînin û li ser xwe bisekinin. Em dibêjin, jixwe em jinê naxin, heqeretê lê nakin, em nazewicin, ew qes bes e. Lê têrê nake. Di jiyana hevbeş de hê jî, em ne model in. Serokatî dibêje, “*hê jî di nava me de du têkiliyên jin û mêr ku ez mînak bigrim derneketin.”* Ew di dilê Serokatî de jî bûye hesret.

Serokatî ji bo hemû zanistiya civakê gotibû, pîvanên wê zelal in. Em li ser penç xalan sekinîn. Ya yekemîn, divê jineolojî parçe neke, weke zanist giştî bigre dest. Rast e, di nava vê de parçe hene, lê heqîqeta wê yekpare ye. Serokatî ew yek ji bo sosyolojiyê jî got.

Ya duyemîn, divê deshilatdariyê qebûl neke, red bike. Bi rêgez û pîvan nêzikî deshilatiyê bibe.

Ya seyemîn, divê mejiyê hestiyar û analîtîk bi hev re bigre dest û li ser esasê hev û din timamkirinê be.

Ya çaremîn, dîrokê qut nagre dest. Dîrok di îro de ye, îro jî pêşerojê diyar dike.

Ya pencemîn, divê zanista diyardeperest û pozîtîvîst derbas bike. Divê hest û hîsan înkar neke.

**Hevala X…:** Em jineolojiyê çawa pênase dikin û digirin dest, çima nîqaş dikin? Di vî zemînî de nîqaşkirin wê baştir bibe. Hemû hevalên ku bi salane rêveberî û fermandarî kirine li vê derê ne. Dema ku rêxistin jî vê mijarê li vir nîqaş dike, dixwaze nêrînek derkeve ku di pratîkê de jiyanî bibe. Lewma risteke pêşengtiyê ya akademiyên me jî heye. Divê em li vir zelal bikin, divê nêzikatiyeke me ya hevpar çawa derkeve? Tiştên ku di mejiyê zilam û jinê de werin rûxandin pir in, em azad jî nebûne. Lê herî kêm em ketina riya azadiyê. Hevalê M… dikare ji aliyê zilam ve bigre dest, divê nêrîneke hevpar çawa derkeve holê? Heval çawa digre dest?

**Hevala X…:** Heval M… hinek tiştên nêzikî rastiyê gotin. Di van 40 salên dawî de ji aliyê jinê ve pêşketinek çêbû. Ji hemû aliyan ve gav hatin avêtin. Lê me nedît ku di van salan de serhildaneke zilamê Kurd li hemberî zîhniyeta deshilatiyê çêbû. Hê jî li Kurdistanê, tundî, destdirêjî, rejîmkirin heye. Heval van bi çi ve girê dide?

**Hevala X…:** Heval M… dibêje, hevalên xort ji hevalên jin hêvî dikin ku wan biguherînin. Ango risteke erenî didin ser milê jinê, an pirsgirekê hawaleyî jinê dikin?

**Hevalê M…:** Rast e, hevalên xort vê yekê hawaleyî jinê dikin. Di esasê xwe de jî nexwestina guhertinê heye. Di nava PKK’ê de pirsgireka hevalên xort, ji aliyê azadiya jinê ve nexistina rojeva xwe heye. Em hemû jî dişibin hev, sibê em ê rapor binivisînin û em hemûyê jî bibêjin me têkoşîna zayendî di xwe de cemidandiye û bi awayekî çalak nemeşandiye. Ew tê çi wateyê? Me têkoşîn di xwe de sekinandiye.

**Hevala X…:** Mêr çawa nêzikî pirsgireka azadiyê dibe?

**Hevalê X…:** Li gel jinê bi awayekî hevbeş jiyîn û meşîn bi asta azadiyê ve girêdayî ye. Ji aliyê bîrdozî, sîyasî, felsefî û leşkerî ve çiqasa têgihiştin çêbibe, ew kes ew qesî azad e. Çiqasî azad be jî, dikare ew jiyana hevbeş ava bike. Beriya her tiştî ji bo vê têkoşînek beramberî xwe divê were dayin. Serokatî çiqasî pirsgireka azadiyê ya jinê nirxandibe, ew qesî jî pirsgireka mêr nirxand. Yê ku

pirsgirek ava kiriye û derxistiye holê mêr e, lê dîsa yê ku vî tiştî ji xwe re weke pirsgirek nabîne jî mêr e. Ji ber wê dibêje bila min biguherînin. Ango dixwaze bibêje, ez naguherim. Li dijî azadiyê ber xwe dayin heye. Bêguman tesîra jinê ser mêr jî heye û diguherîne. Lê her tiştî çareser nake.

Pirsgireka mêr heye, ez bi xwe jî li ser vê disekinim. Di mijarên siyaset, bîrdozî, şer û jiyanê de gelek tişt dikevin rojeva me, em van tiştan pir rehet nîqaş dikin û pîska hev û din digirin. Lê mijara azadiya jinê bi awayekî berfireh û rehetî naye nîqaşkirin. Kîjan demê ev mijar vedibe, dibe mijara henek û pekenokan. Di nava jiyanê de nêzikatiyeke wisa heye.

Ger civaka azad wê bi jina azad ava bibe, ger jina wê civakê ne azad be ew civak û merê wê jî ne azad e; sedema vê bêtêkoşîniyê çi ye? Herî kêm di vê mijarê de em tevlî Serokatî dibin, an jî bi Serokatî qaneh bûyin herî kêm di vê mijarê de tê jiyîn. Ev yek bi xwe re nexweşî û lewaziyeke jî derdixe holê, dibe sedema ketinê. Pratîkên wan ber çavan e. Yên ku vî tiştî dijîn, ji asta civakê jî diborin. Wê demê mesele ne biçûk e. Lewma xwe guhertin û hev û din guhertinê de têkoşîneke mezin tune ye. Ez van tiştan di despêkê de ji bo xwe dibêjim. Dibe ku me hin aliyên xwe yên çort derbas kiribin, lê dema ku di ziraviyên jiyan û kesayet de heya ku em xwe rizgar nekin, em ti caran nikarin bi jinê re bibin heval. Wê demê an tuyê

bi çavê kevneşopiyê jinê binêrê, an jî bi nêzikatiya bûrjûvaziya biçûk lê binêrê. Ya me niha di navbera herduyan de ye. Tesîra Serokatî û partiyê jî heye, lê divê tesîrên van bîrdoziyên dîtir êdî qet nemînin.

Têkiliyên jin û mêr ku îro em di nava PKK'ê de jiyan dikin, ne li gorî asta Serokatî ye. Têkiliyên me yên rojane, dan û stendinên me ne li gorî asta PKK û Serokatî ne. Tesîrên kevneşop hene. Em vê jiyan dikin. Li hemberî vê bêguman têkoşînek heye. Lê bi rastî jî li hemberî nêzikatiyên berovajî, êş û bertekeke me ya mezin tune ye. Ev jî ji jinê re tê hiştin. Mesela di civakê de destdirêjiyek çêdibe, lê dervayî 40-50 jinî ti kes lê xwedî dernakeve. Ev ne êrîşeke li ser civakê ye? Lê mijareke olî ba, zêdetir lê xwedî derketin hebû. Jixwe ti kes nikare wê wêrekiyê nîşan bide ku di nava PKK'ê de nêzikatiyên pir çort li hemberî jinê nîşan bide. Lê ji aliyê çand ve, tesîra pergalê û deshilatdariyê ji tesîra PKK'ê zêdetir e. Ango di nava PKK'ê de, tesîra zîhniyeta ku PKK li dijî wê şer dike, ji tesîra PKK'ê xurtir e.

Dibe ku weke têgeh em jineolojiyê nû dibînin, lê 40 salin li ser wê esasê têkoşînek tê dayin. Ji ber wê ti kes ne xerîb e. Weke zanist nû ye û lêgerînên wê hene. Lê naveroka wê berê jî hebû. Hevalan got, divê em li kû bigihêjin hev? Bi hevkirin û bêdeng mayinê hevkarî û jiyana hevbeş çênabe. Van waneyên me û nîqaşên me ji aliyê zîhniyet û mejî de, ji aliyê têgeh û siyasetê de me pêş

dixe. Ya din jî hem weke jin, hem weke mêr divê em xwe ve rû bi rû bimînin. Ka me di kû de winda kiriye. Niha pîvana me Serokatî ye. Çima zilam dikare hem jinê re, hem mêr re têkiliyeke azad pêş bixe? Lewma tiştên ku dibêje bawer dike, aîdî wî ne. Êşa herimandin û rûxandina civakê bi rastî jî dijî. Ji ber wê dikare her kesekî/ê re rêhevaltiyê bike.

Ger em jî di vê mijarê de serê xwe biêşînin, li ser xwe bisekinin û hinek tiştan ji xwe re îtîraf bikin, vê rastiyê ji dil hîs bikin, em jî dikarin rêhevaltiyeke pêş bixin. Di paradîgmaya civaka exleqî û polîtîk de çiqasî pêşketin çêbibe, dê biteyise ser nêzikatî û hevaltiya me jî. Jixwe dema ku tê jiyîn, di şexsê hin hevalan de em vê yekê dibînin jî. Hevalên bi vî rengî re hem jin, hem mêr her kesek bi rehetî dikare bide û bistîne. Sezgiyên jinê ji yên mêr xurtir in. Nêzikatiya kîjan hevalî çi ye, jin fêm dikin. Wê demê kî di xwe de asteke şoreşgerî û azadiyê pêş bixe, jixwe xwe nêzikî jinê dike. Wê demê bi hev re têkoşîn, pêşketin, herikîn û jiyîn çêdibe. Gihêştina hev çêdibe. An na em ê her xwe dubare bikin û li serê tevgerê bibin bela.

**Hevalê X…:** Ez dixwazim bi çend gotinên herêmî destpê bikim. Dibêjin, “ne pêwîst e ku jin di nava aboriyê de cih bigre, lewma xirab dike. Nêrîna jinê bigre, lê nexe pratîkê.” Her  wiha di pirtûka siyasetnameyê de çîrokek li ser jinê heye; zilamek, 40 salî îbadet dike. Piştî vê dibêjin tu dikarê sê daxwaziyan ji xwedê bikê, wê daxwaziyên te qebûl bibin. Zilam jî dibêje hevsera min ew qesî xizmetî

min kiriye, ez dixwazim ji wê jî bipirsim. Bi vî rengî hevsera xwe re dibêje, xwesteka destpêkê tu bike, ez ê te guhdarî bikim. Ew jî dibêje, xwedê bixwaze ku min pir xweşik bike. Ew jî vê daxwaziyê ji xwedê dike û hevsera wî pir xweşik dibe. Lê jina wî êdî weke berê tevnagere, çêkirina xwarinê û mezîkirina zarokan hemû dikeve ser milê zilam. Li gorî çîrokê êdî jin naye male jî.

Bi vî rengî zilam neçar dimîne ku daxwaziya duyemîn ji xwedê bike, îcar jî dibêje bila hevsera min nexweşik bibe. Lê dema ku jina wî nexweşik dibe jî, ti kes naye mala wî. Êdî zarok dayika xwe ditirsin û xwarina wê naxwin. Vê carê jî zilam neçar dimîne û xwesteka xwe ya seyemîn dike. Dibêje, weke berê lê bîne. Di dawiya çîrokê de jî dibêje, kî ku jinê guhdarî bike û gotina wê pêk bîne, weke wî zilamî lê tê. Ew mijareke bîrdozî ye.

Em her tiştî nîqaş dikin, lê tiştên ku em nîqaş dikin di nava me de dimînin. Em nikarin pirsgirekên ku di nava civakê de hene, çareser bikin. Her wiha pergala deshilatdar çiqasî bixwaze di civakê de xirabiyan pêş bixe jî, aqilekî civakî heye, di astekê de xwe diparêze. Ji bo vê jî divê em ew aqilê civakê baş tehlîl bikin. Ger jineolojî dixwaze bibe zanista civakê, divê tespîtên me yên li ser civakê jî di vê astê de kûr bin. Li gorî zîhniyeta zilam pergala ku çêbûye, êdî weke lewîathanê xwe bi xwe dixwe. Hem hemû berhemên civakê dixwe, hem jî weke avakarê xwe zilam jî li gel wê dixwe.

Her sal serok-komar û serokwezîrên hemû cîhanê kom dibin. Piraniya wan zilam in, hinek jî hene aliyê fîzîkî ve jin in, lê di mejî de zilam jî xirabtir in. Ew kes nîqaş dikin, qaşo pirsgirekên civakê nîqaş dikin. Her wiha hin tespîtên civakî jî dikin. Pirsgirekên destdirêjiyê, zêdebûna hejmarê, tûndiyê, nexweşiyên weke penceşêrê, mijarên ekolojiyê, demokrasiya lîberal ûhwd pêşniyar dikin. Lê piştî ku nîqaş dikin belav dibin û çareseriyek jî pêş nakeve.

Em jî van mijaran nîqaş dikin. Lê çima kombûyinên van dewletan encam nagrin û nikarin çareseriyê pirsgirekên cîhanê re biafrînin. Lêwma pirsgireka wan deshilatiya ku çavkaniya xwe ji zilamtiyê digre ye. Ger pergala sermayeyê wan pirsgirekên ku li wê derê tên nîqaşkirin çareser bike, nikare sermaye kom bike. Wê demê tiştekî ku li ser deshilatiya xwe pêş bixin jî namîne. Ya duyemîn zilam nikare li ser civakê tespîtên rast bike. Jin dikare tespîtên rast bike, lewma jin bi xwe civak e.

Mesela tevlêbûna jinê ya aboriyê meseleyeke dûv û dirêj e. Di nava civakê de jî her têkoşîna vê hatiye dayin. Ya rast pergal di şexsê jinê de, tolê ji civakê digre. Xistina civakê bi jinê çêdibe. Ger tu nikaribê jinê bixê, tu nikarê civakê jî bixwê. Ger nikaribin wê bikin jî, nikarin deshilatdariya xwe pêş bixînin, wekhevî çêdibe. Di vê çarçoveyê de şerekî kûr heye. Ew şer di nava ferdên malbatê de jî didome. Lê bingeheke wê ya dîrokî heye. Malbatên ku tê de nakokî tunebin jî, ji ber radestbûna jinê

nakokî çênabin. Ew şer di nava hemû civakê de didome û diteyise ser şexs jî. Şexs di nava xwe de, bi xwe re şer dike. Ji bo vê yekê divê em civakê baştir tehlîl bikin û jineolojiyê jî li ser vê esasê pêş bixin.

Di vê çarçoveyê de jineolojî, hem ji bo gelên Rojhilata Navîn, hem jî ji bo hemû mirovahiyê dikare bibe çareserî. Da ku nirx û rista jinê ya esasî derkeve holê, xebatên jineolojî divê kûr bibin. Di vê mijarê de jî, divê em di destpêkê de bi kesayeta xwe re têkoşîn bikin. Mesela Zerdeşt dibêje, “Ehrîman û Ahûra Mazda heye.” Ne ku hinek mirov xirab in û hinek baş in. Di nava mirovekî de hem xirabî, hem başî hene. Ango di nava her kesî/ê de Ehrîman û Ahûra Mazda heye. Di zilam û jinên ku hatine kolekirin de, ew milê Ahûra Mazda xilas bûye, Ehrîman bi ser ketiye. Ew taybetmendiyên Ehrîman jî li ser me tesîr kirine.

Ne ku zilam ev pergala deshilatiyê ava kiriye û ji ber wê jî azad e. Jixwe vê pergalê di destpêkê de zilam ji cewhera wî dûr xistiye. Di kesayetiya wî de nepixandin û werimandineke vala çêkiriye. Şikandina vê yekê jî ne zehmet e. Rojane di serê her mirovekî de şerê Ehrîman û Ahûra Mazda heye. Di çarçoveya bîrdozî de hem şerekî rojane, hem jî şerekî demdirêj pêwîst dike, da ku Ahûra Mazda ser bikeve.

Ger di van mijaran de pêşketin çênabe, divê em xwe lêpirsîn bikin. Lewma kadro û pêşengên vê paradîgmayê û têkoşînê em in. Ger xebat kêm bin, wê demê lewaziya me nîşan dide. Ger xebat û pêşketin şaş bin, wê demê xeletiya me nîşan dide.

Bi taybetî di şoreşan de çand û exleq pêş dikeve. Di jineolojiyê de, em nikarin tiştê heyî bi kadro ve sînordar bihêlin. Ew jî çandek û şoreşeke dixwaze. Ger jineolojî di nava civakê û raya giştî de were belavkirin, bi xwe re ronesanseke çêdike.

**Hevalê X…:** Heval tiştekî balkêş got, dibêje "*yê ku zilam tîne dûnê jî dayik e*." Ji bo çi ev yek got, çawa şîrove kir? Tam fêm nebû.

**Hevalê X…:** Weke bersiv, Serokatî dibêje, "*di her hebûneke de nêrbûyin û mêbûyin heye."* Ne ku ez dixwazim xirabiyên ku zilam çêkirine bixim stûya jinê û wê gunehbar bikim. Divê hemû civak, bi zîhniyeta jinê tevbigere. Ez dixwazim vê bibêjim. Lewma zarokekî xort jî jin tîne dûnê û heya asteke wî mezin dike.

**Hevala X…:** Jineolojî nû dikeve rojeva me. Lê dema ku em paradîgmayê mezî dikin, di bingeha paraznameyên Serokatî de ev tişt heye. Jineolojî, zanista Modernîteya Demokratîk e. Dema Serokatî dibêje, "*bê jin jiyan nabe*," dibe sedem ku mirov jineolojiyê jî wek bingeh û zanista civakê bigre dest. Mirov dikare weke zanista jin, jiyan û civakê bigre dest. Di dîrokê de têkoşîn û berxwedana jinan

jî pir çêbûye, jixwe hinek jî hê di nava pelên dîrokê de veşartî ne. Jineolojî dixwaze van tiştên ku hatine veşartin û nebûne dîrok, derxîne holê.

Ya din jî, dê rewşa jinê heyî wê lêkolîn bike, tehlîlan bike û rêkên çareseriyê ava bike. Serokatî weke rêgez jî datîne, mesela etîk û estetîkê pêş dixe. Mesela etîk teorî û felsefeya exleq e. Estetîk teoriya xweşikbûnê ye. Di estetîk de polîtîqa jî heye, azadî jî heye, wekhevî jî heye. Ger ew nabe dê di jiyanê de jî lewaztî derkeve û jiyan nameşe.

Weke kadro tiştê ku dikeve ser milê me jî, divê em vê yekê rêk û pêk bikin. Rêxistin bikin, di xwe de ava bikin û bidin pêşiya xwe. Divê em di destpêkê de rast fêm bikin û kesayeta xwe li ser wê ava bikin. Berê jî rêxistinên jinê yên weke femînîzmê derketine holê. Lê Serokatî wan rexne dike û weke alternatîf jî jineolojiyê datîne holê. Femînîzm jî mîrasek e, em bi awayekî giştî red nakin. Mesela zilam di qada femînîzmê de tune ye. Alternatîfa wê ya hevjiyana azad tune ye. Di van milan de em jî pir caran nakokiyên ku derdikevine re nikarin bibin bersiv. Serokatî bi awayekî vekirî têkiliyê jin û zilam datîne holê.

Lê em nikarin pêk bînin. Dema ku em diaxifin, em dibêjin me fêm kiriye. Lê di pratîkê de dernakeve holê. Pirsgireka esasî bi rastî jî fêmkirin e. Mesala Serokatî dibêje, divê jin xwe ji zilamtiyê qut bike, lê divê zilam jî xwe ji wê zilamtiyê qut bike. Ji vî milî ve xwe nêşandin û

sekneke parastinê heye. Xwe razîbûn û pirsgirek weke ya jinê dîtin heye. Ger jin careke kole be, zilam du caran kole ye. Lê em lêpirsîna vê çiqasî dikin.

Di jiyana me de jî tiştên wisa derdikevin. Bi rastî jî ger em ji vê derê destpê bikin û kesayeta xwe ava bikin, em dikarin di civakê de jî guhertinê pêk bînin. Lê ger em ji vir despê nekin, em nikarin ji civakê re jî pêşengtiyê bikin. Bi rastî jî teorî têrê nake. Mesala hinek hevalên xort teoriyên pir xweş kirin. Lê gelo me xwe qaneh kiriye, ji bo pêkhatina wê çiqasî dikeve nava hewildanan? Di pratîkê de jî pir caran nêzikbûnêh zayendperest derdikevin. Mesela tu hevalekî re dibêjê, hevalekî pir xweş e, demokrat e. Lê tu dibînê careke re nêzikatiyeke wisa raber kir ku mirov şaş dimîne. Dibe ku mirov xwe cuda jî bide nîşandan, lê pirsgirek mejî ye. Divê ji bo guhertina mejî mirov hewildanan nîşan bide.

**Hevalê E…:** Hevalan li ser nîqaş kir. Lê bi ya min jineolojî, di nava qalibên zanisteke de bi cih nabe. Ji bo ku divê hemû zanist ji nû werin tehlîlkirin û bi çavekî jinê werin destgirtin, dê jineolojî di nêrîn û ferasetê de guhertineke bike. Zêdetir weke nêrîneke felsefîk tê fêmkirin. Ji ber vê ez jî nikarim tiştekî zelal bibêjim.

Dema ku tevger û pelên femînîzmê em bigirin dest jî, em ê fêm bikin ku her yek aîdî bîrdoziyeke ye. Mesela yên anarşîst, anarko femînîst in. Xwe weke beşeke jinê ya van bîrdoziyan rêxistin dike. Her partiyek jî beşa xwe ya jinê

cuda rêxistin dike. Ger em wisa bigrin dest, dê jineolojî weke beşa jinê a PKK'ê were nirxandin. Divê ne wisa be, Serokatî jî wisa pênase nake. Jixwe nêrîna me ya jinê de guhertinek heye. Dîroka wê girtina dest de cudabûnek heye. Divê mirov cudabûna di navbera tevgerên femînîst û jineolojiyê de bi awayekî şênber dayne holê. Em jinê dixin navenda hemû zanist û dîrokê. Ez bawer nakim ku di ti bîrdozî û tevgerên dîtir de wisa be. Divê ji vî alî ve mirov jineolojiyê, ji van tevgerên dîtir cuda bike.

Mijareke dîtir, hevalan gotin "*dê jin bibe pêşengê jineolojiyê û civakbûna nû.*" Ger pêşeng hebin, dê hinek jî paş bimînin. Wê demê em nêzikatiya baviksalar, bi awayekî dijber najîn? Wê demê jin nabe kirde û zilam nabe bireser? Ji aliyê polîtîk ve dê nêrîn û nêzikatiyeke wisa derkeve holê.

**Hevala X…:** Lê divê em armanc û hewildanên jineolojiyê ku li ser kîjan esasê pêş dikevin li ber çavan bigrin.

**Hevalê E…:** Divê jineolojî weke hemû civakê hembêz dike, gotin û nêzikbûnên xwe diyar bike. Ger tu jinê bixê navendê, wê şaş were fêmkirin. Bi taybetî dê bertekên zilam çêbibin. Encamên polîtîk yên vê gotinê û nêzikatiyê çêbibin. Ez dixwazim vê yekê bibêjim.

Li ser demografyayê jî, zêdebûna nufûs di asta kunbûna tabaqayeke ozonê xeter e. Gihêştiye asteke wisa. Di nava sed salî de, 4-5 qat nufûs zêde bûye. Ger wisa

bidome, dê çavkaniyên li ser rûyê erdê, têra mirovahiyê nekin. Divê ew bibe mijareke sereke ya jineolojiyê. Sedemeke esasî ya vê pirsgirekê zîhniyeta baviksalarî ye, lê li gel vê divê hemû sedemên wê werin tehlîlkirin û pê re têkoşîn were kirin. Di cewhera xwe de îro zêdebûna nufûsê bi civakbûnê ve ne elaqadar e. Di sewalan de jî hevsengiyek heye. Dervayî ew hevsengiya xwezayî, sewal ne pir zêde dibin, ne jî pir kêm dibin. Dema ku sewalek li ser xwe xeteriya tunebûnê hîs bike, dê zêdetir xwe zêde bike.

Di mirovan de jî hesteke wisa ya parastinê heye. Lê ya ku îro pêş dikeve, ne ji ber pêwîstî û parastinên xwezayî ye. Kapîtalîzm ji aliyekî ve da ku ji xwe re hêza karkeriyê biafrîne, ji aliyekî ve jî da ku tiştên dixe bazarê bikaribe bifroşe, vê yekê ji nedîtî ve tê. Divê pêşiya vê were girtin. Ev yek jî bi gotina *“rêjeya zayinê qontrol bikin, nizanim nufûsê kêm bikin”* nabe. Rêka yekane hevsengiya berhemkariyê û karanîna van berheman çêbibe.

**Hevala X…:** Ez bawerim, ji ber ku femînîzmê li ser heval nêrîneke wisa ava kiriye, heval jineolojiyê jî îro weke deshilatdariya jinê dinirxîne.

**Hevala X…:** Nêrînên ku hevalê E… anîn ziman, ji mirov re pirsan çêdike. Ya yekemîn, ger wisa difikire wê demê pênaseya jineolojî ya heval çi ye? Dibêje “*ne zanistek e.”* Di pênaseyên me de tiştê ku şaş dibîne çi ye, weke ya rast jineolojiyê çawa pênase dike? A din Serokatî

got, bila jin vê zanistê pêş bixin. Li ser vê esasê jî hewildanên jinê çêdibin. Di vir de jî tirsek heye, jinê weke deshilatê pergala nû dibîne. Mesela em dibêjin, jin û ciwan pêşengiya şoreşa me dikin. Lê di tevlêbûna me ya şoreşê de pirsgirekek derdikeve? Dema ku li Rojava û Bakur, jin pêşengtiya şoreş û têkoşînê dikin, ma civak tevlî şoreşê nabe? Ew mijar hinekî werin vekirin dê baş bibe. Di bin vê nêrînê de têgihêştineke çawa heye?

Yek jî ji bo demografyayê, min bi baldarî guhdarî kir. Heval nafikire ku sedema hemû zêdebûnên nufûsê û pirsgirekên demografîk dewlet û deshilatdarî ye. An na sedema din çi ye? Ger tiştek hebe, ez dixwazim fêr bibim.

**Hevala X…:** Mijareke girîng e, dibe ku nakokiyên mirov hebin û mirov nîqaş jî bike. Lê me ew qesî nîqaş kir. Dibe ku heval wisa jî fêm kiribe, lê dibe ku ji ber nêzikatiyên heval be jî. Ez jî vê yekê dixwazim fêm bikim; bi rastî jî jineolojiyê wisa fêm dike, an nêzikatiya wî wisa ye? Me got, jineolojî zanista jin e, lê hemû civakê hembêz dike, nabêje bila zilam paş be û mafê axaftinê ya zilam tune ye. Her wiha nabêje deshilat jin e. Divê heval di van mijaran de fêmkirinên xwe şênbertir veke. Gelo di heval de, “*ha deshilatî ji destê me derdikeve*” heye?

**Hevala X…:** Pê ve girêdayî, heval rista dayikê di civaka xwezayî de çawa digre dest û îro çawa lê mezî dike?

**Hevala X…:** Serokatî ev rist çima daye jinê û çima dibêje jineolojî, çima cihê wê têgeheke mêr tê de derbas dibe bi kar neanî ye?

**Hevalê X…:** Di nêrînên heval E… de derket, weke ku mêr bê rist e. Lê hevala E... bi awayekî xwezayî û saf nakokiyên xwe anîn ziman. Mirov dikare rista jinê û zilam zêdetir şênber jî nîqaş bike. Her wiha divê heval bikaribin nêrînên xwe bi awayekî vekirî bînin ziman. Wisa hinek tepisandin çêdibe. Mirov bi bertek bibersivîne ne rast e. Nakokiyên heval hene, tesîra zîhniyeteke 5 hezar sal li ser heye, dixwaze nîqaş bike û çareser bike. Lê mirov bibêje, tu çima van tiştan dibêjê, rast nabe.

**Hevala Dilzar:** Helwesta hevalê A... şaş e. Hevalan pirsên xwe kirin, bertek nîşan nedan. Bi vî rengî bersiva pirsan dayin jixwe şaş e. Hevalekî xort nêrîn dide û heval jî şaş dibînin û pirsan dikin, ew pir xwezayî ye. Heval dibêjin, "*ger wisa be em nîqaş nekin.*" Heval dibêjin, "*ger şaş be, heval dikarin rast bikin;"* lê dema ku pirsek jî çêbibe, ew qesî refleks nîşandayin pêwîst nake. Jixwe mafê heval heye û wê niha bersivên xwe bide. Ya dîtir jî ew tenê ne pirsgireka hevalên jin û hevalên xort e. Tevgereke ew qesî mezin heye û ji wê jî zêdetir civak heye. Hevalan gelek tehlîl kirin, lê divê di nava wan tehlîlan de em xwe jî bigrin dest.

Rast e, heval bi awayekî samîmî nêrînên xwe anîn ziman. Ger rast be em ê tevlê bibin, lê şaş be peywira me ye ku em sererast bikin. Mirov wisa teng negre dest baş e. Lewma em nîqaş dikin û divê em hinek tiştan zelal bikin. Em her tiştê ku Rêbertî dinîrxîne weke ya xwe dibînin. Lê hinek mijar hene ku em weke ya xwe nagrin dest, em dijberî wê disekinin. Ez carna vê hîs dikim. Mesela hinek heval teoriyên pir xweş dikin û astê pir mezin dikin, lê di heman nîqaşê de nêrînên dijber jî derdikevin. Divê em giştî bigrin dest û ji hev qut nekin. Ji ber wê divê em hinekî bêhnfireh û giştî nêz bibin. Wê demê em dikarin bibêjin, bila heval jî qet pirs nekin. Em nikarin wisa bibêjin. Mesela di nirxandinên hevalê E… de, tiştên pir rast jî hebûn, tiştên pir şaş jî hebûn. Em ê jî nakokiyên xwe bînin ziman. Divê lêpirsîne re vekirîbûn hebe û hasasiyet çênebe.

**Heval X…:** Jineolojî weke têgeh tê wateya zanista jinê. Ez nikarim îfade bikim, an jî heval fêm nakin. Tiştê ez dixwazim bibêjim, gotina zanist têrê nake. Hinek hevalan got, dayika zanistan. Serokatî dibêje, di bin navê zanistê de bi parçekirina civakê mirov nikare bigihêjê encamên teqez. Dema ku dibêjin zanist parçebûn tê ber çavên min. Ez ji ber vê wisa pênase dikim. Divê em parçe nekin. Dema ku em dibêjin jineolojî, divê bikaribe hemû zanistan û bûyerên civakî bigre nava xwe. Divê weke diyardeyeke felsefî were dest girtin. An na ez nabêjim, nikare bibe zanistek. Ez dijberî wê dibêjim, ango ji zanisteke pir pir berfirehtir e.

Hevalan gotin, ma sedema pirsgirekên demografîk ne deshilatdarî ye? Jixwe ez jî dibêjim çareserî sosyalîzm e. Ez dibêjim, divê kombûyinên heyî tenê li ser Ewropa û derdoreke teng nayen belavkirin, divê di belavkirinê de hevsengiyek hebe. Bawerim îfadekirina min hinekî bi pirsgirek e.

Her wiha di mijara pêşengtiya jinê de; mijareke ku ji polemîkan re rê vedike ye. Ez ji aliyê biyolojiyê ve nagrim dest. Mirov dikare weke serweriya jinê bi nav bike. Lê ji aliyê polîtîk ve dema ku em 100 sal şûnve bifikirin, dê encamên cuda derxîne holê. Mesela, dê zilam di kûdera vê têkoşînê de be? Em dibêjin, zanista jinê, lê zilam jî tevlî vê têkoşînê nabin? Ji ber wê weke mêr, em îro tevlî vê waneyê jî dibin. Ger em tenê jinê weke pêşeng pênase bikin, dê em ê civakê parçe bikin. Ger bi awayekî em zilam jî tevlê nekin, dê ev parçebûn bibe sedama windakirina hêzeke.

Ji ber Serokatî, zilam di nava rêxistinê de gelek tiştan re rêz digirin, an na tiştên pir cuda jî derkevin holê. Yek jî dema ku em hemû civakê difikirin, dê çawa jineolojî hemû civakê re pêşengtiyê bike? Ger ti yekê re bibêjê pêşeng, dê ji aliyê biyolojîk ve wê bikê kirde û ya din jî bike bireser. Dê ev jî bibe sedema parçebûnê, ji aliyê polîtîk ve bê îtîfaq bihêle. Cihê wê em dikarin bibêjin serweriya dayikê (anaerkîl), bawerim gotineke wisa rastir bibe.

**Hevala Dilzar:** Heval E… got, ji ber Serokatî kes dengê xwe dernaxîne, an na wê cuda be. Piştî 40 salî, dema ku em ji bo rewşa heyî tespîteke wisa dikin, wê demê heval dikare bi xwe li ser vê lêhûrbûn bike û bersiva wê bibîne. Zilam çawa tê de cih digre, jixwe rêgezeke jineolojiyê hevjiyana azad e. Jixwe em ê wê jî nîqaş bikin. Lê ez dixwazim heval bipirsim, weke hevalekî xurt hûn dixwazin di kûdera vê zanistê de bin? An jî rûxmî têkoşîna 40 salî, hê jî ji ber Serokatî hûn rêz nîşanî vê têkoşînê didin, rewşa me hûn çawa dinirxînin? Dê piştî 10 salan wê çi bibe? Ya din jî tevî tespîta pêşengtiya jinê, tespîteke wisa kirin ne bi nakok e? Ez nabêjim ev tespit bi awayekî giştî şaş e, lê tespîteke wisa guman ava dike. Em qala pêşengtiya jinê dikin, têgeha pêşengtiyê hiyeraşî ava nake. Lê di nava tevgereke ku ji vî alî ve cîhan tesîr kiriye de, tespîteke wisa kirin ne paşverûtî û windahiyek e. An jî di navenda pêşnexistina me ya şoreşê de ev nêzikbûn tune ye?

Em dikarin hinekî din van tiştan nîqaş bikin. Jixwe bi vî awayî nîqaş zêdetir şênber dibin. Bi rastî nirxandinên xweş yên hevalan jî çêdibin, erenî tê dest girtin, kelecaniyeke ava dike. Heval jî van tespîtan dikin. Lê dema ku hinekî dikevin nav, em dibînin ku hê jî tesîra zîhniyeta deshilatdariyê li ser hevalên xurt heye. Dibêjin, ger ji bo jinê tiştekî baş were pêş xistin û parastin jî, dê vê yekê em ê bikin. Sûleyman Demîrel dibêje, “*ger komînîzm jî were, em ê bînin.*” Ya me jî hinekî dişibe wê. Ev

nêzikatiyeke deshilatdarî ye. Ji ber vê dişibînim hev. Ango axaftinên xweşik dibin, lê dema ku rêz tê pratîk û înşayê nêzikatiyên cuda derdikevin. Me ew qesî têkoşîn daye, Serokatî dibêje “*min di xwe de zilamtî kûştî ye*.” Lê hevalên me yên xort dibêjin, “*me hinekî xwe sînordar kiriye.”* Ma têrê dike. Ev yek, nêzikbûna paradîgmayê ye.

Serokatî bere di paradîgmayê de digot, “azadiya zayendî” lê pişt re got, “azadiya jinê.” Wisa binê wê xêz kir û kûr kir. Serokatî got, “min di sosyalîzmê de pêşketin û vekirin, bi jinê çêkirin. Li hemberî çetegeriyê, bi jinê tevdîr girtin.” Nirxên ku me dimeşînin van tespît û nirxên Serokatî ne. Lê li gorî vê yekê, em tabloyê heyî çawa dinirxînin?

**Hevalê X…:** Dema mirov gotinên Heval E… dibihîze, pir nakokî hene. Me bi hev re dahûrandineke 96’an a Serokatî guhdarî kir. Wê demê weke peyv jî me jineolojî nebihîstibû. Serokatî hevaleke jin, radike ji wê re dibêje “*şoreşa me şoreşeke jinê ye.”* Beriya wê saleke xîtabî kongreya jin dikir û digot, “*tevlêbûna PKK’ê, ji pêkanîna şoreşa jinê re derbas dibe.”* PKK, partiyeke bindestan e. Li Kurdistanê jî, xwe weke partiyeke karkeran pênase kir. Her wiha bindesta herî esasî jî jin e. Xala yekemîn, dema ku bindestek bixwaze mafê xwe bistîne, em çima nerehet dibin.

Ya duyemîn, dema ku Heval Heqî û Kemal hatin û tevlî şoreşa Kurdistanê bûn û gotin, “*Şoreşa Tirkiye, ji Kurdistanê rê derbas dibe”* ma wan hevalan Kurd kirin kirde û Tirk jî kirin birêser û bi vî awayî tevlî şoreşa Kurdistanê bûn? Van herdu pirsan heval bibersivîne dê baş bibe.

**Hevalê X…:** Heval E… li ser navê hemû hevalên xort diaxife, ne rast e. Dibêje, “*ji ber xatirê Serokatî, em qebûl dikin.”* Serokatî dibêjê, em ne tarîqatek in û hûn jî weke mûrîdan bi min ve girêdayî ne. Jixwe tiştê ku herî zêde Serokatî diêşîne jî ew e. Em li ser esasê paradîgmaya Rêber Apo tevlê dibin û xwe di vê paradîgmayê de kûr dikin. Wê demê Hevalê E…, ti hevalên xort ku tevlî vê partiyê bûne samîmî nabîne? Ango piştî Serokatî, em hemû dê pişta xwe bidin partiyê û paradîgmaya wê? Paradîgmaya me jî li ser esasê azadiya jinê pêş dikeve. Ger bi vê paradîgmayê bawer nekin, em di oxira çi de canê xwe datînin holê?

**Hevala X…:** Serokatî hevjiyana azad weke rêgezeke esasî xiste nava modela me ya rêxistinbûnê. Niha jî bi piranî dikeve merîyetê. Heval E… dibêje, zilam di kûdera wê de ye? Ma zilam jî di nava ev pergala hevjiyana azad de cihê xwe nagre? Ger em jineolojiyê weke deshilatdariya jin û tunebûna mêr binirxînin, ma ew di heman demê de ji paradîgmayê jî bawernekirin e?

**Hevalê X…:** Heval ferqa pêşengtî û deshilatdariyê çawa dinirxîne?

**Hevalê X…:** Tevlêbûna me ya Serokatî, tenê ji ber xatirê wî ye; an em tevlî fikir, tevger û paradîgmaya wî bûne? Ez nabêjim ku di nava me de pirsgirekên tevlêbûnê tune ne. Lê nêzikatiyên şaş jî, şaş in. Mesela tevlêbûneke rast a Serokatî tune ye.

**Hevalê X…:** Ez li ser navê hevalê xort neaxifim, li ser navê xwe diaxifim. Ez dîtin û nakokiya xwe tînim ziman. Jixwe Serokatî piraniya rastiyên me tîne ziman. Her wiha bi taybetî di mijara jinê de pratîkên me yên derbasbûyî jî li ber çavan in. Bi rastî jî, me zayendperestî derbas kiriye? Min bi xwe nikariye derbas bikim. Hê jî bi awayekî Serokatî behs dike, mirov bi jineke re çawa dibe rêheval, ez nizanim. Serokatî dibêje, "*an hûn weke xûçka xwe mezî dikin, an jî weke jina xwe mezî dikin.*" Dibe ku em 100 salî din jî nikaribin vê nêzikbûnê derbas bikin. Divê ji bo vê yekê guhertina nifşan çêbibe. Heval rexne dikin, dibêjin hevalên xort dibêjin me zilamtiya xwe sînordar kiriye. Mi ya min ger sînordarkirin jî çêbibe, divê em şûkir bikin. Bi rastî jî bêyî ku em jê bawer bikin, em gelek tiştan tînin ziman. Zilamtiya xwe kûştina merekî, kevneşopiya xwe derbaskirina jineke ne hêsan e.

Hevalan pirsî, bi rastî jî ez bi guman nêzik dibim. Ger Serokatî tunebe, dê rewşa me çawa be? Pratîka me ya 2002-3'yan heye. Ez nabêjim hevalan qet ji bîrdoziya

Serokatî tiştek fêm nekiriye. Lê meşandina tevger û civakeke bi kêmek fêmkirina bîrdoziyê nabe. Bi rastî jî qesî ku em valatiya Serokatî dagirin, me bîrdozî fêm kiriye? Hevalan gotin, em partiya bindestan e. Rast e. Yên ku herî zêde bindest bûne jî, jin in. Ji ber vê partiya jinan e jî. Lê me got, gelê ku herî zêde bindest e Kurd in, ev partî jî ya Kurd an; an me deriyê xwe ji her derdoreke re vekir? Me hevalê Kemal û Hevalê Hakî weke nirxên herî pîroz yên vê tevgerê negirtin dest?

Bi kurtasî ez dibêjim, divê em bîrdoziya bindestan biparêzin. Lê ger em ji aliyê biyolojîk ve jinê bidin pêş, wê rê li pêşiya hin tiştên din veke. Ger weke nasnameya netewî jî, me bigota partiya Kurdan e, divê me cih nedaba wan hevalan. Lê me wisa nekir.

Serokatî dibêje, "*ev tevgera bindestan e, ya ku herî zêde bindest e jî jin e.*" Jixwe ti kes ji bo vê tiştekî nabêje. Lê ji aliyê polîtîk jin weke pêşeng were dest girtin, dê encamên cuda derxîne holê. Ez vî milî de nakokiya xwe tînim ziman. Ez cihê wê gotina ana-erkîl baştir dibînim. Jixwe Serokatî jî, da ku civak parçe nebe; carna têgehan diguherîne, carna fikarên xwe tîne ziman. Bi ya min em hinekî hev û din şaş fêm dikin. Lê divê her kesek fikir û nakokiyên xwe bikaribe bi awayekî vekirî bîne ziman. Wisa bi Serokatî ve qiyas kirin, ne baş e.

**Hevala Dilzar:** Qesî ku Heval E… dibêje, mafê min heye ku ez nêrînên xwe bînim ziman, nêrînên ku ew tevlê nebe jî dikarin werin ziman. Mirov nakokiyên xwe bîne ziman baş e. Tespîteke girîng e jî. Di hevalan de jî fikirandin çêdibe, nêrînên xwe tînin ziman. Divê li hemberî vê berteka Heval E… çênebe.

Ya din jî, di mijara pêşengtiya jin de; mijar ne ev e ku, ji aliyê biyolojîk ve kî jin be, pêşeng e. Dê yên ne jin jî hemû paş bimînin. Mesela ji ber ku Çîler jin e, nabe pêşenga civakê. Divê mirov ji aliyê biyolojîk ve negire dest. Mesela hevaleke jin be, xwe azad neke, xwe nêzikî nêrînên Serokatî neke, her kole bijî, nekeve paradîgmayê ez jî li pêy wê nameşim. Ango mesele ne biyolojî ye.

Pêşengtî jî, naye wê wateyê ku ti kes li gel wê bimeşe. Em têgehan pir rojane û polîtîk dikin, ne rast e. Serokatî mînaka Hevalê Fîkrî Baygeldî jî da. Hevalekî ku xeta azadiya jin, fêm kiriye û li ser wê esasê meşiyaye hebe; em jî weke jin dizanin li pêy wan bimeşin. Ji ber wê divê nêzikatiyên Heval E…, ne bi bertek bin. Nêrînên mirov yên cuda hebin jî, divê mirov nîqaş bike û ji hev û din bide fêmkirin. Divê mirov bi mînak û şibandinên pir dijber, pêşiya nîqaşan negire.

Mînaka 2002-3'yan jî rast e. Gelek hevalên me hebûn, di şer de leheng bûn. Bi her alî ve xwe timam kiribûn, lê di vê mijarê de ketin. Lê em jî dixwazin derxînin zanebûnê ku mirovê ku di hemû beşên jiyanê de

lehengtiyê dike, çima di mijara jinê de lewaz e. Da ku em bikaribin ew lewaziya xwe derbas bikin. Cîhan me bi azadiya jinê nas dike. Dibêjin, *“aliyê PKK’ê yê herî xurt, pêşxistina azadiya jinê ye.”* Hevalên xort jî gotin, em bi vê yekê kelecan dibin. Lê em di nava xwe de dibînin ku qesî ku aliyê me yê herî bi hêz e, di heman demê de aliyê me yê herî lewaze jî. Lê ji bo her kesî jî ne wisa ye. Ma lewaziya herî mezin a her hevalekî, jin e? Na. Ji ber vê em dijber nagirin dest. Lê sedemeke girîng ku em nikarin derketinên mezin bikin jî, dîsa ev mijar e. Mesela Serokatî dibêje, “*di nava me de du têkiliyên rast yên rêhevaltiyê derneketin.”* Çima? Çima em nikarin xwe ji ajoyên xwe xilas bikin? Em bixwazin em dikarin. Gelek hevalan jî ew yek ser xistiye. Hinek heval dibêjin, “*min qet têkilî jiyan nekirî ye, navê min jî derneketiye, ji ber vê pirsgireka min jî tune ye.*” Ya rast jî, ne bi vî rengî ye. Em nikarin wisa teng bigrin dest, mijareke pir berfireh e.

Heval E… bal kişand ser mijareke. Divê em giştî bigrin dest. Her kes di nava civakê de ye, lê yê ku civakbûnê ava dike jî jin e. Ger pîvana me civaka exleqî û polîtîk be, heyvîna wê jî jin e. Ev jî rastiyek e. Giştîbûnê jî divê em rast bigrin dest. Di PKK’ê de carna tenê di kesekî/ê de giştîbûn çênabe, lê komek heval de giştîbûn çêdibe. Ji ber vê yekê divê nîqaşa me jî li gorî vê berfirehbûyin û giştîbûnê be. Em dibêjin, ji ber ku pêwîst dike em hinek tiştan dibêjin. Lê ger mirov tiştê ku dibêje bawer nake, jixwe ew kes ne azad e. Naye wê wateyê ku em tiştê herî xirab ku jiyan dikin jî, em biparêzin.

Heval E… dibêje, ger zilam xwe hinekî sînordar kiribe jî, em şûkir bikin. Lê piştî ew qesî têkoşîn, ger em hê jî vê dibêjin, ne baş e. Gelek hevalên me yên jin û xort ku ji asta xwe sînordarkirinê derbas kirine hene. Ger tiştekî ku em şûkir bikin hebe, ew e; paradîgmaya Serokatiya me azadiya jinê weke navend digre. Ji bo vê jî îro hemû cîhan me nas dike.

Her wiha dema ku mirov dibîne ku di encama têkoşîna me de, heval xwe diguherînin baweriya mirov xurtir dibe. Ev yek dihêle ku mirov têkoşîna xwe jî mezin bike. Mijareke baş a nîqaşê ye jî; mirov li ser vê esasê dikare nîqaşên xwe berfirehtir bike.

**Hevalê X…:** Her hevalek nêrînên xwe tîne ziman. Ji vî alî ve gelek aliyên ku mirov jê hêz bigre û ji bo xwe bike mijara lêpirsînê jî hene. Li gel vê yekê ger di şexsiyeta me de parçebûn hebe, ji ber nîvçobûna me ye. An em tiştan tam nagirin dest, an jî em di nav de jiyan nakin. Mesela em jineolojiyê nîqaş dikin, bi xwe re têgeh û rêgezên xwe jî derdixîne holê. Dê ew yek di nava civakê de giştîbûneke derxîne holê. Ji aliyê zîhnî û rihî de, bîrdoziyê li ser hîmekî bide rûnişkandin.

Di dîrokê de li kû parçebûnê destpê kiriye? Dema ku di mîtolojiyon de jin hatiye xistin, parçebûnê destpê kiriye. Dema ku di olan de jî jin xistine nava mal û dêran, civak êdî civakbûnê derketiye. Ango di şexsê jinê de, di civakê de parçebûn çêbûye. Li gel vê qelîştokê, zilam bi xwe jî dikeve û nîvço dimîne. Bi vî awayî qeyrana civakî destpê dike.

Ji vî alî ve dema ku em heqîqetê digirin dest; yek, ji aliyê neheqiyê ve mafê xwe gerîn e. Dudu, gihêştina giştîbûna xwe ye. Divê ji vê yekê bawerî çêbibe û jiyanî bibe. Serokatî di paraznameyan de civaka exleqî û polîtîk digre dest, lê beriya wê dibêje şoreşa mejî û wîjdanê. Dema ku em qala van tiştan dikin, ji nû ve avakirina civakê zêdetir, em berovajîbûna wê sererast dikin. Civak, jiyan, kes berovajî û parçe bûye. Mejî jî parçe bûye. Ji ber vê yekê civak, nikare nirxên xwe yên civakbûnê û azadiya xwe bibîne. Têgîn, nêrîn û bûyerên wê hemû şaş bûne. Tiştê ku dibîne jî hêleşaşî ye. Lewma hatiye dorpêçkirin. Ji bo vê jî em heqîqeta xwe digerin û ya heyî lêpirsîn dikin.

Jineolojî jî, têgîna azadiya jin de zanistek e û vê zanistê sererast dike. Hêleşaşî û parçebûnên me re jî dibe çareserî. Ji bo vê jî zanistiya ku ji aliyê jineolojiyê ve tê pêş xistin, ji bo heqîqeta civakê wê bibe dermanek. Ji aliyê sosyolojiyê ve jî rista xwe pêk tîne. Azadî di vê derê de destpê dike. Dema ku te fikirînên xwe pêş xistin û pêk anîn, azadî destpê dike.

Tiştê ku di me de derdikeve jî, di ferasetê de nîvçobûyin e. Di empatiyê de nîvçomayin e, di zanebûnê de nîvçomayin e. Ev jî dihêle ku em nikaribin têgîn û jiyaneke giştî pêş bixin. Ji ber vê jineolojî, dê beriya her tiştî têgînên heyî pênase û sererast bike. Li ser vê esasê jî civak û mirovê ku parçe bûye re bibe çîmento.

Di nava me de jî, ger em bibêjin em bi awayekî giştî bîrdoziya azadiya jinê pêk tînin, ne rast e. Kêmasiyên me pir in. Dê ew jî bi lêgerîn, şîrove, fêmkirina Serokatî ve derbas bibe. Fêmkirina Serokatî, jixwe azadî ye. Divê li ser vê esasê nîqaş û lêpirsînên me kûr bibin.

**Hevalê X…:** Mirov nîqaş dike. Lê divê hinek tişt jî werin sererastkirin. Heval E…, hinek tişt wisa tevlî hev kirin. Li ser esasê nîqaşên hevalan hinek lêhûrbûna heval çêbibe, dê baş bibe. Em ne tenê tevgereke rizgariya netewî ne û ji aliyê fîzîkî ve em tenê ji ber xatirê Serokatî jî tevlê nebûne. Mirov li ser felsefe û feraseta Serokatî tevlêbûna xwe ya paradîgmayê çêbike, wê baş bibe. Heval bikaribe wisa bigre dest, wê sererastkirinek jî çêbibe.

# RASTIYA ONTOLOJÎK A JINÊ

## Jin enerjiya herîkbar a jiyanê ye

**Hevala Dilzar:** Di destpêkê de em dixwazin jinê hinekî pênase bikin. Jin nasnameyeke civakî ye û ji aliyê biyolojiyê ve jî di navenda jiyanê de ye. Lê weke hebûneke gerdûnî em ê çawa bigirin dest? Ji aliyê ontolojîk ve divê em vê mijarê hinekî bigirin dest. Em weke biyolojî dikarin bibêjin, dayik e, zarokên xwe re mijûl dibe. Bi vê yeke ve girêdayî em dikarin pênaseyên girîng jî bikin. Biyolojiya wê ve jî girêdayî ristên civakî derketine holê. Li derdora jinê gelek nirx derketine pêş û van nirxan hiştiye ku civakbûn pêş bikeve. Dervayî vê jin hebûneke çawa ye, em dixwazin ontolojiya jinê jî bigrin dest.

Em jinê weke hebûneke çawa digirin dest, em jiyanê çawa pênase dikin? Em li ser jiyanê lêhûrbûn dikin, çend heval dikarin nêrînên xwe bînin ziman? Jiyan çi ye, em dikarin çawa pênase bikin?

**Hevalê X…:** Herikîna exleqî û polîtîk e.

**Hevalê X…:** Jiyan, zindîbûn e. Ger tiştek di nava tevgerê de be, zêde dibe û xwedî rengîniyê be, zindî ye.

**Hevalê X…:** Felsefeya gendûnê ye. Gerdûn, xwe di jiyanê de pênase dike û armancên xwe di vê qadê de raber dike.

**Hevala X…:** Jiyan, enerjiya herikbar ya gerdûnê ye.

**Hevala Dilzar:** Gerdûn bi xwe, enerjî ye. Jiyan jî di nav de herikîna wê enerjiyê ye. Ev enerjî carna şênber dibe, carna dibe mirov, carna dibe ax, carna dibe dar. Ango formekî qezenç dike, li ser wê jî em pênase dikin. Li ser wê şêweyê em herikandina enerjiyê pênase dikin. Bawerim lêhûrbûna hemû hevalan di vê mijarê de çêbûye, êdî em di nava gerdûnê de diherikin. Jixwe gerdûn diherike, lê em jî di nava vê herikînê de ne. Dema ku em hîs dikin ku em naherikin, em hîs dikin ku em jiyan nakin. Em nemirîne, lê em jiyan jî nakin. Bi vî awayî fêmkirinek di me de jî çêbûye.

Mirov jî di nava ev grava enerjiyê de herikandinek e. Di mirov de enerjiya ku ketiye para jinê heye û ya ku ketiye para mêr heye. Herdu ne yek in. Weke beşeke zindiyan, enerjiyek dikeve para mirovan. Lê di nava xwe de jî, enerjiya jinê û mêr cuda ye. Hevalan jî got, gerdûn bi rengînî û cudabûnan hebûna xwe ava dike. Ji bo vê ferqa di navbera jin û mêr de heye jî, divê em weke pengaveke gerdûnê bibînin. Di navbera zindiyan de, an jî mêr û jin de ferq hene, lê bi hev re jiyanê ava dikin. Ew ferq dihêle ku gerdûn herikîna xwe bidomîne. Ango ferq, ne ji hev pût bûn û dijminahiya hev kirin e. Mirov dikare li ser cudabûnê lêhûrbûna xwe kûr bike, lewma pir girîng e. Cudabûyin, nîşaneyeke azadbûnê ye. Dema ku em di xwe de cudabûnan hîs dikin, em wateyeke nû qezenç dikin. Wate divê em tenê ji aliyê felsefî ve cudabûnê

negirin dest, weke enerjî cudabûn di me de çawa şênber dibe, divê em vê yekê fêm bikin. Her wiha divê em tê bigihêjin ku jiyan di me de çawa şênber dibe.

Jin û mêr jî bi vî rengî ye. Hemû taybetmendiyên gerdûnê, weke zereyeke wê di mirov de jî hene. Bi zindîbûyin, zêdebûyin û cudabûyinê, em jî azad jiyîna xwe îfade dikin. Hemû zindî wisa ne, lê di mirov de lûtke ye. Ji bo ku mirov hebûna xwe ferq bike, pir girîng e. Mesela peyva azadî, di Kurdiya berê de, aza ye. Aza jî tê wateya yê ku vejiye û çêbûye. Ango vejîn û çêbûn, jixwe şêweyeke azadiyê ye. Dervayî deshilatdarî, dagirkerî û metîngeriyên heyî jî em bifikirin, tenê hatina me ya gerdûnê, azadiyê îfade dike. Divê em hebûna xwe bi vî awayî bi wate bibînin.

Ew yek di rûmet jiyankirinê de gava yekemîn e. Êdî dayik û bavê min bi darê zorê zewicîbin, ez bê xwestek anîbim dûnê, pir ne girîng e. Di dawiyê de ez encameke azadiya gerdûnê me. Lewma ez heyî me. Wate dayina hebûna xwe û hemû hebûnên di gerdûnê de pir girîng e. Hebûn û cudabûnên di gerdûnê de weke azadî girtina dest, di jineolojiyê de pir girîng e. Ger em ji aliyê felsefî û fikrî ve wate nedin vê mijarê, em gotina “*jin jiyan e*” jî fêm nakin. An na tenê gotina, dayikê jin û mêr aniyê dûnê, pir ne watedar e. Em dixwazin vê yekê kûr bikin. Ji bo vê hebûna jin û zilam, wateya hebûnê, enerjiya ku dikeve para me fêmkirin pir girîng e.

Çawa ku xwezaya gerdûnê heye, xwezaye mirov, xwezaya jin û mêr jî heye. Em dervayî ristên civakî vî tiştî dibêjin. Ango xwezaya wê digirin dest. Serokatî dibêje, *“armanca gerdûnê azadî ye.*” Ew hevokeke ku divê em li ser hîmê wê şoreşê lêbikin e. Divê felsefeya me ya azadiyê li ser wê were avakirin. Ger armanca gerdûnê azadî be û bi pir-rengiyê xwe nîşan dide, mirov jî hebûneke azad e. Di pirtûkên pîroz de dibêje, “*xweda ji bo ku xwe nas bike, mirov ava kiriye.*” Em jî dema ku tiştekî diafrînin, em dixwazin nîşan bidin, were dîtin. Ango hebûn û cudabûna xwe nîşan dayin, bi azadiyê ve girêdayî ye. Lê  bi watekirina vê mijarê di destê me de ye. Ger ez weke gaveke hebûnê ya gerdûnê hatibim dûnê û cudahiyek min hebe, ez hebûneke azad û bi wate me. Dervayî vê pîvanê herikîna min, azad nebûyina min e. Divê em hebûna xwe bi vî awayî bigrin dest.

Di hebûna jin û mêr de, di enerjiya ku dikeve para jinê û mêr de cudabûn heye. Serokatî dibêje, “*enerjiya zilam ger bi deshilatdariyê ve girêdayî formeke bigre, dibe deshilat û pergala xwe pêş dixe.*” Dema ku em taybetmendiyên zilam û taybetmendiyên koletiya li ser jinê hatiye pêş xistin mezî dikin, ferq hene. Hebûyin û enerjiya jinê, zû şênber nabe. Lê ya zilam zû şênber dibe û hema dicemide. Form girtin û şênber bûyin ne yek e. Mesela di serdema civaka xwezayî de, jinê formek girt, li ser wê esasê di jiyanê de herikînek çêbû, di civakê de guhertinek û pêşketinek çêbû, lê necemidî. Ango enerjiya

jinê şêwe girt, lê qalibekî cemidî negirt. Lê di ya zilam de cemidandin çêdibe. Jixwe deshilatdarî jî li ser wê pêş dikeve. Li cihê ku deshilatdarî pêş ketibe, divê em bizanibin ku li wê derê herikandin tune ye; cemidandin heye û azadî tune ye.

Di serdema çînayetî û hiyerarşiyê de jî, enerjî di şexsê zilam de tê cemindandin, herikîn tune ye. Jiyanê hepis dike, enerjiya heyî dicemidîne. Dixwaze enerjiya jinê jî di nava wê pergalê de bifetisîne. Komkûjiyên ku li ser jinê tên kirin jî, berdewamiya wê ne. Hê jî şaristaniya navendî, da ku enerjiya jinê bicemidîne û bixe nava pergala xwe, jinan dikûje. Kûştinên di bin navê "*sedvaniya pîrhevokan-caziyan"* jî bi vî rengî pêş dikevin, her roj li kolanan kûştina jinan jî bi vî rengî ye. Enerjiya deshilatdariya zilam cemidî ye, dixwaze ya derdora xwe jî bicemidîne û bi vî rengî xwe mezin bike. Mesela em di sosyolojiya azadiyê de dibêjin, "*ger şaristaniya demokratîk tune be, şaristaniya navendî jî nabe.*" Wate ger jinên ku werin kûştin tunebin, ew pergala deshilatdariyê nikare xwe mezin bike. Ew mînakeke biçûk e.

Her wiha dest danîna ser keda jinê heye, dest danîna ser nirx û keda mirovên hûnermend, bindest heye. Enerjiya wan jî tê dizîn, lê kûştina jinan pir şênber e. Ger jineke kole be jî, enerjiya di jinê de li hemberî pergalê weke xeterî tê dîtin. Ew pergala deshilatdar dixwaze wê jinê bikûje, enerjiya wê bicemidîne û tevlî ya xwe bike.

Ew jî enerjî û herikîna di xwezayê de girtina dest ve girêdayî ye. Ger em herikîna jiyanê mezî bikin, xwezaya jinê zêdetir nêzikî wê ye. Lewma weke hebûn, enerjiya ku ketiye para jinê taybetmendiyeke dide jinê. Lê dervayî wê jî biyolojiya jinê û di dema neolîtîkê de form girtina jinê, ji bo vê yekê zemîneke ava dike.

Dema ku jin û zilam tê pênasekirin; tip dibêje, her mirovek ji 23 cot kromozonan ava bûye. Di jinê de 23 cot kromozon, ango 46 kromozon hene û hemû jî X in. Di zilam de 22 cot X in, lê cota 23'emîn yek X e, yek jî Y ye. Ango di mêr de 45 X, yek jî Y heye. Ferqa kromozonekî heye. Di wî kromozonî de ferqa enerjî û genan jî çêdibe. Ew kromozonê ku zayendê diyar dike, ya jinê X e, ya zilam Y ye. Di Kromozona Y de, 114 gen hene; di kromozona X de 3 hezar gen hene. Ango kromozonê ku zayenda jinê diyar dike, zêdetir çalak e. Bi awayekî xwezayî liv û tevgera jinê jî zêde dibe. Hêza herikînê jî zêde ye, piralî ye. Ew ne xirab e, ji wê kaosê azadî derdikeve. Cemidandîbûn û yekalîbûn xirab e. Di kromozona X de, tîrbûyineke enerjiyê heye.

Kromozona Y jî, mirov dikare weke enerjiyeke pênase bike. Lê li gorî X, çalakbûna wê kêm e. Lêkolînên cuda yên biyolojiyê pêş ketine. Dibêjin, kromozona Y ji xwe tunekirinê re vekirî ye. Lê kromozona Y, xwe zêdekirinê re vekirî ye. An jî kromozona X, pir-rengî ye, tê de enerjî çalak e û herikbar e. Dijberî wê jî angaşt hene, bi taybetî

deshilatdariya mêr dixwaze vê yekê pêş bixe. Mesela dibêjin, kromozona Y zêdetir cemidî ye, lê zêdetir ber xwe dide û qeyimtir e.

Di encamê de divê weke agahî mirov bizanibe, lê em xwe naspêrin van angaştên biyolojiyê. Lewma dibêtî heye ku em ber bi zanistperestiyê ve jî biçin. Jixwe her tişt bi biyolojiyê ve girtina dest, nêzikatiyên xelet jî pêş dixe. Tiştê ji bo me girîng, hebûna jin e. Weke hebûn, em jinê çawa pênase dikin?

Serokatî dibêje, "*jin nasnameyeke bi qeyran e*." Di nava qeyranê de her lêpirsîn û lêhûrbûn hene. Mesela dema ku hevalekî xort wek rêvebir diçe qadeke, di nava saleke de şêwaza xwe ava dike û li gorî wê di avahiya qadê de jî kombûyin û hevqutbûyinek çêdibe. Lê dema ku ew rêvebir jin be, demeke dirêj nikare şêwazeke ava bike. Em di nava rêxistinê de vê mijarê rexne dikin û dibêjin, "*çima şêwaz ava nabe.*" Lê divê em aliyê din jî bibînin, zû bi zû di jinê de qalip û statûko pêş nakeve. Di her derê de em dikarin vê yekê bibînin. Cih bi cih mînakên dijberî vê jî derdikevin, lê weke taybetmendiyeke jinê mirov dikare vê yekê bigre dest. Ew mijara hêrikîn û cemidandina enerjiyê ve girêdayî ye.

Ger em ji milê rêxistinî ve bigirin dest; wisa hema statûko ava kirin û avahiya hevalan li gorî xwe dabeşkirina hevalên xort şaş e, lê form û şêwaz ava nekirina hevalên jin jî şaş e. Lewma em dibêjin, neolîtîk jî

enerjiya jinê ku form qezenç kiribû. Wate bêyî ku em bibin statûkoperest, em dikarin formekî ava bikin. Pê ve girêdayî dema ku enerjiya zilam jî dicemide û form digre, deshilatdariyê pêş dixe. Ango deshilatdariya zilam, formgirtineke şaş a mirovahiyê ye. Di dîroka mirovahiyê de qalibekî şaş ava bûye û di wê derê de zilam jî weke biresereke hatiye karanîn. Jehrîbûyina mirovahiyê ye, deshilatdarî jehr e. Deshilatdarî li ser enerjiya cemidî xwe ava dike û dixwaze enerjiya herîkbar a li derdora xwe jî bixe qefesê. Ew mirovahiyê jehr dike.

Ew jehrkirin, hem li ser mer, hem jî li ser jinê tê pêş xistin. Divê hevalên xurt, bikaribin bibêjin; *"ew pergala deshilatdariyê nahêle ku enerjiya min biherike."* Mesela dema ku Serokatî pergala Îmraliyê tehlîl kir, di encamê de got, "*ez nikarim di nava vê pergalê de mezin bibim, biherikim.*" Heman tişt ji bo me jî derbasdar e. Ne şert e ku em bikevin Îmraliyê, li hemû qadên pergalê ava kirine, heman tişt derbasdar e û li ser me tesîr dike. Divê hevalên xort, deshilatdariyê bi vî awayî bigrin dest. Ger di nava pergala deshilatdariyê de weke mer, mirov bikaribe azad jiyan bike, dê Serokatî bikira. Lê Serokatî nikarî, got "*min hepis dike û difetisîne.*" Deshiltadariyê çiqasî enerjiya me hepis kiribe û girtibe bin serweriya xwe, em ew qesî dicemidin. Bi vî awayî em ê bibin parçeyekî vê pergalê ku li ser me deshilatdariyê pêş dixe. Azadnebûyin, ew e.

## Jin hevsengiya mejiyê hestiyar û analîtîk e

Mijara mejiyê analîtîk û hestiyar jî, bi hebûnê ve girêdayî ye. Mijareke ontolojîk e. Piştî ku Serokatî qala jineolojiyê kir, di vê mijarê de lêhûrbûna me hinekî din kûr bû. Dibêjin, "*di jinê de mejiyê hestiyar pêş e, di zilam de jî mejiyê analîtîk pêş e.*" Ew pênase şaş e. Mejiyê hestiyarî di hemû zindiyan de heye, lê mejiyê analîtîk, xwe hinekî cuda dike. Mejiyê hestiyarî, hem di jin de heye, hem jî di zilam de heye. Mirov, xwe ji zindiyên din çawa cuda kir. Di pêvajoyê neolîtîkê de, exleq û qanûnên civakî pêş xistin. Amûrên jiyanî pêş xistin, pîvan danîn holê. Bi van tiştan mirov, hebûneke nû ava kir. Dîsa pêşketina zimanê sîmgesel, çêkirineke mejiyê analîtîk e. Ev mejiyê analîtîk hiştiye ku em weke mirov, xwe ji xwezayê cuda bikin. Ne qutkirin e, cudakirin e. Ger mejiyê analîtîk hiştiye ku em cudabûnên xwe derxînin holê û taybetmendiyên mirov derxînin pêş; tê wê wateyê ku bûye sedem ku mirov bibe mirov.

Ew pir girîg e. Lewma di vê mijarê de hêleşaşiyeke me ya mezin heye. Niha mejiyê analîtîk ku rê derketiye cuda ye, lê mejiyê analîtîk bi xwe cuda ye. Mejiyê analîtîk, mejiyê ku mirov dike mirov e, dihêle ku xwe ji hebûnên din cuda bike û zêdetir bi wate jiyan bike. Bi cudabûna mirov, mirov azad dike. Ger civakbûyin, di neolîtîkê de derdora jinê pêş ketibe, wê demê mejiyê analîtîk di jinê de heye. Ango yê ku neolîtîk û şoreşa civakî ya ewil pêş xist,

mejiyê jinê bû. Hemû nirx û amûrên ewil yên civakî, pîşesazî, teknîk, cotkarî û hwd hemû di pêşengtiya jinê de ava bûn. Avakerê wê jin e. Em xeyal bikin, genim gihandin û destar çêkirin; pêşketineke mezin e. Weke ku tu îro diçê fezayê. Jinê ev yek pêş xistiye. Pêş xistina vê de jî tenê mejiyê hestiyarî kar neanî ye.

Di jinê de hem mejiyê hestiyar heye, hem jî mejiyê analîtîk heye. Lê di nava hevsengiyeke de hev û din qontrol dikin. Nahêle ku berovajîbûn û rêderketin çêbibin. Divê deshilatdarî jî weke berhemeke zekaya analîtîk neye dîtin. Mejiyê analîtîk, mirovahî kiriye mirovahî. Ew ne deshilatdarî ye. Dema ku mejiyê analîtîk rê derketiye û berovajî bûye, deshilatdarî pêş ketiye. Em bibêjin, di zilam de tenê mejiyê analîtîk heye, rast nabe. Di deshilatdariya zilam de hevsengiya di navbera mejiyê hestiyar û analîtîk de xirab dibe. Mejiyê analîtîk, pêşiya mejiyê hestiyar diçe û rê derdikeve.

Mijareke dîtir, mejî-zeka wisa parçe parçe girtina dest jî ne rast e. Heqîqet yekpare ye. Ger weke mirov, mejî heqîqeta me be, mejiyê me jî yekpare ye. Em weke mirov ew qesî ne tevlîhev in. Ger mejiyê me ew qesî parçe be, divê em parçebûna di navbera rih û bedena xwe de jî xwezayî bibînin. Ya yekemîn divê em mejiyê hestiyarî û analîtîk di nava hevsengiyeke de bigrin dest. Ya duyemîn jî, divê em hest û fikir jî di nava hevsengiyeke de bifikirin. Em nikarin bibêjin, hîs û hestên min tiştekî cuda dibêjin, lê fikrê min cuda dibêje. Mesela em dikarin mirovên ku

em fikrên wan diecibînin, hez bikin. Em çima Serokatî hez dikin? Lewma fikrên wî bala me dikşînin. Tiştê ku hezkirinê diyar dike jî hestên me ne. Wê demê di navbera fikir û hestan de girêdanbûneke xurt heye. Xwe yekpare girtina dest ve jî girêdayî ye.

Çima di mirov de hestiyarbûyin xurt e? Ger em tenê bi dîtina çav, bihîstina guh û bêhn girtina poz ve bigirin dest; ew di hinek sewalan de xurtir e. Lê di ya mirov de di navbera hemû pêjnan de hevsengiyek heye. Ji bo vê mirov xurt e. Ew pêjn û hîsên mirov hemû dibin yek û fikir ava dibe. Wê demê wateyeke nû qezenç dike. Ji ber ku em hest û fikir pir zêde ji hev û din qut dikin, em nikarin xwe yekpare bigirin dest. Mesela kesekî dîn jî, dibîne û dibihîze, lê ji ber ku nikare bi mejî re bike yek, di tiştên ku hîs dike de nikare encameke rast derxîne. Em nikarin destê xwe biavêjin tiştekî dikele, lê yekî dîn dikare.

Di jinê de hestiyarbûn pir xurt e, lê hestiyarbûn ne mejiyê hestiyar e. Di jinê de mejiyê hestiyar jî pir xurt e, lê li gel mejiyê analîtîk di nava hevsengiyeke de ye. Lê mejiyê ku deshilatdarî pêş dixe de, berovajîbûn heye. An jî pir zêde derxistina pêş a mejiyê analîtîk, dihêle ku rêderketin çêbibin. Ji ber vê yekê herikîna esasî ya civakê, şaristaniya demokratîk e. Lê şaristaniya navendî, bi mejiyê analîtîk rêderketineke jiyan dike. Dema ku mejiyê analîtîk de nepixandin çêdibe, rêderketin çêdibe û şaristaniya deshilatî pêş dikeve.

Di piraniya baweriyan de, çavpirçîbûna zindiyekî ne baş e. Mesela pişîkeke em bigrin dest, dervayî tiştên ku dixwe nikare tiştekî din bixwaze. Mejiyê hestiyar ji te re dibêje, qesî ku zikê te digre bixwaze û bixwe. Zindî hemû wisa ne. Lê mirov, zêdetirê pêwîstiya xwe dixwe û hinekê jî hiltîne. Obezîte jî, wisa pêş dikeve. Ne nexweşiyeke fîzîkî ye. Pergal bi vî rengî di bedena mirov de xwe şênber dike. Obezîte îbadeteke zanistperestiyê ye. Ya ku ji te re dibêje, li gorî pêwîstiya xwe bixwe mejiyê hestiyar e. Lê mejiyê analîtîk dibêje, sibêroja xwe jî bifikire, pirê bixwe, hinekê jî hilîne. Di navbera wan de hevsengiyeke pir zirav heye, dema ku ew hevsengî xirab dibe, tu ber bi deshilatiyê ve diçê.

Ger mejiyê hestiyar, nikaribe li ser mejiyê analîtîk qontroleke çêbike, an jî mejiyê analîtîk nikaribe li ser mejiyê hestiyar qontroleke çêbike, zindî dikare ji rê derkeve. Mesela giyayek, an jî darek heye, di xwazeyê de pir kêm maye, mirov bi mejiyê xwe yê analîtîk dikare zirarê nedê û biparêze. Lê bizinek ji ber ku tenê bi mejiyê hestiyarî difikire, dê wî giyayî, an jî darê bixwe.

Serokatî, mejiyê analîtîk û hestiyarî çawa pênase kir. Di her kêliyeke jiyanê de pênase dike û dinirxîne. Mesela xwe parastin, di hemû zindiyan de heye. Ger gulek dikare xwe biparêze û mirov nikare xwe biparêze, wate hevsengiya mejî xirab bûye. Bi vî rengî Serokatî teyisîna hevsengiya mejî di her kêliyeke jiyanê de digre dest.

Mirovê ku nikare xwe biparêze, mejiyê xwe cemidandiye. Parastin, tenê ne civakbûyinê ve, bi hebûnê ve girêdayî ye. Mesela mirovek dicemide, cilekî li xwe dike; dema ku germ dibe dîsa wî cilî datîne. Ew nîşaneya mejî ye.

Mesela ji bo ku civak baştir, rastir û xweşiktir rê ve biçe ketiye nava kîjan hewildanan. Ji bo zarokek biveje û bi tendûrîstî mezin bibe kîjan ked dane, ew hemû berhemên mejî ne. Ango mejî, ji jiyanê ne qut e. Mejiyê hestiyarî û analîtîk, di nava hevsengiyê de, dema ku hev û din qontrol bikin û bi hev re bimeşin; wê demê jiyan û hebûneke azad pêş dixin.

Weke me got, di navbera hebûna jin û mêr de cudabûn hene. Me pênaseya gerdûnê jî, weke zêdebûyin, cudabûyin û pir-rengîbûyinê kir. Ew hersê taybetmendiyên bingehîn yên gerdûnê ne, lewma herikandinê nîşan didin. Ew ji bo jinê jî derbasdar e. Jin, ji mêr zêdetir ji pirbûyin, zêdebûyin û cudabûyinê re vekirî ye. Mesela ax berhem dide. Di Kurdî de piraniya tiştên ku berhem didin, mê ne. Tê de pirbûyin û zêdebûyin çêdibe. Di giştî xwezayê de wisa ye. Mesela dema ku darek şîn be û fekî bide, mê ye; lê dema ku dar hişk be û bibe êzing, ner e. Ango dema ku potansiyela pirbûyin û berhemdayinê tê de hebe, mê ye. Ew hebûnê ve girêdayî ye. Di navbera jin û zilam de jî ferqeke bi vî rengî heye. Di zimanê Kurdî de, gelek mînakên bi vî rengî hene. Felsefeyeke nîşan dide.

Îro, hebûn û fikirên ku xwe jî bawerî û hestan qut dikin, zêdetir xwe nêzikî zanistperestiyê dikin. Cemidandinê re vekirî ye. Mesela di baweriyê de herikandin heye. Em çiqasî dûrî sezgî û hîsan bikevin, em cemidandinê re ew qesî vekirî ne. Di sezgî û hîsan de daneyên pir şênber tune ne. Mesela dibêjin, hîsên dayikan xurt in. Lê dema ku xort jî, sehekiya xwe xurt bike, di wan de jî potansiyel heye. Mesela carna hevalên xort helbestan dinivisînin, xwe weke dayikê dibînin. Lê potansiyela hîsê ya di hundirê xwe de derdixînin. Lê ger hîs kêm bin û tu tenê bi daneyên zanistî tevbigerê, tu cemidandinê re zêdetir vekiriyê. Di vê yekê de xefikên qefesbûyinê zeditir hene û xeterî ye. Di jineolojiyê de, bi zanistê ve girêdayî hest û hîs jî hene. Daneyên şênber jî girîng in, lê hîst, hest û xeyalên mirov jî girîng in. Tiştê ku tu li ser lêhûrbûn nekê û nizanibê, tu nikarê xeyal bikê.

## Pirs û nîqaş

**Hevalê X…:** Serokatî, bi dîroka mirov dixwaze bigihêje dîroka gerdûnî. Kes, bi dahûrandina kesayeta xwe tevlî civakê dibe; civak, bi dahûrandina rastiya xwe tevlî gerdûnê dibe. Zilam jî, bi xwe dahûrandinê tevlî jinê dibe. Divê em her wisa ya giştî bigerin. Hem di jinê de, hem jî di xort de mejiyê hestiyar heye. Lê mejiyê hestiyar ku di jinê de heye, zêdetir giştî ye. Di mejiyê zilam yê analîtîk de rêderketin çêbûye. Ew rêderketin jî careke re çênebûye, di nava pêvajoyekî de çêbûye.

Mejiyê analîtîk, her analîz dike û parçe dike. Şaristanî jî her parçe dike. Kesayet û civakeke ku bi mejiyê analîtîk hatiye înşakirin heye. Di nêzikbûna me ya ku têkiliya kes û civakê, jin û mer, civak û xwezayê pênase dike de ya girîng ferqkirina cudabûnan e. Serokatî, kesayeta ku ketiye ferqê taybetmendî û kesayeta xwe pênase dike. Em dibêjin, mirov jî hebûneke civakî ye. Cudabûnên ku wî dikin mirov hene. Lê mesele hinekî jî ketina ferqa ew cudabûnên xwe ye.

Em di vê derê de pirsgirekan jiyan dikin. Beriya ku em rastiya Serokatî û partiyê nas bikin, zanebûna me bi mal û gundê me ve sînordar bû. Lê îro em dibêjin, ger gerdûn pir-rengî û herikbar be, dîrok jî wisa ye. Ji ber ku em ji zanebûna dîrokê qut bûn, nêzikatiyeke me ya teng hebû. Ev yek jî dihêle ku tu nekevê ferqa zayenda xwe û civakbûna xwe. Lewma tu tiştekî nizanê. Çima kapîtalîzm dibêjê, kêliya heyî bijî, pêwîst nake tu dîrokê pir bizanibê? Lewma ger tu dîrokê bizanibê, dê hin heqîqet derkevin holê.

Serokatî dibêje, *"mirov hemû gerdûna zindiyan di xwe de temsîl dike."* Lê em xwezayê pir nas  nakin. Ger wisa be, em xwe jî nas nakin. Di vir de cehaletek derdikeve pêş. Ew yek jî di nêzikatî û feraseta me de tiştên berovajî û rêderketî derdixîne holê.

**Hevalê X…:** Me jineolojî niha bihîst. Hevalên ku ji bo jineolojiyê hatibûn arastekirin hebûn, ew jî me digot qey ji bo xwe dixwînin. Wisa weke têgihiştineke zanisteke civakî di me de tune bû. Lê pişt re jî me wisa fêm kir ku beşeke lêkolînê ya hevalên jin e. Hê jî di me de nêzikatiyeke wisa heye. Lê ger zanisteke civakî be û ez jî weke zilamekî endamê vê civakê bim, divê ez sûd jê werbigrim.

**Hevalê X…:** Serokatî ji bo jineolojiyê dibêje, projeya min ku nîvço maye. Bi lêgerîn û lêhûrbûnên îro, em dikarin weke timamkirina vê projeyê binirxînin. Dema ku em dîrokê mezî dikin, jin di dîrokê de pir zêde nehatiye pênasekirin û rista wê derneketiye holê. Jineolojî, ji aliyekî ve jî van rastiyên dîrokî wê derxîne holê. Tiştê min jineolojî fêm kir ew e, divê li ser vê esasê em kûrbûyineke çêbikin. Divê waneya jineolojî ne tenê di akademiyan de, di nava giştî avahiya hevalan de jî were nîqaşkirin. Mesela di dîrokê de gelek jinên leheng hene, lê em hê navê wan jî nizanin.

**Hevalê X…:** Bêguman, weke jinolojî zanisteke civakî pêş xistin, dê bi sûd be. Lê di şexsiyet de kûrbûyinek pêwîst dike. Lewma di derheqê jinê de jî, nêrîn û agahiyên me parçe parçe ne. Serokatî dibêje, *“mirov bi dubarekirina hemû rawestgehên gerdûnê hebûna xwe pêş dixe*.” Hem ji bo jinê, hem jî bo mêr wisa ye. Lê divê mirov hinek taybetmendiyên jin û mêr nas bike ku mirov rêderketin û berovajîbûnan jiyan neke. Weke hebûn,

hinekî behsa cudabûnên jin û mêr hate kirin. Dema mirov li ser van cudabûnan difikire, gelek tişt tên bîra mirov. Lê tiştê esasî her çiqasî cudabûn hebe jî, jin û mêr taybetmendiyên hev û din timam dikin.

Dema ku Serokatî dibêje, armanca gerdûnê naskirina mirov e; di mirov de tu dikarê gerdûnê jî baştir pênase bikê. Ger em li ser esasê feraseteke wisa tevbigerin, em zêdetir dikarin wate bidin gerdûn, jiyan, mirov û civakê jî. Lewma ew diyarde hemû bi hev ve girêdayî ne û armanca wan azadbûyin e. Bi taybetî weke zayend jin, zêdetir nêzikî azadiyê ye. Jin zû bi zû nacemide, zû bi zû qalib nagre, herikbar e. Sedemeke vê jî, jin danehev û formên berê ku ji civakê girtine zû bi zû bernade ku hema bikeve formeke nû. Meşeke bi îstîkrar heye. Lê zilam zû dicemide. Her çiqasî wisa be jî, di xwezayê de du hebûnên ku herî nêzikî hev in, jin û mêr e. Ji ber vê yekê dê tiştê ku were avakirin jî bi hev re be.

**Hevalê X…:** Em, yekem care vê waneyê dibînin. Dema ku min di paraznameya "*Sosyolojiya Azadiyê*" de jî, cara yekem ew mijar xwend, hîseke cuda da min. Mirov aîdî xwe dibîne. Dema ku me berê femînîzm û hwd dixwend, me dervayî xwe dîdît. Nêzikatiyên radîkal û çort dihatin bîra mirov. Ji ber ku navê wê jî bi zimanekî kevnar, ango Kurdî ye, ew hestên aîdiyeta jineolojiyê li ser me çêbûne. Lê tesîra naveroka wê jî heye, nêzikatiyeke cuda mirov dibîne.

Ne tenê ji bo jinê, em xwe jî di jineolojiyê de dibînin. Dibe ku jin pêşengtiya wê bike, lê zanisteke civakê ye. Zanista modern, li ser angaştên Descartes hatiye rûnişkandin. Lê bingeha wê şaş e. Ev felsefe bi piranî li ser esasê mejiyekî analîtîk pêş ketiye. Dema ku me berê dixwend, pir xweşiya me diçû. Em jî analîtîk difikirîn. Lê piştî ku em hinekî fêrî şîrovayên Serokatî bûn, me ferq kir ku di bingeha xwe de nêzikatiya ku civak parçe kiriye, ev e. Di destpêkê de îlmê pozîvîst li ser jinê tesîrek kiriye, lê civak hemû parçe kiriye. Dema ku li cihekî jin bireser be û were parçekirin, jiyan û civak hemû parçe dibe. Serokatî dibêje, "*divê mirov lêpirsîna pozîtîvîzmê her di kesayeta xwe de bike, ez jî her li ser xwe lêpirsîna vê dikim.*" Lewma tesîrên wê yên pir cuda hene. Em ne di ferqa wê de ne, lê di ziman û uslûbê me de jî nêzikatiyên pozîtîvîst pir derdikevin pêş.

Serokatî jî, bi sererastikirina vê zanistê û pêşxistina felsefeyeke nû jineolojiyê pêş dixe. Nêzikatiya me ya gerdûnê jî, di bin tesîra pozîtîvîzmê de ye, me mekanîk digirt dest. Bi nêzakatiyeke felsefî û civakî girtina dest tune bû. Lê dema ku min pênaseya Serokatî ya dubendiya enerjî û madeyê di şexsê jin û mêr de tîne ziman û li ser wê esasê hevjiyana azad pênase dike xwend, pir zêde bala min kişand. Tiştekî muazam e, di mirov de kelecanî ava dike. Bi taybetî li gel paraznameya pencemîn, van mijar jî di serê me de zelaltir bûn. Di jinê de civakê, di civakê de gerdûnê, di gerdûnê de mirov tê lêpirsîn kirin.

**Hevala X…:** Dema ku Serokatî qala jineolojî kir, ji bo me tiştekî pir nû bû. Lê dema ku mirov ji têkoşîna li hemberî Fatmayê heya roja me hewildanên Serokatî dibîne, mirov dizane ku hîmê jineolojiyê ji pir zû ve hatiye avêtin. Lê bi jineolojiyê, tez û angaştên Serokatî yên ser jin û hebûnê, bi pergal bûn.

Îro jin û civak, li holê hatiye rakirin, ketiye rewşeke ne baş. Zanist û ferasetên heyî, jin parçe kirine. Di dîrokê de li ser jinê gelek tundî û tepisandin hatine ferzkirin. Mesela jinên zane ku di serdema navîn de di bin navê pîrhevokiyê de hatine qetilkirin, min fêm nedikir. Lê her ku min jin û rastiya pergalê ya li hemberî jinê dît, watedayin jî çêbû. Jin wate dide her kêliyeke, lê di civakê de bêwatebûn hatiye pêş xistin. Vê yekê li ser me jî tesîr kiriye, em pir caran wate nadin tiştan. Dema ku watedayin ji holê radibe, hebûna te jî tiştekî îfade nake.

**Hevalê X…:** Serokatî, jineolojiyê weke zanista Modernîteya Demokratîk digre dest. Jineolojî di mirov de meraqeke jî ava dike. Dema mirov li ser lêhûrbûn dike, jineolojî tenê ne weke zanista jinê, weke zanista jiyanê derdikeve holê. Dema em neolîtîkê mezî dikin, her tişt bi jinê pêş dikeve û diafire. Lê bi pergala şaristaniya navendî berovajî dibe. Heya roja me jî ev pergal bi awayekî xwe didomîne. Di jiyana xwe de em dikarin gelek mînakên vê pergalê û berovajîbûnên çêbûne bidin. Jixwe pirsgirekên ku di nava civakê de derdikevin holê, çavkaniya xwe ji vê berovajîbûnê digirin.

Asta ku îro jin tê de jî, bi vê yekê ve girêdayî ye. Pergala kapîtalîst, tûndiyên li ser jinê hinekî zirav kirine û xapandineke jî pêş dixe. Lê bi gotina herî sivik, jin di nava vê pergalê de meta ye. Amûreke kirîn û firotinê ye. Di nava pergalê de civaka ku herî pêş tê dîtin, Ewropa ye. Lê hemû qirêjiyên wê li ser jinê dimeşin. Ger qîmeteke jinê hebe jî, ji ber ku di her tiştî de weke amûr tê karanîn ew qîmet heye. Di destpêkê de jineolojî jî, li hemberî van pirsgirekên di nava civakê de çareseriyan ava dike.

**Hevala X…:** Waneyên me hemû bi jineolojiyê ve girêdayî ne. Mesela di dîrokê de, em afirîneriyên jinê û xistina jinê baş dibînin. Ji vî alî ve jineolojî, lêgerîna jina ku di dîrokê de hatiye windakirin e. Lewma di jineolojiyê de, heqîqeta jin, jiyan, mirov, civak û gerdûnê heye. Têkiliya jinê li gel aboriyê, li gel ekolojiyê, li gel xwezayê digre dest.

Di tableteke de Înana xwe tîne ziman. Dibêje, “*we ez kirim çar parçe; ez agir bûm, we ez temirandim; heya ku hûn min weke berê nekin jî, hûn nikarin bigihêjin rastiya xwe.*” Jixwe ew tablet jî weke qêrîna Înana bi nav kirine. Ger mirov li ser şîroveyan bike, dikare gelek tiştan derxîne. Jineolojî, ji vê qêrînê re bersivek e. Ger ew tiştên ku hatine temirandin û parçekirin, werin sererastkirin, dê jiyan û civak jî sererast bibe. Jineolojî, derxistina holê ya tiştên ku di tariyê de hatine hiştin e; giştîkirina, tiştên ku hatine parçekirin e. Ango jineolojî, gihêştina cewhera civakê ye.

**Hevala X…:** Em pir qala xwebûnê dikin. Jineolojî, ji aliyekî ve xwebûnê derdixîne holê. Gelek peyv hene ku li ser vê esasê vedigerin heman cihî; jin, jîn, jîngeh ûhwd. Dema ku tu bi awayekî berfireh van peyvan tînê gel hev, wateyeke xurtir jî çêdike. Dema ku em qala jineolojî dikin, yekbûna jin û jîn û xwezayê tê ber çavê mirov. Diyerdeya zayinê jî, têkiliya esasî ya di nava van têgînan de ye. Bedewbûna jinê û xweşikbûna jiyanê bi hev ve girêdayî ye.

Serokatî, ji bo dîrokê hin pênase dikirin. Mirov di vê derê de jî dikare bibêje, jineolojî weke keştiya Nûh e ku jiyanê radike û dibe cihekî, da ku biparêze. Jineolojî, dixwaze enerjiya ku bûye qalib bigihîne herikîneke. Dîsa di nava lêgerîna wê de herikîna azadiyê heye. Ew nêrîn hemû di mirov de lêgerîn û kelecaniyan çêdike. Dema ku tu bi xwebûna xwe ve dibê yek, tu jî pê re diherikê.

Jineolojî di nava civakê de jî bal dikşîne. Mesela dema ku pirtûka jineolojî hate nivîsandin û wergerî Farsî bû, pir bal kişand û pir belav bû. Lewma meraqeke mezin heye. Çavkanî û nêzikatiyên heyî, her yekalî û weke hev in. Lê jineolojî bi mejî û nêzikatiyeke cuda diyarde û hebûnan digre dest. Gelek derdorên jin ku li hemberî me dijbertiyeke tûj dikirin, dema ku jineolojî xwendin, nerînên wan ji bin ve guherîn. Lewma ger mirov tenê weke nav bigre dest jî, jineolojî xweş tê guhê mirov. Asoyeke cuda di mirov de ava dike. Tu pir berfireh ji bûyeran mezî dikê.

Berê jî zayendperestî, pergala deshilatdarî û pergala mêr ku xwe sazî kiriye dihat nîqaşkirin. Lê dema ku ew yek dibe tiştekî şênber û sazî dibe, ji bo mejiyê mirov zêdetir balkeş tê. Êdî ji asta razberbûyinê derdikeve û dibe çavkaniyeke esasî. Tu êdî di nava wê de her tiştekî xwe dibînê. Tu xwe ji dîrok û zanistê qut nagirê dest. Ew tişt hemû di pergaleke de giştîkirin û pênasekirin, ne tenê ji bo jinê, ji bo mirovahiyê kelecaniyeke diafrîne. Lewma ji bo her derdoreke, li xwe vegerînek e.

**Hevala X…:** Me di zindanê de jî perwerdehiya jineolojî dît û hinek derfetên lêkolînê jî me dîtin. Lê li vir girtina dest, di mirov de hin cudahiyan pêş dixe. Divê di destpêkê de zanist û felsefeya jineolojî were pênasekirin, ger tu tiştekî pênase nekê tu nikarê çareser jî bikê.

Texrîben 5 hezar sal e, bi pênaseya jin hatiye lîstin. An jî bê pênase hatiye hiştin. Divê em xwe ji nû ve pênase bikin û li gorî pirsgirekên civakî çareser bikin. Hin derdorên ku di nava pergalê de dixwazin pirsgirekan çareser bikin hene, lê revîze dikin. A me ne wisa ye, em şoreşê çêdikin. Ji bo ku pirsgireka civakî were çareserkirin, divê pênaseya wê di şêwazeke şoreşgerî de were pênasekirin. Pirsgirek di ketina jinê de derket holê. Bi ketina jinê jî civak, jiyan û xweza ketiye. Wê demê divê em pirsgirekê di vê derê de bigrin dest.

Di çareseriya jineolojî de, felsefe heye. Tenê ji aliyê fîzîkî ve civakê nagre dest û sosyolojiyê li ser wê esasê pêş naxe. Ya din nêrîna rast a dîrokê heye. Serokatî pênaseyên serdeman dike. Qala dîrokîkirina sosyolojiyê û sosyolojîkirina dîrokê dike. Çima civak, ji dîrok û felsefeyê qut tê dest girtin? Lêpirsîna vê dike. Her wiha civaka exleqî û polîtîk derdixîne pêş.

Lêkolînên me li ser zanistan û felsefayan çêbûne, hemû zanistên di nava pergalê de –her çiqasî hinekên wan angaşt kiribin ku dê pergalê derbas bikin jî- heqîqetê parçe dikin. Hinek di bin navê materyalîzmê de, hinek jî di bin navê îdealîzmê de vê yekê dikin. Lê li ser esasê kirde-bireser, rih-beden vê parçebûnê pêş dixin. Jineolojî zanista xwe li ser rexneya van zanistan pêş dixe. Di jineolojiyê de wisa parçekirin tune ye. Dubendî hene, lê ew dubendî hev û din timam dikin, hev û din xilas nakin. Li ser wê esasê jî enerjî her pêş ve diçe û jiyan herikîna xwe didomîne.

**Hevalê X…:** Bîst û çar seatan di nava jiyanê de tiştê ku herî zêde li ser tê nîqaşkirin, mirov dikare bibêje jin e. Nêrînên hemû cîhanê, li ser jinê hene. Oldar li gorî xwe, çepgir li gorî xwe, dewlet li gorî xwe, lîberalîzm li gorî xwe li ser jinê nêrînan pêş dixe. Ji ber ku di nava jiyanê de xwedî hebûneke ye, bi hezaran sale li ser tê axaftin. Lê ya ku li ser wê pênaseyeke rast û zanistek tune, dîsa jin e. Ji aliyê şênber ve, ez wisa digrim dest.

Bi rastî jî em jineolojiyê çawa ji mirovekî di nava civakê de ye bidin fêmkirin? Em ji civakê re nikarin behsa Descartes û pozîtîvîzmê bikin. Ji vî alî ve weke zanisteke girtina dest a jineolojiyê pir giran e. Saziya ku herî zêde barê şoreşê li ser milê wê ye. Ger hemû cîhan li ser wê diaxife û berovajîbûn hemû li ser wê pêşketine be, divê di çareseriyê de jî barê herî giran rake. Di bin wî barî de derketin ne zehmet e. Ne tenê jina Kurd, giştî mirovahî mijara gotinê ye. Giştî mirovahî û civakê digre dest. Ew yek wêrekiyeke dixwaze. Ji ber vê ez sekna herî mezin a şoreşgeriyê, weke jineolojî dinirxînim. Hem weke sazî, hem jî weke sazî wisa ye.

Hevala Dilzar: Armanca me ne tenê zanist û felsefeya wê ye. Lê felsefe jî pêwîst dike. Mesela li qada civakî, merek jina xwe dixwe û ji hevalên me re dibêje "*hêza min têrê dike, çima ez lê nexim?*" Hevalên me nikarin bersiva vê bidin. Ger em bikaribin pênaseya jiyanê rast bikin û kûr bikin, dê em ê civakê jî bikaribin qaneh  bikin. Rast e, barek e. Lê divê mirov bikaribe wê wêrekiyê jî nîşan bide. Felsefe jî, ne tenê teoriya hişk e. Axaftina mirovekên bi temen a di nava civakê de jî felsefe ye.

**Hevala X…:** Serokatî dibêje, tiştê herî giran neketina ferqa kolebûna xwe ye. Bi qebûlkirna wê jiyîn e. Li ser jinên ku bedena xwe difroşin, bernameyeke radyo hebû. Jinek tevlê bûbû, di serî de got, "*ez naxwazim navê xwe bidim.*" Got, "*merê min ez xistim nava vî karî, ez niha ji vî*

*karî pereyan jî qezenç dikim û karê xwe jî bi rûmet dikim.”* Ketina herî xirab mirov di vê derê de dibîne. Di karekî wisa de rûmetiyeke çawa heye? Lewma di asta herî jêr de ketin e. Ew mînaka herî balkeş e. Gelek mînakên bi vî rengî hene.

Tiştê ku jin xistiye vê rewşê hinek jî çavbirçîbûn û ajo ne. Dîrokeke pir ne dûr e jî, mesela di neolîtîkê de bi xwarineke pir kêm çawa jiyan kirine. Her wiha pêximber çawa bi xûrmeyeke zikê xwe têr dikin. Civak ti caran, ji bo tiştên wisa neketiye. Lê pergala kapîtalîst, civak aniye asteke wisa ku tiştê herî xirab re dibêje, “*tiştê herî xweşik e.”* Dema ku kêmek serbest dibe, vê yekê weke azadî dinirxîne. Lê koletiyeke pir kûr heye.

Ji derketina têkoşîna Tevgera Azadiyê ve, bawerî dayina Serokatî, ji bo me hemûyan derketinek bû. Ketina ferqa hinek tiştan û careke dîtir di xwe de hêvî dîtin, ji bo me tiştekî pir mezin e. Hem weke hevalên jin, hem jî weke hevalên xort têgihiştineke me jî çêbûye. Lê ji aliyê din ve hê jî hev û din fêmnekirin jî heye, em cuda mezî diyardeyan dikin. Rast e, em pir dûrî heqîqeta xwe ketine. Lê taybetmendiyên me yên cewherî jî, hê xwe didin hîskirin.

Ji vî alî ve nêzikatiyên hevalên xort, zêdetir teng in. Mesela tu dixwazê tiştekî nîqaş bikê, hema qut dike û diavêje. Hewildana fêmkirinê pir zêde tune. Lê dema ku hevalên jin di rêbazeke de ser nexin, yek din diceribînin. Ji

vî alî ve kûranî di hevalên jin de zêdetir e. Zayenda xwe naskirin jî, di asteke xurt de ye. Lê li hemberî jinê pêşderazî hatine avakirin. Dibêjin, "*jin nikarin falan karî û bêvan tiştî bikin.*" Îro di nava hevalên xort de jî, nêzikatiyên dişibin vê hene. Dibe ku pir naye lêvkirin, lê di binmejî de heye.

Ya herî girîng hevalan jî bi lev kir, "*jineolojî zîhniyet û mezîkirinek e.*" Bi vê nêrînê divê her tiştî me biguhere. Dema ku konferansa jineolojî çêbû, jinên biyanî jî pir alaqa nîşan dan. Mesela ji dil dixwastin tevlê bibin, li ser nivîsan binivisînin. Di malparên xwe de li ser jineolojî gelek nivîs nivîsandin. Vê yekê jî diyar kir ku di wan de jî hêviyek daye avakirin. Lêgerîneke wan hebû, pêwîstî pê dîdîtin. Ji ber wê xwedî lê derketin. Dema ku mirov rewşa jinê ya di nav de dibîne, mirov çima ew qesî xwedî lê derdikevin jî fêm dike.

Hevalan got, barekî pir giran e. Rast e, dê em ê her tiştî jî nû ve bigrin dest. Ew jî tiştekî pir zehmet e. Mesela jineke xwedî nêrînên femînîzma Îslamî heye, dixwaze nêrîna dîrokê ji nû ve bigre dest, lê tê qetilkirin. Bi rastî jî tiştê ku em dixwazin bikin, ne hêsan e. Demeke dirêj e, jin ji van qadan hatiye dûrxistin û her tişt bi nêrîna zilam hatiye dest girtin.

Êdî piranî civak li ser ragihandinê tê beralîkirin. Ji vî alî ve vekirina tv'ya jinê pir girîng e. Tiştên ku em bi riya wê bikin, pir in. Mirov ji wê derê jî dikare hin tiştan bide

destpêkirin. Bi rastî jî em ê çawa di civakê de nêrîneke nû ava bikin, dê têkiliyên jin û mêr li ser çi esasê bin, zarokek wê çawa were mezinkirin. Divê van mijaran de nêzikatiyek derkeve holê. Ew tişt gengaz in, mirov nikare bibêje ne gengaz e. Her kesekî ku kêmek dikeve ferqa wê û zîhniyeteke rast digre, guhertinan jî jiyan dike. Zarokê ku hinekî li gorî zîhniyeta rast tê perwerdekirin, bi awayekî baştir mezin dibe û zîhniyeta pergalê jî li ser pir tesîr nake. Lewma bi zanebûneke tên mezinkirin.

Ji ber vê yekê divê di çarçoveya azadiya jinê de, Tv, radyo, kovar, pirtûk, fîlm, belgefîlm ûhwd hebin. Pêşxistina van tiştan, dê nêrîna di derheqê jinê de jî biguherîne. Lê ji bo vê ked û xebateke domdirêj jî pêwîst dike.

**Hevala X…:** Heval got, mirov nikare mijara jinê felsefî bigre dest, şaş e. Lewma jineolojî bi xwe aso û mezîkirineke felsefî ye. Jiyan bi nêrîna jinê pênasekirin e. Divê mirov bi çavekî materyalîzmê jinê mezî neke. Jixwe dema dayikek, an jî pîrikek zarokên xwe re gotineke pêşiyan dibêje jî, felsefe dike. Lorikek, bi xwe felsefeyek e. Ango di nava civakê de, li derdora jinê felsefeyek heye. Jixwe Serokatî, bi felsefeya mezîkirina jin, vê paradîgmayê ava dike. Ew mijar sererast bibe dê baş bibe.

**Hevala X…:** Divê em nêzikatiya ku zanistê aîdî xwe nabînin, derbas bikin. Bi zanistên pozîtîvîst ve qiyas kirin, dervayî xwe dîtin e. Ew rastiyek me ye. Lê pergalê di me

de nêrîneke wisa ava kiriye; dibêje, "*tu nikarê bifikirê, tu nikarê felsefe pêş bixê, tu kêmaqilê, tu zanistê fêm nakê...*" Ango tu ji hemû aliyan ve kêmê. Lê dema ku em felsefe û zanista xwe digirin dest, em şênber û vekirî digirin dest. Di akademiyên me de ev tişt pêş dikevin. Li serê van çiyan, di nava daristaneke de em rih û bedena xwe digirin dest û ji wir derdikevin rê. Gelek derdorên din jî li ser jinê nîqaş dikin, lê ew kî ne û çawa nîqaş dikin. Ew jî girîng e.

Nêrîna mîtolojî, ol, felsefe û zanistan heye. Feylezof, jinê weke seqet, nîv mayî, tênegihîştî, kêmaqil dibînin. Disa di zanistê de, jinên ku xwestine zanistê pêş bixin, hatine qetilkirin. Ji ber vê yekê divê em gûftogoyeke ku van nêzikatiyan hemûyan derbas bike, pêş bixin. Her wiha ger civak, ji civakbûna xwe dûrketibe, bi xistina jinê ve girêdayî ye. Wê demê divê em felsefeya wê baş bikin. Pêwîstiya me bi pêş xistina felsefeya jin, mer, jiyan û civakê heye. Em vê yekê jî bi awayekî şênber dikin, bi razberî nagirin dest. Çandeke me heye, mirov bê pirs nemaye. Ji ber vê em nikarin bibêjin, em nikarin felsefeya wê bikin, tenê divê ji aliyê civakî ve em çareseriyan ava bikin. Bi hev ve girêdayî ne, ger tu nikaribê felsefeya wê pêş bixê, tu nikarê çareseriyên şênber jî pêş bixê.

**Hevala Dilzar:** Serokatî di paraznameyan de jî dibêje, "*di hîmê lêgerîna min a felsefeyê de, jineke ku bikaribe bi min re nîqaş bike û min derbas bike*" heye. Ango Serokatî, asta ku jineolojî bigre jî, weke lêgerîna xwe ya

felsefî datîne holê. Li ser jinê lêhûrbûn kirin, asta zanistê ya serdemê derbaskirin; Serokatî weke lêgerîneke felsefî digre dest. Heval di vê mijarê de dikarin nêrînên xwe bînin ziman; her wiha weke hebûn em xwe çawa digirin dest? Bêyî ku em bikevin nêrînên pozîtîvîst, divê em hebûna xwe bikaribin pênase bikin.

Heval got, jineolojiyê mirov nikare weke felsefe bigre dest. Di fêrbûyina me ya zanistê de jî, analîtîk mezîkirin heye. Zanistên pozîtîvîst xwe dispêrin agahiyên objektîf û şênber, lê jineolojî xwe dispêre hîs û sehekiyê. Di ti nêzikbûnên zanistî de, sehekî weke daneyeke esasî naye destgirtin. Jiyaneke civakî ya deh-hezaran sal heye, di wir de tiştên ku hatine jiyîn û li ser civakê tesîreke mezin kirine hene. Heya roja me jî di hîs û sehekiyan de xwe didin der. Mirov nikare van jî, ji zanistê qut bigre dest.

**Heval X…:** Min jineolojî, weke zanisteke pozîtîvîst nenirxand, şaş hatiye fêm kirin. Ez dibêjim, weke kes ji ber ku em di bin tesîra pozîtîvîzmê de mane, em jineolojî wisa digirin dest. Ne ku jineolojî bi xwe, zanisteke pozîtîvîst e. Ez ji aliyê gerdûnî ve digrim dest, em dikarin heya Bîg Bangê biçin. Ji wê derê heya roja me, jin û zilam bi hev re ne û hebûneke xwedî nirx in. Ew enerjiya wan, di dema çêbûyin û hebûnê de jî bûye xwedî çawanî. Ango ji destpêkê ve jin û zilam, du hebûnên ku hev û din timam dikin in, hê jî ew hevrebûn berdewam dike. Êdî çawaniya kîjanê çi be, kîjan kîjanê dikşîne, nizanim.

Di pênasekirinê de jî em zehmetiyan dikşînin; taybetmendiyên jinê, zêdetir nêzikî xwezayê ne. Lewma piralî ye, hêrikbar e, dikare hîs bike, dikare hebûnê zêde û berdewam bike. Ger hevsengiyeke rast hebe, mêr jî tevlî nava vê hêrikînê dibe. Tiştê ku dixwazim bibêjim, pozîtîvîzm nahêle ku mirov vê hêrikînê bi giştî fêm bike, parçe dike.

**Heval X…:** Serokatî di paraznameyan de dibêje, "*taybetmendiyeke herî girîng a mirov, mezinbûyin û esnekbûyina mejiyê wî/ê ye.*" Lewma esnekbûyin, her xwe înşa dike. Ew hilbijêrek e. Cihê ku esnekbûyin tune be, her hişkbûn û tîrbûyineke çort heye. Di xwezayê de jî tiştê esnek, her şîn û zindî ye; tiştê ne esnek hişk e û çort e. Zilam jî, çort û raste rast e.

Di xwezaya yekemîn de jî mejî heye, lê hêdî ye. Ji aliyê metafîzîk ve jî ew herikîn hinekî lez dibe. Her wiha ji ber ku dahûrandineke rast a sosyolojiyê û felsefe tune, dahûrandineke rast a psîkolojî û derûniyê jî tune. Niha di zindan, nexweşxane, karxane û hemû saziyên dewletê de psîkolog hene. Da ku ew xeleka pergalê bizivire, mirov kar tînin, ango wan xelekan rûn dikin. Armanc dike ku mirov li gorî qeîde û quralên wê pergalê bimeşin.

Serokatî pir girîngî dide felsefe ye. Dibêje, tiştekî herî zêde ez dixwazim, li gel jinê têgihiştineke felsefî ye. Lê divê em di destpêkê de bikevin ferqa xwe û pişt re di nava hevsengiyeke de bibin yek. Niha aliyên me ku me dûrî

rastiya me dixin çi ne? Dibe ku îro pîrik û kalikên me ku li gund jiyan dikin, wateya tê zanîn de pir felsefe nizanibin, lê di jiyan û gotinên wan de heqîqetek heye. Serokatî dibêje, pozîtîvîzm pûtperestiya nûjen e. Em hinekî lêkolîn bikin, tê de têkiliya xweda-evd heye. Ev nêzikbûn, tesîra xwe li hemû qadên jiyanê dike. Ger civaka ku ketiye bin tesîra kapîtalîzmê tune be, kapîtalîzm 24 seatan nikare xwe li ser piyan bigre. Ji bo şaristaniya navendî jî heman tişt derbasdar e. Lewma di nava civakê de pergaleke ku dimeşe ava kirine.

Dê jineolojî vê pergalê parçe parçe bike. Lewma derdoreke kêm a civakê pergaleke deshiltdariyê ava kiriye û bê dilê wan ji sedî 95’ê civakê bi vê yekê dide meşandin. Derdoreke teng, civakê rê ve dibe. Têkiliya rêvebir û kesê ku tê rêvebirin heye. Ew jî têkiliya kirde û bireser e.

Divê mirov dubendiyên gerdûnî-xwezayî û yên ku hatine avakirin tevlî hev nekin. Demeke dirêj min jî nakokiyeke wisa jiyan kir. Weke ku divê Kurd û Tirk her pêv biçin, jin û zilam her pêv biçin, xweza û mirov her pêv biçin. Di gerdûn û xwezayê de dubendiyeke wisa tune. Divê mirov nekeve kemîna ev dubendiyên ku hatine înşakirin.

Hevala Dilzar: Jixwe dema ku Serokatî Hegel û Marks rexne dike, dibêje, “*pêwîst nake ku dubendî hev û din ji holê rakin.*” Ne di xwezayê de, ne jî di mirov de wisa ye.

**Hevalê X…:** Ez cara yekemîn waneya jineolojî dibînim. Jineolojî zanisteke giştî ye. Em niha bi riya amûrên ku hevalan qala wan kirin dixwazin zanista jineolojî pêş bixin. Lê beramberî wê zîhniyeteke ku xwe bi cih kiriye jî heye. Ew jî dubendiyek e. Mesela Avaşîn û Basya li cihekî digihêjin hev, lê heya cihekî dîsa tevlîhev nabin. Lewma cihê ku ew jê derdikevin, taybetmendiyên wan avan cuda ne. Rastiya wan cuda ye. Ew dibe sedem ku mirov di nava van dubendiyan de hinek rastiyan bigere û bibîne. Tuyê zelaliya aveke, di nava aveke şîlo de çawa bibînê.

Ji dema ku Serokatî gotiye, em jineolojiyê pêş bixin û vir ve; êrîşên dijmin li ser jin û civaka Kurd zêdetir bûne. Qetilkirina Heval Sara wan, qetilkirina sê hevalên li Sîlopî, mirov dikare gelek mînakên din bide. Naxwaze di şexsê wan de heqîqet derkeve holê, dîrokeke tune dike.

Di sala 2006’an de li ser înternetê dîmenek belav bû. Jineke Êzîdî, bi hezaran kes li ser serê wê kom bûne û lê didin, herî dawî jî blokeke betonê di ser serê wê de datînin. Rewşeke ew qesî giran li ser jinê heye. Beriya her tiştî jineolojî, ji bo ji holê rakirina vê rewşê girîng e. Ji bo jineolojî ser bikeve jî, ji her alî ve xwe fedakirin pêwîst e. Da ku em bikaribin ji bin vî barî derkevin. Ji vî alî ve erkên pir girîng dikevin ser milê me. Serokatî fêmkirin jî, ji vê derê re derbas dibe. Ger tu çiqasî bikaribê bikevê ferqa xwe, tu dikarê wate bidê zayenda keleka xwe jî. Ger em her yek lêpirsîneke bi vî rengî di xwe pêş bixin, dê encamên xurt jî bi xwe re bîne.

# DÎROKA BERXWEDANIYA JINÊ Û ZAYENDPERESTÎ

**Hevala Dilzar:** Em hinekî li ser hebûna jin û pênaseya jineolojî sekinîn. Em ji milê dîrokî ve jî dixwazin hinekî bigrin dest. Dîroka Tevgera Jina Azad jî heye, dê wê derê de jî gelek tişt werin vekirin. Ji ber wê em ê hinekî din dîroka berxwedaniya jinê vekin. Em vê yekê dikarin weke dîroka Şaristaniya Demokratîk, dîroka mirovahiyê, dîroka civakê jî pênase bikin.

Em pir caran di xwendina paraznameyan de jî rastî tên, di nîqaşên xwe de jî em tînin ziman. Deshilatdariyeke ku 5 hezar salin heye ye. Li beriya wê jî 2 hezar sal, pevçûnên di navbera xwedawendiyê û deshilatdariyê de hene. Bi giştî 7 hezar sal in, dîrokeke berxwedaniya jin heye. Di nava 5 hezar salên deshilatdariyê de, jin yekser di nava berxwedaniyê de ye. Jixwe ew 5 hezar sal jî, li ser nirxên ku beriya xwe hatine avakirin xwe înşa dike.

Em dîroka xwe ji civaka xwezayî digirin. Pênase û têgihiştina me ya dîrokê guheriye. Em dîrokê tenê nivîskî nagirin dest. Gelek dane hene ku di civaka xwezayî de çandeke xwedawendiyê hatiye jiyîn û li derdora jinê civakbûnek pêş ketiye. Di dîrok girtina dest de jî armanca me ne îspatkirina hebûna civaka xwezayî ye. Divê em feraseteke wisa mezî bikin ku civaka xwezayî tune be jî,

jiyaneke jin û mêr di nava hevsengiyê de jiyîne tune be jî; em dixwazin li ser esasê azadiyê tiştên nû ava bikin. Pêwîst nake ku em pişta xwe bidin daneyên nivîskî jî.

Berê dema ku me dîroka Kurdistanê nîqaş dikir, me digot dewletên Kurdan ava bûne, nizanim Kurdan çi kiriye. Ango me dixwast em bibêjin, di dîrokê de tiştên ku em pişta xwe bidinê hene. Ew mezîkirineke şaş a dîrokê ye. Ger em dixwazin îro û di pêşerojê de azad jiyan bikin, duh tiştekî wisa tune be jî, em dikarin niha ava bikin. Ji vî milî ve divê feraseteke azad a dîrokê hebe.

Ya dîtir jî, dema ku em dîroka jinê digirin dest; divê em nekevin nava daneyên pozîtîvîst ku me dikşîne. Berê di navbera me û hevalên xort de nîqaşên bi vî rengî pir çêdibin; nizanim jinê agir dîtiye, an mêr dîtiye; kîjanî destpêkê goşt xwariye û rê derketiye. Nerîna esas, hevjiyanek hebûye, civakeke xwezayî hebûye. Ew tişt jî li derdora jinê hatine honandin. Ango serdemeke wisa heye û îro jî em dixwazin azad jiyan bikin. Ji aliyê mezinbûnê ve jiyan avakirin, ji aliyê şêwaza jiyanê ve jî hilbirîn girtin, tiştên nû afirandin, pergala domandina jiyanê pêş xistin girîng e. Ji bo dîroka mirovahiyê wateyeke girîng a van pêşketinan heye. Dema ku em dîrokê mezî dikin, risteke girîng a jinê di vê derê de heye. Zarokan tîne dûnê, li derdora xwe jiyaneke dihone, hilberînan çêdike, nirxan ava dike, aboriyê pêş dixe.

Ango bê jin, jiyan naye avakirin. Tenê ji aliyê biyolojiyê ve em nabêjin. Ji olan bigre heya, deshilatdaran, ji dewletê bigre heya kesên dervayî dewletê; çima her kesek li ser jinê nîqaş dike? Lewma jin di navenda jiyanê de ye. Deshilatdarî jî vê dizane, em jî dizanin. Hevalan jî got, piştî ku Serokatî jineolojî pêş xist, êrîşên li ser jinê zêdetir bûn. Lewma dizanin ku em ê ji vê derê derketineke bikin. Ji ber vê yekê berê êrîşên xwe dane ser jin û zarokan. Ew êrîşên li ser jiyan û pêşerojê ne.

## Di şoreşa neolîtîkê de rista jinê û xwedawendî

Beriya zayinê di navbera 10 hezar û 4 hezaran de, civaka xwezayî di pêşengtiya çanda Aryen de sazîbûneke pêş dixe. Di vê serdemê de amûrên jiyanî û teknîkî pêş dikevin. Îro van amûrên jiyanî em biçûk dibînin, an jî bi awayekî rêzê kar tînin; lê ji bo wê serdemê pêş xistina van amûran afirandina jiyanê ye. Lewma ew amûr, wê demê zêdetir jiyanî bûn; bê wan jiyan nedimeşiya, nediherikî. Niha ji me re pir biçûk tê, lê wê demê dîtinên pir mezin hene. Dîtin û afirandinên wê demê em dikarin îro weke ji nexweşiya pençeşêrê re derman dîtinê pênase bikin. Şibandineke wisa çêbe, dikare cihê xwe bigre. Ango astengiyên pêşiya jiyanê radike û herikandina jiyanê leztir dike. Em dibêjin, di sedsala 19’emîn de şoreşa pîşesaziyê çêbûye; lê ji milê teknîk ve şoreşa esasî di wê serdemê de çêdibe.

Vê yekê mirov dikare weke di jiyanê de israrê pênase bike. Çar serdemên qaşeyê ji serê wan re diborin, li hemberî vê ber xwe didin û jiyanê didomînin. Em jî encama hewildan û berxwedaniya wê demê ne. Ger berxwedaniya wê demê tune ba, ne jiyan, ne civakbûn, ne jî tiştên dîtir ku îro hene çêdibûn. Mesela tevn û destar, di bingeha jiyanê de pir girîng in. Gelek tiştên ku niha pêş ketine, li ser wî hîmî pêş ketine.

Me got, mirov xwediyê mejiyekî nerm e. Ew yek dihêle ku mirov afirandinên nû çêbike û di navbera xwe û xwezayê de hevsengiyeke çêbike. Em vê yekê weke Şoreşa Neolîtîkê dinirxînin. Weke şoreşa çandinî û cotkariyê jî tê pênasekirin.

Rista jinê di vê derê de esas e. Em şoreşa ewil ya mirovahiyê, weke berhemeke jinê dikarin binirxînin. Em îro çanda gundiniyê mezî bikin jî, bingeha teknîka ku di bajaran de pêş dikeve binêrin jî, heman tişt heye. Ger em wan afirandinên jinê ji bin bikşînin, li holê tiştek namîne. Zanist û teknolojiyên heyî jî, xwe li ser wê vesaz dikin.

Bz 6-4 hezaran jî em weke çanda Til Xelef pênase dikin. Di dîroka mirovahiyê de, serdema herî bi berhem ku di dîtinan de gihêştina lûtkeyê çêbûye ye. Tevî dîtinên teknolojîk yên îro em vê pênaseyê dikin. Mirov dikare Serdema Til Xelef, weke serdema sazîbûna neolîtîkê jî pênase bike. Ew kombûyinên ku di nava civakê de çêbûne, ji bo pêşerojê sazîbûneke çêdikin. Herikîna jiyan û dîrokê lezbûneke qezenç dike.

Em pêvajoya neolîtîkê, weke serdema xwedawendiyê jî bi nav dikin. Xwedawendî weke çandeke di nava civakê de xwe dide rûnişkandin. Dane û tabletên ku ji wê serdemê mane hene. Em van şîrove dikin. Lewma dîrok hinekî jî şîrove ye. Em tenê li ser esasê daneyan jî tevnagerin, şîrove jî girîng e. Ji hemû afirînerî û nirxên ku di vê serdemê de pêşketine re, pergala civakî ya wê demê re xwedawendî tê gotin. Me berê xwedawendî, weke jineke por dirêj, qralîçeyeke xeyal dikir. Lê ne wisa ye. Xwedawendî taybetmendiya jinên pêşeng ku di nava civakê de rista xwe dîlîzin e.

Mesela hinek peykerên wê demê hene; ji wan pêykeran tu fêm dikê ku şîr dayina zarokê xwe ya jinê pîroz tê dîtin. Lewma ji bedena xwe tiştekî diafrîne û jiyanê didomîne. Mesela peykerek heye, weke ku 20 pesîrên wê jinê hebin çêkirine. Lê di jineke de 20 pesîr tune ne. Xwestine ew berhemdariya jinê zêde bibe, ji ber wê wisa xeyal kirine û bi zimanê sîmgesel bi wî peykerî îfade kirine. Dema ku mirov şîrove dike, pesîra jinê gidayê ewil yê jiyanê dide; ji ber wê pesîrên wê çiqasî zêde bin, berhemdarî û nirxên civakê jî ew qesî zêde dibin. Tiştê pîroz ew e.

Ew yek parçeyekî xwedawendiyê ye. Çawa ku em dibêjin xwedawand, diafrîne, diparêze, dide jiyîn ûhwd; di vê derê de jî bi şîrê xwe jin dide jiyîn. Ew hemû nirxên ku li derdora jinê pêş dikevin, dihêlin ku civak xwe ava bike, bide jiyîn, biparêze û debara xwe bike. Ji bo wê dema ku

em xwedawendiyê digirin dest, divê em tenê jineke ku li derdora xwe tebayek komkiriye nefikirin. Jina ku herî zêde di nava civakê de ked dide, jiyanê ava dike, berheman diafrîne, civaka xwe nas dike, pêşeroja xwe difikire û tevdîran digre, xwedewend e.

## Şerê çanda xwedawendî û xwedatiyê

Derketina çanda xwedayetî jî, dijberî vê şoreşê pêş dikeve. Ji ber vê yekê derketina hiyerarşî weke dij-şoreşî tê pênasekirin. Ew dem jî bi Sûmeran re destpê dike. Em vî pêvajoyî jî zêdetir di mîtolojiyan de dibînin, tabletên wê demê hene.  Dibe ku me îro xebateke berfireh a arkeolojiyê pêş nexistiye, lê arkeolojî pir girîng e. Berê dîrok bi Yewnanan didan destpêkirin, nêzikatiya Oryantalîst hemû dîrok ji serdema felsefe ya Yewnanan didan despêkirin. Lê lêkolînên arkeolojîk hemû pênase û angaştên wan ser û bin kirin. risteke mezin a arkeolojiyê di rûxandina zîhniyeta deshilatdariyê de jî çêbû.

Îcar dema ku lêkolînên Sûmerolîg çêbûn, her tişt bi Sûmeran dan destpêkirin û dîsa deshilatdariyê ve girêdan. Lê em dizanin ku hemû nirx û afirîneriyên ku di Sûmeran de hebûn, beriya wê jî hebûn. Jixweber çênebû. Li ser bingeh û çandeke vesazbûna xwe çêkir. Di çavkaniya mîtolojiya Sûmeran de jî xwedawendî heye. Ew jî çanda xweda li ser wê pêş dixin. Di mîtolojiya Sûmeran de An, xwedayê ezman e; Enlîl, xwedayê hawa ye; Enkî, xwedayê qûrnaz e; Nînhûrsag, xwedawenda çiya ye.

Beriya Nînhûrsag, li Mezepotamya Jorîn, Star heye. Di bingeha çanda Nînhûrsag de Star heye. Star, hê jî bi awayekî devkî li ser zimanê dayikên me ye. Bi tesîra pergala deshilatdarî di mejiyê me de gelek tişt parçe bûne, lê hinek tiştên ku ziman dibin, tu dibînê ku bingeheke wî xurt heye.

Piştî Nîrhûrsag jî, pêvajoyê Înana heye. Di navbera Înana û Enkî de pevçûnek heye. Di tabletan de jî 104 M, weke nirxên jinê derbas dibin. Enkî, dixwaze van nirxên jinê bidize. Înana jî dixwaze cardin van nirxan ji Enkî bistîne.

Di pêvajoyê Sûmeran de, tundî, şer, hiyeraşî, deshiltadarî pêş ketiye. Lê divê em bîr nekin ku di vî pêvajoyî de hê jî jin xwedawend e û hê jî parastina xwe dike. Di navbera jin û zilam de hê jî dengeyek heye. Jin dikare şer bike, wêrekiya nirxên xwe dîsa stendinê nîşan dide. Hê jî şikandin tune ye. Lê pevçûna di navbera xweda û xwedawendan de di dema Sûmeran de destpê dike. Jixwe di wê demê de xwedawendî li erdê ye û di nava jiyan û civakê de ye; lê xweda derxistine ezman. Çanda xweda, di dîrokê de înşakirineke mezin a zîhniyetê ye.

Ji bo Sûmeran mirov dikare mînaka Gilgameş jî bide, di wê derê de daneyên deshilatdariya zilam heye. Dema ku em destana Gilgameş dixwînin, mirov dibîne ku Enkîdu bi rêka jinê tê xistin. Lê li gorî şîroveya min, Enkîdu bi destê jinê naye xistin, li ser Enkîdu bi xwe êrîşeke

zilamperestiye heye. Divê mirov vê destanê bixwîne û şîrove bike. Gilgameş jî, yekî pir mezin e. Jixwe weke pêyv tê wateya gayê mezin. Dibêjin, Gilgameş yek rûniştinê de nizanin çend fiçi vexwarin û çend pezan bi hev re dixwe. Di vê derê de çavbirçîbûnek jî heye. Nirxên ku hatine avakirin, xwarin û tunekirin heye. Ew ne taybetmendiyên mirovên xwezayî ne. Mesela ji bo ti xwedawendan pênaseyên bi vî rengî tune ne. Em dikarin vê şîrove bikin, çima? Ev yek modeleke zilam a dema pêş ava dike.

Her wiha Gilgameş, giyayê nemirînê digere û dixwaze xwe nemir bike. Pişt re weke pergal xwe nemir dikin. Hemû taybetmendiyên Gilgameş, çort in. Zilamekî xwezayî van taybetmendiyan ji bo xwe qebûl nake. Dema ku civakê berê tiştekî biçûk jî girtibin dest û weke remz nîşan dabin; divê em di wê derê de felsefeyeke pir mezin bibînin. Dibe ku weke îro rûneniştibin û pevbestin (kurgu) nekiribin. Lê xeyalên wan yên çêkirinê û înşayê hebûn. Nêzikatiyeke zîhnî hebû.

Mesela di cihekî destanê de, Gilgameş beriya ku Enkîdu bibîne xevn dibîne û diçe dayika xwe re xevna xwe dibêje. Dibêje, "*min di xevna xwe de zilamek dît, weke jinikeke di bin min de bû.*" Dayika wî jî dibêje, "*dê ew ê bibe hevalê te.*" Di pirtûkê de dîpnot danîne û dibêje, ew ne têkiliyeke hevzayendî-neremokî ya weke îro ye. Ango di dîrokê de zilam bi zilam xistinê heye, zilam tenê bi destê jinê nehatiye xistin. Niha dijmin jî, li ser zarokên

me heman rêbazê pêş dixe. Ew rêbazeke deshilatdariyê ya xistinê ye. Mînakeke vê jî, weke me got, em di destana Gilgameş de dibînin.

Mînakeke din jî, piştî ku Enkîdû tê xistin, li gel Gilgameş dibe heval. Dema ku Enkîdû, ji civaka xwe qut dibe û diçe gel Gilgameş, guhertinê jiyan dike. Mesela dibêje, piştî ku Enkîdu li gel Gilgameş bû heval, sewal ji ber wî direvîn. Beriya ku Enkîdu dikeve, Enkîdu û xezal li ser heman avê keleka hev avê vedixwin. Ango qesî ku deshilatdarî zilam ji civakê qut dike, ji xwezayê jî qut dike. Weke wane, qesî ku em dikevin nava pergala deshilatdariyê, em ew qesî ji xwezayê dûr dikevin. Em niha li çiyan jiyan dikin, li gorî bajaran em pir pêş de ne; lê me jî bi xwezayê re yekbûyinek çênekiriye. Di navbera me û xwezayê de mesafeyek heye. Em navê gîha û sewalan nizanin, em wan nas nakin. Em diçin ser aveke, çivîk hemû ji ber me direvin. Dîroka deshilatdariyê jî ji me re jiyan dike. Divê em tiştekî wisa bikin ku sewal ji me nerevin. Em qala sewalên hatine kedîkirin nakin.

Di vê mijarê de Serokatî rexnedayina kesê ku ber bi bajêr ve direve, da. Em dikarin xwe wisa binirxînin; qesî ku em ber bi bajarbûnê ve direvin, em di wê astê de Enkîdû ne. Bi vî awayî êrîşên deshilatdariyê li ser me jî hene. Divê em van destanan weke ku ji me dûr e, tiştekî berê qewimî ye û derbas bûye, negirin dest. Ger em dibêjin, dîrok zindî ye, divê em bi vî awayî lêhûrbûna xwe bikin.

Ya dîtir jî, bajarê Enkî  Erîdu ye; bajarê Înana jî Uruk e. Uruk mînaka bajarê destpêke ye. Dema ku em di nava Şaristaniya Demokratîk de dinirxînin, em ji bajaran re nabêjin na. Em bajarên ku gundan dadûqûrtîne re dibêjin, na. Em bajarbûna ku di nava xwe de dewletbûyinê pêş dixe, red dikin. An na bi şêwaza xwedawendiyê jî em dikarin bajarbûnê ava bikin.

Gerdûn bi xwe me ye. Di wê de potansiyela afirandin û velidandina her tiştekî heye. Velidandin, ne taybetmendiyeke wê ye, ew bi xwe ye. Ji ber ev mêtiya gerdûnê, em dikarin gerdûnê bişibînin jinê. Xweza, ax, av, agir û hewa; hemû element û tiştên di xwezayê de hene mê ne. Ji ber ku her yeke wan tiştekî nû diafrîne û ew afirandina xwe her berdewam dike mê ne. Ji ber ku gerdûn mê ye, di her şert û mercî de di nava xwe de guhertineke û domdariyeke dijî. Zilamê ku zayendeke mirov e jî, ji ber ku aliyê xwe yê jin nabîne û bi ew aliyê xwe ve hev nake, nikare vegere cewhera xwe û her pirsgireka azadbûnê jiyan dike.

Weke ku tê gotin, da ku her hebûneke di gerdûnê de ji tinebûnê ava bibe, divê tinebûn jî mê be. Ew tinebûna ku behs tê kirin, dema potansiyela avabûnê ye. Ji ber vê yekê tê gotin, dema ku teqîna mezin (bîg bang) çêdibe, ev potansiyela di nava xaleke biçûk de her tiştî diafrîne. Ev yek jî raber dike ku gerdûn mê ye. Ev mêtiya gerdûnê di asteke ku hemû kaînatê biafrîne de bi hebûnê ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê her hebûneke ku dikeve nava lêgerîne

xwe nasînê, divê di destpêkê de ev qarektera xwe ya mêtiyê bibîne. Yên ku avabûna xwe, di nava jiyana xwe de afirandinên çalakî, jiyan û wateyên xwe nizanibin, xwe jî nas nakin.

Bi zanebûna xwe ya zarokî jî, em vê mêtiyê û rista wê ya afirandin û velidandinê dizanin. Lê tevî vê jî pirtûkên olî diyar dikin ku di destpêkê de zilam hatiye afirandin. Pir balkeş e! Ji ber vê yekê dema ku em vê yekê dibihîzin, hema em pirseke zarokî dikin; dayika ew zilamê ewil kî bû? Di vê balkeşbûnê de tiştê herî ne xweş jî, tevî hemû nakokî û balkeşiya xwe ew teorî, di hemû dîroka nivîskî de û ji aliyê hemû pergalan ve  rast hatiye dîtin û li ser mirovahiyê hatiye ferzkirin.

Dema ku em ji roja me binêrin, pir zehmet e ku em bikaribin bibêjin, "*di demeke dîrokê de xwedawend hebûn*." Lê dema ku bi awayekî aqilane û bi wate em li jiyana xwe ku ji velîdînê û heya roja me tê binêrin, em ê têbigihêjin ku her tişt li derdora dayikê ava bûye û şêwe girtiye. Tiştê ku mirovan cara ewil kişf kiriye û pîroz dîtiye, qarektera velidandin û afirandiyê yê jinê ye. Ji ber ku ew qarektera xwezayê di jinê de jî hatiye dîtin, pîroz hatiye dîtin. Ax nebatên bêhejmar divelidîne û bi ev velidandina xwe jiyên didomîne. Hewa bi baranê, axê nerm dike û axê ji velidandinê re amade dike. Her wiha jin divelidîne û bi velidandina xwe jiyanê gengaz û domdar dike.

Şikestina yekemîn a zayendî ku li dijberî jinê hatiye pêşxistin jî, di serdemeke ku velidandina jinê ji pîrozbûnê hatiye derxistin û weke lewaztî hatiye dîtin e. Ev serdema şikestinê ku bi Sûmeran destpê kiriye û bi şerê Tîamat û Mardûk timam bûye, serdema ku xwedawendiya jinê ji dest tê girtin e. Ji ber vê piştî şikestinay yekemîn, serdema xwedayên zilam ku bê ked û metîngeh in destpê dike û bi hemû zilma xwe li ser serê mirovahiyê dibe bela.

Ger mirov jî, weke gerdûneke biçûk tê dîtin ev bi xêra jinê ye. Taybetmendiya sereke ya gerdûnê pir-rengî û xwe zêdekirina wê ye. Her wiha jin jî li gel xwe zêdetkirinê, di qarektera xwe de pir-rengiyê dihewîne. Ev yek ji aliyê zilam ve weke lewaziya jinê hatiye dîtin. Taybetmendiyeke sereke ya deshilatdariyê jî, lewaztiya di xwe de vegerandina hêz e. Ji bo vê jî rêbaze sereke ya li hemberî xwe bêhêz dîtin e. Bi vî rengî taybetmendiya hîmî ya hebûnê, ber bi tunebûnê ve diçe. Her wiha taybetmendiyên ontolojîk yên jinê, weke çekeke li dijberî jinê tên karanîn. Piştî wê jî bi çîrokên sexte yên Adem ûhwd tê dagirtin. Çîrokên sewalên jehrî, çîrokên maran, têkilaya jinê bi van ve, fekiyên qedexe û jehrî û pîrozkirina têkiliya zayendî… Her wiha li gel ev dîroka sexte û hatiya avakirin; mirovahiya hatiye avakirin û zîhniyetên ku di bin tahakûmê de ne pêş dikevin.

Ji ber ev çîrokên Ademî, dîsa pirsên zarokî tên bîra mirov; ger di destpêkê de Adem hatibe afiradin û ji Hawa jî ji parsoyên wî velidîbe, ew xwedayê ku di destpêkê de zilam ava kiriye, çima hemû taybetmendiyên velidandinê nedan zilam û dane jinê? Ger Adem, Hawa velidandibe, hê ku dest bi kar kiriye çima hemû mirov nevelidandine? Ger Adem Hawa velidandibe, çima hemû bav dayikan navelidînin? Çima cihê vê her bavek, ji dayikeke velide? Çima xwedayê ku her tiştî diafrîne, neçare ku ji aliyê dayikeke ve were velidandin?

Hebûna ku weke zilamtiyê tê pênasekirin, wê çawa ji paradoksê rizgar bibe?

Weke mêtiya wê, taybetmendiya welidandinê ya jinê jî ontolojîk e. Da ku zilamek bikaribe hebe, divê jinek wî velidîne. Ger jin hebe, her tiştek dikare bê afirandin.

Ger em dîsa vegerin ser xwedawendiyê, cihê xwedawendên kedkar, xwedayên metîngeh girtiye. Bi demê re ne tenê xwedayan, mirovên ku xwe weke siya xwedayan ya li ser erdê dibînin jî pergaleke metîngehî û dagirkeriyê ku qet ked nadin ava kirine. Her wiha ol û mîtolojiyên pîroz ku dibêjin, “da ku karên xwedayan pêk bînin mirov hatine afirandin” jî ne kêm in. Ew mînak jî raber dike ku xweda çiqasî bê ked in. Navê van xwedayan bi demê re guherî ye; bûne qral, bûrjûva, ezbenî… Ev nasnameya wan a hevpar, forma deshilatdariyê ava dike.

Xwedawendî çi ye, Xwedawend kî ye?

Dema ku em dibêjin xwedawend, tevî ku hezaran salin mîtolojiyên bi vî rengî pêş ketine ger şibandinên xwedayên îro nayen bîra me, ji ber nerûxîna heqîqeta xwedawendiyê ye. Di destpêkê de ked, wateyên ku li ser esasê çanda dayiktiyê pêş ketine tên bîra mirov. Ferqa di navberê xweda û xwedawendan de ne li ser esasê mertî û mêtiyê ye. Ango forma mê ya xweda, ne xwedawendî ye. Xwedawend ne hebûneke wisa ye ku li jorê disekine û jiyanê diafrîne, ciza dike, dişopîne, ji bo wê kar tê kirin û di oxira wê de berdel-qûrban tên dayin e. Xwedawend di nava jiyanê de jiyanê diafrîne. Bi keda xwe hûr û kûr jiyanê dihone, çêdike, divelidîne; hebûna ku velidandiye xwedî û mezin dike, jiyanê fêrî wan dike û di hemû kêlî û qadên jiyên de wateyê diafrîne. Ji ber ku di dema neolîtîkê de xwedawendî bi hemû taybetmendiyên jina wê demê ve dibe yek, em fêm dikin ku xwedawendî çandeke kolektîf û civakî ye. Di şexsê kesan de jî carna xwedawendî tê pênasekirin, lê ew yek zêdetir di dema mîtolojiya derbasbûna serdema hiyerarşiyê de çêbûye.

Jin û xwedawendî rûxmî ku ji aliyê hemû form û pergalên deshilatdariyê ve hatibe lanetkirin jî, li ser zimanê jinan heya roja me kariye hebûna xwe biparêze. Hem di dîrokê de, hem jî di roja me de gelek mînakên vê hene. Tevî tiştên ku anîne serê Îştarê, îro peyva "**Ya Star**" li ser zimanê jinan e. Ev mînaka me ya herî diyarker û jiyanî ye. Her wiha Lîlît'a ku hatiye lanetkirin, di mejî û gotinên jinan de her jiyan dike. Dema ku dayik ji bo

zarokên xwe dilorînin, peyvên weke “lî-lî, lu-lu” tînin ziman. Weke ku di navbera Lîlît û zarokên nû çêbûyî de têkiliyeke taybet heye. Ken û bişirîne van zarokan her kes dizane, di hinek civakan de dibêjin meleke wan dikenînin. Di hinek civakan de jî dibêjin ku Lîlît wan zarokan dikenîne û ji bo vê hêdîka pozê wê zarokê dixin, da ku Lîlîtê biqewrînin. Lîlît’ê tirseke wisa xistiye dilê mejiyê pergala deshilatdar ya zilam ku hê jî jê ditirsin.

Ji qirkirina dîrokê, hêrî kêm qesî mirovan sewalan jî para xwe girtiye. Ez qala êrîşên li ser xwezayê nakim. Gûftogoyên pergala deshilatdar yên li ser sewalan, li dijî yên serdema xwedawendiyê ne. Mînak, mar sewalê ku herî zêde ji aliyê vê pergalê ve rastî êrîşê tê ye. Tevî ku di qada tendûristiyê de tê karanîn û weke remzeke saziyên tendûristiyê tê dîtin jî, ji mar pir tê tirsîn û weke nîşaneya sarbûn, xirabî û xofiyê tê dest girtin. Divê li ser esasa çanda xwedawendiyê, ji nû ve were gûftogokirin. Zanyarî, bi sezgiyên xwe tevgerîn û belavkirina şîfayê û xwe nûkirina mar, mijarên ku tên zanîn in. Lê dervayî vê jî hin taybetmendiyên mar ku di jiyana me de tên dîtin û di mejiyê me de cih bûne hene. Mesela hê jî weke parazvanên zarokan tên zanîn. Her wiha zanebûna her mirovekî, marek diparêze di binmejiyê me de heye. Mesela ger yek tiştekî li hemberî me bixwe û nede me, em dibêjin dê marê min nalê ku êvarî tu birazê. Tevahî ku di derheqê mar de gelek nêzikatiyên neyînî hene, ger marekî ku her me diparêze hebe, ji hêza çanda xwedawendiyê tê.

Dîsa li Kurdistanê her malekê marek heye, her kaniyekê marekî wê heye; ev jî nîşan dide ku weke xwedawendeke parastinê tê dîtin. Her wiha Êzîdîtiya ku çanda kevnar ya gelê Kurd e, di deriyê hemû cihên xwe yên pîroz de remza mar datînin. Ew jî di asteke herî jor de pîrozkirina mar e.

Tevî ku xwedawend keda ku jiyanê ava dike derdixîne holê, keda xwe civakî jî dike û berhema ku derketiye holê li hemû civakê belav dike. Her wiha di semaha ku weke îbadeteke heya roja me hatiye de jî, komkirin û belavkirin derdikeve pêş. Di semahê de hema tevger di nava diyalektîkeke jiyanî û herikbariyeke de çêdibin, her tevgerek xwediyê wateyeke ye û di nava coşeke mezin de tên dubarekirin. Dema ku mirov bi awayekî baş bala xwe bidê, mirov girêdanbûna wê bi çanda xwedawendiyê ve dibîne. Her wiha di semahê de amûrên mûzîrê tên karanîn, bawerim ew jî şêwazeke jinê ye. Dervayî jinê di ti olên de bi mûzîkê îbadetkirin tune ye. Olên ku di bin serweriya zilam de pêşketine, statîk û bêdeng dibin. Her wiha hinek ol, amûrên mûzîkê qedexe dikin. Ji ber vê yekê bi tembûrê semahkirinê jî, em zêdetir nêzikî çanda jinê, xwedawendiyê dibînin.

Em di jiyana xwe de, tiştên ku ji aliyê çandî hatine fêrkirin pir zêde lêpirsîn nakin. Weke me di mînakan de jî got, em hinek tiştan fêr dibin û dijîn. Ger em bi kûranî van çandan lêkolîn bikin û gûftogo bikin, em ê ev çanda xwedawendiyê ku di nava jiyana me de zindî ye bibînin.

Zilamtî, li ser esasê tûndiyê di forma deshilatdariyê de xwe çiqasî rêxistin dike bila bike, ji ber ku heyvana jiyanê ye çanda xwedawendiyê ti caran tune nabe. Hemû hebûnan, ji vî heyvanî parçeyek girtine. Her mirovek ji çanda jinê û baweriya xwedawendiyê parçeyek girtiye. An jî her kesekî/ê ji qarektera mê ya gerdûnê tiştek girtiye. Ji ber vê yekê jî da ku em bikaribin azad jiyan bikin, divê em çi çawa jiyan dikin bizanibin û bi wate bijîn. Ger em li ser esasê ku di hemû beşên jiyana me de tesîrên xwedawendiyê hene tevbigerin, dê jiyanê watedar bike.

Pênaseya sêbendî ku Rêber Apo weke xwedawendî, melektî û afrodîtiyê aniye ziman îro jî ji bo hemû jinan girîngiya xwe diparêze. Li gel vê yekê tespîtên mîtolojiyê ku derketine holê, divê li civaknasiyên roja me werin zêdekirin û bigihêjin wateye civakî. Her çiqasî her yek bi serê xwe xwedî wateyeke bin û taybetmendiyên wan yên cuda hebin, hersê bi hev re ji aliyê pêşengtî, vîn, rêvebirina jinê ve giştîbûn û afirandina jiyanê ya jinê îfade dikin.

Ji civakbûna jina azad re pêşengtî kirin, pêşxistina vîna azad di xwedawendiyê de îfadeya xwe dibîne. Xwedawendî, xwe gihandina hêza giştîbûn û pêşengtiya civakê ye. Jina ku weke gerdûneke biçûk tê pênasekirin, bi xwedawendiyê gerdûnî dibe. Di qarektera xwe de nirxên gerdûnî yên mirovahiyê avakirin û derxistina pêş e. Armanca sereke ya xwedawendiyê, cudabûnên etnîsîte,

fikir û baweriyê dîtin e. Divê were zanîn ku ev pir-rengî li gorî armanca azadiyê ya gerdûnê ne. Her wiha em dikarin bibêjin, zîndikirina çanda jinê ye.

Rêgeza exleqî ku bi xwe rêxistinkirina civakê re derdikeve holê jî, di asta herî jor de di melektiyê de şênber dibe. Jina ku di jiyanê de fêrbûyina ve esas digre melîket e. Li ser vê esasê pêwîst dike ku hêza wate û zîhniyetê derkeve holê. Her wiha divê rastiya exleq ji polîtakayê qût nabe ve bibe yek. Melektî, zanebûn û jiyanîkirina fêrkirina exleq û rêgezên civakî ye. Li ser esasê rêgeza etîk ku di hîmê jiyanê de şênber dibe ye, di vê wateyê de rêgeza rastiyê ye.

Afrodîtbûyin jî, lûtkeya afirîneriya jinê, civakbûna ku bi zanebûna polîtîk a jinê tê stirîn; afirandina xweşikbûna gotin, îfade û çalakiyê ye. Di Afrodîtiyê de derdikeve holê ku bi jinê jiyan çêker, estetîk û bi wate ye. Pergala vê jiyanê avakirin Afrodîtbûyin e. Afrodîtbûyin, redkirina forma ku li ser jinê tê ferzkirin e. Afrodîtbûyin, rastiya ku dibêje Modernîteya Kapîtalîst jinê parçe dike û dike amûr û bireser e. Jiyan bi jinê gihandina asteke çêker, estetîk, bi wate ye. Afirandina hezkirina jiyanê ye. Weke ku kapîtalîzm pênase dike, ji rê derxistin û tehrîk-kirinek e. Dijberî wê, bedenê xwe kirina amûr a jinan red dike. Her wiha bi zanebûna exleq û polîtîka azadî ye, bi pergal dibe.

Fêmkirina sêbendiya xwedawendî, melektî û Afrodîtbûyinê ku Rêber Apo pênase dike; xwe ji jintiya ku ji mûdaxaleyên kevneşop û deshilat yên zilam re vekirî ye, jina qlasîk ku nikare bibe vîn qutkirin e. Rê û rêbaza hîmî ya xwe gihandina nasnameya jina azad e. Girêdanbûna herî bi wate ku di navbera dîrok, roja me û pêşerojê de tê çêkirin e.

Îro em ji her demekê zêdetir pêwîstî bi xwedawendan û çanda xwedawendan dibînin. Em di hundirê demeke ku deshilatdariya zilam her tiştî xilas kiriye, hemû nirxên mirovahiyê berhewa kirine û pênaseya mirovahiyê bi tunebûnê ve rû bi rû maye de dijîn. Ev zilamtî, êdî xwe jî tune dike. Li dijî ev forma deshilatdariyê ku xwe bi xwe tune dike, mirov bi xwedawendiya ku ava dike û dide jiyandin dikare roj bi roj xwe biafrîne. Dê xwedawendiya serdema nû jî, jinên ku civakbûna xwe ya azad dikarin ava bikin bin. Ji vî alî ve civak, hemû jin û zilamên ku dixwazin çanda xwedawendiyê bijîn digere. Dê ev kes, ji aliyekî ve kesayeta xwe azad ava bikin, ji aliyê din ve jî civakbûna azad pêş bixin. Dê di her qadeke jiyanê de bikevin zanebûna mêtiya xwe û bi angaşteke velindandina hêza civakî tevbigerin. "*Tiştê esas di her qadeke civakî de velindandin û bûyina hêza afirandinê ye. Ji vî alî ve qarekterê jinê dayina civakê ye. Civakên hov ku bi rûpoşa zilam şêwe girtine, mirovkirin û xweşik-kirin e.*"

## Şikestina yekemîn a zayendî

Piştî Sûmeran, mîtolojiya Babîlan heye. Babîl, weke mala xwedayan tê pênasekirin. Di Sûmeran de girîngiya avê pir zêde ye. Jixwe di wê demê de çandiniya avî pir pêş ketiye û cokên mezin çêdikin. Her wiha di pêvajoyê Sûmeran de xwedanwendî jî hê heye. Ew di pêvajoya Babîlan de jî îfadeya xwe dibîne. Mîtolojiya Babîlan jî, di bin navê "*Enîma Elîş*" de hatiye nivîsandin. Bz di navbera 3-2 hezaran de tê dest girtin. Di destana Babîlan de, Tîamat û kûrê wê Mardûk heye. Heya wê demê şerê ku di navbera xweda û xwedawendan de pêş dikeve, xwedawend têk naçe. Hemû xweda danehevên xwe ji Mardûk re dibêjin, Mardûk jî darbeya dawî li Tîamat dixwîne. Bi aweyekî sîmgesel, Tîamat darbeyeke mezin dixwe.

Piştî pêvajoya Sûmeran, darbeya ku Tîamat dixwe; ew darbe Sûmer û Babîlan jî ji hev cuda dike. Mardûk, bi wê darbeyê li ser laşê Tîamat erd, daristan, ezman, av ûhwd ava dike. Ew bûye çandeke deshilatdariyê. Mesela Hallac kûştine, her parçeyekî laşê wî avêtine cihekî. Parçekirin, li hemberî yekparebûyinê tunekirinek e. Divê em di her tiştî de yekparebûyinê bigerin. Parçekirin jî, hebûn parçekirin e. Hem weke kes, hem weke rêxistin bi vî rengî ye. Tîamatê jî parçe parçe dikin, da ku yekparebûyin çênebe. Mardûk, ji bo derketina olên yekxwedayî jî bingeheke ava dike. Nêrîna yekxweda ya zilam, bi Mardûk re derdikeve.

Bi darbeya ku Tîamat dixwe, çanda xwedawendiyê û jin darbeyeke dixwe. Em ji vê yekê re dibêjin Şikestina Çandî ya Yekemîn û Şikestina Yekemîn a Zayendî. Şikestina mezin ewilî çêbûye ew e. Bi mîtolojiya Grekan, ew çand tê timamkirin. Mîtolojiya Grekan jî, çanda dawî ya mîtolojiyê temsîl dike, piştî wê serdema mîtolojiyan xilas dibe. Mîtolojiya Misir û Hîndî ûhwd jî hene. Lê em yek bi yek venakin. Bi kurtasî Çanda Şikestinê ku bi Mardûk despê dike, bi Zeûs tê timamkirin.

Jixwe mîtolojiya Grekan, li derdora Zeûs tê avakirin. Mardûk darbeyê li Tîamat dide, lê mirina Tîamat jî gelek tiştan diafrîne. Lê Zeûs bi xwe zarokan çêdike. Hemû qûrnazî, entrîka, dek û dolap di Zeûs de hene. Zeûs jinan dixapîne; yekê dixwe, yekê dixapîne. Jina Zeûs jî Hera ye. Lê Zeûs bi xwe, Atenayê tîne dûnê. Ya rast taybetmendiya afirandinê ya jinê, di şexsê Zeûs de tê dizîn. Atena jî dema ku tê dûnê, li gel mertal û cilên xwe yên zirxî tê dûnê. Ango jineke ku xwediyê taybetmendiyên zilam e tê dûnê. Ango jina ku zilam dixwaze, tê dûnê. Niha jî jina ku zilam dixwaze, divê li gorî zilam biaxife, li gorî zilam rabe û rûne, li gorî zilam tevger bike heye. Bingeha xwe ji wê derê digire.

Ji ber ku Zeûs dixwaze taybetmendiya zayin-afirîneriyê ji destê jinê bidize, mirov fêm dike ku hê jî berxwedaniya xwedawendan heye. Di Hera de, xwedawendiya Înana û Tîamat naye pênasekirin, lê di

mîtolojiya wan de jî berxwedana jinê heye. Her wiha berxwedaniya Prometheûs heye. Zilam jî ber xwe dide. Ango çanda berxwedanê heye. Mesela Prometheûs, ji birayê xwe re dibêje, *“ji destê xwedayan tiştekî negire û nexwe, heram e. Ji xwedayên zalim diyariyan negire.*” Ango çandeke berxwedanê li derdora jinê heye, lê darbeyeke mezin jî jinê xwariye.

Di encama Şikestina Zayendî ya Yekemîn de li ser civakê gelek tesîr çêdibin. Jin ji xwedawendiyê tê xistin. Jin ji panteona-meclîsa xwedayan tê avêtin. Di civakê de reng û dengê jinê, tê qutkirin. Ber bi yekrengiyê ve çûyin destpê dike. Berê reng û cudahiyên cur bi cur hene, lê êdî divê her kes li gorî Mardûk be. Êdî dixwazin civakeke yek-rengî ava bikin. Ew taybetmendî û hewildan, her yek li hemberî civakê êrîşek e. Ji ber ku em dixwazin vê êrîşê li ser civakê rakin, em dibêjin Konfedaralîzma Demokratîk yek-rengiyê qebûl nake.

Dîsa dema ku êrîşek li ser civakê çêdibe û civak nikare xwe îfade bike, di nava civakê de afirînerî kêm dibe. Pûçbûyinek çêdibe. Mesela îro pergala deshilatdar hemû zarokan komî dibistaneke dike, yek-rengî wan perwerde dike, ji ber ku zarok nikarin tiştekî din jî bifikirin, afirînerî çênabe. Mesela ew şoreşa afirîneriyê ku di neolîtîkê de pêş ketiye, êdî xilas dibe. Ango ew serdem dibe serdema rawestîna mirovahiyê. Mirovahî li cihekî diqelibe û disekine. Ew tişt di salek û du salan de çênabin, jixwe 2

hezar sal pêvajoyê pevçûnan a Sûmeran destpê dike. Bi guhertina çand, ziman û fikir, pêvajoyekî din dide destpêkirin.

Piştî vê demê, çanda şer û deshilatdariyê destpê dike. Ango çanda şer û deshilatdariyê, bi Şikestina Yekemîn destpê dike. Dîsa fikrê talankirin û ganîmetê, dixwazin weke çand di nava civakê de bidin rûnişkandin. Mesela Gilgameş, bi alîkariya Enkîdû, darên sedîrê hemûyan qut dike û daristanê talan dike. Ew jî encameke wî pêvajoyî ye. Rista jinê, êdî di civakê de kêm dibe. Ji ber ku nirxên jinê di xwedawendiyê de hatibûn komkirin û vegeriyabû çandeke, bi wate bû. Lê êdî xwedawendî jî, ji rastiya jiyanê tê dûrxistin. Êdî deshilatdariya zilam, di nava civakê de destpê dike. Em îro vê çandê weke baviksalarî pênase dikin.

## Şikestina duyemîn a zayendî

Şikestina duyemîn jî, bi pêvajoyê olên yekxwedayî ve girêdayî ye. Ew şikestin ji olên Îbrahîmî destpê dike, di Îslamiyetê de weke lûtkeyeke jiyan dike û heya îro jî tê.

Ferqek di navbera herdu şikestinan de heye. Di şikestina yekemîn de jin, ji xwedawendiyê tê dûr xistin. Lê di şikestina duyemîn de jin ji mirovbûnê tê dûr xistin. Di olan de jin êdî weke mirov jî naye dîtin. Mesela du jin, weke yek mirovî tên pênasekirin. Her wiha dê jin çawa biaxife, kîjan cil û bergan xwe bike hemû tên diyarkirin.

Dev ji mirovbûyinê jî berde, jin êdî weke hebûneke vê gerdûnê jî naye dîtin. Tesîreke pir ne baş ya şikestina duyemîn li ser civakê heye. Şikestina yekemîn û duyemîn, di heman demê de şikestineke çandî di civakê de çêdikin. Ji milê herdu zayendan ve jî şikestinê çêdike.

Di encama ew şikestina duyemîn ya zayendî de, jin ji rastiya xwe dûr dikeve, ji zayenda xwe dûr dikeve, ji hezkirina zayenda xwe, mirovbûna xwe dûr dikeve. Bi kûrtasî xwebûna xwe dûr dikeve. Jin parçe parçe dibe. Jin weke bireser tê dîtin, zilam dikare li ser jinê hemû kiryaran pêk bîne. Jin dibe milk. Kapîtalîzmê jî şikestina yekemîn û duyemîn ji xwe re weke bingeh dîtiye û heya îro jî tesîra van şikestinan heye. Mirov li gorî van ol û zîhniyeta perwerde dibînin, mejiyê xwe li gorî wê ava dikin. Ji ber vê şikestineke çandî li ser civakê çêdibe. DAIŞ’a ku îro weke hovîtiyeke derketiye holê jî, AKP jî di encama van şikestinan e.

Dema ku olên yekxwedayî bi pergal dibin, encamên wisa derdixînin holê. Ne tenê ji ber ku DAIŞ û AKP dijminê me ye em wisa  pênase dikin. Mesela li ser civaka me jî tesîrê van şikestinan heye. Em tenê nabêjin, ji ber ku ol temsîl nakin AKP û DAIŞ ne baş in. Olên yekxwedayî, çandeke ava dikin, ew çand jî xistina jinê û mirovahiyê bi xwe re pêş dixe. Divê em wisa bigrin dest.

Di hersê olên yekxwedayî de, tiştên ku mirov bi xwezayî jiyan dikin, qirêj nîşan didin. Mesela di encama têkiliya zayendî de zêdebûn çêdibe. Ew di hemû xweza û mirovahiyê de wisa ye. Lê di hemû olan de, zayendî qirêj tê dîtin. Di Xiristiyantiyê de rahîp û rahîbe hene, bi awayekî cuda xwe jê dûr digirin. Lê bi awayekî têkiliya zayendî tê jiyîn. Bi taybetî di Îslamê de têkiliya zayendî qirêj tê dîtin. Lê ji aliyekî ve jî tahrîk-kirin heye. Ji milekî pir zewacî û destdirêjî heye, ji aliyekî ve jî têkiliya zayendî qirêj tê dîtin. Ji ber ku hem tê qedexekirin, hem jî pir zêde jiyîna wê teşvîq dikin, mirov ji xwezaya xwe qut dibe.

Em dikarin yek bi yek jî vekin. Mesela di Tevrat'ê de dibêje, "*jin keça pêximber be jî, çavkaniya fîtne û fesadiyê ye.*" Meseleya bihûşt û dojehê jî di Sûmeran de derdikeve. Dîsa bi pênasekirineke cuda be jî, Adem û Hawa di Sûmeran de jî heye. Di Tevratê de jî ew tişt sazî dibin û tên nivîsandin. Meselaya Nuh, meseleya Adem ûhwd; mîtolojiyên beriya xwe digirin û weke çîrok dinivisînin. Bi çîrokan di nava endamên civakê de zîhniyeteke çêdikin. Çîroka bihûşt û dojehê jî bi vî rengî ye. Her wiha karê ku jinê re hatine diyarkirin, karê malê ûhwd hemû di Tevrat'ê de hene.

Ya dîtir jî, di Tevrat'ê de çavbirçîbûn weke tiştekî ku nebaş tê nivîsandin; lê bi riya tîcaretê heman tiştî pêk tînin. Hem di kesayeta Îbrahîm de, hem jî di kesayeta

Muhamed de heye. Ew jî bi xwe re çandeke ava dike. Mesela faîz qedexe ye, tu nikarê pereyekî bidê yekî û çend qatê wê jê bistînê. Lê weke berhem tu dikarê tiştekî bidê wî û pişt re nizanim çend qatê wê jê bigrê. Dikarê tiştekî bi pereyekî bistînê, lê sed qatî wê bifiroşê. Hinek pîvan jî jê re hatine diyarkirin, lê pêşî lêvekirin jî heye. Ew di mirov de çavbirçîbûnê pêş dixe. Her wiha pergala pirzewacî, pergaleke fûhûşê ye. Jinê weke bireser dibîne. Zîhniyeteke wisa di nava civakê de pêş dixin. Ew jî çavbirçîbûnek e.

Dîsa di Tevratê de, divê têkiliya zayendî, li ser esasê zarok çêkirinê be. Ew jî pîvaneke zilamperest e û jin weke makîneya zarokan dîtin e. Her wiha koçberbûyina wan û ji nava hin bûyeran re derbas bûna wan jî heye, dibe ku tesîra vê jî hebe. Lê di encamê de zîhniyeteke zilamperest, di hemû cihên Tevratê de heye.

Derketina Îsa, hinekî din cuda ye. Bi xwe serokê tarîqatekê ye. Lê yên ku Xiristantiyê sazî dikin, xwe ji Îsa qut dikin. Di Xiristiyantiyê de jî cihê jinê qet tune ye. Tenê weke keseke ku pêximber Îsa aniye dunê tê zanîn. Ango tenê navê wê heye, lê dengê wê tune ye. Dibêjin, “*xweda pûf kiriye, Meryem ducanî bûye û Îsa aniye dunê.*” Çawa Îsa aniye dunê, ew jî ne diyar e. Jin ew qesî bê nasname hiştine. Serokatî dibêje, “*Meryem, bermahiya xwedawendiyê ye.*”

Di Xiristiyantiyê de, Ezîzî û Ezîzetî heye. Mirov hewildanên bi wî rengî dikare baş jî binirxîne, lê zayendî qirêj tê dîtin, di tarîqatan de kiryarên cur bi cur li ser jinê pêş dixin. Mesela di bin navê pîrhevoktiyê de, şewitandina jinan di Xiristiyantiyê de tê pêş xistin. Dadgehên Engîzasyonê tên ava kirin, êrîşî hevjiyana azad ya wê demê dikin. Di navenda wê de jî jin heye. Xirîstiyantî, hêdî bi hêdî hemû tarîqatên dervayî xwe ji holê radike û di civakê de yek-rengiyê pêş dixe. Dihêle ku hemû rengên cuda yên di nava civakê de ji holê rabin.

Tesîra Îslamiyetê jî heval kêm zêde dizanin. Mesela di derketina Muhamed de, rista Xetîceyê heye. Lê pir naye ziman, bi awayekî şênber naye vekirin. Dîsa rewşa Ayşe û Fatma heye, lê ya esasî beriya Îslamiyetê di olên gelên Ereb jiyan dikin de tesîra jinê pir zêde ye. Weke pûtên sereke Lat, Menat û Uza pênase dikin. Ew pût weke xwedawend têne dîtin. Wisa risteke wan a mezin tune, lê weke bermahiyên xwedawendiyê ne. Serokatî jî dibêje, "*şaştiya esasî ya Îslamiyetê, qedexekirina wan olên beriya xwe ye.*" Lewma olên yekxwedayî, yek-rengiyê ava dikin. Ne ku civaka Ereb hemû dayiksalar bûn û li derdora jinê çandek ava kiribûn, lê nirxeke jinê û hevsengiyeke civakî hebû. Bi Îslamiyetê re ew jî ji holê tê rakirin. Dema ku Îslamiyet dibe olê deshilatdariyê, bi taybetî bi Xelîfetiyê di nava civakê de çandeke dijberî jinê tê avakirin.

Şikestina duyemîn de, çawa ku jin ji mirovbûnê qut dibe, ji qadên civakî jî tê dûrxistin. Mesela serê jinê girtin, derketina derva qedexe kirin, her cihê laşê jinê veşartin, hemû kiryarên olên yekxwedayî ne. Ji ber vê tesîrên ev şikestina duyemîn, li ser civaka me pir zêde ye û li ser me jî heye. Dibe ku ji aliyê şêweyî ve me xwe guhertibe, lê weke zîhniyet tesîra wê li ser me hemûyan heye. Mesele tenê ne Mislimanbûyin, rojî girtin û îbadet kirin e jî. Weke zîhniyet tesîrên şikestina duyemîn, li ser hemû Rojhilata Navîn hene. Şikestineke pir mezin di nava civakê de çêkiriye.

Hemû taybetmendiyên feodaliyê, bi tesîra Îslamiyetê di nava civaka me de hatine rûnişkandin. Êdî hinek tişt di me de dibin çand û em bi xwe re tînin nava hevalan jî. Mesela dema ku hevalên jin ewilî tevlî gerîla dibin, hinek serê xwe digirin. Demeke dirêj jî tesîra vê li ser hevalên jin hebû, heya pêvajoyê arteşbûyinê jî cih bi cih tesîrên wê dihatin dîtin. Divê em tesîrên van tiştan li ser xwe ji aliyê mejî ve bidahûrînin. Jixwe dahûrandina wan tiştan, dahûrandina zayendperestiyê ye. Zayendperestî, tesîrên şikestina yekemîn û duyemîn in. Tesîrên wan di me de çandeke pêş dixin, zîhniyeteke ava dikin. Nahêle ku em ji kolebûnê derkevin û xwe azad bikin. Ji bo hevalên jin mirov dikare wisa bibêje. Hevalên xort jî nikarin xwe ji tesîra wê deshilatdariyê û tesîra wê ya koletiyê derxînin. Tesîrên wê di xwe de dahûrandin, dahûrandina zayendperestiya civakî ye.

Jixwe zayend û zayendperestî ji hev cuda ye. Zayend, tiştekî xwezayî ye, di hemû hebûnên gerdûnî de heye. Lê li gorî zayendê şêwaz, liv û tevger, sekin û nêzikbûn ava kirin, nasname pêş xistin; zayendperestî ye. Jixwe bi zayendperestiyê zîhniyeteke hegemonîk ava dibe û dibe nêzikbûna deshilatdariyê. Mesela di civaka me de tesîreke pir mezin a zayendperestiyê heye. Em van tiştan jî weke çandeke digirin dest. Divê mirov di van mijaran de lêhûrbûn û nîqaşên xwe kûr bikin. Bi rastî em çiqasî ferqa tesîrên zayendperestiyê ku li ser me çêkirî ne. Mesele ne tenê rê û rêbazên çort in, ango ne tenê tundî û dengê xwe li hemberî jinê bilindkirin e. Mesela hevalekî xort dikare li hemberî hevaleke jin pir zirav jî biaxife, lê bi awayekî zirav dikare deshilatdariya xwe jî bimeşîne. Divê em pîvanên şêweyî daneynin.

Her wiha hevalekî xort, bi niyeteke paqij û saf dikare tesîrên zayendperestiyê, tesîrên şikestina yekemîn û duyemîn jî jiyan bike. Ji ber vê yekê divê bi kûranî girtina dest hebe. Tenê bi niyetî û şêweyî girtina dest rast nabe. Ji bo jinê jî, bi zilam re nîqaşkirin û dengê xwe bilindkirin, ne pîvaneke azadiyê ye. Naveroka nîqaşên me çi ye, em çi jiyan dikin, em hebûna xwe çawa îfade dikin? Her tişt bi hebûnê destpê dike. Dema ku em li ser şikestina yekemîn û duyemîn diaxifin, beriya ku em biaxifin divê em xwe bipirsin, ka di zîhniyeta me de tesîra wan çiqas e.

Dema ku em tesîrên şikestina yekemîn, tesîra olan, tesîra pozîtîvîzmê li ser xwe biavêjin; dervayî wê weke ‘ez’ çi dimîne? Divê em bikaribin lêpirsîna vê bikin. Tiştekî pir kêm dimîne. Lewma tesîrên van tiştan pir zêde li ser me hene. Rast e, tesîra Tevgera Azadiyê jî li ser me heye. Lê tiştên ku em ji Tevgera Azadiyê fêr bûne jî, em nikarin vegerînin zîhniyet û pratîkê. Bi rastî jî van zîhniyetên dîtir, di me de çi ava kirine, em çawa jiyan û gerdûnê mezî dikin, di me de pergaleke çawa ava bûye? Ger pergalên deshilatdar, Di kesayetên me de cih bûbûn, divê em bizanibin ku em bireser in. Ji ber vê divê em di destpêkê tesîrên van pergalan li ser xwe bibînin.

Mirov dikare vegotineke wisa bike, lê em dixwazin bi nîqaşên hevalan vê mijarê timam bikin. Her wiha ger hebin, heval dikarin pirsên xwe jî bikin.

## Pirs û nîqaş

**Hevalê X…:** Di civakê de dibêjin, “*jin dara şikestî ye.”* Dayik bi xwe jî tespîteke wisa dikin. Li gel wê dibêjin, “*jin ziyaret e. Ger tu şaş nêzik bibê, dê weke birûskeke li te bide.*” Yek jî dayik dibêje, “*ez şîrê xwe li te helal nakim.*” Ew tespîtên kê ne û ji bo çi hatine kirin?

**Hevalê X…:** We şikestina duyemîn weke olên yekxwedayî pênase kir. Weke alternatîfa ol jî felsefe pêş ket. Lê di wir de jî jin hate xistin, mirov ji wê re jî nikare bibêje şikestina seyemîn?

Hevala Dilzar: Em hem dikarin pirsên hevalan bibersivînin, hem jî dikarin tesîra zayendperestiyê ya li ser xwe bidahûrînin. Li ser vê esasê em dixwazin hinekî nîqaş bikin. Me çanda xwedawendiyê anî ziman, tevî şikestinan jî, tesîrên vê çandê jî hê di civaka me de hene. Lê pir nehatiye ziman, hinekî di vegotin û çîrokan de maye. Mirov dikare van jî bigre dest. Ev çanda xwedawendiyê tenê di gotinê de maye, an weke zîhniyet jî tesîra xwe berdewam dike?

**Hevala X…:** Zayendperestî, parçe parçe be jî di nava nîqaşên dîtir de jî hevalan girt dest. Hevalan ji mîtolojiyê destpêkirin, pişt re zayendperestî, olperestî, nijadperestî û zanistperestî girtin dest. Ew her çar têgîn; zayendperestî, olperestî, nijadperestî û zanistperestî ji aliyê bîrdozî ve pergalê têr dikin. Ger ew nebin, deshilatdarî weke pergaleke nikare xwe bidomîne. Van her çar  têgîn hem rêbaz in, hem jî weke şêwazên jiyanê xwe vesaz dikin. Zayendperestiyê jî di nava van hersê têgînên din de xwe daye xwarin. Ango hem ol, zayendperest e; hem nijadperestî, hem jî zanistperestî zayendperest e.

Ger em hê jî biçin pêş, di mîtolojiyê de serdema pozîtîf û negatîf heye. Ew serdema mîtolojiya negatîf û dema derbasbûyina pergala dewletî jî, weke serdema zayendperestiyê tê nirxandin. Jixwe weke ku me behs kir, şikestina yekemîn jî di vê serdemê de pêk hatiye. Ji ber vê jî mirov dikare rîçikên zayendperestiyê jî di vê derê de

bibîne. Şikestina duyemîn a zayendî jî, di ol de pêk hatiye. Tiştên ku di serdema mîtolojiya negatîf de pêş ketine, êdî di ol de dibin qanûn, dibin têgihiştin û dibe çandeke zayendperestiyê.

Jixwe zanist jî, êdî roj bi roj, kêlî bi kêlî zayendperestiyê çêdike. Zanîn û agahiya vê ava dike. Dê zayendperestî çawa xwe mezin û berfireh dike, amûrên wê û rê û rêbazên wê mezin dike? Bi taybetî ji derketina wê ve zanista pozîtîf xizmetî wê dike. Ango mîtolojiyê, pîroziya jinê, xwedawendiya wê jê stend. Ol jî civakbûna wê jê stend, di roja me de zanist jî mirovbûna wê jê distîne. Kapîtalîzm jî lûtkeya vê ye. Ji ber vê îro mirovbûyina jinê tê nîqaşkirin. Êdî pirsgireka hebûn û tunebûnê ya jinê derketiye holê.

Ev her çar têgehên ku pergal xwe li ser ava dike de, di herseyên ewil de  pirsgireka hebûn û xwebûnê ya jinê derketiye holê. Çawa ku vê pergalê ji bo jinê pirsgireka hebûn û xwebûnê derxistibe holê, her wiha ji bo zilam jî pirsgireka dûrketin û biyanîbûna rastiya xwe derketiye holê. Biyanîbûneke pir  mezin di navbera jin û mêr de çêbûye. Sedema vê jî herdu alî ji nasnameyên xwe dûr ketine. Di navenda vê rastiyê de jî dîsa zayendperestî heye.

Zayend û zayendperestî çi ye? Lewma ne hemwate ne. Zayend, ji milê genetîk, biyolojîk û fîzyolojîk ve hebûna jin û zilam pênase dike. Ango di navbera jin û zilam de

ferqên biyolojîk û xwezayî ne. Ew ferq ji xwezayîbûnê tên, naguherin. Yek weke jin tê dûnê, hinek wek mêr tên dûnê, lê naguherin. Lê ger em qala zayendperestiyê bikin, ew tiştê ku hatiye hînbûyin e û tê guhertin. Zayendperestî, ew rist û berpirsyariyên jin û zilam ku ji aliyê civakê ve têne diyarikirin in. Her wiha ferqên biyolojiyê jî di nava xwe de dihewîne, lê zêdetir ferqên civakî yên di navbera zayendan de pênase dike. Ew wate û bendewariyên ku civak ji jin, an jî mêr bar dike ne. Ev tiştên ku em qalê dikin, ferqên ku weke nasname ji jin û zilam hatine barkirin in. Weke çand û zîhnityet ji jin û zilam hatine barkirin. Ew ferq dikarin werin guhertin. Lewma înşa ne. Ango encama aqilê mirov in. Lewma jî em dikarin van tiştan lêpirsîn bikin; di nava civakê de rastî û şaştiyên wan, qencî û xirabiyên wan tehlîl bikin. Hêza me heye ku em vê biguherînin jî. Ji bo zayendperestiyê mirov dikare vî tiştî bibêje.

Ji bo nasnameyên jin û mêr ku ji aliyê civakê ve hatine diyarkirin, di nava xwe de karbeşiyê jî diyar dikin. Mesela zilamek dikare bav be, dikare karmend be; jinek dikare malê be, paqijiyê bike, lê zilam dikare biçe bigere, dikare dîplomasiyê bike. Ger ew karbeşî nebûya, dibe ku çûyina ser kar de karbeşiya jin û mêr bi awayekî din ba. Jin û zilam li gorî van karbeşiyan berpirsyariyan digirin û wisa tevdigerin. Her jin û merek jî li gorî vê karbeşiyê tê perwerdekirin û mezinkirin. Di warê pîşeyî de hînkirin û amadekirina civakî çêdibe.

Ew qalibên ku hatine avakirin jî, wisa pir ne nerm in û nakevin nava hev. Jin di nava ew sînorên ku jê re hatiye diyarkirin de ye, her wiha zilam jî wisa ye. Forma zilam û jinê diyar e. Sînorên wan dijwar in, dema ku yek dixwaze wan sînoran derbas bike, rastî nerazîbûnên tûnd yên civakî tê. Berdela derbaskirin û xirabkirina van ristan, bi taybetî jî ji bo jinê bi kûştinê encam dibe. Jina ku dixwaze hinekî vê nasmayê têk bibe û derbas bike, bi jiyana xwe berdela wê dide.

Di pênaseyê de jî hat ziman, ferqa herdu zayendan hinek vebû. Zayend xwezayî ye, lê zayendperestî tiştekî sosyo û çandî ye. Îcada aqlê zilam û înşayeke civakî ye. Cardin zayend bi biyolojiyê ve girêdayî ye, zayendperestî birdoziya deshilatdariyê ye. Dîsa zayendperestî îşaret bi çavaniya zayendê dike; nêr û mêtiyê diyar dike. Her wiha rist, peywir, qalib û sînorên me diyar dike. Zayend naguhere, lê zayendperestî li gorî dem, çand û civakan diguhere. Mirov dikare bibêje ku ji malbateke heya malbateke din asta zayendperestiyê diguhere. Asta pêkhatina wê diguhere.

Kesê ku zayendperestî xistiye nava sosyolojiyê An Okley e. Bi taybetî piştî salên 1970'î ku tevgerên havirdorparêz, tevgerên çandî, tevgerên femînîst pêş dikevin; zayendperestî nirxandin weke nerazîbûneke civakî derdikeve holê û weke têgîn di nava sosyolojiyê de xwe cih dike. Ristên ku jin û zilam re hatine diyarkirin,

rewşa jinê xistiye asta herî jêr. Hebûn û tunebûna wê di nîqaşê de ye. Lewma lêpirsîna li hemberî wê dihêle ku zayendperestî weke têgîn bikeve nava sosyolojiyê. Di van salan de mijarê ve alaqadar lêkolîn çêdibin, tiştê ku herî zêde dikeve nîqaşê jî; zayendperestî nikare di ferqên di navbera jin û zilam de were pênasekirin. Ew rist û misyona jin û zilam, tenê bi ferqên biyolojiyê nikarin werin pênasekirin. Tiştekî sosyolojîk, barkirineke civakî heye. Piştî salên 1970'î tiştê ku herî zêde tê nîqaşkirin, yek jî ew e.

Ew rewş bi awayekî diyar di nava civakê de heye û jin di bin de difetise, hewildanên derbaskirina vê rewşê hene. Di vê mijarê de gelek lêkolîn çêdibin, gelek têgeh di lîteratora sosyolojiyê de li ser vê esasê têne bicihkirin. Ji aliyê sosyoljî û psîkolojiyê ve bi awayekî berfireh lîteratoreke vê çêdibe. Di serî de jî me got, di navbera çandan de gelek ferq hene. Di van lêkolînan de ew jî derdikeve holê. Mesela, di hinek civakan de nêzikatiya li hemberî keç û xortan diguhere. Nêzikatiya ciwanan diguhere, konevaniyên îstîkdamê diguherin. Karbeşiya jin û zilam diguhere.

Zayenperestî di demeke nêz de ketiye nava zanista civakî. Lê pirsa ku bi hezaran sale tê nîqaşkirin jî, ew e; gelo sedema bindestbûna jin ji ber biyolojiya wê ye, an na? Em jî gelek  caran nîqaş dikin û serdestiya mêr, an jî bindestbûna jinê bi rastiyên biyolojiyê ve girê didin. Li ser

vî esasî jî hewil didin encamên rast jê derînin. Ya rast ferq û cudabûna di navbera jin û zilam de, li ser bingeheke dîrokî û civakî têne înşakirin.

Me qala nêzikatiya mîtolojî, ol, nijadperestî û zanistperestiyê jî kiribû. Di destpêkê de di nava mîtan de, zayendperestiya ku saz bûye, mirov dikare di nava mîtên wê demê de pênase bike. Serpêhatiyên Înana-Enkî, Mardûk-Tîamat; têkilî û şerên di navbera wan de çawa bûn, şikestina jin a pêşî çawa bû, di van mînakan de derket holê. Bes di nava civakê de mîtolojî xilas nebûye. Mîtên rojene ku civak ji xwe re çêdikin hene. Zayendperestiyê xwe di van mîtan hemûyan de daye xwarin.

Ne tenê di perwerdê de jî; di çîrokên ku rojane em dibîzin, ji dîrokê heya roja me tiştên weke vegotin û destan tên gotin û di nava civakê de belav dibin hene. Di nava van hemûyan de zayendperestî heye. Di çîrokan de jin her ya xirab e; pîrhevok hene, zarokan dixwin, porê wê qije, nizanim singa wê çawa ye, di nava daristanan de dijî, diziya zarokan dike. Bawerim di zarokiya xwe de me hemûyan tiştên wisa guhdarî kirine.

Ya duyemîn jî ol e; ol civakbûna jinê jê girtiye. Rastiya jiyan û civakê ya jinê xistiye nava çar dîwaran. Mesela di Îslamê de dibêje, *“jin zeviyek e, hûn dikarin bi dilê xwe biajon.*” Ew mînak jî bes e ku em rastiya jinê di nava ol de fêm bikin. Ango dibêje jin mal û milkê we ye, hûn dikarin li gorî kêf û xwesteka xwe kar bînin. Ol bi

karanîna jinê, hem ji aliyê biyolojîk, hem ji aliyê çandî, hem jî aliyê zayendî ve hemû deriyên jinê ji  zilam re vekirine. Li pêşiya wê ti dîwar nehiliştine. Weke zîhniyet, têgihiştin û çandeke di nava civakê de ev yek bi cih kiriye. Cihê ku herî zêde serdestiya zilam xwe dide der jî zayendperestiya di ol de ye.

Mesela pirtûkên pîroz pir zêde li ser vê mijarê disekinin. Têkiliya jin û zilam, di her serdemekê de pênase dike û dixe nava qaliban; mesela di dema rêgil de, di dema zarok anînê de, di dema têkiliya zayendî de weke rêziknameyeke diyar kirine. Weke qadeke dest avêtiyê û jê re qanûn û qeîde çêkirine. Li ser esasê karanîna jin a bêsînor her tişt saz kiriye.

Rawe kiriye ku zilamek ne tenê bi jineke re, bi çend jinan re dikare bijî. Ew tiştê ku îro em pê re dibêjin "mala taybet" jî ji aliyê Îslamiyetê ve hatiye rawekirin. Rêber Apo dibêje, "*di navbera mala giştî (kerxane) û mala taybet de ti ferq nemaye.*" Îslamê sînorên di navbera mala taybet û giştî de jî ji holê rakirine.

Di vê çarçoveyê de girîng e ku tesîra zayendperestiyê ya Îslamiyetê ku li ser me ava kiriye, em baş lêpirsîn bikin. Mesela jin şerm e; vê yekê li ser me tesîreke çawa kiriye? Vê yekê di me de têgihiştineke çawa ava kiriye? Divê em lêpirsîna vê baş bikin. Li aliyekî tundî û tepisandin heye, lê aliyê din jî harkirin heye. Zilam bêsînor di ser jinê de ber dide. Dihêle ku zilam êrîşkar be.

Tiştên ku di Rojhilata Navîn de tên jiyîn hene; ji kûştina namûsê bigrin, heya çanda destdirêjiyê; ew encamên çi ne, kê ew çand ava kir? Bêguman sedema hemûyan ne Îslam e, lê çanda Îslama deshilatî diyarker e. Ji ber vê yekê divê em hem çanda zayendperestiyê, hem jî çanda Îslamê lêpirsîn bikin. Em ê aliyên baş yên Îslamê jî bigrin dest, lê ji aliyê zayendperestiyê ve tesîra wê jî em ê lêpirsîn bikin. Bi taybetî jî em dikarin tesîrên vê çandê ku li ser me çêkirine û derbaskirina wê bigrin dest.

Di zanistê de jî, gelek gotinên balkeş hene; mirov dikare wan bi bîr bixe. Mesela Arîsto, weke bavê felsefeyê tê bi navkirin. Li gorî wî, zilam çalak, jin jî pasîf e. Ji çêbûnê, ango vejînê wisa ye. Dibêje, ya mê, merê seqet e. Ew kese ku ne xwedî rihekî ye. Gotiye, “wêrekiya mêr dema ku emir dike, ya jinê jî dema ku îteat dike derdikeve holê.” Pênaseyeke herî balkeş jî ya Darwîn e. Ji pênaseya wî jî baş diyar dibe ku zanist çiqasî zayendperest e. Gotiye, “jin be şevqata xwe ya kûr û ezeziya kêm, di zîhniyetê de ji zilam cudatir e.” Di vir de jinê erenî dibîne. Lê dibêje “*van taybetmendî yên nîjadên jêrîn in. Ew taybetmendiyên şaristaniyên paşmayî ne.”*

Dema ku mirov van pênaseyan dibihîze, mirov dizane ku zanist li ser vê têgihiştinê saz bûye. Ger tiştekî baş yê jinê hebe jî, ne taybetmendiyeke baş ya mirov e. Taybetmendiya kes û civakên paşvemayî-îlkel in.

Rêber Apo di paraznameyan de jî dibêje, malbat helîna zayendperestiyê ye. Ew rist û mîsyonên ku me qala wan kir, ji biçûkayî ve di nava malbatê de ji zarokan têne barkirin. Têkiliyên di navbera zilam û jinê de jî, ji ber ku têkiliyên serdestiyê ne; Serokatî dibêje weke dewleta biçûk in, weke qada deshiltdariya mêr in. Jixwe qarektera xanedaniyê jî di vê çarçoveyê de tê pênasekirin. Li ser vê esasê malbat kakilê ku zayendperestî tê de xwe saz dike ye.

Em hinekî têkiliyên jin û mêr yên di nava malbatê de binêrin. mêr di malbatê de serdest e û xwediyê her tiştî ye, jin malê wî ye. Bi vî awayî her rengê îstîsmarê li ser jinê rewa ye. Heta qada têkiliya zayendî her tiştî zilam diyar dike. Jin makîneyeke zarok anînê û paqijiyê ye. Xizmetî zilam û zarokan dike, xwarinê çêdike. Têkiliyeke ku her tim zayendperestiyê dize ye. Têkiliya zewacê bi xwe jî, di bin hestên destdirêjiyê de pêş dikeve. Zilam kengê bixwaze, dikeve têkiliyê. Jin bixwaze nexweze jê re ne mesele ye. Zilamê ku derva li hemberî dewletê û deshilatdariyê têk çûye, li ser jinê bi destdirêjiyê deshilatdariya xwe ava dike. Li wê qadê de şarz dibe, xwe rehet dike. Ji ber vê têkiliya di nava malbatê de jî têkiliyeke deshilatdariyê ye.

Ji bo jinan nûmûneyên wê yên girîng hene. Di nava malbatê de têkiliyên 30-40 salî berdewam dikin hene. Hemû jî di bin venerîn û serweriya zilam de derbas dibin,

jin jî vê yekê weke qedera xwe dibîne. Ew heza jinê ku li hemberî vê rabe nemaye. Jixwe dema ku dixwaze li hemberî vê yekê derkeve, têgîna namûsê derdikeve holê û bi kûştina xwe berdela wê dide. Di bin kûştinên namûsî de zayendperestiya civakî heye. Mêrtî û deshilatdarî heye. Dema ku jin dixwaze kêmek sînorên xwe derbas bike, dişewite.

Li gorî zilam, jin bê aqil û bê teqet e, jinik e. Ya ku her li ser deshilatdarî were meşandin e, bireser û amûrek e, ya rast ne tiştek e. Ger wateyeke wê hebe, di çarçoveya domandina deshilatdariya zilam de ye. Ji hebûn û xwebûnê wateyeke wê tune ye.

Zarokê ku di wê malbatê de tê dûnê jî, ji vê zîhniyet û nêzikbûnê para xwe digre. Têkiliya bav û dayikê çawa be, keç û xort jî li gorî wê şêwe digre. Nasneme û rist li gorî vê yekê ji aliyê bav û dayikê ve, ji keç û xortên zarok tên barkirin. Xwe çawa bin, dixwazin zarokên xwe jî wisa bin. Mesela kûr her kolanan digerin, lê keç nikarin. Mijarên zayendî yên keçê her şerm in, lê yên kûr ne wisa ne, weke nîşaneyeke şanaziyê tê dîtin. An jî tiştên ku keç dixwaze dibe ku tune be, lê dema ku kûr tiştekî dixwaze divê teqez were dîtin. Kûr delalî tên mezinkirin. Di vê nêzikbûnê de kûr zayenda xwe jî dihese. Lê keç ferq dike ku kûr ji wê qîmetir e. Keç her bi gîrî ye. Ew tişt diteyisin ser cih û şêwe jî.

Mesela li gorî van forman, rengên cilên wan jî tên diyarkirin. Piştî temenekî, jixwe derketina derva ya keçan jî şerm e. Şerme ku dengê xwe bilind bike, şerme ku li hemberî zilaman tiştekî bibêje. Mesela di malê de dayik û bav diçin kar, lê dema ku tên zilam li hemberî tv rûdine û xwe pal dide. Lê jin dîsa karê xwarinê, zarok û malê re mijûl dibe. Lê herdu jî çûne kar û li gel hev westiyane. Lewma hemû karê malê ji jinê hatiye barkirin, jin jî lêpirsîna vê nake, weke qedereke qebûl kiriye. Lêpirsîna vê yekê nake. Ew rewşa herî şênber ya zayendperestiyê ye. Bi sedan nûmûneyên wê hene, mirov di têkiliyên malbat û civakê de van tiştan dibîne. Piştî demeke guhertin û dij derketina van yekan jî ne hêsan e.

Piştî ku zarok ji malê derdikevin û tevlî qada perwerdê dibin, li wê derê jî zayendperestî heye. Ew rist û nasnameyên ku ji bo keç û kûr hatine diyarkirin, di qada perwerdê de zêdetir bi pergal, zêdetir sazkirî ji zarokan tê barkirin. Li wê derê birdoziya deshilatdariyê tê hîn kirin. Di hemû pirtûkan de karên ku jinê tên barkirin paqijî, mezîkirina zarokan û çêkirina xwarinê ye; lê hemû pîşe û ristên din ji bavê tên barkirin. Kûr dikare gokê ûhwd bilîze, lê keç dikare malik bilîze, zarokekî pêlîstok didin destê wê. Dîsa zemîna perwerdê, nêzikbûna mamosteyan li ser esasê zayendperestiyê ye.

Dîsa qada ziman, zimanê me yê jiyanê û rojane jî zayendperest e. Pir caran mirov diaxife jî ew zîhniyeta me diteyîse ser zimanê me. Nabêjin jin, dibêjin jinik minik. Ji ber ku ziman îfadeya zîhniyetê ye, ew jî wisa saz dibe. Car din perwerde deshilatdar e, bi temamî li ser yekdestiya mêr saz dibe. Yê ku karê baş û qenc dike mêr e, jin bireser e. Di aboriyê de jixwe jin tune ye, jin tenê dikare di malê de dilê zilam xweş bike. Ango jin ji qada aboriyê hatiye avêtin. Jixwe keda ku jin dide û karên ku dike weke aborî nayen dest girtin. Her wiha jin nikare di her pîşeyîkî de cih bigre û her karekî bike. Hemû karên bi pere û bi berhem weke karên zilam hatine diyarkirin. Jin hewil didin ku van sînoran bişkînin jî, lê weke formên civakî hatine diyarkirin, bi awayekî xwe didomînin.

Dîsa di tendûristiyê de, ji ber ku jin di nava ew dorpêça zayendperestiyê de dijî û difetise, ew yek bi xwe re pirsgirekên kûr yên tendûristiyê derdixe holê. Jineke ku êdî nikare bi tendûrîstî bijî, derdikeve holê. Jixwe ne nexweşbe jî, nexweş tê dîtin. Zilam, jinê weke nexweşiyeke dibîne; qirêj û kîret dibîne. Ji ber vê jin jî êdî wisa nêzikî xwe dibe. Mesela rêgilên serê mehê hene, di nava me de êdî weke nexweşiyeke rûniştiye. Lê ne nexweşî ye. Di  bin wê de jî zayendperestî heye. Demên berê weke kîretî û herimandina jin dihat hesibandin. Piştî hezaran sal, ne gengaze ku jin vê yekê bi şanazî bijî. Dema ku wexta wê tê, jin diçilmise, tengav dibe. Şerm dike, naçe ser sofreyê rûnane.

Dîsa hemû pirsgerekên jineokojîk bingeha xwe ji zayendperestiyê digirin. Jina ku weke makîneya zarokan hatiye dîtin, dê bedena wê çiqasî sexlem be? Serokatî dibêje, “her zarokek anîn, ji bo jinê mirinek e; her têkiliyeke zayendî dîsa wisa ye.” Bê dil û weke qedereke van tiştan dike, ji ber vê ne gengaze ku bedena wê saxlam bimîne.

Her wiha di bingeha hemû pirsgirekên civakî de zayendperestî û serdestiya mêr heye. Cardin di qada siyasetê de jî zayendperestiya herî tûj û dijwar em dibînin. Heya ku di vê qadê de hinek sînor hatine derbaskirin, gelek berdel hatine dayin. Dîsa jî gotina jinê difire û diçe, lê gotina mêr diyarker e. Em çiqasî di pergala hevserokatiyê de tengav dibin. Ji bo ku pergaleke wisa rûnene, hevalên xort di şaredariyan de, di partiyên siyasî de, di saziyan de ber xwe dan. Bingeha van hemûyan de cih negirtina di nava siyasetê de ya jin heye. Her wiha di çand û hûner de, tesîrên zayendperestiyê pir in. Çand ji xwarin û vexwarina me bigre heya şêweya me, ji axaftina me bigre heya nêzikatiya me bi gelek tiştan ve têkîldar e.

Ew çand jî li ser esasê zayendperestiyê saz bûye. Cil û berg jî li gorî wê hatine diyarkirin. Zilam dikare her cihê xwe vekirî bihêle, lê jin nikare kêmek milên xwe rake. Jinan dixin nava bûrke û çarşafan, tenê ber çavên wê çend kûnik hene, wekî din tiştekî wê xwûya nake. Weke siyeke reş diçe û tê.

Mesela tevger û nêzikatiyên jinê şerm tên ditîn, lê yên zilam ne wisa ne. Mesela bila hevaleke jin bi dengekî bilind bikene, şerm e; lê dema ku hevalekî xort be, herî zêde heval jî pê dikenin. Ew hemû girêdayî zayendperestiya civakî ne û tesîra xwe li ser me jî kiriye. Ger hevaleke jin, du-sê caran li hemberî hevalekî xort bikene, ev hevalê xort şaş fêm dike.

Her wiha di hunerê de jin, bi giştî obje ye. Hemû parçeyên bedena wê weke amûr tên karanîn. Di fîlm û çapameniyê de jî, hemû ristên jin û mêr li gorî zayendperestiyê ne. Mesela Holîwid heye; Amerîqa êdî bi rêka van fîlman dikeve welatên nû û wan dagir dike. Pêwîstî bi dagirkirinên leşkerî nabîne. Lê di wê derê de jî her tişt li ser esasê serwerî û qûveta zilam e, ger jin jî hinekî derkeve pêş an bi bedena xwe, an jî xwe şibandina zilam derdikeve pêş. Dîsa di van fîlm û rêzefîlman de, têkiliyên sexte yên evînê, zîhniyeta namûsê tên bi cihkirin.

Dîsa zimanê nûçeyan zayendperest e. Di nûçeyeke kûştina jinê de, dîsa jinê sûçbar dike, nizanim tehrîk kiriye, fûhûş kiriye, li kolanan geriya ye ûhwd. Zilam jî “namûsa xwe paqij dikin.” Bi ziravî jinê terbiye dike û gefan lê dixwe. Gelek mînakên vê ku em rojane dijîn û dibînin hene.

Tundî jî, milê herî berbiçav yê zayendeperstiyê ye. Şêweyên cuda yên tûndiyê jî hene; tûndiya derûniyê, tûndiya tepisandinê, gef lêxwarinê û hwd. Lê tûndiya ku

bi lêdan û kûştinê encam dibe, aliyê herî berbiçav yê zayendperestiyê ye. Van bûyerên tûndiyê, mirov rojane di nava malbatê, civakê û kolanan de dibîne. Ji ber ku pir tên zanîn û hundirê mirov reş dikin, ez naxwazin bikevim nava mînakên wê.

Bi awayekî giştî mirov dikare bibêje, ger ew zayendperestî nebe û weke zîhniyeteke xwe ava neke; ne gengaze ku jina kole hebe û vê jiyanê bijî. Ne gengaze ku zilam deshilatdarî û nêzikatiyeke wisa raber bike. Ger wisa be înşayeke bîrdozî ku kêlî bi kêlî xwe çêdike heye. Di vê çarçoveyê de, girîng e ku di jiyan, nêzikbûn, têkoşîn û her tevgreke xwe de em lêpirsîna zayendperestiyê bikin. Her wiha girîng e ku li ser vê esasê mirov koletiya jin û serdestiya mêr lêpirsîn bike. Ger em di kesayeta xwe de şênbertir bikin, dê em ê bigihêjin encamên rasttir.

**Hevalê X…:** Serokatî qala, qirkirina civakê, ekolojiyê û jinê dike. Di bingeha wê de şikestina zayendî heye. Bindestbûna jinê, bindestbûna civakê; bindestbûna civakê jî, xirabkirina hevsengiya di navbera mirov û xwezayê de tîne. Şikestina yekemîn de li gel derketina dewletê, pirsgirekên civakî derdikevin holê. Di navenda pirsgirekên civakî de jî şikestina jinê heye. Di wê derê zîhniyet bi rêka mîtolojiyê pêş dikevin. Xwedayên mirov tên înşakirin. Dema em digihêjin olên yekxwedayî, xweda ne mirov e. Jin jî weke mirov naye dest girtin.

Di xwezayê de jî, navenda her tiştî de mêtî heye. Zayin di xweza û jinê de heye. Ji ber vê yekê deshilatdaran nirxa zayinê jî ji destê jinê girtiye. Çîroka Adem, di Sûmeran de jî heye. Pişt re di olên yekxwedayî de tê pênasekirin. Dibêjin, Adem û Hawa xistine nava bihûştê. Lê ji ber ku jin nefsa xwe nikarî, ji bihûştê hate qewirandin. Di vir de li hemberî jinê heqeretek heye. Lê di cewhera meseleyê de, xweda dara zanistê ya di nava wê baxçeyê de qedexe dike. Jin wê darê dibîne û bi zilam re jî parve dike. Bi vî awayî zane dibin û civakbûnê pêş dixin. Lê mesele pir hatiye berovajîkirin. Di civaka xwezayî de jî, jina ku digihêje zanistê civakbûnê pêş dixe.

Zilam, li hemberî xwedawendiyê dij-şoreşê pêş dixe. Ew dij-şoreş jî her pêş dikeve. Bi mîtolojî, ol, felsefe û zanistê her xwe mezin dike. Mesela tesîreke pir mezin a ol heye. Di rêveberina civakên dervayî dewlet û deshilatdariyê de jî risteke mezin a ol heye. Lewma xîtabî wîjdanê dike. Di ol de nîqaş û lêpirsîn tune. Dogma, teqûzî heye. Ew yek di hemû daneyên me de xwe cih dike.

Mesela beriya ku ez tevlî Tevgera Azadiyê bibim, min nedifikîrî ku fikreke jinê jî hebe. Her min xwe di navendê de dîdît. Lewma ol de dibêje, ya esas zilam e; jin tenê dikare karê malê bike. Her wiha di têkiliya zayendî de jî rista jinê tune ye. Tenê zarokan tîne dûnê. Asta nîqaş, fikir, hebûn û xwebûnê di jinê de tune. Wisa digirin dest. Ji ber ku bi vî rengî pergal dikare jinê bixîne, pergala xwe ava dike û dimeşîne. Ger ew tişt werin nîqaşkirin, dê heqîqet derkeve holê. Ji ber vê nîqaş qedexe ye.

Min pirtûkek xwend, keşîşek dikeve şikefteke. Dixwaze lêhûrbûn bike û li gel xwedê biaxife. Mişkek tê û solên wî dixwe. Keşîş ji mişk re eciz dibe û dibêje, “*tu çi dikê?*” Mişk jî dibêje, *“ez birçî me.*” Keşîş dibêje, “*mişkê ehmeq, tu çima nahêlê ku ez li gel xwedê biaxifim û bi wî ve bibim yek?*” Mişk jî dibêje, “*tu hê bi min ve nebûyê yek, tuyê çawa bi xwedê ve bibê yek?*” Vê yekê ez pir tesîr kirim. Em jî carna nikarin bi hevalên keleka xwe ve bibin yek.

**Hevalê X…:** Di herikîna şaristaniyê de du rûbar hene. Yek herikîna heqîqî ya civakê ye, yek jî herikîna deshilatdariyê ku bi Sûmeran destpê kiriye. Di nava ew herikîna deshilatdariyê de, berxwedaneke civakê jî heye. Bi ya min, divê jineolojî ne tenê jin, hemû civakê careke din vegerîne ser ew rûbarê esasî. Tevgera me jî van 40-50 salên dawî têkoşîna vê daye. Lê jineolojî hinekî din vê yekê bi pergal dike.

Em di şexsê xwe de jî şênber bikin; dema ku komkûjiyek çêdibe, em vê yekê çiqas hîs dikin. Em felsefeya wê nîqaş dikin, lê weke zilam em tundî û êrîşên li ser jinê û civakê çiqasî derdixin zanebûnê û li dijî wê têdikoşin. Li Edeneyê xwendekareke zanîngehê hatibû qetilkirin, Serokatî digot, “*we çiqasî ew hîs kiriye*?” Bûyerên bi vî rengî, em di nûçeyan de guhdar dikin û derbas dibin. Her wiha li gel hevaleke jin, em çiqasî dikarin têkiliyeke rast daynin? Ez bi xwe di nava lêgerîn û lêpirsîneke wisa de me. Divê mirov bikeve giranî û cîdîyeta wê.

**Hevalê X…:** Hem di şikestina yekemîn de, hem jî di şikestina duyemîn de hin rastî derdikevin holê. Da ku ew şikestin çêbibin, xeyal û înşaya zîhniyeteke heye. Mesela xweda em weke kîjan zayendê digirin dest? Di bin mejiyê me hemûyan de zilam bû. Lê dibêjin notir e. 99 navên xweda hene, piraniya wan jixwe navê zilaman e. Lê weke taybetmendî, hinekên wan taybetmendiyên ku di dema civaka xwezayî de li ser jinê hatine pênasekirin jî nîşan didin. Mirov dikare bibêje, hin pênaseyên ku civakê ve eleqedar in, hatine dizîn.

Ji bo ku xwedayekî zilam were avakirin, divê di destpêkê de zilamek bihata avakirin. Dema ku zilam hate gotin, divê çi were bîra mirov; hêz, qûvet û serwerî tê bîra mirov. Lê di civaka xwezayî de rista zilam, ne wisa ye. Ji ber wê yekê bi van qarekteran di destpêkê de zilam hate avakirin. Qarekter jî bêguman li gorî hiyerarşî û deshilatdariyê bûn. Piştî wê rastiyeke xweda hate avakirin. Di şexsê qralên rahîb de ew yek pêk tê. Şikestina yekemîn bi vî rengî ye.

Her wiha bingeha ku şikestina yekemîn pêk aniye, rê li pêşiya şikestina duyemîn vedike. Êdî pêwîstî bi zilam û xwedayekî ku mirov xwe nikare bigihînê heye. Tenê fikir û taybetmendiyên zilam, nabin xweda. Êdî zilam bi giştî dibe xweda. Ne tenê dewlet e, êdî xweda ye. Fermanên pîroz dide, bê nîqaş in.

Hemû têgîn û qûramên netewe dewletê, jî nêr in. Di kapîtalîzmê de jî, di encama şikestinên yekemîn û duyemîn de nêrtî û zilam pêş e. Di encamê de jî, mêr xwe di nava rastiyeke de dibîne, kurgu dike. Lê nizane ku di nava hêleşaşiyê de ye. Jixwe ji ber rastiya wî ya ontolojîk, pirsgirekeke herikînê ya mêr heye. Divê vê yekê bi zanebûn û felsefeyê derbas bike. Lê ji bo ku nikaribe xwe bigihîne wê derê, ji aliyê deshilatdaran ve xistine nava hêleşaşiyeke. Bi hêz û deshilatdariyê tê xapîn. Divê mêr û civaka ku di navenda wê de mêr heye, li hemberî gerdûn û xwazeyê xwe weke hêzeke serwer bibîne. Li hemberî jinê, hêz e; li hemberî yên weke xwe hêz û serwer e.

Di bingeha şeran de jî ew heye. Ji ber ku mêr xwe, kesê herî bi hêz dibîne; ew yek dibe sedem ku li dijî merên weke xwe jî şer bike. Di dîrokê de weke ku sedema hemû şeran jin e, tê destnîşankirin. Ango qaşo ji bo rizgarkirina jinê, dîsa mêr şer dikin. Bi taybetî ew nêzikbûn, di şikestina duyemîn de zêde bûne. Piştî wê êdî mer, li ser navê jinê biryar digirin û şer dikin.

**Hevalê X…:** Em pir caran li ser van mijaran sekinîne û me nîqaş kiriye. Lewma hemû waneyên me bi civakê ve girêdayî ne û jin jî di navenda vê civakê de cih digre. Ger tu bixwazê di nava civakê de pirsgirekeke çareser bikê, divê teqez tu bi jinê destpê bikê. Ger em jinê nexin navenda her tiştî û bi vî rengî pirsgirekên xwe yên civakî çareser nekin, em şoreşa xwa ya zîhnî jî nikarin ava bikin.

Deshilatdaran jî, ji bo ku bikaribin li ser jiyan û civakê hûkim bikin; neçar bûn, ji cihê ku jiyan diafire destpê bikin. Ji ber vê di destpêkê de nirxên jinê bi dest xistin û jin kirin kole. Bi vî rengî hemû qûrnazî li ser jinê ceribandin. Piştî ku jin dikeve, hemû civak dikeve. Niha jî tu malbateke mezî bikê, dayika malê çiqasî pêşketî û zîrek be, malbat teva wisa ye.

Tarîtiya ku di şikestina yekemîn de çêbûye, di roja me de jî berdewam dike. Ger dîroka jinê di tarîtiyê de hatibe hiştin, dîroka mirovahiyê jî di tarîtiyê de hatiye hiştin. Ji ber vê yekê heya îro dîrokeke rast nehatiye nivîsandin, kîjan deshilatdarî serwerî bi dest xistibe, dîroka xwe nivîsandiye.

Di nava mîtolojî û olan de, ya ku li ser civaka Rojhilata Navîn herî zêde tesîr kiriye jî olê Îslamê ye. Mûhamed, ji aliyekî ve jin ji mirinê xilas kiriye, lê ji mirineke din re derî vekiriye. Mesela dibêje, divê ti kes rûyê jinê nebîne, guneh e, divê di nava çar dîwaran de be. Ew jî zîndanîbûnek e. Di nava civaka me de, pirsgirekên ku ji ber vê ferasetê derdikevin pir in. Pêwîst nake ku em yek bi yek vekin. Di cewhera xwe de fikra jinê çi dibe bila bibe, ti kes wê guhdarî nake. Lewma “jin tiştekî nizane.” Her deshilatdarekî jin reş kiriye, da ku pergala xwe bikaribe bidomîne. Jin tenê weke koleyeke ku karên male dike, an jî metayeke ku dibe amûra reklaman e. Jin nikare derkeve, nikare biaxife, nikare siyasetê bike, nikare bi aboriyê re mijûl bibe. Lê di rastiyê de ne wisa ye, ya ku ev diyarde hemû afirandine jin bi xwe ye.

Di malê de jî ne wisa ye. Dayik gelek tiştan re pêşengtiyê dike, fikrên wê deh qat yên zilam xweştir in. Lê naye guhdarkirin. Di civaka Kurdan de, ew tişt pir pêş e. Divê em jî tesîra wê li ser civaka xwe û kesayeta xwe baş bidahûrînin, da ku em ya nû jî bikaribin biafrînin.

**Hevala X…:** Şikestina yekemîn, li ser mîtolojiyan çêdibe. Ji mertebeyeke pîrozbahiyê, dikeve asteke nemirovbûyinê. Heya roja me jî, tesîrên vê bi awayekî berdewam dikin. Ew li ser me jî tesîr dike, em pir caran nêzikbûnên di bin tesîra vê zîhniyetê de ne re rû bi rû dimînin.

Hevalan gotin, êrîş û tûndiyên li ser jinê em pir hîs nakin. Lê bi kê re hinek hestên mirovî mabin, li hemberî van kiryaran nikare bêdeng bimîne. Yek jî em tevgereke mirovahiyê ne, ne gengaz e ku em hîs nekin. Her wiha weke jin, ji ber ku em bi xwe tiştên wisa re rû bi rû mane, li keleka me dayik û xûçkên me heman zext dîtine, em baş têdigihêjin.

Li Anatolyayê, herêma ku pê re dibêjin Herêma Deryaya Spî, çanda Kîbela pir bi tesîr e. Li wir xerabeyên Bîzansan hene. Keleheke kevn heye. Lê beriya wê hoyik û peykerên çanda Kîbela di wê kelehê de hene. Hemû manastir û avahiyên Bîzansan, li ser wan hatine çêkirin. Dema tu dipirsê, dibêjin ji ber ku Kîbela xirabî û bênamûsî kiriye, xweda ew kiriye kevir. Ji ber ku pîroz hatiye dîtin û di nava civakê de xwediyê nirxekî bûye, li

wir peykerên wê ava kirine. Lê îro deshilatdarî hêleşaşiyeke bi vî rengî pêş dixe. Biçê heman herêmê Kîbela bipirsê, kes ya rast nizane.

Ew algiyên namûs û bê exleqiyê çi ne? Divê zilamekî mezî neke, rûyê xwe nîşanî ti kesî nede, porê xwe veneke, ti kesî re neaxife. Divê bê destûra bav û hevserê xwe dernekeve derva. Ew hemû sedemên kûştin û tûndiyê ne. Îro ew tişt pir rewa jî tên dîtin. Ji aliyê jinê ve jî qebûlkirineke çêbûye, weke qeder tê dîtin. Koletî hatiye pêjirandin. Ger wisa be, divê her tiştê vê pergalê, ev dîrok were lêpirsîn kirin.

Ew pênaseyên ku ji destpêka dersê ve hevalan ji bo zilamê deshilatdar kirin, hemû di bavê min de hene. Çavbirçî ye, bi hêz e, gotin li ser gotina wî re tune ye. Jixwe 3-4 caran zewicî ye. Ez jî di malbateke wisa de mezin bûm. Teqez vîna mêr û gotina wî derbasdar e, tesîreke dayikê tune ye. Bawerim li Kurdistanê piraniya malbatan jî wisa ne. Lewma heman ol û zîhniyetan li ser malbatên me û me tesîr kirine. Di malbateke wisa de, bi serê xwe tevgerîna jinê, vîna xwe derxistina holê, ne gengaz e. Ew şêweya malbatê di zayendperestiyê de lûtke ye. Mirov nikare ji nava wê derkeve. Di nava wê malbatê de gihandina zarokên mêr jî, li gorî wê zîhniyetê ye. Mesela birayên min, tevî ku li gel hevalan jî têkiliyên wan hene, bi awayekî mîsoger heman zîhniyet û nêzikatiyê nîşan didin. Wê demê divê mirov daneyên civakî û dîrokî

lêpirsîn bike û guhertinê ji bin ve bike. Divê ez weke jin koletiya ku min dayika xwe girtiye lêpirsîn bikim, birayê min jî zîhniyeta deshilatdariyê ku ji bavê xwe girtiye lêpirsîn bike. Dibe ku em di nava civakê de tenê kesek bin, lê zîhniyet yek e.

**Hevalê X…:** Ez dixwazim baştir fêm bikim. Hevala R… got, keç ji dayika xwe, kur jî ji bavê xwe nêzikatî û zîhniyetê digirin. Li Dersîmê, keçek ji dayika xwe zêdetir bavê xwe hez dike. Kur jî dayika xwe zêdetir hez dike. Bi piranî di navbera keç û dayikê de, kur û bav de nakokî hene. Hevala Sara jî dibêje, "*ez li gel dayika xwe her di nava şer de bûm."* Ew çima wisa ye?

**Hevala X…:** Di psîkolojiyê de Freud jî dixwaze vê mijarê bidahûrîne. Keç, hasûdiyan ji dayika xwe dikin; kur jî hasûdiyan ji bavê xwe dikin. Freud vê yekê li gorî xwe di şexsê malbatê de dixwaze bidahûrîne. Lê bingeheke wê ya mîtolojîk û dîrokî heye. Heya ku pirsgirekên civakî nayen çareserkirin, derûniyên kesayetî nayen çareserkirin. Di civake de tesîra dê û bav ji aliyê heval gotiye ve li ser zarokan heye, lê di cewhera xwe de ya dîtir girîng e; ango tesîra dayikê li ser keçê, tesîra bavê li ser kur heye. Her wiha piranî jî daxwazî û hezkirin li hemberî kesê bi hêz heye, ew jî bav e.

Ez mînaka jiyana xwe bidim; dahûrandina min ya li ser mer, piştî jiyankirina hin pratîkan çêbû. Min bavê xwe jî qebûl nedikir, lê dahûrandina wê bertekê kirin, bi

awayekî kûr girtina dest tune bû. Serokatî dibêje, jin di cewhera xwe de hin tiştan napêjirînin. Lê alternatîf tune ne û jin ji ber vê yekê tiştên tên jiyankirin weke qeder digre dest. Dema ez dayika xwe tînim ber çavan jî, ez feraseta qederê ku di wê de pêş ketiye jî dibînim. Bavê min sê hêvî anîbûn ser wê, lê disa jî bêhnfireh bû û qebûl dikir. Weke qedera xwe dîdît. Jixwe tiştekî ku bike jî tune.

Mesela dema ku bavê min hêviya seyemîn tîne ser dayika min, dayika min dixwaze malê biterikîne û zarokên xwe jî digre û diçe mala apê min. Lê apê min wê qebûl nake. Ji bo zarokan jî, bavekî wisa hezkirin ne gengaz e. Mesela hemû xûçk û birayên min, bavê min hez nedikirin. Bertekek hebû. Sedemeke bi hev re tevlêbûna me ya rêxistinê jî ew e. Qeyrana ku di malbatê de jî, weke ya civakê ye. Tu li hemberî wê qeyranê, dikevê nava lêgerînan. Bi vî rengî tevlêbûneke Tevgera Azadiyê çêdibe. Dibe ku tu pir zêde ne di ferqa bîrdoziya wê de bê jî, lê bertek û nerazîbûneke te çêdibe.

Îro dema ku ez digirim dest, ez dibêjim nerazîbûna min li hemberî koletiya dayika min û deshilatdariya bavê min bû. Lê heya ku min ew yek fêm kir jî, ez gelek pêvajoyên zehmet re derbas bûm. Tu bi demê re dixwînê, nîqaş dikê, hin tiştan jiyan dikê û bi wî awayî têdigihêjê. Lê beriya ku em wan pêvajoyan jiyan bikin, em ne di ferqa tiştekî de bûn. Ger hezkirin û xweziyek li hemberî bav hebe jî, ji ber wê ye. Lewma her tiştê baş, xweşik,

hêz, pere bi bav tên pênasekirin. Her wiha di nava civakê de hê jî gelek mirovên ku neketina ferqa hin tiştan û zayendperestiyeke kûr jiyan dikin hene. Ez pir dûr jî naçim, mînaka birayê xwe didim. Hemû bê exleqiyan jiyan dike, lê nahêle ku jin bêyî wî gaveke biavêje. Divê ew rastî were dahûrandin.

**Hevalê X…:** Pirsa min kiriye, heval R… di şexsê xwe de girt dest. Lê ez ji bo giştî civakê jî dipirsim. Ji ber ku di navbera kur û bav de, şerekî deshilatdariyê jî heye, kur bavê xwe hez nake. Lewma di malê de bav deshilatdar e, ji ber ku kur jî bi heman zîhniyetê tê mezinkirin, her di navbera wan de nakokî çêdibin. Her wiha ji ber ku keç, koletiya dayika xwe û hêza bavê xwe dibîne, xweziya xwe bavê xwe tîne. Nakokiyeke wisa heye. Ji ber ku ew tişt rewa dibin û dibe qeder, em nikarin di van qadan de gavên mezin biavêjin.

Di vê derê de tiştê girîng hem weke kes, em ê tesîrên vê çawa li ser xwe biavêjin û em ê civakê çawa biguherînin. Dibe ku îro zanebûneke me li ser zayendperestiyê û azadiya jin çêbibe, lê li ser me tesîrên zayendperestiyê bi kîjan awayî berdewam dikin, yek jî ji bo ku li ser civakê em ji milê erenî ve tesîr bikin, em dibin xwediyê hewildanên çawa?

Heval li ser şikestina yekemîn û duyemîn jî sekinîn. Jixwe hemû taybetmendiyên zayendperestiyê ku îro tên jiyîn, bingeha xwe ji şikestina yekemîn digirin. Şikestina

duyemîn jî vê kûrtir dike. Tenê milekî erenî yê ol heye, berê mirov dide felsefeyê. Lewma dema ku ol, dibe dogme, lêgerînên felsefê destpê dikin. Bi taybetî di şikestina duyemîn de, di şexsê jinê de civak bê vîn dibe. Jin tune dibe û civak jî dibe kerî. Bi pengava modernîzmê ve jî, îro jin dibin amûrên xemilandina vîtîrînan, ango dibin temayên ku tên firotin.

**Hevala Dilzar:** Serokatî jî, pir li ser têkiliya xwe û dayika xwe disekine. Te qet li ser vê lêhûrbûn kir, têkiliya di navbera we de çawa ye?

**Hevalê X…:** Lêhûrbûneke min a kûr çênebûye. Qesî ku ez dizanim, bavê xwe pasîf dibîne. Li herêma me (Dersîm) jî zilam wisa pir ne pêş e. Lê dîsa bi hêza xwe ya fîzîkî, deshilatdar e. Min bi xwe nedîtiye ku zilamekî li hemberî jineke destê xwe rakiriye. Lê van demên dawî de, di navenda Dersîmê de qetlîamên jinan çêdibin. Ew jî xirab-bûyinê nîşan dide.

**Hevalê X…:** Di destpêkê de dixwazim tiştekî bipirsim. Ji aliyê fîzîkî ve xurtbûna zilam, lewaziya jinê qederek e? Ma ew tiştekî xwezayî ye, an zayendperestiyê ve girêdayî ye? Li gorî baweriya min, fikir li ser bedenê jî tesîr dike. Mesela jin bi awayekî wisa tê mezinkirin ku divê her lewaz û bê vîn be. Mesela di neolîtîkê de, ji aliyê fîzîkî ve hevsengiyeke çawa hebû?

Berê me çawa dîrokê mezî dikir, xeteke raste rast hebû, her tişt ber bi başî û pêşketinê ve diçû. Lê bi taybetî bi guhertina paradîgmayê, ew nêrîn guherî. Serokatî got, tiştên ku hûn fêrbûne, biavêjin û ya nû bixin cihê wê, da ku hûn bigihêjin rastiyê. Ango dîrok her ber bi başbûnê ve neçûye, dijberî wê ber bi xirab-bûyinê ve çûye. Tesîra mezîkirina dîrokê ya raste rast, li ser min jî heye. Di guhertina vê de ez zehmetiyan dikşînim.

Ji aliyê azadiya jinê ve jî, tesîra zayendperestiyê li ser me heye; di guhertina wê de jî em zehmetiyan dikşînin. Em di nava çandeke welatparêziyê de jî mezin bûn, di nava tevgerê de bi hezaran şehîdên jin hene, têkoşîn û çîroka wan heye. Tesîra van jî li ser me heye. Lê ew tesîr li ser bingeheke azadiyê nehatiye rûnişkandin.

Di civakê de çiqasî jin bê hêz bikeve, ew qesî di zilam de deshilatdarî û hêz pêş dikeve. Zilam xerîzeyên xwe li ser wê bingehe zêde dike. Kîjan zilam dibe bila bibe, di nava civakê de asta wî çi dibe bila bibe, qadeke ku bikaribe ajoyên xwe pêk bîne û xerîzeyên xwe mezin bike, qada jinê ye. Jixwe di Tirkî de gotineke balkeş heye. Dema ku zilamek ji milê zayendî ve nexweşî, an jî pirsgirekan jiyan bike; dibêjin, *“ew bê îktîdar e.*”

Mînaka Sûmeran hate dayin, destpêkê zilam dixin û pişt re jinê dixin. Mesela di pergala îro de, dema zilamek were bîst saliya xwe, dişînin leşkeriyê. Li wê derê hemû feraset û nêzikbûnên deshilatdariyê li ser wî ferz dikin û

wî bê vîn dikin. Kes nikare li dijî van kiryaran jî derkeve, lewma dê were cezakirin. Ew zilamê ku ji her alî ve di leşkertiyê de tê fetihkirin, dema ku tê malê dibêjin, mafê wî yê zewacê heye. Ango du astên bingehîn yên merbûyinê hene. Ya yekemîn, divê di destpêkê de biçe leşkeriyê, deshilatdariya dewletê qebûl bike û piştre jî deshilatdariya xwe li ser jinê ava bike. Weke leşkeriyê, hemû saziyên dewletê li ser vê esasê nêzikî mêr dibin.

**Hevalê X…:** Di vê mijarê de hinek lêhûrbûna min çêbû. Hevalan berê ji min pirsîbûn û gotibûn, nêrîna te ya li hemberî azadiya jinê çi ye? Cihê ku ez ji aliyê mejî û kesayet ve bigirim dest, min hevsengiya di nava xebatê de, fikra jinê girtin dinirxand. Min digot, di navbera min û hevalên jin de, ji sedî nod hevsengiyek heye. Rast e, tesîra van nêzikatiyan û hewildanê hevsengiyê li ser kesayet jî hene; lê dema ku em kesayeta xwe, pîvanên zayendperestiyê û azadiyê dixin, ji sedî 90 tesîrên zayendperestiyê li ser me hene.

Dema ku Serokatî, serdema koma Apoger de cara ewil li Kurdistanê digere. Diçe malbateke, keçek ciwan û kalek di wê malê de hene. Dema ku Serokatî wan dibîne, dibêje qey ew ciwan nêviya wî kalî ye. Lê piştre mezî dike ku hevjîna wî ye. Li hemberî wê bertek û reflekseke mezin a Serokatî çêdibe. Dema ku dibêje Kurdistan metîngeh e jî, tenê dagirkeran qest nake. Kesayet û civaka Kurd di bin metîngehiyê de ne. Di şexsa ew keça ciwan de vê

dahûrandinê dike. Di nava civaka me de mînakên vê gelek in. Bi xebatên jin û ciwanan ji aliyekî ve pêşî lê te girtin. Lê dema ku hişmendiya wê naye avakirin, ti çiqasî mûdaxaleyên şexsî bikê jî encameke xurt dernakeve holê.

Me di Modernîteya Demokratîk de jî girt dest, di herikîna civakê de du rûbar hene. Ya yekemîn berxwedanî ye û ji sedî nodê civakê digre nava xwe. Lê aliyê deshilatdariyê ji sedî deh be jî, li ser hemû civakê xwe ferz dike. Hevalan gotin, li hemberî jineolojiyê kelecaniyek bi me re ava dibe. Hesteke pir xweş e. Di dîrokê de, tevgerên femînîst hene, tevgerên şoreşger ku bi awayekî xurt mirov rengê jinê nav de dibîne jî hene. Lê di dawiya dawî de rengê jinê namîne. Jinê pêşengtî jî kiriye, berdelên giranbiha jî dane; lê dema ku şoreş gihêştiye armancê, rengê jinê nemaye.

Lê bi jineolojiyê sazîbûnek çêdibe, bi taybetî ji vî alî ve mirov  dikare kêfxweşiya xwe bîne ziman. Tiştên ku di dîrokê de bi pêşengtiya jinê de çêbûne, wê bigihêjin sazîbûnek e. Hem ji bo tevgera me, hem jî ji bo civakê ew tiştekî pir mezin e. Divê mirov bikaribe vê mîrasê li ser piyan bigre û zindî bike.

**Hevala X…:** Di nava gotinên pêşiyan de gotineke xweş heye; dibêje, *“merê du jinan, rûreş e ji herdu dûnan*.” Her wiha gotinek heye, dibêje *“jin dara şikestî ye.”* Ew yek mirov dide fikirandin. Dara şikestî, berhem nade, şîn nabe, bê hêz e, bê çare ye, ji xwe ne bawer e.

Her wiha dibêjin, “*jinên bêkes har dibin, merên bêkes jar dibin.*” Li ser jinê ew qesî gotin hene ku piranî jî li ser esasê xistina jinê ne.

Hevalan gotin, çima bi mêr ve ew qesî girêdanbûyin heye? Em rastiya mîtolojî, ol, felsefe û zanistê binêrin; di hemûyan de mêr li ser destan e. Zilam, weke ku bi wahiyeke pîroz bûne zayendên jorîn. Mafekî wisa dane zilam. Hemû maf û serbestî dane zilam. Weke xweda digirin dest. Pirtûkên pîroz de dibêje, nizanim tu dikarê çend jinan bînê. Her wiha di nêzikatiya ol de, her nêzikatiyeke neyînî ku li hemberî mêr pêş ketiye, gunehek e. Ji bo jinê, merê wê xwedayek e. Hêza herî mezin mêr e, dervayî wî alternatîfeke te tune ye. Ne mafekî te yê axaftinê, ne jî mafekî tê yê jiyanê dimîne. Jiyan ji her alî ve tê tengavkirin.

Ji aliyê hêza fîzîkî ve jî, ger ji aliyê mejî ve jin ew qesî nehatiba tengavkirin, biçûk nehatibûya dîtin, li gorî wê nehatiba mezinkirin, çima hêza jinê ya fîzîkî ne xurt be. Mesela di nava gerîla de hinek hevalên jin hene, barê ku ew radikin ti kes nikare rake. Fîzîkeke wan a xort heye. Hêza fîzîkî jî, bi zîhniyetê ve girêdayî ye. Ji zarokiya me ve, her me re dibêjin, “*tu nikarê…”* Nedihiştin ku em tiştekî biçûk jî rakin. Ji ber ku tu jî ji vê yekê bawer dikê, tu qet pêkanîna karekî fîzîkî naceribînê.

Em çûn maleke, zarokekî 4 salî, ji dayika xwe re digot, “*tu çima nûçeyan temaşe dikê, jin nikarin nûçeyan temaşe bikin.*” Zarok bi zîhniyeteke wisa tên mezinkirin. Ew pir girîng e. Bi taybetî di hin civakan de, di van mijaran de pir pir girtîbûn heye. Beriya ku tevgera me li Kurdistanê pêş bikeve, jinê nedikarî destê xwe bide merekî û silav bike. Ew bi Serokatî pêş ket. Ew tenê ne silavek e, tu dikevê cihê miroveke. Ne ku tesîrên van qalibên civakî li ser me tune ne. Lê gelek tişt jî ji holê rabûne. Lewma di ber vê de têkoşînek hatiye dayin.

Hevalan gotin, îktîdarsizlik. Dema ku zarok çênebin, pirsgireka biyolojîk ya mêr hebe jî, dîsa gunehkarê wê jin e. Lewma jin weke makîneyeke zarok anînê tê dîtin, dema ku zarokan jî çêneke, sedem çi dibe bila bibe, risteke jinê namîne. Bi taybetî di nava civakeke ku di bin tesîra Îslamiyetê de ye, divê mirov dahûrandina mêr û jinê baş bike û divê em ti tiştî jî ji hev û din cuda negirin dest.

Em dibêjin, dayika min li mal otorîte bû. Bi rastî jî wisa ye? Em bibêjin, di nava malê de dibe ku hin dayikên otorîter hebin. Lê di nava civakê de çawa wê jinê mezî dikin? Ew jin çiqasî dikare, qalibên civakî bişkîne? Divê mirov wisa teng negire dest.

**Hevala Dilzar:** Dive em malbatê baş tehlîl bikin. Di ti malbatan de otorîteya dayikê tune ye. Tenê bav dihêle ku dayik li ser zarokan hinekî xwedî însîyatîf be. Pênaseyek wisa ne rast e. Di nava rastiya malbatê de jin çawa dibe

bila bibe, xwediyê kîjan taybetmendiyan be bila be, di dawiya dawî de her tişt bi gotin û kiryarên zilam encam dibin. Dibe ku di nava herêmên Kurdistanê de cudabûn jî hebin, em nikarin hemûyan bikin yek. Mesela gelek baweriyên cuda hene, her yekî wan jî nêzikatiya jinê cuda ye. Lê li ser hemûyan jî, tesîrên zayendperestiyê hene. Mesela sekneke jinên Êzîdî heye. Li ser wan tesîra çanda civaka Ereb û Îslamiyetê jî heye, lê dema ku hevalan kêmek ew rêxistin kirin, hema bi xwe bawer bûn. Axaftinên wan binêrin, polîtîk in. Ango nêzikatiyeke giştî heye, lê divê em van kîteyên jiyanî jî baş tehlîl bikin. Ango tesîrên cewhera civakê, li ser hinek civakan zêdetir e.

Divê em malbata xwe baş binirxînin. Mesela malbata Serokatî jî, malbateke Kurd e. Malbatên Rihayê hemû wek hev in. Piranî jî Riha di raya giştî de, weke cihekî ku herî zêde lê qetlîamên namûsê çêdibin tê pênasekirin. Lê Serokatî ew malbat û civak çawa pênase kir. Serokatî dayika xwe jî, bavê xwe jî baş tehlîl kir. Herdu jî ji xwe re weke model negirtin dest. Ger tu dayik, an jî bavê xwe weke çavkaniya hêzê bibînê, tu dikarê yekî/ê wan ji xwe re weke model bigirê. Lê Serokatî herdu jî qebûl nekirin. Pir taybetmendiyên xweş yên dayika xwe jî dibêje, lê dahûrandina wan jî dike. Her wiha dayik û pîrîka Serokatî, paşverûtiyê jî li ser wî ferz dikin. Serokatî tevî nêzikatiyên malbatê û dewletê, rêkeke din hildibijêre. Serokatî ji vê yekê re dibêje, “*civaka xwe ava kirin.*” Got, *“civakeke ku dayik û bavê min bida min tune bû.*”

Yê em dizanin li Rihayê feodalîzm, tesîrên ol, kûştina jinan zêde ye, lê Serokatî got, bavê min bêhêz e. Lewma Serokatî kûr mezî dike û tehlîlên kûr dike. Dema ku em xwe pênase dikin jî, divê em xwe nexapînin. Malbat, weke dewleteke ye. Deshilatdariya dewletê di wê derê de ava dibe. Di nava malbatê de têkilî çi bin jî, têkiliyên civakî mêr pêş dixe, gotina wî derbasdar e. Rast e, li Kurdistanê hê jî jin li ser piyan e û hêzeke wê heye. Mînakên vê jî zêde ne. Lê hêzeke ku me ber bi civakbûna azad ve dibe jî tune ye. Tiştek nehiştine. Mesela zarokekî 4-5 salî ku malbateke bi 4 dayik dîbîne, an jî merekî ku bi çar jinan re zewicî dibîne; dema mezin bû dê tenê weke amûreke fûhûşê jinê mezî bike. Dê jinê weke amûreke ku zilam kar tîne bigire dest.

Dema ku jin pêwîstî û pirsgirekên di nava malbatê de re mijûl bibe, naye wê wateyê ku jin otorîte ye. Ji çi dibe bila bibe, dema ku zarokê wê di nava ev rastiya civakî de mezin bibe, dê çawa jinê mezî bike. Tesîreke xirab ya ol, li ser civaka me heye. Zilam ew qesî zêde jin anîne malê ku weke biçe malên giştî yên jin tên firotin, diçe mala xwe. Bi taybetî ji ber ku AKP, Îslamiyetê bi kar tîne, di nava civaka me de tiştên wisa pir zêde dike. Civaka me ji aliyê siyasî ve, her çiqasî li dijî AKP be jî, ji aliyê çandî ve nikare dijber derkeve. Gelek malbatên me dikevin vê kêmîne.

Kêmasiya me jî di vê derê de heye, me nikarî em Moderníteya Demokratîk pêş bixin. Em tenê nikarin bibêjin, tesîra pergalê ye. Di encamê de çandeke civaka me çêbûye, em vê rexne bikin jî, rastiyek e. Ger her pergaleke deshilatdar bikaribe bi hêsanî vê yekê kar bîne, divê em xwe ber çavan re derbas bikin. Lewma divê em tevdîrên wê bigrin. Yek jî divê em alternatîfa wê ava bikin. Ger civak tiştekî baştir û xweştir bibîne, dê wê jiyan bike. Di van mijaran de jî, lêhûrbûn, dahûrandin û hewildanên me kêm in.

Em îro Bakur bigirin dest. Dibe ku di encama têkoşîna siyasî de piraniya civakê piştgirî bide me, lê yên ku reyên xwe didin partiya me ya siyasî, ma zîhniyeta Moderníteya Demokratîk jiyan dikin? Na. Ji aliyê çandî ve tesîra Îslamî zêdetir e. Ne ku em her tiştê Îslamê jî şaş dibînin, lê di encamê de li ser civakê tundî û ferzkirinek heye. Bi taybetî li ser jinê tesîrên vê tên dîtin. Divê ew tişt zêdetir bi kûranî werin dahûrandin. An na tenê gotina "*di mala me de dayik otorîte ye*" ne rast e.

**Hevala X…:** Tesîrên têkoşînê li ser civakê hene. Mesela dema ku Minbiç rizgar bû, tiştê ewilî wan jinan kir çi bû? Çarşefên xwe yên reş avitin. Lewma bi tûndiyê xistibûn nava wan çarşafan, dema ku kêmek hêviya azadiyê dîtin, ew çarşev çirandin. Bi taybetî divê hevalên xort vê fêm bikin, jin her wisa jiyan dikin. Ger îro hin tişt qebûl kiribin û weke qeder lê hatibe jî, di hundirê jinê de her xwesteka ji wê tûndiyê rizgarbûnê heye. Jiyana jinê bi

tiştên ku naxwaze tijî ye. Hatiye fetisandin. Mesela îro qûral û qeîdeyên Îslamê pêk tînin, ne ku Îslamiyetê pir baş dizanin û hûndirîn kirin e. Ji zarokiya wan ve, ew tişt li ser wan hatine ferzkirin. Dê ew ferzkirin heya kû bidomin? Em di mînakan de jî dibînin, dema ku jin xwe weke hêz û vîn dibîne, dikare li hemberî wê serî rake.

**Hevalê X…:** Civaka Kurd îro hatiye parçekirin. Mirov dikare herêm herêm û kes bi kes jî bigire dest. Ji vî alî ve cudabûn pir in. Mesela li Botanê, mêr serwer e. Lê li Efrînê, jin gelek tiştan bi rê ve dibin. Lê li wê derê jî zîhniyeta zilam serwer e. Dibe ku jin di pratîkê de hin tiştan rê ve bibe, lê bi zîhniyeta zilam rê ve dibe. Cewhera jinê tê de tune bû. Jixwe civaka wê herêmê jî ji milê exleq û çand ve parçe parçe bûbû, mirov dikare bibêje ji civakbûnê derketibû. Mesela di civaka me de, li Botanê, hev û din berdan, bi taybetî hewildaneke jinê ya bi vî rengî tune ye. Lê li Efrînê tiştên wisa pir xwezayî bûn. Civakeke bi vî rengî, ne ku çar çar e. Lê ji bo avakirina Modernîteya Demokratîk jî, hin daneyan dide te. Ji ber vê yekê li cihên wisa pergala me jî bi hêsanî dikare were pêş xistin.

**Hevalê X…:** Jineolojî dibe ku weke têgeh nû be, lê dema ku têkoşîna me li ber çavan were girtin, em cara ewil van tiştan nîqaş nakin. Serokatî ji ber derengmayin û pêş neketina azadijya jinê, demokratbûna civakê, nirxandinan dike. Ev jî cihê rexne û rexnedayinê ye. Em çiqasî dereng tevdigerin, nakevin tempoyê şoreşê, nîşanî me dide.

Serokatî, malbatê weke dewleteke biçûk dinirxîne. Dibe ku dayik di malbatê de hinek otorîter be jî. Dewlet jî wisa ye, ger tu dest karê dewletê nedê, dibêje halê xwe de jiyan bike. Bav jî, ji dayikê re dibêje dest karê min nede, sînorên nava malê de ku min diyarkirine de tu dikarê azad bê. Bila jin hinekî derkeve dervayî wan sînoran, wê demê otorîterbûyina jinê diyar dibe! Rastiya me ew e.

Dema mirov dîrokê mezî dike, mirov êşeke dikşîne. Pêwîst e, mirov li hemberî rewşa heyî êş jî bikşîne. Mirov carna jiyanê jî nefret dike. Dema ku hin tişt di serê mirov de rûdinin, hin mînak tên jiyîn, mirov ji zilamtiya xwe nefret dike. Jixwe divê mirov wê zilamtiyê biverişe.

Em rastiya civakê îro dinirxînin, lê têkoşîna me ya li hemberî vê pir lewaz e. Mesela em di gûmrûkê de dixebitîn. Dayikek hebû, bi rêxistinê ve jî girêdayî bû, xwediyê çar zarokan bû. Min çend caran ji hevalên jin re got, dest biavêjinê. Me birin mala wan jî, lê careke çûn û pişt re pişta xwe danê. Jixwe çûyina ewil de jî, keça malbatê re gotibûn, were beşdar bibe.

Îro li ser înternetê jî, gelek kes  ji me re peyaman dişînin, di nava civakê de li hemberî me sempatiyek heye. Lê em serê xwe pê naêşînin û rêxistin nakin. Malbateke heye, keça wan tevlî gerîla dibe û ew malbat parçe dibe. Lewma ti kesî serê xwe pê re ne êşandiye. Dibe ku ev malbat ne çar çar bin jî, lê divê em pê bidin fêmkirin. Divê em malbatan jî, civakê jî li gorî rastiya heyî bixin ferqa hin

rastiyan. Ger em di civakê de guhertineke wisa bingehîn çênekin, hewildan û bertekên me şexsî dimînin. Em xwe perwerde jî dikin, lê encamên ku di perwerdeyan de derketine holê, em derdora xwe re parve nakin. An jî sînordar dimînin. Lewma em xwe jî baş qaneh nakin.

Mesela malbatek hebû, keça wan diçû ber pez û hinek debara malê dikir. Hevalên me yên kadro ku li wê derê dixebitîn, wate nedidanê, digotin keç nikare van karan bike. Bi zîhniyeta civakê nêzik dibûn. Di nava civakê de me jî digot, jin nikare ji malê derkeve, karê dervayî malê zilam dike. Hevalên li wê derê jî li gorî nêzikatiyên xwe yên civakî tevdigerîn. Min wisa fêm kir ku tiştên ku em dibêjin, em pêk nayînin. Em dibêjin, tesîrên pergalê li ser me hene. Lê ew qesa sale rêxistin me perwerde dike, em çima tesîrên rêxistinê di wê astê de li ser xwe hîs nakin? Divê em vê pirsê li xwe bikin.

Şêwaza girtina dest a Serokatî û ya me pir cuda ye. Rast e, hin kes û derdorên din jî jinê derdixin pêş, lê zêdetir bedena wê derdixin pêş. Serokatî bi cewher û taybetmendiyên wê, jinê digire dest. Serokatî, xweşikbûna welat, xweşikbûna civakê, xweşikbûna jiyanê hemûyan di şexsê dayikê de digire dest. Ji ber vê rista pêşengtiya şoreşê dide jinê. Girêdanbûna xwe ya hevaltiyê, têkoşînê û welat, bi jinê pênase dike. Dema ku em vê daxînin kesayeta xwe, alaqaya me bi jinê tune ye. Em xweşikbûn, an jî qarektera jinê mezî nakin; nêzikatî û mezîkirina

zayendî zêdetir pêş e. Em jî zû bi zû nakevin ferqa rastiya dîrokî ya jinê, hevalên jin jî zû bi zû nakevin ferqa vê. Rast e, hewildanên me hene. Lê di xwe gihandina armancê de em kêm dimînin.

**Hevalê X…:** Bi rastî jî heval tiştên pir xweş tînin ziman. Ger ev tişt di nava civakê de werin rûnişkandin, dê hemû pirsgirekên civakê jî werin çareserkirin. Lê dema ku em pratîka xwe ya nava civakê tînin ber çavan, gelek tişt hev û din nagirin. Ger em bibêjin, em ê di perwerdeyeke de bikevin ferqa her tiştî û dema em ji vê akademiyê derketin em ê hemû pirsgirekên xwe yên zîhnî çareser bikin û di nava civakê de jî em ê pêk bînin, rast nabe. Divê tu têkoşîna xwe ya zîhnî her bidomînê. Lê divê em di vê derê de li ser hin mijaran xwe qaneh bikin, hêleşaşiyên xwe derbas bikin.

Di civakê de gelek tişt hene, em şaş  didin meşandin. Bi taybetî jî di mijara jinê de şaştiyên me hene. Mesela li ..., dema ku zilamek şaştiyeke dike em ciza didin wî. Zilamek hebû, me jî nas nedikir; çû û jineke din jî anî. Heval jî ew girtin û avêtin zindanê. Zilam bi bertek nêzik bû, dibêje, “*ger ez derkevim, ez ê deh jinan bînim.”* Di nîqaşên me yên bi civakê re mirov dîdît ku gelek mijaran de  qaneh nebûne. Ger tu nikaribê mirovan qaneh bikê, tu nikarê li ser wî qûral û qeîdeyên xwe bidê meşandin. Ji ber vê yekê divê em giraniyê bidin perwerdehiyan û civînan.

Lewma li vê derê gelek kes hene, ger fersend bibînin dê weke berê bibin. Lê niha ji ber bandora şoreşê nikarin hin tiştan bikin. Zilamekî Ereb hebû, rojeke min dît, du jinên xwe dane pêy xwe û tê. Bi ecizî ji min re got, "*ka mala jinê li kû ye?*" Min got, xêre tu çima eciz bûyê? Lê min fêm kir ku hevalan ew qaneh nekirine û hin tişt jê xwestine. Ger ew bihata qanehkirin, bi wî rengî bertek nîşan nedida. An na tenê bi tirsandinê nabe.

**Hevala X…:** Heval got, divê civak were perwerdekirin. Rast e, lê ger zilamek biçe û keçeke deh salî ji xwe re weke jin bîne. Em ê çi bikin? Lemwa tiştên wisa li vê derê pir tên jiyîn, lê li hemberî wê gelek rê û rêbazan têkoşînê tên dayin.

Em dema ku vê mijarê nîqaş dikin, em her bi jinê îzah dikin. Me anîmasyonek temaşe kir. Zilam li malekê ye, jina wî mase ye, kûrên wî hinek kûrsî ne, hinek derî ne ûhwd. Zilam jî di nava wê malê de jiyan dike. Pişt re ew zilam, diçe ber lingê zilamekî dîtir dibe paspas. Ango zilam jî kole ye; zilam koleyê ajoyên xwe ye, koleyê deshilatdariyê ye. Ne ku tenê jin kole ye û zilam ew xistiye kole. Yên ku zilam û jin xistine kole, ew ajo û hîsên zilam in. Divê em vê baş fêm bikin. Bi têgehan em hin tiştan ji wateya wê derdixin. Divê em bizanibin ku pirsgirek di kûderê de ye. Pirsgirek ne binketina jinê ye, ne jî tiştekî şexsî ye. Pirsgirek ew zîhniyeta koletiyê ku me hemûyan de hatiye avakirin e. Divê zîhniyet biguhere.

Hevalan jî got, divê em di xwe de dest bi dahûrandina hin tiştan bikin. Rast e, lê dema ku em vê yekê dikin jî, em bi hin tiştên din îzah dikin. An jî em dibêjin vî alî wisa kiriye, lê aliyê din jî wisa kiriye. Ne wisa ye. Hevalekî jî got, "*ez carna tiştên pir xweş xeyal dikim, lê carna jî hin tiştan difikirim ku ji xwe nefret dikim.*" Mesele ew tiştê ku em jê nefret dikin e. Em di kêliyeke de jê nefret dikin, lê di encamê de em dibin koleyê wî tiştî. Lewma li hemberî wê têkoşîna me tune. Weke ku em jê direvin fêm dikin, lê ya rast em jê narevin, tenê em çavên xwe jê re digirin û em wî tiştî jiyan dikin.

Dema em li vê derê nîqaş dikin, em fêm dikin ku me çiqasî zirar daye mirovan û jiyanê. An jî me di xebatan de çiqasî texrîbat ava kirine. Niha tenê dilê me pê dişewite. Ez jî ji Serhadê me, bavê min heya ku ez mezin bûme, hemû rêbazên tundî û şikenceyê ji dayika min kirin. Lê niha bavê min, ji dayika min jî koletir e. Lewma dayika min hê jî têkoşîn dide, lê bavê min di jiyana xwe de qet têkoşîn nekir. Hem bi xwe kole bû, hem jî dixwast koletiya xwe li ser dayika min jî ferz bike. Lê dema zarokên wan mezin bûn, nikarî wê yekê jî bike. Bi xwe bû koleyê xwe. Dema ku em bi dayika xwe re dikenin, dîn dibe û dibêje, hûn çima bi min re nakenin. Ango bûye belangazek.

Rewşa zilam a niha jî wisa ye. Ya herî girîng jî ne di ferqa ew belangaziya xwe de ye. Lê jin ne wisa ye. Jinê jî koletî jiyan kiriye, lê li hemberî wê têkoşîna jinê her berdewam kiriye. Di dîrokê de mînakên vê gelek in. Lê zilam koleyê zîhniyet û ajoyên xwe ye û hê jî vê koletiyê jiyan dike. Divê em ji vê derê bigrin dest, li ser vê lêhûrbûn bikin, da ku em bikaribin ji vê koletiyê rizgar bibin.

Jixwe şikestina seyemîn jî dê dijberî zilamtiyê pêş bikeve. Da ku di jiyanê de hevsengiyek çêbibe. Divê hevalên xort jî wisa fêm bikin. Lê di hevalên xort de xwe xapandinek heye. Çima? Di perwerdehiyan de nêzikbûna hevalan pir cuda ye, lê di pratîkê de nêzikbûn cuda ye? Min bi xwe jiyan kiriye. Bi fêrbûyinên xwe yên jiyana beriya partiyê tevdigerin û bi wê yekê dixwazin deshilatdariya xwe ava bikin. Divê di vê mijarê de em rast nêzikî xwe bibin û hêleşaşiyên xwe derbas bikin. Ger wisa bibe, em dikarin zêdetir pêş ve biçin.

**Hevala X:** Heval …  got, di civaka Rj. de tirsek çêbûye û wisa civak naye meşandin. Jixwe heval rabû ser xwe û her tişt bi derdora xwe îzah kir. Lê heval bi xwe di malbatê de çawa nêzikî dayik û xûçka xwe bûye? Ez dixwazim hinekî ev mijar jî were vekirin.

**Hevala X…:** Tiştên ku heval lêpirsîn dike û dixwaze were vekirin, ez jî girîng dibînim. Rast e, divê di destpêkê de perwerde û guhertina zîhniyetê esas were girtin. Lê li

hemberî ciza hin pêkanînên dîtir jî pêwîst dikin. Ji civaka exleqî û polîtîk, ew tişt her hene. Ger dervayî civakê, nêzikatiyên ferdî ku zirarê didin civakê hebin, bi yasayên ku pêşxistine ciza kirine. Mesela ew kes nehiştine nava klanê. Lê li gel wê perwerde jî kiriye. Ew lêpirsîna heval, pir mezin e. Lê ew lêpirsîn li dijî pergalê jî tê kirin? Mesela di vê pergalê de her roj jin tên kûştin. Ew jî cizakirinek e, di heman astê de lêpirsîna wê jî tê kirin?

Ya din jî, Serokatî got, min di şexsê xwe de zilamtî kûştiye û diçû malên hevalên jin perwerde didan. Azadî weke pirsgireka xwe dîdît. Pirsgireka azadiyê ya zilam jî heye. Heval dibêje, min gotiye lê hevalên jin nehatiye pirsgirekên civakê çareser nekirine. Ma heval azad e, jin kole ye? Dê jin li ser pirsgirekên rêxistinî bisekine. Lê çima zilam vê yekê ji xwe re weke pirsgirek nabîne? Nêzikatiya heval ya azadiyê çi ye?

**Hevalê X…:** Ez li derdora pirsgirekê nezivirîm. Ango ne ku min çavê xwe ji pirsgirekê re girt. Ji ber ku karê me li wê derê cuda bû, min got hevalên jin pê re mijûl nedibûn. Jixwe mijareke ez tê de hakîm nebûbûm, min bi wî zilamî re axifîbama jî, min nedikarî tiştekî ji wî zilamî bidim fêm kirim.

Ez bi xwe jî di malbatê de, bi tesîrên kevneşopiyê û pergalê dijîm. Ez bibêjim, ez pir baş nêzikî dayik û xûçka xwe bûm, ne rast e. Her çiqasî min bixwesta, hinekî pêşiya dayik û xûçka xwe vekim jî, tu neçarê li gorî civakê

tevbigerê. Baweriya te bi xûçka te hebe jî, baweriya te bi wê civakê tune. Cîranên min jî, li min bawer nakin. Em bi heman zîhniyetê tevdigerin. Em bi zîhniyeteke ku pir zêde sînorên hatine danîn divê jin derbas neke tevdigerîn. Mesela di malê de xûçka min pir dihat hezkirin, lê me aîdî xwe nedîdît. Me digot, wê sibê biçe bibe milkê yekî din. Me jê hez dikir, hinek jî gunehê me pê dihat. Weke tiştekî ku ger em neparêzin dê bişkê, me digirt dest.

Meseleya cizakirinê, ger pirsgirekek hebe, em bi heman rêbazan nikarin çareser bikin. Rast e, rojane li ser jinê tundî û şikence heye. Jixwe em dixwazin vî tiştî ji holê rakin. Ger zilamek biçe, keçeke deh salî re bizewice, dê helwesteke te hebe. Lê cizakirin, pirsgirekê çareser nake. Lewma zilam ji wî tiştî fêm nake. Mesela hevalek nû hatibe çiyê, qûral û qeîdeyên ewlehiyê nizanibe, bêyî ku ez jê bidim fêm kirin ez nikarim wî/ê hevalî/ê ciza bikim. Divê ew heval jî xwe di mijarê de qaneh bike.

**Hevala Dilzar:** Bi wî cizayî, carna tu hêza rêxistinê û civakbûyinê jî nîşanî kesên xeletiyan dike didê. Ger heval S… qaneh nebûye, ez jê dipirsim. Di civakê de kesek du caran dizewice, zilam qaneh jî nabe û dibêje, *“di Îslamiyetê de tiştekî wisa heye, ez ê pêk bînim.*” Tuyê wî kesî çawa qaneh bikê?

Ez mînake bidim, careke ev gundên me yên li Xinêre, bûyereke desdirêjiyê çêbûbû. Rêveberiya me ya pratîkî, got “*em li ser sekinîne û me ciza kiriye*.” Me got, we çawa

çareser kir? Hevalên me gotin, “*me zilam qaneh kir û bi keçikê re zewicî*.” Em ê niha bibêjin çi, ew hevalê ku çareseriyeke wisa pêş xistiye jî hevalekî kevn bû. Niha ew keça ku rastî destdirêjiyê hatiye xûçka me be, em ê qebûl bikin, an na? Welehî ti kes qebûl nake. Yek jî hevalên me vê yekê weke cizakirina wî zilamî pênase dikin. Ew bi feraseta me ve girêdayî ye. Dema ku bûyerên bi vî rengî di nava civakê de çêbibin, divê mezîkirina şoreşgerî pir cuda be. Lê carna nêzikbûna hevalên me, ji ya civakê jî paşketîtir e.

**Hevalê X…:** Cizakirina civakê jî, divê mirov weke ya dewletê negire dest. Mesela Heval mînaka ... da, li wê derê ger cizayek bihata dayin, bi bîryara gel dihat dayin, vîneke civakî hebû. Yek jî em bibêjin, ew zilam bavê heval be. Pencî salî ye, lê diçe û keçeke deh salî re dizewice, dê helwesta heval çi be?

Mesela li Kobanê, zilamekî jineke din anî, kongreya jinê bîryar di derheqê wî kesî de derxist û di nava civakê de jî lêpirsînek çêbû. Pirsgirekên bi vî rengî, di encama wê lêpirsînê de pir kêm bûn. Êdî ti kesî wêrekiya wê jî nîşan nedida.

**Hevala X…:** Nêrîna me ya namûsê çi ye? Zilam, heya êvar çi bixwaze dike, jinan tîne malê û hwd. Lê dema ku xûçka wî bi xortekî re biaxife, weke bênamûsî dinirxîne. Ger pîvaneke bênamûsiyê hebe, divê ji bo jinê û ji bo zilam yek be. Mesela carna jin, cilên zilaman xwe dikin.

Lê kîjan xort, cilê jinan xwe dike. Layiqî xwe nabîne. Ger tiştekî wisa çêbibe, dê xwe pir biçûk bixe. Ez dixwazim heval hinekî têgeha namûsê jî vekin. Îro ji bo me namûs çi ye?

**Hevala X…:** Cihê ku hevalê S… lê mezin bûye, çanda gelê Ereb pir zêde ye. Di zîhniyeta zilamên Ereban de, deshilatdarî pir xurt e. Dema dibêjin, dewlet û deshilatdarî yekser zilamên Ereban tên bîra min. Peyvên wan jî pir nêzikî hev in, hemû jî peyvên li ser kêf hatine sazkirin in. Şikestinên li ser jinê çêbûne jî, hemû di encamê van ajo û kêfan de ne. Ji bo ku ev kêf ji holê rabe, exleq jê re pêwîst dike. Heval dibêje, ez dijberî ciza me. Lê exleq rêzika civakê ye. Heval exleq dixe kûdera vê mijarê?

**Hevalê X…:** Hevala Dilzar mînaka destdirêjiyê da. Li Bakur, AKP îro ev yek kiriye qanûn. Ger yek li ser jineke destdirêjiyê bike, divê pê re bizewice. Li Bakur jî, di nava civakê de gelek paşvûrtî hene. Ji bo vê yekê divê perwerdekirin hebe. Lê dema ku li hemberî tiştekî xirap, cizakirinek çêdibû, di nava gel de moraleke pir mezin ava dikir. Dibe ku di wî kesî de şikestinek çêbe, lê civakê jê hêvî digirt. Hevaleke jin pirsî got, xortekî qet cilên jinan xwekirine, an na? Çend caran me cilên jinan xwe kirin û em tevlî çalakiyan jî bûn…

**Hevala X…:** Dema ku li ..., rêziknameyên qanûnî hatin derxistin, di derheqê tûndiya li ser jinê jî hinek qanûn hatin derxistin. Ji bo di temenê biçûk de zewicandina keçan, duzewaciyê, tûndiyê, şîdetê ûhwd qanûn hatin derxistin. Beriya wê mala jinê, gelek nakokiyên bi vî rengî re mijûl dibû. Lê piştî ku biryara vê hate girtin, li hemû malên li vê derê civîn çêbûn; hemû jin û zilam hatin komkirin û ev biryar bi gel ve hatin parvekirin. Yên ku qebûl nekirin jî, çûn mala jinê û nîqaş pêş xistin. Lê bi piranî civak agahdar bû û piştgirî da.

Piştî demeke nêz, zilamekî 50 salî çû û keçeke 14 salî anî. Li hemberî wê yaptirim çêbû. Ne ku zilam nedizanî û agahiya wî pê tunebû. Mesele bi vî rengî ye. An na weke ku heval girt dest nebû.

**Heval S…:** Tenê bi civîneke mirov nikare zîhniyeta 5 hezar salan derbas bike. Divê perwerdehiyên demdirêj û kûrtir werin pêş xistin. Mesela çima zilam tevî ku meselê agahdar bû, çû keçeke biçûk re zewicî?

**Hevala Dilzar:** Zilam tevî ku mesele fêm kiriye, weke bertek çûye û keçeke biçûk re zewiciye. Ango di feraseta xwe de israr dike. Di civaka me de tesîrên gelek ol û pergalan hene. Em jî perwerdehiyan û civînan dar dixin, dixwazin bidin fêm kirin. Lê dema ku dîsa guhertin çênebe, em ê çi bikin?

**Heval X…:** Ger bi keçeke biçûk re zewicandin çêbibe, an jî destdirêjî çêbibe, divê li hemberî wê helwesteke me hebe. Mirov dikare ciza jî bike. Lê di zewaca du û sê jinan de, divê ciza nebe. Divê em jê bidin fêm kirin. Ew bavê min be jî, ez nikarim tiştekî bikim. Tenê ez dikarim, jê bidim fêmkirin ku ne tiştekî baş e. Ez pê re mijarê zelal bikim. Teqez divê em qaneh bikin. Divê em pê re çareseriyeke pêş bixin.

Em jî di van mijaran de ne zelal in, em dixwazin bi perwerdehiya partiyê di xwe de guhertinan çêbikin. Berê hevalan ji min re digotin, "*tu pir qlasîkê, pir feodalê*." Ger hevalekî bi min nedaba fêm kirin, min nedikarî derbas bikim. Îro jî ez li ser vê esasê tevlî perwerdehiyê dibim û dema ku ez ji vê akademiyê derketim, divê ez jî biçim û hinekên din qaneh bikim. Ger ez nikaribim, çend kesan qaneh bikim, di min de pirsgirek heye. Divê em xwe bê çare nebînin. Ger bûyerek were çêkirin, em ê hemû aliyan re biaxifin, wê keçê ji destê wan derxînin. Ger hê jî tûndiya xwe li ser jinê ferz bike, em ê wî bigrin jî. Lê cizakirin heya cihekî ye, ne çareseriyeke mayinde ye.

**Hevala X…:** Mesele tenê ne xwendin û perwerde ye. Hinek kes û derdor hene dixwazin pergalê biparêzin. Mesela li Mexmûrê perwerdehî heye, çima hê jî duzewacî û sêzewacî çêdibin? Wê demê em ê li wir çi bikin? Qûrnaztî û parastineke zilamtiyê heye. Li hemberî wê, weke civak divê em jî xwe biparêzin.

**Hevalê X…:** Asta lêhûrbûna min a di vê mijarê de ew qes bû, ji ber vê yekê dibe ku min pirs jî teng bersivandibin. Dibe ku di mezîkirinên min de jî şaştî hebin. Lê di pratîkê de mirov çiqasî bibîne û sererast bike, dê zêdetir encamgir be.

**Hevala Dilzar:** Lê yê ku biçe û civakê qaneh bike tu yê. Ji ber wê jî divê tu xwe îkna bikê û di vê mijarê de xwe kûr bikê. Dibe ku partiyê xebatên cuda jî dabin pêşiya me, lê ew karê her kesekî/ê ye. Carna bûyerek çêdibe, lê ger tu rast tehlîl nekê û çareser nekê; di nava civakê de dibe mînak. Sibê jî yekî ku du caran zewiciye, wê ji te re bibêje, "*milet destdirêjiyê dike, hûn tiştekî nakin, lê hûn ji min re dibêjin çi…*" dibe ku weke gotin, wisa jî nebêjin, lê pratîk dê wisa pêş bikeve. Niha çend seat in em nîqaş dikin, lê em nikarin te qaneh bikin. Ger tu bi vî zimanî biçê, tu jî nikarê civakê qaneh bikê.

Ji bo ku em jineolojî û feraseta îlma azad a Serokatî fêm bikin, divê em hêza şîroveya azad di xwe de fêm bikin. Azadî, bi hin feraset û derdoran ve ne girêdayî ye. Dervayî van, divê em bikaribin çanda ku Serokatî dide pêşiya me fêm bikin. Bêyî ku mirov di bin tesîra ti fikiran de bimîne, bi awayekî azad li ser esasê felsefeya Serokatî lêpirsîn kirin pir girîng e. Ji bo mezinbûn û azadiya me pir girîng e. Li ser vê esasê mirov dikare di vê perwerdehiyê de xwe kûrtir jî bike, lê weke nêzikatî divê mirov di hinek tiştan da qaneh bike. Divê mirov qanehbûyinê re jî vekirî

be. Serokatî dibêje, “*ger mirovek dîlê ajo û dogmayên xwe be, ew kes nikare civakê biguherîne.”* Ji bo pêşketina kes, ji nerînên cuda re vekirîbûn pir girîng e.

**Hevalê X…:** Bawerim hevalê S… jî xwest bibêje, li gorî pêkhatina sûçan divê ciza werin diyarkirin. Ango hinek tişt hene, divê teqez werin cizakirin, lê hinek tişt jî hene, mirov dikare bi axaftin, civîn û perwerdehiyê derbas bike. Mesela du kes bi hev bikevin, di destpêkê de tuyê bixwazê herduyan jî qezenç bikê, ger di xwe de israr bikin û tiştên cuda ferz bikin, dê mirov li ser wan biryar bigire.

Civaka me ji resmiyet û ciza pir ditirse. Lê li gorî rewşê carna mirov bi cizakirinê ser dixe, carna jî bi axaftin û efokirinê. Axaftina wê hêsan e, lê dema ku mirov dikeve navê zêdetir girîngiya wê hevsengiyê dibîne.

**Hevalê X…:** Dibe ku peyva jineolojiyê nû be, lê 30 sale têkoşîna xweser ya jinê di rojeva tevgera me de ye. Kêmasiya me, heya îro me kesayetên xwe bi awayekî giştî neguhertine. Bêguman têkoşînek heye. Lê em tam çareser jî nakin.

Jineolojî, ne tenê projeya hevalên jin e jî, manîfestoyeke civakî ye. Ger em bi awayekî giştî li ser bisekinin, mirov dikare li ser wê şoreşeke ava bike. Lê hem weke hevalên jin, hem jî weke hevalên xort em kêm dimînin. Divê em li ser vê mijarê nîqaş bikin û bi rê û rêbazên dewlemend hev û din bidin fêm kirin. Da ku em bikaribin di civakê de jî guhertinan çêbikin. Ango em hê jî

negihiştine asta azadiyê. Em bi awayekî ji civakê qetiya ne û em li ser esasê felsefe û jiyaneke alternatîf têkoşîn didin. Ew jî li ser xwîna şehîdan, li ser keda Zîlan, Berîtan û Berîvanan dimeşe.

Yên ku jiyan avakirine jî, herdu zayend in. Lê çima herdu zayend bûne agir û  bi hev ketine. Hev û din qebûl nakin. Bûne dijminên hev. Hev û din dişewitînin û dikûjin.

**Hevala Dilzar:** Hev û din nakûjin, zilam jinê dikûje. Hev û din naşewitînin, zilam jinê dişewitîne. Rojane bûyerên ku tên jiyîn hene, lê jin û zilam weke hev girtina dest, ne rast e.

**Hevalê X…:** Rast e, penç hezar sale deshilatdariyeke zilam dimeşe. Herî dawî tesîrên Îslamê li ser me çêbûne. Em dikarin bibêjin, ew pergala deshilatdariyê Îslamê jî kar aniye. Rast e, di destpêka Îslamê de jî hin tişt hene, lê li gorî şert û mercên wê demê ye. Ez bi xwe jî careke zewicî me, lê ez ji bo wê jî poşman bûme. Dema ku mirov ew qesî zilm û tundî dibîne, weke zilamekî di nava civakê de pêwîst dibîne ku tiştekî wisa bike, mirov bi kiryarên xwe poşman dibe. Min gelek caran bi meleyan ve jî nîqaş kiriye. Hin îzahatan pirzewaciyê re tînin. Lê piranî li ser esasê çavbirçîbûnê ye.

Tiştê girîng beriya her tiştî di van mijaran de xwe qaneh kirin e. Piştî wê jî civak guhertin e. Lê ji ber ku me xwe timam nekiriye, dema ku di nava civakê de gelek pirsgirek tên jiyîn, em nikarin bibin bersiv. Em dest

navêjin pirsgirekan. Lewma em bi xwe dibin pirsgirek. Ger em biçin qafeteryayan rûnin û partiyan bidin, em nikarin pirsgirekên civakî re mijûl bibin. Ger em tesîrên pergala deshilatdar li ser xwe navêjin û ji bo çareserkirina pirsgirekên civakê jî em nekevin nava hewildanên kûr, em nikarin ser bikevin.

Ger em li ser projeya jineolojî baş xebitîna, rewşa îro ya civakê çênedibû. Mesela dijmin, bedenên tazî yên hevalên me teşîr dikin, li hemberî wê gel bertek nîşan nade. Wê demê weke kadro divê em xwe lêpirsîn bikin. Lewma di wan mijaran de em neçûne li gel civakê û me ew şiyar nekirine.

Bi projeya jineolojî, Serokatî dibêje, "*hem xwe azad bikin, hem jî civakê azad bikin.*" Lê em li hemberî vê pir lewaz dimînin. Ez bi xwe jî pir  zêde di bin tesîra zayendperestiyê de bûm. Mesela beriya ku ez tevlê bibim, dema ku heval dihatin mala me. Min digot, bila hevalên xort biçin mala bavê min. Lewma hevsera min malê bû û baweriya min pê nedihat. Lê bi demê re, bi naskirina hevalan re hin nerînên min jî guherîn. Weke jin, ger baweriya mirov ji hevser, xûçk û hevala mirov naye; tu dikarê li hemberî wê her nêzikatiyê raber bikê.

Bavê min bi xwe jî, pir feodal bû. Bi daran dayika min dida. Xûçka min ku ji min biçûktir hebû, navê wê Helîn bû, got em li dijî vê yekê derkevin. Em çend rojan li gel bavê xwe axifîn, lê fêm nekir. Di encamê de me got, tu

nikarê werê vê malê. Hemû êş û azarên me jî dayika me dikşandin. Mesela ez her dihatim girtin, dayika min her ber deriyê qereqol û zindanan bû. Min rojeke bavê xwe li wan deran nedît. Herî zêde jî xûçka min, li hemberî bavê min têkoşîn meşand. Dema xûçka min hate çiyê jî, bavê min got “*te xûçka xwe bir û radestî xortan kir*.” Lê di encamê de dema ku hatin û heval dîtin, gotin “*bi hezaran keçên me hene.”*

Ger bi rastî jî, em li hemberî hevalên jin bi bawerî nêzik bibin, dê hem parastina xwe bikin, hem civakê biparêzin, hem jî azadiyê pêş bixin. Jixwe jineolojî ew e, azadiya giştî civakê ye. Lê em di vê mijarê de hem xwe, hem jî giştî civakê tam qaneh nakin.

Mesela  li bajarekî, kesekî ku karê faîzê dike hebû. Bi faîzê pere dabûn malbateke me ya welatparêz, dema ku wê malbatê nikaribû pereyan lê vegerîne, keça wan ji bo kurê xwe anîbû. Lê weke rêxistina wê derê agahiya me jê tune bû. Jixwe derdoreke ku çeka dewletê rakirine û koricitî dikirin bû. Herî dawî hevalan mûdaxale kirin, lê êdî wê keçê jî qedera xwe qebûl kiribû. Her wiha li bajaran jin tên firotin, em çiqasî jê re dibin çareserî?

Di encamê de çareseriya esasî jî, bi rêxistinbûnê çêdibe. Em bi 30-40 hevalî nikarin ji hemû pirsgirekên civakê re bibin bersiv. Divê em komînên gel ava bikin û wan perwerde bikin. Da ku hem bikaribin xwe rê ve bibin, hem jî bikaribin pirsgirekên xwe çareser bikin. Lê em

diçin welatparêzekî dibînin, dibêjin tu berpirsyarê vê taxêyê û xatirê te. Ma wî kesî bi xwe, di kesayeta xwe de guhertinek nekiriye, wê pirsgirekan çawa çareser bike.

# BERXWEDANIYA JINÊ Û MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST

**Hevala Dilzar:** Em vegotina xwe berdewam dikin. Piştî şikestina duyemîn û olên yekxwedayî, mirov serdema Modernîteya Kapîtalîst jî weke serdemeke dikare binirnîxe. Ya rast weke zîhniyet jî, mirov dikare hinekî li ser zanistê jî bisekine. Di nava civakê de tesîrên zanista heyî çawa pêş dikevin, mirov dikare vê jî weke mijareke bigire dest û binirxîne.

## Di felsefeyê û zanistperestiyê de jin

Ji bo felsefe hevalan pirs kiribû, em weke mijareke cuda nikarin bigirin dest. Lê em dikarin hin tiştan nîqaş bikin. Serdema felsefe û zanistê jî di nava Serdema Şikestina Duyemîn de ne. Lewma hemû di nava hev de pêş dikevin. Ew, tesîreke jî li ser jinê dike.

Di felsefeyê de navê jinê pir kêm e. Ji ber ku di jinê de şikestin çêbûye, fikirandin û xwe îfadekirina jinê jî kêm e. Di civaka Rojhilata Navîn de, jinên zane û kamil hene. Her wiha jinên ku li ser feylezofan tesîr kirine hene. Tesîra nêrînên feylezofan jî li ser jinan çêbûye, lê wisa bi kûrahî jin girtina dest tune ye. Weke hebûneke azad jin girtina dest zêdetir, jin weke bireser û amûreke girtina dest heye.

Ya yekemîn, jinên ku raste rast bi felsefeyê re mijûl bûne kêm in. Sedemên vê hene; dema ku jin bixwaze bi felsefeyê re mijûl bibe jî, pêşiya wê astengiyên pergala deshilatdar û zilam hene. Jin neçarin ku van astengiyan derbas bikin û xwe bidin qebûlkirin. Ji ber vê yekê di nava pergala kapîtalîst de nêzikbûna jinên ku dixwazin felsefe bikin, di bin bana femînîzmê de kom dibin. Lewma weke zayend di destpêkê de dixwazin xwe bidin qebûlkirin. Lê hinek jinên ku bi felsefeyê re mijûl bûne û bingeha zanistê ava kirine jî hene.

Ya dîtir jî, ji hejmarê zêdetir; dema ku mirov û ji aliyê fikirandinê ve pêşketina mirov digire dest, jin weke kirdeyeke naye dîtin. Dema ku dibêjin mirov jî, zilam qest dikin. Zilam dibe kirde û feraseta mejiyê zilam esas tê girtin. Gelek feylezof hene dema ku dibêjin mirov, zilam tê bîra wan. Dema ku dibêjin jin jî, nîv mirov, an jî nîv zilam tê bîra wan. Weke zilamekî ku hebûna xwe timam nekiriye, ango seqet maye tê nirxandin. Mesela Arîsto jinê bi vî rengî pênase dike. Ji bo vê yekê weke çareserî mirov dikare felsefe pêş xistina jinê û di felsefeyê de jin weke kirde dîtinê girîng bibîne.

Di Rojhilata Navîn de, nêzikatiyeke jinên zane heye. Ew herikandineke dîrokî û civakî ye. Di nava civakê de jî jinên zane hene, kes diçin tiştan jê pirs dikin, ji pirsgirekên xwe re çareseriyê digerin. Em vê jî weke berdewamiya çanda xwedawendiyê digirin dest.

Pêş ketina zanist jî, piranî li Ewropa çêdibe. Lewma pêşketinên ku heya sedsala 11-12'emîn li Rojhilata Navîn çêdibin, piştî seferên Xeçperestan derbasî Ewropa dibin. Li Ewropa şêwazeke jiyana kabîleyan heye. Weke Rojhilata Navîn, wisa civakbûn, şaristanî û hwd pêş nakeve. Nakokiyên ku ev yek derdixîne holê jî tune ne. Ji bo vê yekê di civakê de birçîbûnek heye. Li ser esasê nirxên ku ji Rojhilata Navîn hatine veguhestin, bingeha şoreşeke tê ava kirin. Ew yek jî di destpêkê de li Îtalya destpê dike û li hemû welatên Ewropa belav dibe. Navendên esasî jî Îtalya û Fransa ne.

Di van navendan de pêşketinên zanîstî jî çêdibin. Ne ku di hin dibistan û labaratuaran de lêkolîn hatine çêkirin û pêşketin çêbûne. Pêşketina zanistê û derketina kapîtalîzmê rastî heman demê tê. Ji bo wê pêwîstî bi nirxandinên kûrtir jî heye. Lewma bi pêşketina vê pergalê re, zanist dikeve bin serweriya vê pergalê. Ji ber vê yekê êdî zanist, weke zanistperestî pêş dikeve. Zanist bi xwe dibe deshilatdariyek.

Deshilatdarî, di destpêkê de bi zor û tûndiyê naye pêş xistin. Ewilî ji aliyê zîhniyetê ve hegemonyayek tê avakirin. Ji ber vê yekê pergala deshilatdar, zanistê jî di bin venerîna xwe de pêş dixin. Ji bo vê yekê xebateke taybet heye. Zanistê, ne di xizmeta civakê de, li dijî civakê pêş dixin.

Di vê derê de, di navbera olperestî û zanistperestiyê de têkoşîneke pir mezin heye. Ew têkoşîn bi serketina zanistperestiyê encam dibe û pergaleke weke kapîtalîzmê pêş dikeve. Di bingeha wî de jî kûştina jinê heye. Pergala deshilatdar ji bo ku xwe li ser civakê serwer bike, êrîşî nirxên di nava civakê de û çanda civakê jî dike.

Mesela bi navê "*şewitandina cazi-pîrhevokan*" pêvajoyek tê jiyîn. Di Rojhilata Navîn de pêvajoyekî bi vî rengî tune ye. Di bin navê cazitiyê de bi awayekî komî jin nayen şewitandin û kûştin. Çima li Ewropa derket? Mirov dikare bi şerê di navbera ol û zanist de pêşketiyê ve girê bide.

Zanist, rastiyeke civakê ye. Bi zanebûn jiyîn e, pêdivî û pêwîstiyên xwe yên jiyanî bersivandin e. Bi zanebûn tevlî jiyanê bûyin, li gorî wê pêşketin ava kirin e. Lê derketina zanist a di vê serdemê de, hem pêwîstiyên civakê berovajî dike, hem jî van pêwîstiyan bi kar tîne.

Di Rojhilata Navîn de jî, di bin cazitiyê de şewitandina jinan tune ye, lê hin çîrokên ku bûne remza zayendperestiyê hene. Mesela jinbav heye, pîrhevok heye. Dema ku jinek zarokekî tîne dûnê, ew pîrhevok wî zorakî direvîne. Niha li Rojhilata Navîn de jî, navê pîrhevokê dikin cazi. Ew hemû teyisînên zîhniyeteke di bin mejiyan de ne, encamên serdemekê ne.

Girêdana wê bi Lîlît ve jî heye. Hevalan hinekî qala çîroka Adem û Hawa kirin. Weke jin û zilamên destpêkê tên pênasekirin. Lê jina ku di destpêkê de bi Adem re jiyan kiriye, Lîlît e. Ji ber ku Lîlît, Adem qebûl nake û li dijî wî derdikeve. Ji bo wê xweda jî, wê diqewitîne û jineke ku li gorî xwestekên Adem tevbigere diafrîne. Lîlît'ê serî netewandiye û hatiye qewitandin. Çîrok bi vî rengî ye. Van tiştên mîtolojîk, heya niha weke çîrok hatine. Divê mirov nebêje, "çîrok in" û derbas neke. Li gorî netew û herêman, çîrokên bi vî rengî, di şêwazên cuda de tên gotin. Divê mirov van baş tehlîl bike û şîroveyan pêş bixe.

Jixwe jin zarok tîne dûnê, her wiha mezinkirin û perwerdekirina zarok jî ji aliyê jinê ve çêdibe. Dema ku hiyerarşî pêş dikeve, zilam êdî dixwaze bi pergala xwe zarokan perwerde bike. Dibêjin, ji ber ku Lîlît bi Adem re nezewiciye û zarokên wê çênebûne, dixwaze zarokan birevîne û bikûje. Di nava çîrokan de gotinên bi vî rengî hene. Bi tesîra vê yekê di nava civakê de hê jî dema ku jinek zarokekî tîne dûnê, yek li gel wê dimîne.

Di Rojhilata Navîn de ji ber ku dewletbûn û şaristanî pêş ket û di Ewropa de pêş neket; civaka Ewropa gav bi gav hiyerarşî û deshilatdarî nas nekirin. Ne ku baviksalariya zilam tune bû û hiyerarşî qet tune bû, lê weke şaristaniya navendî pêş neketibû. Pişt re bi tesîra Rojhilata Navîn, veguhestina şaristaniyê li ser Ewropa çêbûbû.

## Şewitandina ‘caziyan’

Şewitandina jinan li Ewropa, di sedsala 14’emîn de destpê dike, lê piranî di sedsala 16-17’emîn de çêdibin. Dibêjin, jin nunertiya nebaşiyan dike, jixwe Lîlît jî weke lanetkirî tê dîtin. Jin di nava civakê de jî ger li gorî pîvanên baviksalar tevnegerin, weke lanetkirî tên bi navkirin. Profîleke Lîlît ava kirine û jinan jî ber bi vê profîlê ve def didin. Êrîşeke hişmendî ye.

Di Ewropa de, mijara cazitiyê çawa pêş dikeve? Di nava civakê de sêhr, efsûn heye. Hin jinên ku di nava civakê de hêza xwe di bin qontrolê de kar tînin hene. Mesela di nava civakê de hin nexweşî hene, wan tespît dikin. Bi rêvebirina enerjiya xwe, vê yekê pêş dixin. Di kesê hemberî te de jî enerjiyek heye û tu rastî hev tînê. Jin bi vî awayî nexweşî û tiştên windabûyî tespît dikin, kevneşopiyeke bi vî rengî ye. Hin jinên ku bi vî karî re mijûl dibin, nexweşiyên mirovan baş dikin. Risteke jinan a bi vî rengî di nava civakê de heye. Bi vî awayî tesîreke jinê li ser mirovan jî heye; saxbûyin û nexweşiya wî dinirxîne. Ji vê yekê fêm dike, ji nava hev derdixe. Jixwe pîrikên ku dema zarok çêdibe, alîkarî didin dayikê hene. Ew jî nasnameyeke di nava civakê de ye. Ango ew taybetmendî dihêlin ku civak, civakbûna xwe nas bike û wê herikînê bide berdewamkirin.

Di rêveberina civakê de ew rista jinan, nahêle ku deshilatdarî li ser civakê serweriya xwe bide rûnişkandin. Li Rojhilata Navîn, şaristaniya navendî jin xistiye. Lê li Ewropa hê jî tesîreke jinê heye. Heya Ronesans, Reform û pêvajoya Ronahiyê, di jiyana qabîleyan de ew qesî dijbertiyeke tûj jî li dijî jinê tune ye. Feodalîzm û tesîra baviksalariyê heye, lê pergaleke deshilatdarî di asta jor de nehatiye avakirin. Lê diyardeya ol, bi serê xwe cuda ye. Dema ku jin û zilam di nava civakê de, ji bin tesîra ol derkeve, hema pêşiya wê digire.

Di sedsala 13-14’emîn de ceribandin û pêşketinên xwezayî jî nû bi nû pêş dikevin. Ango nûveyên zanistê pêş dikevin û ol li ser xwe xeteriyeke hîs dike. Jixwe Xiristiyaniyê xwe daye qebûlkirin, bûye ola fermî û bûye deshilatdar. Êdî di nava civakê de çi li dijî ola deshilatdariyê xeterî ava bikin, wan tehlîl dikin. Hem jinan, hem jî komên Heretîk li hemberî xwe xeterî dibînin. Komên ku hem Xiristiyantî qebûlnekirine û Pagantiyê jiyan dikin hene. Hem jî hin komên ku Xiristiyantî qebûl kiribin jî, li gorî çanda xwe berê dijîn hene. Wan re dibêjin Heretîk. Ti qûral û qeîdeyên wan naşibin yên Xiristiyantiyê. Bawerî û îbadetên wan, naşibin tarîqatên Xiristiyantiyê. Ya rast, bi awayekî veşartî çanda xwe ya berê dijîn.

Ew komên Heretîk dibin navnîşana êrîşên Xiristiyantiya deshilatdar. Di nava van komên Heretîk de jî tesîra jinê pir zêde ye. Di wê derê de jin weke çîna duyemîn û bireser nayen dîtin. Zêdetir bi hev re jiyankirin û wekheviya jin û zilam heye. Ew hilbijêrek e, bajarên wan hene. Li dûrî Xiristiyantiyê jiyan dikin. Weke cih jî nakevin nava wan pergalan.

Di vê derê de herdu navnîşan jî dibin yek. Hem êrîşî Heretîkan dikin, hem jî êrîşî jinan dikin. Dema ku êrîşî Heretîkan dikin, di heman demê de êrîşên nirxên jinê jî dikin. Mesela îro AKP dema ku êrîşî civakê dike, bi qestkirina PKK'ê dibêje ez êrîşî terorîzmê dikim. Ango di sedsala 13 û 14'emîn de jin tê terorîzekirin. Lewma ya ku li dijî ew pergala deshilatdar jin e. Li hemberî jinê dadgehên Engîzasyonê tên ava kirin. Di van deran de jin tên darizandin.

Mesela kesekî nexweş heye, diçe gel çend kesan û baş nabe. Lê jinek wî baş dike. Dibêjin, wê demê ew jin sêhran çêdike. An jî tiştek winda bûye, ti kesî peyda nekiriye, lê jineke peyda kiriye. Dibêjin, ew jin sêhran dike. Bi vê yekê jinan didarizînin. Bi vî rengî bi awayekî komî şewitandina jinan çêdibe. Pêvajoyekî pir xirab e. Pêvajoyekî komkûjiyan e. Em îro dikarin bişibînin komkûjiyên Dersîm, Zîlan û Helepçe. Di dîrokê de cara yekemîn li hemberî zayendeke mirovahiyê êrîşeke bi vî rengî çêdibe.

Ne ku jinan digirin û yekser qetil dikin. Li pêşiya civakê wan şikence û teşîr dikin, da ku di çavê civakê de nirxên jinan werin xistin. Hin belgeyên ku ji wê demê mane hene. Jixwe weke belgeyên dadgehên Engîzasyonan e, her tişt bi awayekî fermî çêdibe. Di wan belgeyan de jî tê fêmkirin ku şikenceyên pir giran li ser jinê hatine pêşxistin. Mesela hestiyên wan dişkînin, wan tazî dikin, porê wan jê dikin, di avê de dixeniqînin. Mesela di nava civakê de jinên ku qet nezewicîne û bi serê xwe jiyan dikin hene. Dibêjin, ew bi şeytan re têkiliya zayendî çêdikin. Nêrînên bi wî rengî pêş dixin. Ji bo ku bakîrebûyina wê îspat bikin jî, bi biryara dadgehan tecavûzî wan dikin.

Jinên pîrik hene. Di wê demê de li Ewropa nexweşî hene û pir zarok dimirin. Civak dixwaze bi çêkirina pir zarokan tevdîrên pêşeroja xwe jî bigire. Lê ji ber ku pir zarokan tînin, bedena jinê ranake. Ji ber vê yekê jin di navbera xwe de kûrtajê pêş dixin. Tevdîrên bi vî rengî hene. Jinên pîrik, wan zarokan ji ber wan dikin. Pergal vê yekê jî qedexe dike. Dibêjin, pîrik van zarokan ji zikê jinê derdixe û ji şeytan dide xwarin. Bi vî rengî pîrikan jî digirin û şikence dikin. Niha belgeyên wê demê bixwînin, di pêvajoyê darbeya 12'ê Îlonê de li Tirkiye kîjan şikence hatibin meşandin, wê demê jî heman tişt e. Kiryarên ji wê xirabtir jî hene. Mesela dibêjin, pîrikên ku zarok ji ber jineke din kirine, ew zarok di rehîmê xwe de veşartiye. Bi vî rengî sîxan ji rehîmê wan ve dikin. Rê û rêbazên pir hovane kar tînin.

Tiştekî girîng, çawa ku Ronesans li Florensa, ango Îtalya destpê dike; şewitandina jinan jî li Îtalya destpê dike. Hem di pêşketina zanistê de, hem jî di ol de jin weke xeteriyeke tê dîtin. Divê em bizanibin ku zanista ku pêş ketiye, li ser xwîna jinan pêş ketiye. Zanistperestî jî dibîne ku ger tesîra jinan li ser civakê ew qesî xurt be, deshilatdarî nikare xwe bide rûnişkandin.

Dîsa li Ewropa, di bin navê "*neçîra caziyan*" de êdî kom tên rêxistinkirin. Bi vê yekê hem di zilam de tundî tê teşvîk-kirin, hem jî hevsengiya di navbera jin û zilam de ji holê radikin. Tiştê herî girîng jî ew e. Gotina neçîrkirinê, ji bo sewalan tê karanîn, ji bo mirovan naye karanîn. Jinên ku weke pîrik, sêhrê dike û cazi pênase dikin jixwe tên kûştin. Dervayî vê jî, êdî wisa lê tê ku hemû jin dikevin bin pêla vê êrîşê. Mesela hinek kesên ku ji hevsera xwe eciz in, dibêjin ew jî cazi ye û wê jî dikûjin. Bi vî rengî di nava civakê de jî, bêbawerbûnek li hemberî hev çêdibe.

Dema ku di sedsala 14 û 15'emîn de, ev komkûjî çêdibin. Bi awayekî giştî refleksa civakê pir zêde tune ye, refleksa zilaman jî tune ye. Mesela ger jinek bi cazitiyê were sûçbarkirin, hevserê wê jî êdî nikare wê biparêze. Ger hewil bide biparêze jî, dibêjin tu jî ketiyê bin tesîra şeytan. Her wiha hin jinên dewlemend jî hene, wan jî weke cazi dikûjin û dest didin ser milkê wan. Jin ji aliyê civakî ve hem bê wate dibe, hem bê milk dimîne, hem jî bê parastin tê hiştin. Ango jin tenê ji aliyê fîzîkî ve naye kûştin.

Jixwe dema ku sedsala 17 û 18’emîn tê mezîkirin, mirov dibîne ku di nava civakê de şikestinek çêbûye. Modeleke nû ya jinê tê ava kirin. divê jineke ku îteat dike, pergal û zilam qebûl bike, tenê karê malê bike, di nava civakê de ne xwedî ti modelan be. Ji aliyekî ve jî modeleke jinên bûrjûvazî tê pêş xistin. Jinên ku pir diaxifin re dibêjin, şîret e. Qefesan dixin serê wan û gem dixin devê wan. Bi vî awayî van jinan li kolanan digerînin. Komeke jinan jî heye, di çêkirina dermanan da alîkarî didin, giya ûhwd kom dikin; di belgeyan de weke bêaqil hatine pênasekirin.

Ew yek di heman demê de xistineke civakê ye. Lewma ew jinên ku tên xistin û bêwate dibin re zilam jiyan dikin. Li hemberî civakê êrîşeke pir mezin tê pêşxistin. Di vê serdemê de êdî jin nikare derkeve derva. Lewma divê li mala xwe bêdeng rûne. Piştî ku ji ser re 3-4 sedsal derbas dibin û kapîtalîzm pêş dikeve, da ku jin careke din derkeve derva û hebûna xwe nîşan bide, têkoşîna karkeriyê dide. Êdî mînakên jinên ku ji bo hebûna jinan têkoşîn didin û tên kûştin hene. Em îro xwe bi karkertiyê îfadekirinê jî rexne dikin, lê di wê serdemê de ji bo ku jin karkertiyê bikin têkoşîn didin û di wê oxirê de tên kûştin. Lewma di nava civakê de kapîtalîzmê qarekterek ava kiriye, ew jî karkertî ye. Ger jin jî vê qarekterê qebûl bike, dikare derkeve nava civakê.

Ya dîtir jî, dema ku Îspanyol û kesên din yên Ewropaî diçin û rojavayê welatên xwe dagir dikin, mirovên çermreş ku li wê derê dijîn hene. Wan kesan weke şeytan pênase dikin. Hêdî bi hêdî modelê şeytan, dibe mirovên reş. Her çînayetiyê di nava civakê de pêş dixin û dixwazin kî di tebaqaya jêrê de bimîne jî, wan weke şeytan bi nav dikin û reş dikin. Jixwe piştî wê, serdemeke koledariyê jî destpê dike.

Di pêvajoya şewitandina caziyan de hejmarên cuda tên dayin. Hinek dibêjin, 120 hezar jin hatine kûştin. Hinek jî hejmara wan bi milyonan îfade dikin. Di encamê de bi deh-hezaran jin hatine kûştin. Êrîşeke hovane ya bi vî rengî hatiye pêş xistin. Yek jî kesên ku vê hovitiyê dikin, ne kesên nezan in. Kesên herî zane vê yekê dikin. Mesela oldar in. Hemû derfetên madî û manewî di destê oldaran de ye. Yên zanistiyê piranî pêş dixin jî, kesên oldar in. Di nava civakê de herî zêde ew kes ol nas dikin, civakê nas dikin û zanistê jî dizanin.

Her wiha kesên pîspor û wêjevan hene, ew jî piştgiriyê didin heman zîhniyetê. Mesela Descartes, şewitandina caziyan diparêze. Martîn Luther ku di Xiristyantiyê de reform pêş xistiye, şewitandina caziyan diparêze. Şekspir, wêjevanekî pir mezin e, lê şewitandina caziyan diparêze. Mesela li Tirkiye, piştî pêvajoyê darbeyê, gel ew qesî terorîze kirin ku hemû kesên zanyar neçar man ku piştgiriyê bidin vê yekê. Mirovên zanyar, hûnermend û

wêjevan digotin, "*dewlet mafdar e, divê em dewletê biparêzin.*" Niha jî berdewam dike. Ji serdestiyê re îbadet dikin. Hin kesên demokrat hebûn, lê ew jî ber bayê dewletê ketin. Mesela Şener Şen, ji destê Erdoxanê faşîst diyarî girtin. Ango bi awayekî giştî zemînê heyî tê terorîzekirin û her kes jî ber bayê wê dikeve. Lê ne mirovên nezan in.

Di pêşketina zanistê de rista Fransiz Becon pir zêde ye. Dema ku li ser xwezayê lêkolîn jî dike, xwezayê weke biresereke dibîne. Zilam jî weke kesê ku dikare destdirêjiyê bike dibîne. Şewitandina caziyan jî bi vê mantiqê xwezayî dibînin. Di vê derê de berxwedena jinê heye, lê xistina jinê jî heye. Jixwe piştî wê modela jinê ku pêş dikeve îteat dike, destê xwe naxa nava her karekî, biaqil, bêdeng, nerm, her tiştî pêk tîne, dengê xwe bilind nake. Li Rojhilata Navîn di şikestina duyemîn de çi hatibe jiyîn, li Ewropa jî bi vî pêvajoyî re heman tişt tê jiyîn.

Di nava civakê de bêbawerî pêş dikeve. Ev êrîş di heman demê de li hemberî nirxên exleqî û polîtîk yên civakê ye. Li hemberî van rêgezan êrîşeke pir mezin heye. Lewma bêbawerî, heznekirin, ji hev dûr ketin tê pêş xistin. Ew tişt jî civakbûnê parçe dike û civakê ji heqîqeta xwe dûr dixe.

Piştî vî pêvajoyî, zayendiya mirovan jî ji aliyê pergalê ve tê diyarkirin. Êdî civak nikare di derheqê zarok anîn û neanînê de biryar bide. Pergal li ser wan biryar dide.

Civak êdî xwe weke kerî û garanan dibîne. Ew heqereta herî mezin a li dijî mirovahiyê ye. Jiyan dikin, nemirîne; lê ji bo ku pergal xwe bidomîne tenê xizmetî wê dikin û ji bo wê pergalê, zarokan çêdike. Ango pergala deshilatdar, zayendê jî dixe bin serweriya xwe.

Kapîtalîzm jî li ser vê bingehê, heman tiştî didomîne û pêş dikeve. Em nikarin bibêjin, ol pir hişk nêzik dibe, lê kapîtalîzm pir nerm e. Ger wisa be çawa li hev dikin? Lê ne wisa ye. Tundî jî yozbûyinê çêdike, berdan jî yozbûyinê çêdike. Lewma di herduyande jî kes nikare bi vîna xwe tevbigere. Piştî ku wisa be, dixwazê bila li Îranê bi çarşefê bigere, dixwaze bila li Amerîqa tazî bigere. Mesela îro jî dibêjin, bila jin tûrbûnê bide serê xwe, an jî nede serê xwe. Lê herdu jî ferq nakin, lewma wateya jinê nemaye, ji aliyê vînê ve tunebûye. Herdu jî ji hev xirabtir in. Ji aliyekî ve bi nûximandin û girtinê, vîna jinê tê şikestin; ji aliyê din ve jî bi vekirinê, bi heman yozbûyin û bêvîniyê xistina jinê heye. Ango hem di olperestiyê de, hem jî di zanistperestiyê de zayendperestî heye. Herdu jî ji heman derî re derdikevin.

Pê ve girêdayî me got, têgeha jineolojî cara ewil Serokatî kar aniye. Lê peyvên nêzikî vê hene, mesela jinekolojî, jeneolojî heye. Jinekolojî, nexweşiyên jinê re alaqadar dibe, li ser vê lêkolînan dike. Jeneolojî, li ser genan lêkolînan pêş dixe. Jixwe weke geneolojî jî tê xwendin. Lê divê em tevlî hev nekin, jeneolojî û jineolojî cuda ne.

Dema ku li Ewropa pêvajoyê şewitandina caziyan pêş dikeve, weke encam mirov dibîne ku jin gav bi gav ji bedena xwe tê dûrxistin. Mesela jinên pîriktiyê dikin, êdî tên cizakirin. Wisa dibe ku êdî ti kes nikare pîriktiyê bike û anîna dunê ya zarokan jî zehmet dibe. Ger jinek divê pîriktiyê bike jî, divê destûra dêrê bigre. Hêdî bi hêdî vê jî hişktir dikin, jinên ku di dêrê de perwerdehî nedîtibin, nikarin pîriktiyê bikin. Bi demê re jin êdî nikarin bijîjktiyê jî bikin. Mesela jin diçe dêrê heya dawiyê dixwîne, lê bawername nadinê, ger tu nikaribê bawername bistînê jî, nikarê karê bijîjkiyê û pîrîktiyê bikê. Bi vî rengî her ku diçe sînorên jinê tên tengkirin û bi demê re bi tevahî di qada tendûristiyê de jin tune dibe. An jî zanebûna jinê ya li ser bedena mirov ji holê tê rakirin.

Di bingeha pêşketina tipê de jî, bi vî rengî kûştina jinan heye. Jixwe êdî hem pîriktiyê zilam dike, hem jî nexweşiyên jinan re zilam mijûl dibin. Niha jî piranî jinekolog zilam in, zilam ji jinê baştir laşê jinê nas dike. Jin laşê xwe nas nake. Jixwe laşê zilam jî tabû ye. Mesela piranî fîlîman de jinê tazî nîşan didin, lê zilam tazî nîşan nadin, lewma tabû ye. Wisa payeyeke xwedatiyê dayina zilam heye. Lê zilam bi xwe jî bedena xwe nas nake. Mesela mirov êdî ji ber ku bedena xwe nas nakin, nizanin saxbûyina wan çi ye; ji ber vê yekê nikarin nexweşiyên xwe jî bizanibin. Îro laşê mirov ji tipê jî derketiye, li ser wê sektoreke mezin hatiye avakarin. Ger em pergala Konfedaralîzma Demokratîk ava bikin, lê pergala xwe ya

tendûristiyê ava nekin, dê em ê hemû civakê radestî pergala deshilatdar bikin. Lewma civakê li gorî wê xwe arasta kiriye. Serokatî jî perwerdê û tendûristiyê, weke du qadên bingehîn yên zîhniyetê dibîne. Lewma bi van civak ava dibe. Kîjan pergal dibe bila bibe, ger tu bi dehan welatan jî rizgar bikê û pergala xwe pêş bixê jî, ger tu tendûristiyê ji destê deshilatdariyê negirê, tu nikarê wê civakê ava bikê.

Ji milekî ve qirkirina civakan heye, ji milekî ve nexweşkirina civakan heye û civak neçarî pergala deshilatdariyê dibe. Hemû bi hev re dimeşin. Tevî ku ew qesî zanist pêş ketiye, nexweşî jî ew qesî pêş ketine. Mesela tip pir zêde pêş ketiye, lê nexweşî zêdetir in. Lewma ger nexweşî nebin, pergal nikare xwe bide jiyîn. Ji bo wê divê em bi hev ve girêdayî bigirin dest.

Ango deshilatdarî bi vî rengî pêş dikeve. Bi derketina kapîtalîzmê, pîşesazî pêş dikeve, makîne çêdibin, markentalîzm ji holê radibe, cihên nû tên dagir kirin. Di van cihên ku hatine dagirkirin de, şewitandina caziyan pêş dixin. Mesela li dervayî Ewropa cihekî dîtir, şewitandina caziyan tune ye, lê vê yekê weke çekeke deshilatdariyê dibin her cihekî ku dagir kirin e. Mesela, dibin Hîndîstanê. Li wir jî gelek jin şewitandine. Dîsa li Efrîqa gelek jin şewitandine. Weke DAIŞ’a îro ye. Dema ku diçin cihekî hêza wir dişkînin û wir dagir dikin, yekser jinan dişewitînin. Bi vî rengî belav dibe. Hemû cîhanê belav

nebûye, lê qesî ku kolanyalîzm belav dibe, şewitandina caziyan jî belav dibe. Mesela di sedsasa 20’emîn de li Ewropa şewitandina caziyan tune ye, lê li Efrîqa heye. Lewma di wê demê de hê jî li Efrîqa hin welat tên dagirkirin.

Begefîlmek heye; “*tûfek, mîkrop ve çelîk.*” Dema ku deshilatdarî diçin cihekî dagir dikin, hem mîkrop ango nexweşiyên xwe dibin, hem jî feraseta xwe ya şewitandina caziyan dibin. Vê jî weke çekeke bi kar tînin. Çêbûyinên bi vî rengî di bingeha kapîtalîzmê de hene. Em vê pevajoyê jî heya derketina zanist, di çarçoveya şikestina duyemîn de digirin dest, lewma bi ol ve girêdayî ye.

## Di têkoşîna şikestina seyemîn a zayendî de femînîzm û jineolojî

Di sedsala 18, 19 û 20’emîn de, ango serdema kapîtalîzmê de şikestin di paradîgmaya serdest de çêdibe. Ew pêvajoyekî pir girîng e. Dema ku di hegemonyayê de şikestinek tê jiyîn, di bingeha we de têkoşîn û derketinên jinan hene. Pêşketina sosyalîzmê û femînîzmê di vê yekê de diyarker e. Heya niha jî ew têkoşîn berdewam e. Mesela di 1857’an de li New York’ê berxwedana jinan û şewitandina wan heye. Berxwedana Olympe De Gouges û îdamkirina wê heye. Em van berxwedanan jî weke destpêka vî pêvajoyî digirin dest. Her wiha têkoşîna Roza Lûksembûrg, Clara Zetkin em weke bingeke digirin dest.

Ew pêvajo heya niha serdemek e. Em vî pêvajoyî weke serdema şikestina seyemîn a zayendî pênase dikin. Serokatî dibêje, dê ew şikestina seyemîn li dijî zilam çêbibe. Şikestina yekemîn û duyemîn li dijî jinê çêbûbûn, divê şikestina seyemîn jî li dijî zilam çêbibe ku zilam jî azad bibe, jin jî azad bibe. Lê pêşengtiya wê jî dê jin bike.

Naye wê wateyê ku jin, hemû zilaman biguherîne. Ne ku jin, zilaman an bişkînin û tune bikin, an jî weke berê berdewam bike. Jixwe vî pêvajoyî dest pê kiriye û berdewam dike. Ango serdemeke dîrokî ye. Tevî ku em rexne dikin, tevgerên sosyalîst jî di nava vê serdemê de cih digirin. Lewma pêşketinên baş jî ava kirine. Dîsa têkoşîna femînîzmê, bingeha esasî ya vê serdemê ye.

Hevalan di waneyên berê de jî femînîzm girtine dest. Femînîzmê, ji aliyê dîrokî ve berhem û encamên pir girîng derxistine holê. Hin tiştên ku weke tabû tên dîtin, xistine nîqaşê; hin lêkolînên zanistî pêş xistine. Hin zanebûyin pêş xistine û xwe gihandine asta zanebûna demê. Heval carna mînaka femînîzma radîkal didin, lê divê em bizanibin ku pêşketinên pir girîng derxistine holê. Paradîgmaya serdest, bi awayekî giştî nehatiye şikestin, lê lêpirsîn kirin, guman jiyan kirin, ji bo jiyaneke dervayî pergala deshilatdar ketina nava lêgerînan pir girîng e. Hê jî ew rista xwe dîlîzin. Mesela îro jî hin kom hene, piranî teoriya jiyana dervayî deshilatdariya zilam pêş dixin.

Em yek bi yek, pêl û pengavên femînîzmê venakin. Zêdetir em dixwazin sedema ku em cihê femînîzmê jineolojiyê pêş dixin bigirin dest. Serokatî di paraznameyê de dibêje, weke têgeh divê cihê femînîzmê jineolojî were karanîn. Femînîzm, weke têgeh tê wateya kadincilik-jintî ye. Dema ku ‘îzm’ bi têgeheke ve were kirin, weke bîrdoziyeke dibe. Em vê rexne dikin. Weke ku hegemonyayeke ava dike, pêş dikeve. Jixwe Femînîzm hinekî ji wî alî ve diçe. Ji aliyê têgehê ve em bi vî rengî rexne dikin.

Lê weke feraset femînîzm yekalî ye û tenê jinê derdixe pêş. Lê Serokatî dibêje, bi jineolojî em hem jinê hem jî jiyanê digirin dest. Jineolojî, weke me destpêkê de jî got, zanista jin û jiyanê ye. Zanista me ya civakî ye.

Li hemberî femînîzmê hin rexneyên me jî hene; ya yekemîn, di mijara azadiya jinê de gelek lêkolîn hatine kirin, lêpirsîn li ser gelek têgehan kirine, xebatên lêpirsîn û mezinkirina mejî çêkirine. Van tiştan hemû pêş xistine, lê dîsa jî di perspektîfeke teng de mane. Çima teng dimînin? Jixwe parçe parçe ne û her yek ji aliyê xwe ve mezî dike. Mezîkirineke çînî heye. Meseela femînîstên sosyalîst de, mezîkirineke çînî heye. Tenê jinên karker digirin dest. Ew yek têra pênasekirina jinê nake.

Serokatî got, “*çîna yekemîn a dîrokê ku bindest bûye jin e.*” Ji bo wê divê em hemû jinan weke çîneke jêrîn û bindest bûye binirxînin. Di nava civakê de jî çînên bindest

hene, di nava wan de jî jin hene. Tenê bi ew jinên ku di nava çînên bindest de ne re mijûlbûyin, dihêle ku di mijara azadiya jinê de femînîst jî teng bimînin. Jin hem çîna yekemîn e, hem netewa yekemîn ku hatiye xistin e. Ew yek bi dîrokî mezîkirinê ve jî girêdayî ye; ger em ji serdema hiyerarşiyê ve bigirin dest û heya îro binirxînin, em ê nêrîneke rastir pêş bixînin; lê em tenê bi derketina kapîtalîzmê bigirin dest, em ê jî teng bimînin û tenê jinên karker esas bigirin. Rexneya esasî, teng mezîkirina çînî heye. Pê ve girêdayî jî mezîkirineke dîrokî ku giştî şaristaniyê tehlîl dike pêş nexistine. Mesela gelek teorî hene, pirtûkên ku jinên femînîst nivîsandî hene. Şaristaniyê jî cih bi cih tehlîl dikin, lê weke pergal girtina dest a şaristaniyê û dahûrandin tune ye.

Dîsa şêwaza rêxistinbûyina wan, em rexne dikin. Ya rast rêxistinbûyineke pir xurt tune. Pêşxistina teorî û zanebûnê esas digirin. Pêşxistina hinek têgehên teorîk û akademîk esas digirin. Di nava civakê de rêxistineke pêş xistin û civak guhertin tune ye. Teoriyeke ku bi civakê re hevdîtin çêneke, têkilî danîne, ji rastiyê qut e. Lê femînîzm teoriyê pêş dixe, zanebûn ava dike. Mesela di dahûrandina baviksalariyê û zayendperestiyê de rista femînîzmê pir girîng e. Em jî li ser vê dahûrandinan dikin û di kesayetên xwe de digirin dest. Lê dahûrandinên femînîzmê pir kûr in. Lê di nava civakê de li ser wê esasê rêxistinkirin û guhertinek tune ye. Jixwe dibêjin, *"em bingeha wê ya zanistî pêş dixin.*"

Ji ber vê yekê Serokatî got, *“ger mîlîtaniya wî karî pêş nekeve, dê ew jî weke sosyalîzma pêkhatî bibe.*” Divê mîlîtantiya van fikiran jî hebe. Ger femînîzmê xwe di nava civakê de rêxistin bikira, hem li ser civakê tesîreke mezin bikira, hem jî teoriyên wan ku ne li gorî rastiya civakê ne wê derketibana holê. Dê bikaribana li gorî wê rastiyê xwe careke din ber çavan re derbas bikin. Ji bo pratîzekirina teoriyê, rê û rêbazeke wan tune ye. Tenê yek bi yek, kom bi kom tên gel hev. Mesela jinek teoriyeke dinivisîne, li gorî wê di femînîzmê de pêlek çêdibe.

Ya dîtir, femînîzm jinê û zilam tehlîl dike. Baviksalariyê, têkiliya zayendî, bi riya têkiliya zayendî avakirina deshilatdariyê tehlîl dikin, dahûrandinên zilam dikin. Lê ji bo guhertina zilam perspektîfeke wan tune ye. Guhertina zilam pir girîng e. Di vê derê de jî femînîzm yekalî dimîne. Ji bo jinê dibêjin, nizanim wê çawa xwe pêş bixe, xwe çawa deshilatdarî û baviksalariyê qut bike ûhwd. Lê milê din yê civakê jî heye. Ew dubendiyeke xwezayî ye. Jin bêyî vê dubendiyê nikare jiyan bike. Divê guhertina zilam jî, ji bo xwe esas bigirin.

Piştî salên 1980’î di pêlên femînîzmê de lêkolînên pir kûr jî çêbûn. Femînîzma radîkal-mîsoger kûliyeteke mezin ava kirin, bûn xwedî danehev. Bi serdemê ve girêdayî jî hin encam derketin. Mesela hilweşandina hin pergalan hebû. Daneyên wê derketibûn holê. Vê yekê jî hişt ku lêkolînên xwe kûrtir pêş bixin û careke din xwe lêpirsîn bikin. Lê di nava xwe de hinekî teng man, civakî nebûn.

Bêgûman pergala deshilatdar ji vî alî ve baş didahûrînin û tehlîl dikin, lê jiyaneke dervayî pergala deshilatdar jî neceribandine. Mesela Serokatî got, “*bila jin ji zilam qut bibe, yekîneyên xweser ava bikin, tenê bi vî rengî jin dikare ji zilam qut bibe.*” Tenê ji pergala deshilatdar qutbûyin têrê nake, dê fîzîkî qutbûyin jî bihêle ku jin di zîhniyeta xwe de azadbûyineke ava bike. Em nabêjin teqez divê em di mejî de qut bibin. Ew rast e, lê qutbûyina fîzîkî jî dihêle ku tu bi awayekî azad xwe ava bikê. Ji bo vê mecalek vedibe. Ango dervayî pergala deshilatdar û zilam, jiyanek ava kirin pir girîng e. Lê di femînîstan de ceribandineke bi vî rengî tune ye.

Ceribandinên çawa hene? Komên biçûk yên jinan hene û bi hev re jiyan dikin. Vê yekê jî li ser esasê sazîbûyineke û ji holê rakirina pergalê dar naxin. Weke hilbijêreke şexsî vê yekê pêş dixin. Weke modeleke civakî ku pêşengtiyê ji civakê re bike pêş naxin.

Pirsa “em ê çawa jiyan bikin” pir girîng e. Di jiyanê de jin, zilam, zarok, ciwan, extiyar heye; zayendî, aborî, ked, pêwîstî, birçîbûn, pirsgirek hene. Dema em dibêjin jiyan ew tişt hemû tên bîra mirov. Ji bo wê jî pirsa “*em ê çawa jiyan bikin*” ne pirseke ji rêzê ye. Dema ku mîlîtanek vê pirsê bi awayekî kûr li xwe bike û bersivên wê bigere, dê em ê ber bi şoreşgertiya encamgir ve biçin. Di femînîzmê de pirseke bi vî rengî nehatiye kirin, ezezî û şexsiyet derketiye pêş. Di nava jiyana lîberal de jiyîn heye.

Ya dîtir jî, di mezîkirinê de oryantalîzm heye. Ji ber ku çavkaniya derketina wan Rojava ye, ji Rojava cîhanê mêzêkirin heye. Bi vî rengî mezîkirina Rojhilat û Rojhilata Navîn jî heye. Di nava wan de sekneke parçe jî heye. Neofemînîzm heye, ekofemînîzm heye, femînîstên sosyalîst hene, femînîstên mîsoger hene. Ev parçebûn nahêle ku hêzeke xurt ava bibe. Dihêle ku marjînalbûyin pêş bikeve. Jixwe pratîkbûyinê esas nagirin.

Tevî ku çavkaniya derketina wan Rojava ye û nêrîneke oryantalîst heye, xwe gerdûnî dibînin. Li gorî wan hemû tevgerên ku têkoşîna jinan dimeşînin, divê xwe weke femînîst bi nav bikin. Em jî xwe weke femînst pênase dikin û xwe dervayî femînîzmê nabînin. Lê em ne tenê femînîst in, em hem femînîst in û mafê jinan diparêzin; hem jî azadkirina civakê û zilam jî difikirin. Ji ber wê hemû tevgerên jinê, di sînorên femînîzmê de pênasekirin şaş e. Ya dîtir jî hemû jinan nagire nava xwe. Dema ku em tevgerên femînîst mezî dikin, yên di nava wan de cih digirin, hemû jinên xwedî temeneke navîn û jortir in. Di nava jinên ciwan de kar meşandin, rêxistinkirina jinên ciwan pir kêm e.

Jixwe di nava civakê de hin tiştan jiyan dikin, digihêjin ûmrekî û wisa hin tiştan têdigihêjin. Ji nû ve perwerdekirina zarok û ciwanan pêş nabînin. Ji bo hin xebatên me jî derbasdar in. Carna hin qadên xebatên me, heval ji malbatên welatparêz re dibêjin zarokên xwe bidin xwendin. Lê em niha dixwazin tesîrên wê xwendinê li ser

xwe paqij bikin. Di tevgerên femînîst de jî nêzikatî bi vî rengî ye. Tiştên ku di nava pergala kapîtalîst de tên jiyîn, weke ceribandin û danehev pênase dikin. Piştî hewil dide dervayî pergalê xwe bi awayekî azad ava bike.

Dîsa ji ber ku di navenda mezîkirina wan de Ewropa heye û nikarin vê yekê derbas bikin, tenê zilam û dewletê weke hêz dibînin. Hêza yekane wan dibînin. Difikirin ku li her cihî wisa ye. Ji ber ew mezîkirina bi hêleşaşî, nikarin ji dewlet û zilam jî qut bibin. Tevî ku têkoşîneke li dijberî pergala deshilatdariyê dimeşînin, qutbûneke giştî jî nikarin çêbikin.

Têgeha baviksalariyê baş tehlîl dikin. Di nava civakê de deshilatdarî çawa pêş dikeve û dibe çand, baş dinirxînin. Lê pirsgirekên ku li derdora jinê pêş dikevin, rista jinê ya di nava civakê de, rista jinê ku mirovbûyin û civakbûyinê ava dike, tam dernexistine zanebûnê. Dizanin ku jin tê pelçiqandin, zilam li ser jinê tûndiya fîzîkî, derûnî û zayendî pêş dixe. Ew tişt derxistine zanebûnê, lê li derdora jinê jî civakbûnek tê avakirin. Jin azad be jî li derdora wê civakbûnek tê avakirin, jin kole be jî li derdora wê civakbûnek tê avakirin. Jin kole be, civak jî kole ye; jin azad be, civak jî azad e. Ew mijar pir girîng e. Bêguman armanceke me xwe azadkirin e, lê armanca me ya esasî jî civak azad kirin e. Ji ber wê em di nava civakê de ew qesî xebatên civakî dimeşînin û perwerdehiyan dardixînin.

Di nêzikatiya femînîzmê de ji vî alî ve kêm mezîkirinek heye. Ne ku jinê û civakê nas nakin. Lê di bingeha wê xeletiyê de ezeziya Ewropa heye. Di bingehê de lîberalîzm heye, vê yekê derbas nakin. Ji ber vê yekê jî pirsgirekên şexsî digirin dest. Dibe ku mirovek di xwe de asteke zanebûnê û jiyanê derxîne holê, lê keleka te civakeke kole hebe, tu jî nikarê azad bibê. Divê bi pêşxistina xwe ya şexsî mirov asta derketî bes nebîne. Paradîgmaya azadiyê kêm dimîne.

Ya dîtir jî, ji gelek aliyan ve rexneyên femînîstan hene. Rexneyên radîkal dikin, baş e. Ji hin aliyan ve ji me zêdetir zilam û pergala zilamtiyê rexne dikin. Lê tuyê bi zilam re çawa jiyan bikê? Vê yekê pênase nakin. Lewma li ser guhertin û azadkirina zilam pir zêde lêpirsîna wan çênebûye. Pîvanên bi hev re jiyankirina jin û zilam ava nekirine. Projeyeke hevjiyana azad ku Serokatî daniye pêşiya me, di femînîzmê de tune. Mijareke pir girîng e. Ger alternatîfeke me ya jiyana civakî tune be, em çiqasî bibêjin jiyana heyî şaş e jî, bê wate ye. Divê bi rexneyên çêker, alternatîfa wê jî were avakirin.

Serokatî, teoriya şikestina seyemîn li dijî zilam danî, bîrdoziya ji zilam qutbûyinê danî, teoriya hevberdana bêdawî danî, herî dawî weke timamkirina projeya xwe ya nîvço mayî hevjiyana azad danî holê. Bi rastî jî ji her alî ve digire dest û alternatîfan datîne holê. Mirov tenê li ser hevjiyana azad lêhûrbûneke kûr bike, mirov dikare jiyaneke azad bijî. Ne ku bi cîldên pirtûkê dagirtî ye,

angaşta hevjiyana azad ya Serokatî çend pel in. Lê naveroka wê pir xurt e, mirov bi awayekî rast bigire dest, ew têrê dike ku mirov jiyaneke azad bijî.

Femînîzm ji bo vê yekê hewildanek nîşan nedaye. Rast e, li ser tundî, şikence, zilamtî, deshilatdarî û tûndiya zayendî dahûrandinên kûr dike. Tûndiya zayendî jî, tenê ne desdirêjî ye. Divê em vê jî rast fêm bikin. Îro hemû têkiliyên zayendî ku di nava civaka me de bi awayekî xwezayî qala wan tê kirin, tûndiyên zayendî yên li ser jinê ne. Mesela hin dayikên me hene, deh zarokên wan çêbûne. Lê dibêjin me têkiliya zayendî jiyan nekiriye, dibêjin me hîs nekiriye ku em tenê di kêliyeke de jî aîdî xwe ne. Mirov pir jê tesîr dibe. Zarokên wê dayikê û hevserê wê jî hemû şoreşger in. Zilamekî ku mirov ew qesî dixe re mirov çawa dikare jiyan bike, em di nava jiyaneke wisa de xwe çawa ava bikin. Tiştên ku wê dayikê jiyan kirine, tûndiyên zayendî ne.

Em jî weke zarok, berhemên têkiliyeke wisa ne. Dema mirov vê yekê difikire, mirov hebûna xwe şerm dike. Pêwîst nake ku teqez destdirêjî li ser jinê çêbibe, jixwe di nava malbatê de jiyîna her têkiliyeke zayendî, weke destdirêjiyek e. Jin weke xwe jiyan nake. Di gelek cihên Rojhilata Navîn de, sûnetkirina jinan heye. Dûrîtina rahîmê wan heye. Da ku têkiliya zayendî jiyan neke. Ango dervayî destdirêjiyê, di nava civaka me de tûndiya zayendî li ser jinê pir zêde ye.

Ew ji bo me jî derbasdar in. Dibe ku em kadro bin û têkiliyên zayendî jiyan nekin. Lê her kêliya ku em xwebûnê neafrînin û bi vî awayî li hemberî jinê tevgereke raber dikin, em tûndiyê dikin. Ji ber wê divê lêhûrbûneke me hebe, ka ew civak çi jiyan dike, dê çawa ji vê rewşê derkeve. Divê her lêgerîneke me hebe. Hevalên me yên herî pêşketî ku di qada civakî de kar dikin, dema ku di navbera zilam û jinê de pirsgirekek tê jiyîn, mezî dike ka tûndiya fîzîkî li ser jinê hatiye meşandin, an na. Ango ger li jinê nedabe, pirsgirek tune ye.

Mesela careke ji Başûr jinek hatiye û gilî li hevalan dike, dibêje, "*hevserê min bi zorê min re dikeve têkiliya zayendî.*" Hêvalê me yê xort, ji ber ku weke pirsgirek nabîne pê re mijûl nabe. Lê ew jin pesîra hevalan bernade. Di dawiya dawî de du hevalên jin diçin ku zilam re biaxifin. Zilam ji wan hevalên jin re bi awayekî çort ji dibêje, hûn kadro ne, hûn vî tiştî nizanin. Ango ferasetek destdirêjiyê di nava civaka me de heye. Gelek tiştan li ser me jî ferz dike.

Serokatî got, "*ger pêwîst bike, divê hûn 5 salan nêzikî jina xwe nebin.*" Em ê çawa di vê mijarê de civakê qaneh bikin. Tiştê ku ji civaka me re hatiye hiştin tenê têkiliya zayendî ye. Ji ber vê yekê heya ku guhertineke kûr ya zîhniyetê çênebe, civak jî hema pîvan nagire. Gelek tişt di nava civakê de tên jiyîn, lê nikarin bînin ziman. Mesela dayikek dikare were û ji hevalên kadro re bibêje, hevserê

wê tûndiya fîzîkî li ser we meşandiye, hema nikare bibêje tûndiya zayendî li ser ferz kiriye. Her wiha zarokên kûr ku rastî destdirêjiyê tên hene. Nikarin vê yekê bînin ziman. Lewma di nava vê civakê de ger were zanîn ku tiştekî bi vî rengî hatiye serê wî, dê divê pişt re xwe bikûjê. Pir caran jin û merên ku ji aliyê polîsan ve rastî destdirêjiyê hatine, întîhar dikin. Nikarin bi wê yekê jiyan bikin.

Bi kurtasî di nava vê pergalê de jiyaneke xwezayî tune ye. Mirov, mirovan dikûje; mirov, mirovan difiroşe. Di nava pergaleke bi vî rengî de têkiliya zayendî jî bi awayekî xwezayî naye jiyankirin. Di femînîzmê de jî ew mijar pir hatiye nirxandin, lê pîvanê bi hev re jiyînê yên jin û zilamekî jî tune. Ji bo vê jî civak îflah nabe.

Bi awayekî giştî em dikarin bibêjin, derketina jineolojî jî, li ser esasê ji holê rakirina van kêmasiyên femînîzmê û timamkirina wan e. Jineolojî dixwaze, kêmasiyên femînîzmê timam bike û şaştiyên wê jî ji holê rake. Serokatî ji bo hêzên dijî pergala deshiltadar dibêje, *"rexneyên min ji bo timamkirinê ne.*" Ango li dijberî wî cih nagire û wisa rexne nake, di heman cihî de sererastkirineke çêdike. Bi vê yekê em civakbûnê û pîvanên civakbûyinê ji nû ve diafrînin. Bi jineolojiyê em angaşt dikin ku em femînîzmê derbas bikin, femînîzmê di nava xwe de jî bihewînin û di nava civakê de asta herî jor de zanebûneke biafrînin. Em dixwazin hem zanista wê, hem felsefe û teoriya wê, hem jî aliyê wê yê civakî pêş

bixin. Em dixwazin li ser esasê jineolojî, di hemû qadên jiyanê de xebatan bimeşînin. Em dixwazin di bin bana jineolojî de, pratîka jiyana azad ava bikin. Mesela di gundekî de tenê jin dikarin bi serê xwe jiyan bikin. Divê ji vî alî ve ceribandinên me hebin.

Careke di televîzyona Ronahî de, bernameyek derket. Cihek hatibû vekirin, jinên ku nezewicîne û jinên ku hevserên wan mirîne tê de dixebitin. Hevalên me hema gotin, "*jinebîhan atolyeyek vekirine.*" Lê ne rast e. Jinebî ji bo jinên ku hevserê wan miriye tê gotin. Lê jinên ku qet nezewicîne re tu nikarê bibêjê jinebî. Ew jî di nava wê atolyeyê de cih digirin. Ji ber vê yekê divê em pênaseyên xwe dîqat bikin. Her wiha divê bi Kurdî jî em pênaseyên nû pêş bixin. Weke jineolojî di vê mijarê de jî angaşta me heye.

## Pirs û nîqaş

**Hevala X…:** Hat gotin ku "*di navbera olperestî û zayendperestiyê de têkoşînek heye*." Ew nirxandin, min tam fêm nekir.

**Hevalê X…:** Projeya Serokatî ya avakirina bajarên Star hebû. Bawerim hê jî pêş neketiye, projeyeke wisa niha di rojevê de ye, an na?

**Hevala X…:** Dema ku em di zindanê de bûn, me nûçeyek bihîst ku di zindana Mêrdînê de li hemberî du kesan desdirêjî çêbûye. Ji ber ku di nûçeyê de tenê tîpên

destpêkê yên navê wan hatibû dayin, me nizanî jin in, an zilam in. Me got, qey hevalên me yên jin wê derê ne, me hemû nas dikirin. Me hema ji wan re name nivîsand ku em rewşê fêr bibin. Lê hevalan bersiv nedan. Piştî mehekê cardin di rojnameyê de heman bûyer derket, me dît ku herdu jî hevalên xort in. Du hevalên ciwan bûn. Li ser wan gelek şikenceyên fîzîkî û zayendî dikin. Lê ji ber ku şerm dikin ji hevalan re jî nabêjin. Pişt re heval bi xwe pêdihesin ku dijmin wisa nêzikî du hevalan dibe.

Dijmin ji wan re digotiye, hûn zilam in, hûn ê çawa jiyan bikin. Ji we re çek, xwe bikûjin. Bi wî rengî wan herdu hevalan tînin nava hevalan, dizanin ku nikarin bibêjin jî. Lê dema ku heval pê dihesin, gazî parezeran dikin û dijmin teşîr dikin. Hevalan, herdu hevalên ciwan ku rastî desdirêjiyê hatine qaneh dikin da ku dijmin teşîr bikin, da ku cardin nikaribin bûyerên bi vî rengî çêbikin. Wan hevalan jî her tişt bi awayekî vekirî jî çapemeniyê re gotibû, lê navê wan hevalan nehatibû eşkerekirin.

Lê her kesî hêvî dikir ku ew herdu heval întîhar bikin. Lewma dibêjin jin fêr bûye, jixwe şerm bike jî, întîhar nake. Lê ji ber ku ew heval heya asteke hatibûn qanehkirin û hin tişt derbas kiribûn, bûyer hemû gotibûn. Jixwe weke min got, dema me nûçe di destpêkê de bihîst, me jî got qey hevalên jin in.

Zilam di van mijaran de hesas e, ji ber ku simbêla wî jê dikin, dibêje namûsa min çû. Mesela ji ber ku di

şikenceyê de simbêlên hevalên xort jêdikirin, bi mehan û salan dernediketin derva. Hê jî mirovên di dema darbeyê de hatine girtin û hatina şikencekirin hene, ji ser re 30 sela derbas bûye, lê hê jî dema ku derdikeve nava civakê serê xwe dixin ber xwe. Derûniyeke pir xirab e. Ji vê derê jî mirov fêm dike ku di encama êrîşên pergala deshilatdar de şikestina herdu zayendan bi hev re ye. Her wiha du sal berê, ji ber ku dewletê di zindanê de simbêlên du zilaman jê kiribûn, herduyan bi hev re xwe şewitandibûn.

**Hevalê X…:** Hevalan gelek mijar vekirin, di mijara azadiya jinê û nêzikatiyên di nava civakê de tehlîlkirinek çêbû. Ji ber wê dema ku mirov pirsgireka jinê bigre dest, mirov nikare tenê bi jinê bigire dest. Bi awayekî giştî bi civakê ve girêdayî ye. Tesîrên vê yên erenî û neyînî li ser me jî hene. Mirov nikare xwe jê dûr bigire dest.

Her wiha da ku civak vegere ser cewhera xwe em têkoşîneke dimeşînin. Di vê derê de divê em jinê jî weke bingeha çareseriyê bigirin dest. beriya ku ez tevlî tevgerê bibim, li hemberî jinê bertekeke min jî hebû. Tiştên ku dihatin serê jinê min weke heq kiriye pênase dikirin. Lewma meteke min hebû, rojeke telefonî me kir û got hevserê min li min daye. Em çûn û me anî malê. Her cihê wê mor bûbû. Pişt re me xwest ku ji hevserê xwe veqete. Lê pişt re meta min çû û dîsa xwe radestî hevserê xwe kir. Ew yek pir zora min çû. Ji ber vê yekê êdî çi bihata serê jinê, min digot heq dike. Lê dema ku ez niha lê mezî

dikim, ez fêm dikim ku meta min jî radestî nêrînên wê civakê bûbû. Ger meta min venegerîba gel hevserê xwe, her çiqasî em jê xwedî derbiketina jî, dê civakê bi çavekî dîtir lê binerîba.

Ew mînakeke biçûk e, lê di şexsê wê de ez dikarim bibêjim piştî tevlêbûna min di nêrîna min a jinê de hin guhertin çêbûn. Lê naye wê wateyê ku ez jinê weke xwedawendeke dibînim û nêzikatiyên min çar çar in. Mesela dema ku em jineke re diaxifin, em dibêjin niha yek bibîne dê bibêje, çi zilamekî layt e! Ango jinê re axifîn, zilam biçûk dixîne. Her wiha di nava partiyê de têkiliya jin û zilamekî çawa çêdibe, li gel jinê çawa tê jiyîn, hê jî gelek mijarên ku ez nikarim ji navê derkevim hene. Hin pîvanên giştî yên partiyê hene. Lê di kîteyan de mirov şaşwaz dibe.

Dema ku em pirsgireka jinê nîqaş dikin, weke hevalên xort em bi henekî digirin dest. Jixwe ew diyar dike ku em biçûk digirin dest. Ji ber vê yekê em nikarin gelek pirsgirekên xwe çareser bikin. Em dibêjin, jin falan tişt û bêvan tişt e. Lê em vê mijarê di şexsê hevalên jin yên gel xwe de digirin dest. Ne ku ji aliyê felsefî û zîhnî ve em dahûrandineke kûr dikin. Ji ber vê yekê em ne dikarin kesayetiyên xwe bidahûrînin, ne jî dikarin pirsgirekên xwe yên civakî çareser bikin. Ji ber ku pir zêde tesîra ol, baviksalarî û deshiltadariyê li ser me heye ku em nikarin li ser hîmekî teqûz van tiştan nîqaş bikin.

Jineolojiya ku Serokatî pêş xistiye jî, di van mijaran de ji bo me hemûyan ronahiyek e. Lewma divê her merek, fêmkirina jinê û li gorî cewhera jinê nêzikî jiyan û civakê bûyinê ji xwe re weke peywireke bibîne. Em her dibêjin, bila jin me azad bikin. Lê divê em xwe azad bikin û astengiyên ku em ji bo azadiya jinê pêş dixin jî divê em holê rakin. Dibe ku jin ji jiyan û azadiya civakê re pêşengtiyê bike, lê ew peywir hemû weke karê jinê dîtin û xwe di vê mijarê de berpirsyar nedîtin, ne rast e.

Di nêzikatiyên jinê de jî, hin kêmasî hene. Dema ku mêr mezî dikin, weke ku hemû zilam yek bin, digirin dest. Weke ku zilamê di nava civakê de jî yek e, gerîla jî yek in. Zîhniyeta zilamtiyê, di şexsê her merekî de nirxandin heye. Rast e, zîhniyeteke giştî ya zilam heye, lê di nava têkoşîna me de, çiqasî kêmasiyên me hebin jî, me gelek tişt derbas kirine. Her wiha dema ku zilamek di nava partiyê de kêmasiyeke jiyan dike, cihê dahûrandina zîhniyeta dîrokî û civakî, zêdetir bertek derdikevin holê. Ji ber vê yekê hê jî em nakokiyan jiyan dikin û em nizanin çawa nêzik bibin. Ger em tevlî partiyê bûbûn, jixwe em bi dil tevlê dibin û her tiştî wisa qebûl dikin.

**Hevala X…:** Zîhniyeta zilam di şexs de girtina dest rast e, ne şaş e. Ya din jî em li hemberî kesan tênakoşin, kî dibe bila bibe em di şexsê wî de şerekî zîhniyetê dimeşînin. Dixwaze bila bav û birayê mirov be, dixwazê bila hevalê me be. Em bi vî rengî binirxînin dê baş bibe.

Mesela zilamên şoreşger, di mijara zayendperestiyê de her tiştê xwe derbas kirine? Dema ku di şexsê mirov de lêpirsîna hin tiştan were kirin, divê zora me neçe. Ger em di kesayetiya xwe de nikaribin lêpirsîna wê zîhniyetê bikin, wê tenê weke teorî bimîne. Dibe ku li gorî jiyana civakî tiştên ku me derbas kiribin û hin guhertin jiyan kiribin; lê hem weke jin, hem jî weke zilam hê jî tesîrên zayendperestiyê li ser me hene. Rast e, Serokatî feraset û jiyaneke alternatîf daniyê holê û em jî di asteke de gihêştine zanebûna wê û hewil didin di kesayeta xwe de jiyanî bikin. Lê hê jî tesîra bermahiyên pergala deshilatdar li ser me hene, divê em her lêpirsîna vê jî bikin.

**Hevala Dilzar:** Heval got, em bi dil tevlê bûne û tiştên ku pêk tînin dipêjirînin û dikin. Ma me hemû tesîrên pergala deshilatdar li ser xwe avetine. Mesela hevalên ku li qada civakî xebitîne dikarin hin mînakan bidin, bi rastî jî dema ku em diçin nava civakê em çawa nêzikî jinê dibin? Perspektifên çawa didin? Em pirsgirekên civakî yên wê derê çawa çareser dikin? Em di nava civakê de jî weke vê derê bi dil hin tiştan dikin, an nêzikatiyên me yên cuda hene? Heval dikare lêpirsîna xwe ya vê mijarê de bîne ziman.

Ez mînakeke bidim. Ji bo karekî ez çûbûm bajarekî. Hevalekî xort hebû, hevalekî kevn bû û hevalekî rêzdar bû. Min çend caran ew dîtibû. Wî hevalî ez birim maleke. Dema em çûn malê, kêliyê em ketin malê ew heval pir

guherî. Ger berê min nas nekiriba, min bawer nedikir ku ew heval e. Ji rûniştina wî bigre, ji jina malê av xwestinê bigire ferqeke wî ji zilamên yên civakê tune bû. Sekin û axaftina wî li gorî kevneşopiya baviksalarî bû. Lê beriya wê çend deqîqeyan em derva hatin nêzikatiya wî ne wisa bû. Berê jî min, ew nas dikir, ne hevalekî wisa bû. Ger yekî biyanî bihata wê malê, ji sekina wî fêm nedikir ka zilamê malê ye, an heval e. Carna wisa dibe.

Min çima ew mînak da. Bêgûman hem weke jin, hem jî weke xort em di vê derê de asteke ava dikin. Lê dema ku em diçin qada civakî em li gorî rêgezên baviksalariyê dimeşin. Xwe ju nuda li gor rêgezên jiyana azad çêkirin, avakirin lawaz e. Hevalên jin jî carna wisa dikin. Mesela hevalên me yên jin ku li ... dixebitin, çend jin ji mûtbaxê derxistine, jiyana çend jinan guhertine. Lê ya zilam xetertir e. Pir zû deshilatdariyê ve dibin yek. Encamên wê jî pir dişkînin. Li ... gelek mînakên wê derketin holê. Ev pirsgirekên kesan e, lê ev kes jî ji nava me derketine. Dibe ku em li vê derê pirsgirekeke wisa jiyan nekin, lê yên keleka me û ji me xortir tevlî jiyanê dibin, diçin û pirsgirekên wisa derdixînin, wê demê navê ku mirov xwe lêpirsîn bike. Kesekî ku di cewhera wî de ew qesî xirabî heye, heya vê demê di zemîna me de çawa xwe daye jiyandin. Ji ber vê yekê divê xwe kûr lêpirsîn bikin. Jixwe ger em weke pirsgirekên şexsî bigirin dest, em jî nikarin ji navê derkevin.

Dibe ku em îro bi dil tevlê dibin û hevaltiyeke xort jî dikin, lê divê em her lêpirsîna xwe berdewam bikin û di kesayeta xwe de sazîbûneke ava bikin. Jixwe me nasname û kesayetek girtiye, em nabêjin dê her kes xirab bibe. Lê pergal jî hin tiştan pêşkeşî me dike. Bi taybetî li ser zilam tesîrên wisa hene. Rastiyeke wisa jî heye.

**Hevalê X…:** Ez carna naxwazim bi ti awayî alîkariya hevalên jin bikim. Ez wisa difikirim ku niha mer, ji aliyê fîzîkî vê ji jinê xurtir e. Rojeke hevaleke jin barekî giran dabû pişta xwe, ez jî vala dihatim. Min got, ez alîkariya te bikim. Got, çi ji te re, ez ê barê xwe bi xwe rakim. Bi bertek nêzikbûn heye. Dema wisa dibe di serê mirov de jî dîtinek çêdibe, gelo hevalên jin me hemûyan wisa dibînin? Min ji xwe jî pirsî, gelo bi zor dayina xwe, jin dixwaze hêza xwe îspat bike? Dibe ku sedem ew be. Dixwaze, ji ew rista karê malê ku di nava civakê de jê hatiye barkirin derbas bike.

**Hevala Dilzar:** Weke hevalên jin mejiyekî me yê civakî heye. Mêrên ku berê alîkariya wan kirine, çawa serê wan bûne bela dîtine. Alîkariya wan kirine, lê pişt re jî gotine "*nikare barekî jî rake.*" Ango gelek mînakên wisa hene ku jin bêwate kirine. Nêzikatiyên pir cuda hene. Dibe ku heval bibêje, di vê derê de sûçê min çi ye? Dibe ku bi niyeteke baş jî were gotin. Lê me jî gelek wane derxistine. Divê derûniya kesên hemberî xwe jî hûn bifikirin. Çima helwesta jinê wisa ye? Divê weke hevalên xort hûn hinekî

din bi kûranî li ser bifikirin û hewil bidin ku derbas bikin. Jixwe ew tê wateya jineolojîk mezîkirinê. Ango divê tenê mirov rûyê bûyeran ku tê xûyakirin nebîne, kûraniya wê divê were dîtin. Ji bo zilamekî dîtina wê di mijara zîhniyetê de jî gavek avêtin e.

**Hevalê X…:** Hê jî ez qaneh nebûme. Jiyaneke me ya hevpar heye, ger wisa bi pêşderazî mezîkirin hebe, dê em ê çawa jiyaneke hevpar ava bikin? Ez nakokiyên xwe dibêjim. Mesela em qampê çêdikin. 8-9 hevalên jin hene, dibêjin bila hevalekî xort were û falan tiştî rake. Bi vî rengî xwe mûhtacî zilamekî kirin, zora min diçe. Bawerim xwe lêpirsîn kirin ji bo herdu aliyan jî pêwîst dike. Bi taybetî dema ku ez xeta Berîtan û Zîlanan difikirim û kêmasiyên ku di şexsê hevalên jin de derdikevin pêş dibînim, ez eciz dibim.

**Hevala Dilzar:** Dibe ku hin mînakên rastî bin jî, lê nêrîneke çawa heye; li hemberî jinê her nêzikatiyeke lêpirsîner heye. Dema jin kêmasiyeke dike, tu dibêjê temam jin ew e. Nikare vê yekê derbas bike. Dibe ku heval baweriya xwe jî hevalên jin yê vê derê bîne. Lê bi nêrîneke ku jinê her lêpirsîn dike jî ne rast e, cihê wê çima hewil naye dayin ku jin were fêmkirin.

**Hevala X…:** Mirov nizane ji kû dest pê bike. Berê jinan di nava rojê de 24 seatan kar dikirin, mafê wan yê axaftinê jî tune bû. Bimra jî bimaya jî, nexweşba jî, ti kesî nedigot bila rojeke malê be û bêhna xwe bide. Her wiha ji

aliyê fîzîkî ve berê pir tundî hene. Lê dema ku ti îro mezî dikê, li gorî berê zêdetir tundî li ser jinê hatiye ferzkirin. Zarok jî, keç û xort be li gorî wê nêzik dibin. Li gorî wê mezin dikin, jinê bi zarokî ve dikin nava qaliban û sînorên pê re datînin.

Mesela di malê de ez ya mezin bûm. 9 heb xûçk û birayên min hene, ji wan 8 heb min bi destê xwe mezin kirine. Birayên min jî 6 bûn. Min ew qesî ked da wan, ez weke dayikê bûm ji bo wan. Lê birayên min digotin, ez kûr im, mafê min yê kirina her tiştî heye, lê ti nikarê tiştekî bikê. Ger min bixwasta biçama cihekî, digotin divê birayekî te bi te re were. Zarokekî çar salî ji bo te dikin nobedar. Ew kûrik biçe kû, çi bike, bi çi re mijûl bibe; pir ne pirsgirek e. Lê keç çend salî dibe bila bibe, nikare lingê xwe biavêje derva. Dayik jî êdî wisa nêzik dibe. Lewma êdî wê jî pîvanê civakî girtine. Lêpirsîneke kûr tune. Ger keçek biçe cîrana xwe û were, êvar dadgeha wê çêdibe.

Mesela li ... keçeke 9 salî, wêneyekî wê kişandibûn û bi montajê serê we dabûn ser laşekî tazî. Bêyî ku lêpirsîn were kirin, malbatê ew keç kûştin. Ti kesî sedema wê nepirsî, lewma mijar namûs bû. Bûyerên bi vî rengî pir zêde bûn. Lê piştî pêvajoyê şoreşê ku hevalan dest avêtin van pirsgirekên civakî, di nava civakê de gelek meseleyên wisa tên çareserkirin. Mala jinê, ji sedî 70’î van meselayan çareser dike. Yên mayî jî li ser disekinin. Milet dibêje, çawa çêbû, çima berê ew qesî pirsgirek tunebûn? Berê jî

heman pirsgirek hebûn, gelek jin dihatin kûştin. Lê kesî lêpirsîn nedikir, li ser nedisekinîn. Jinan bi xwe jî digot, ger tiştek nekiriba çima bihata kûştin? Her sûç li ser jinê dihat hiştin. Mesela dema ku merek jina xwe berdide, dikare biçe jineke din xwe re bîne. Lê ji bo jinê dibêjin, ger tiştekî baş bikira çima merê wê ew berda?

Hevalê S… got, em nikarin li ... mirovan bidin qebûlkirin. Lê ne wisa ye. Destpêkê gel baweriya xwe YPG-YPJ'ê tîne. 24 seatan jinan ji nava lepên DAIŞ'ê derdixîne, her kesek dizane ku DAIŞ çi tîne serê wan jinan. Niha li Rojava, yê ku di derheqê jinê de qet tiştek nedizanîn jî, agahdar bûn. Ne ku berê pirsgirek tunebûn, lê niha çi were jiyankirin, derdikeve holê. 24 seatan doz safî dibin, pirsgirek tên nîqaşkirin. Tiştekî veşartî ku mirov bibêje min fêm nekiriye tune ye. Yên ku li hemberî vê derdikevin, ne ji ber fêmnekirinê ye, ji ber ku li gorî zîhniyeta xwe qebûl nakin, bertek nîşan didin.

Hem weke jin, hem weke mêr em îro li vê derê perwerde dibînin û zîhniyeta xwe lêpirsîn dikin. Sibê em ê biçin nava civakê, li gorî vê zîhniyetê jî em ê pirsgirekên civakê çareser bikin. Ez bi xwe demeke dirêj li ser xebatên jinê sekinîm. Ez gelek bûyerên bi vî rengî re rû bi rû mam. Mesela jinek hatibû û giliyê hevserê xwe dikir, ew jî bawerim di asayîşê de bû. Lêdanek li wê jinê kiribû, ji rengê jinê derxistibû. Ew zilam hatibû li ser kûrsî rûniştibû û digot nizanim ji min çi kiriye. Me got, ka canê xwe

veke, ka li te çi kiriye. Wê jinê re gotibû, divê tu nas bikê ku ez zilam im. Ma ew zilam nizane ku mirov nikare tiştekî wisa jinê bike. An jî yek biçe li nava kolanê xûçka xwe ya ducanî bikûje, ma wê hêvî bike ku bê ciza bimîne. Ger em qûralên hişk li pêşiya vê daneynin, ciza nekin wê sibê çawa çêbibe.

Zilamekî keça xwe kûştibû, bera binê bîrê dabû û ew bîr jî xistibû cihê çopê. 8-9 mehan agahî jê nehat girtin. Pişt re dema ku bêhn ji laşê wê hat, cîranan gilî kirin û me çû laşê wê ji nava bîrê derxist. Ma tiştekî wisa dê bê ciza bimîne. Yek jî bûyerên wisa tên jiyîn, lê miletê me jî astekê de hin tişt fêm kirine. Dizanin ya baş çi ye û ya ne baş çi ye. Lê tu bixwazê nexwezê hinekên di paşverûtiya xwe de israr dikin hene. Cih cih nêzikatiyên baviksalarî derdikevin holê. Ger hem weke jin, hem jî weke xort em di nava civakê de pîvan û rêgezên xwe bidin rûnişkandin û ji xwe re bikin mesele, dê pirsgirek jî werin çareserkirin, dê guhertinên zîhnî jî di civakê de çêbibin.

**Hevala X…:** Di serdema ku em jiyan dikin de jî taybetmendiyên hevpar yên ol û zanist berdewam dikin. Hin tiştên dişibin hev hene. Di exleqa ol de, xalek heye dibêje, *“ger jin sêhr û efsûnan çêbikin, dê nizanim rastî kîjan cizayan werin.*” Di Xiristiyantiyê de jî, di Cûhîtiyê de jî ew heye. Di dema ku nûveyên kapîtalîzmê nû bi nû derdikevin holê de, êrîşên ol yên li ser jinê hene. Pê ve girêdayî şikestinek di civakê de jî çêdibe.

Di destpêka kapîtalîzmê de jî sîmyager hene, wan weke jirêderketî pênase dikin. Çima? Di nava van tevgeran de jin pir bi tesîr e. Nûveyên dayiksalariyê di nava wê civakê de hene, Xiristiyantî li wê erdnigariyê nû pêş dikeve. Tesîrên Xiristiyantiyê pir zêde li ser ew civaka xwezayî çênebûne. Ew nahêlin ku dewlet bi awayekî navendî xwe ava bike. Mesela milk û erdên wan ji destê wan tê girtin û kapîtalîzm ji bo xwe kar tîne. Li hemberî vê di pêşengtiya jinê de berxwedanek çêdibe. Qontrala bedena jinê, di destê jinê de ye.

Ji ber ku dewlet ne navendî ye û dixwaze navendîbûna xwe pêş bixe, divê li ser vê bedenê hin tiştan bike. Di van deman de baweriya protestantiyê pêş dikeve û Serokatî dibêje kapîtalîzmê jî xwe sipartiyê wê. Îdeologê wê Martîn Luther e. Xiristiyanî dibêje "*di dema zarok anînê de pir jin dimirin. Pêwîstiya civakê jî ji zarokan heye. Ji bo ku jin nemirin divê hin tevdîr werin girtin.*" Martîn Luther jî dibêje, "*bila bimirin, ma di nava civakê de kêrî çi tên?*" Ew zîhniyet di nava forma dewlet neteweyê de heya roja me berdewam dike. Weke metayeke di malê de, rista wê zarok anîn e, ango pêwîstiyeke dewlet neteweyê pêk tîne. Dervayî vê risteke jinê tune ye. Rista jinê diyar e; divê bibe leşker û karker. Jin jî divê leşker û karkeran bîne dunê. Ji bo ku ev rista xwe pêk bîne jî, weke objeyeke zayendî tê karanîn. Êdî ew ajoyên zilam her tên sorkirin û van ajoyên xwe jî li ser jinê tatmîn dike.

Gelek pêlên femînîzmê hene. Rexneyên me jî li ser wan hene, hevalan hinek vekir. Lê di nava van pêlan de hin jinên bûne remz hene. Mesela Clara Zetkîn heye, di nava sosyalîstan de cihê xwe digire. Aleksandra Colantay heye. Têkiliyên wê û Stalîn hene; pir balkeş e. Li hemberî anarşîstan çalakiya Kronştent çêdibe, Colantay dibêje, wisa nekin, dê ew nêzikatî wê rê derketineke pêş bixin. Pir bi pêşbinî ye. Lê Stalîn dibêje, fikrên te yên revîzyonîzmê ne, rê derketî ne. Dibêje da ku dewlet neteweyeke xurt pêş bikeve, divê dengên cuda dernekevin. Lê Colantay vê yekê weke pirsgirek dibîne. Bi vî rengî karê dîplomasiyê didin vê jinê û ji welat dûr dixin.

Di nava tevgerên femînst de, weke sosyal demokrat û sosyalîst jî, cudabûnek çêdibe. Roza Lûksembûrg, di nava koma femînîstên sosyalîst de ye. Li hemberî şerê cîhanê, Roza Lûksemburg dibêje “*divê em di nava şerê cîhanê de cihê xwe negirin.*” Lê sosyal demokrat dibêjin, “*na divê em tê de cih bigirin*.” Hin zilam hene, ji Roza Lûksembûrg re dibêjin, *“tu bi fîstanê xwe yê kin nikarê aqil bidê sosyalîstan.*” Ango di demên herî krîtîk de berxwedan û hewildanên van jinan çêbûne.

Her wiha kêmasiyên van jinên femînîst jî hene. Mesela mirov dikare têkiliya Roza Luksembûrg, li gel xortan binirxîne. Lê divê em bikaribin bi awayekî giştî çanda sosyalîzmê jî lêpirsîn bikin. Lewma em xwe dispêrin wê çandê. Di nava van tevgerên sosyalîst de jî, li hemberî jinê

nêzikatiyên ne baş hene. Ji bo vê yekê Serokatî hin tevdîran digire. Mesela partîbûyina jinê, teoriya qutbûna ji zilam, projeya guhertina zilam, jineolojî ev tevdîr in ji aliyekî ve. Serokatî dixwaze nêzikatiyên şaş ku dibe ku çêbibin, bi rêxistin û bîrdoziya jinê berteraf bike.

Di navbera me de jî hin nêzikatiyên şaş hene. Divê em pir şexsî jî nekin. Mesela di 87'an de tehlîlên Serokatî li ser Fatmayê çêdibin. Di şexsê wê de, hemû jinan digire dest. Di şexsê xwe de jî, hemû zilaman digire dest, lê bi kûştina zilamtiya xwe vê yekê dike. Dibêje, *"ya ku tê dahûrandin ne kes e, civak e; ne kêlî ye, dîrok e."* Tiştên ku em li vir didahûrînin, ne falan kes û bêvan kes e, em zîhniyeteke didahûrînin û cihê wê feraseteke nû datînin. Em dixwazin zîhniyeta ku 7 hezar sale tê jiyîn, derbas bikin. Di nava van 7 hezar sal de jî, her tiştek tiştekî din teşvîk dike.

Mesela ol, li ser zanistê çawa tesîr kir? Dewlet neteweyê li ser malbata min tesîreke çawa kir, di nava wê malbatê de jî li ser min tesîreke çawa kir? Ez ê li hemberî wê têkoşîneke çawa bidim? Em dibêjin, Zîlan pêşenga me ye. Serokatî jî dibêje, *"Zîlan fermandara min e, ez leşkerê wê me."* Ne tenê pêşengên hevalên jin in. Wisa avêtina ser aliyekî jî rast nabe. Gelek hevalên xort ku lehengî kirine û şehîd ketine jî hene. Bêyî ku jin azad bibe, xort azad nabe; bêyî ku xort azad bibe jî, jin azad nabe. Hevsengî û diyalektîkeke civakî heye. Em wisa bigirin dest baştir e.

**Hevala X…:** Hevalekî nivîs nivîsandibû. Di rapora xwe de gotibû, hevalên jin di 8'ê Adarê de pîrozbahiyê dikin, hevalên xort jî ji wan re kulîlkan dişînin. Hevalên jin wan kulîlkan didin ser maseyê. Serokatî di wê rojê de diçe ku ji hevalên jin re civînê çêbike, dema kulîlkên li ser masê dibîne dibêje *"ew ji kû hatine?"* Dema ku Serokatî bihîstiye ku ji kû hatiye, hêrs bûye û gotiye, "*divê hûn qebûl nekin. 5 hezar sal e, li ser we tundî, şikence, metîngehî, dagirkerî meşandine. Niha jî bi qûrnaziyên zirav ji we re kulîlkan dişînin. Divê hûn qebûl nekin."* Vî hevalî di berdewamiya rapora xwe de gotibû, min 6 sal berê ew nivîsa Serokatî ji kowareke xwendibû, lê ez niha fêm dikim. Jixwe piştî 6 mehan ew heval şehîd ket.

Em gelek caran tiştan di dema wê de fêm nakin. Hevalan jî gotin, keviran bi lingê jinan ve girê didan û diavêtin avê û digotin ger bêguneh be, jixwe wê dîsa li ser avê bikeve. Gelek mînakên din yên balkeş jî hene. Bi deh-hezaran jin hatine qetilkirin. Kê ew kiriye û çima kiriye? Em li ser vê lêhûrbûn dikin. Em van tiştan bîr dikin. Pişt re em radibin û dibêjin, nizanim ez li hemberî jinê eciz bûme, nizanim li hemberî zilam bi bertek im. Qûsûrê mezî nekin, yên ku ev yek kirine re mirov dikare bibêje mirov in. Dibe ku hin tişt di dîrokê de hatibin jiyîn, lê tiştên ku îro tên jiyîn jî li holê ne. Divê em nebêjin, zilamê deshilatdar; divê em bibêjin zilamê ku di bin komkûjî, tundî, şikence û zilma xwe de kole maye.

Gelo ew tiştên ku îro di nava civakê de tên jiyîn, pirsgirekên jinê ne, an pirsgirekên zîhniyetê ne? Em çawa digirin dest. Hinek heval dibêjin, hûn wisa dikin, em naxwazin biaxifin. Qûsûrê ef bikin, lê çima em nakevin giraniya ew êşên hatine kişandin û berdelên ku hatine dayin. Em bi rehetî dikarin bibêjin, em ji nava pergalê derketin û tevlî partiyê bûn, em azad in, bila hevalên jin jî xwe azad bikin. Li ser vê zîhniyetê lêhûrbûn kirin tune.

Niha li ... jî, zîhniyeteke bi vî rengî heye. Zîhniyeta dewletê li ser civakê pir kûr tesîr kiriye. Em rojeke çûn cihekî. Ji ber ku dizanin em kadro ne, weke ku em memûrên dewletê ne nêzikî me dibûn. Em pir eciz bûn. Lê yên ku vê zîhniyetê ava dikin jî, dîsa hevalên me ne. Hin tişt tên gotin, lê em nizanin ku dê bigihêje kûderê. Hevalekî got, “*çima hevalên jin, nabin Berîtan û Zîlan.*” Jixwe armanca me ew e. Pêwîstiya me perspektîfeke bi vî rengî jî tune ye. Jixwe Serokatî û şehîdên me perspektîf dane. Divê mirov hinekî xwe lêpirsîn bike. Ma hevalên ku vî tiştî dibêjin, bi xwe çêbûne, şoreşa zîhniyetê di xwe de ava kirine? Perspektîfa azadkirinê, ne tenê ji bo jinê ye, ji bo hemû civakê ye.

Têkoşîn hem ji aliyê hevalên jin ve, hem jî ji aliyê hevalên xort ve yekalî tê destgirtin. An em pir zêde li ser lêhûrbûn nakin, an jî em li ser lêhûrbûn dikin, encamên rast jê dernaxînin. An em pir parastinî nêzik dibin, an jî dest navêjinê. Çima ew qesî wahşet pêş ketiye, bi rastî jî ez fêm nakim.

**Hevala Dilzar:** Lê divê beriya her kesî, divê tu fêm bikê. Lewma tuyê pêşengtiyê bikê. Yek jî te got, pêwîstiya me bi perspektîfê tune. Tamam bila hevalên xort perspektîf nedin. Lê di hevalên jin de jî tiştekî wisa derdikeve; divê di destpêkê de mirov wate bidê, xwe kûr bike, pîvanên têkoşînê derxînê zanebûnê û li ser wê esasê têkoşînekê bimeşînê. Niha hevalekî xort bibêje, jin ne pêşeng e, ez pêşeng im. Tuyê li hemberî derkevê. Lê heval dibêje, min hê jî wate nedayê. Ger mirov wateyê nedê, mirov nikare li dijî wê têkoşîn jî bike. Ew deshilatdariya ku tu wate nadê, ew zilamtî wê te biencixîne û derbas bibe. Ji bo wê jî divê jin zêdetir xurt bisekinin. Divê mirov wateyê bidê û li hemberî wê hêzeke xurt û mezin biafrîne.

Yên ku ew komkûjî kirine, îro jî hene. Hê jî di nava civaka me de tiştên wisa derdikevin. Wê demê divê em baş tehlîl bikin û hêza çareseriyê di xwe de ava bikin. An na tiştên ku heval gotin, ne şaş in. Divê hevalên xort di xwe de deshilatdariyê tehlîl bikin, jin jî koletiyê di xwe de tehlîl bikin. Em ger li hemberî kesên ku di nava civakê de şaş nêzik dibin her heqeret bikin, em di nava xwe de jî nikarin asteke azadiyê pêş  bixin. Her wiha em bibêjin, hevalên me ne û pir xweş in jî nabe. Bi kurtasî divê heval li ser rê û rêbazên xwe yên pêşengtiyê lêhûrbûn bikin. Di bingeha wê de jî fêmkirin û watedayin heye.

Serokatî ji bo jinê weke şertê yekemîn, ji sînorên zanînê yên serdemê derbaskirin danî. Dema ku peywir danîn holê, peywira yekemîn peywirên entelektûelîbûn. Ne ku em tenê ji aliyê teoriyê ve digirin dest. Lê têkiliya wê bi zanebûnê ve heye. Hevaleke ciwan dikare li ser vê hinekî din lêhûrbûn bike û vê mijarê hinekî din veke.

**Hevala X…:** Ne ku ez vê zîhniyetê nabînim û fêm nakim. Di hevalên jin û xort de, tesîra zîhniyeteke ne baş heye. Tesîra pergala 5 hezar sal e. Em hewil didin ku vê zîhniyetê derbas bikin. Em dixwazin van nêrînên şeytanî derbas bikin. Tiştê ku ez wate nadimê, ew zîhniyeta ku vê yekê dike mirov, ne dikare weke mirovahî, ne jî weke sewalî binirxîne. Her kes vî tiştî dizane. Lê em carna vê bîr dikin. Carna jî em pir razber digirin dest. Ez xwe jî di nava vê de dibînim. Em ji xwe dûr digirin dest. Divê weke çareserî jî her kesek di destpêkê de ji xwe bizivire. Em heya êvarê li vir nîqaş dikin û weke pirsgirekeke şênber datînin holê. Lê piştî kêliyeke ji rojeva me derdikeve. Ew tişt rewa dibin.

Ji ber ku em van tiştan xwezayî nabînin, ji ber vê yekê em li vir in û di nava têkoşînê de ne. Ji ber ku hestên me yên mirovahiyê vî tiştî nikarin rakin, em dixwazin bîr bikin. Cihê ku em pê re têkoşîn bimeşînin û li hemberî wê derkevin, ji bo ku em zêdetir êş nekşînin weke ku tiştekî wisa qet nehatiye jiyîn em tevdigerin.

**Hevala Dilzar:** Ger wisa be, ew tiştekî trajîk e. Di asta nexweşiyê de ye. Em mirov in, mejiyekî me heye. Bê mejî, bê dîrok, bê civak, mirov nikare bibe mirov. Mirov çiqasî ezez bifikire jî, mirov nikare xwe ji civakê û jiyanê qut bigire dest. Ger qut bibe, em nikarin weke bizmarekî ev pergala mekanîk bin jî. Ew xwe bênirxkirina mirovahiyê ye. Ger em tenê kêliyeke jî van tiştan bîr bikin, jixwe em ji şoreşgertiyê dikevin. Ji bo me hemûyan derbasdar e. Ger em ev pergala deshilatdar ya zilam ku gihêştiye asteke hovane, tenê di kêliyeke de jî bîr bikin, em ne şoreşger in. Ji bo vê yekê hevalan got, ger jineolojî di angaşteke çareseriyê de be, wêrekiyeke mezin e. Pêngaveke şoreşgerî ye.

Mijara mejî jî pir girîng e, ger mirov bê mejî be mirov nikare roja xwe jî sererast bike. Lê divê em mejî û hafizaya xwe jî kûr bikin û tîr bikin, her zindî bigirin.

**Hevalê X…:** Mirov ew xistina civakê ku ji aliyê dijmin ve pêkhatiye dibînin. Di encama vê de fikir û zanebûn hatiye lewazkirin. Ew tişt jî, bi ew qesî hostatî hatine kirin ku li keleka me çi diqewime em nabînin. Dibe ku me ev tişt hinekî bi PKK'îbûnê derbas kir. PKK, ev tişt nîşanî me da, ji bo vê em hinekî ketin nava têkoşîna wê. Lê dema ku em civakê mezî bikin, welatê wî, axa wî, ziman û çanda wî, rûmeta wî ji dest tê girtin, ji xwebûnê derdikeve, lê bertekeke biçûk nîşan nade. Zîhniyet ev e. Ger em vê zîhniyetê wisa giştî negirin dest û tenê weke

pirsgirekeke jinê bigirin dest, em ê bikevin nava paradokseke. Wê demê wateya van perwerdehiyên me jî namîne. Çiqasa nakokî derkevin, mirov bi nîqaşan dikare rastiyan jî derxîne holê. Pişt re mirov wê rastiyê esas digire. Ger nêzikatiya me wisa be dê baştir be.

**Hevala Dilzar:** Di nîqaşan de carna nakokî derdikevin. Li ser nirxandinên hev jî, heval nirxandin dikin. Lê tiştekî wisa pir çort ku pêşiya nîqaşên me bigire derneket. Dibe ku em nêrînên hev û din qebûl nekin jî. Mesele hinekî bi vê ve jî girêdayî; herdu zayend jî qesî ku xwe azad bikin, bala xwe didin zayenda din jî, gotin û nêrînên wan fêm dikin. Ji ber ku jin nikare xwe ji deshilatdariyê rizgar bike û azad bike, perspektîf dayina zilam jî weke deshilatdariyeke tê dîtin. Dibe ku hevalên jin de nêrîneke wisa çêbibe. Divê mirov fêm bike.

Bi rastî jî hewildana fêmkirina jinê dayin pir girîng e. Jin jî, zayenda xwe bi kûranî fêm nakin. Em li ser çoka dayika xwe mezin bûne, lê em dayikên xwe fêm nakin. Ji ber ku jiyan û civakbûn li derdora jinê dihone, divê hem weke xort, hem jî weke jin, em hewildaneke mezin a fêmkirina jinê nîşan bidin. Ger hevalekî xort, rastiyeke heyî jî bîne bîra hevalên jin; heya ku zilam xwe nedahûrîne û guhertineke çêbike, weke ku xwediyê wê rastiyê ye jî xwe nîşan dide. Ew jî weke deshilatdarî derdikeve hemberî jinan û ew jî di jinan de refleкseke derdixîne holê.

Lê di asta ku herdu zayend jî xwe azad dikin de, dikarin hev û din jî mezin bikin. Bi taybetî qebûlnekirina hin tiştan ya jinê, pêwîst dike. Lê divê were kûrkirin, ne ku her tiştî bi awayekî çort red bike û derdora xwe belav bike. Divê bi zanebûnê, bi watedayinê, bi rê û rêbazên têkoşînê redkirinên xwe dayne holê. Divê hewil bide zilam bidahûrîne û fêm bike. Her rexnekirina zilam, ne mîsogerî ye. An jî her gotina jin, naye wê wateyê ku em gihêştine zanebûna azadiya jin. Serokatî got, "*hûn her dibêjin azadî, lê zilamekî feodal were, dê we bi erdê ve bike yek.*" Divê em li ser vê lêhûrbûn bikin. Ew ji bo jinê rexneyeke pir mezin e.

Em li ser pirsgireka azadiyê pir nîqaş nakin û em pir nakevin nava nakokiyan jî. Em bîr dikin, em diborînin. Em xwezayî dibînin. Hatina me ya vê derê naye wê wateyê ku em gihêştine zanebûna her tiştî. Niha nîvê hevalan ji HPG û YJA-STAR'ê hatine, dema ku têkiliyeke di navbera xort û jineke de çêdibe em çawa çareser dikin? Em tenê qadên xweser ava dikin, yekîneyên hevalan jin û hevalên xort cuda ne. Ger her cih wisa be, em dikarin nakokiya zayendî nîqaş bikin. Niha nakokiya zayendî nemaye. Ger têkoşînek hebe, bila heval bibêjin heye û me bi vî rengî têkoşîn da.

Herî zêde rexne bi vî rengî dihat destgirtin. Digotin, "dema ku em tên gel hev, pirsgirek derdikevin." Çareserî jî nehatina gel hev e. Bi vî awayî em nikarin zemîneke bê

nakokî jî ava bikin. Em nikarin bi hev û din rexne nekirinê, xwe ji vê meseleyê rizgar bikin. Niha me çareserî di vê derê de dîtiye. Hemû yekîneyên me xweser in. Carna akademî bi hev ra pêş dikevin. Dema ku her cih xweser be, jixwe ew kes dema ku diçe pratîkê yekser dikeve. Ne ku bê vîn e, şoreşger û şer jî dike. Lê kesayeta xwe nedîtiye, kesayeta xwe nedahûrandiye, lêhûrbûn nekiriye. Dema ku ji zayenda hember, îlgî û alaqayek hebe, wê çawa nêzik bibe, zayenda hemberî xwe çawa bikşîne azadiyê? Van tiştan nizane. Hem jin, hem jî zilam wisa ye. Em tenê bi lêdana dijmin şoreşê nikarin ava bikin. Bê nakokîbûn jî, şoreşê nayne. Di vê mijarê de ji ber ku hevalên jin pêşeng in, neçar in zêdetir lêhûrbûn bikin û serê xwe biêşînin. Divê em xwe di vê mijarê de berpirsyar bibînin.

Serokatî dibêje, “ger armanca gerdûnê azadî be, di herikîna xwezayî ya gerdûnê de jiyanek hebe û em vê weke azadî îfade dikin; di nava ew herikîna xwezayî ya jiyanê de, li hemberî astengiyên ku derdikevin pêşiya me ger em êş dikşînin û berdelan didin, tê wê wateyê ku ew me azad dike.” Divê em lêhûrbûna vê bikin. Em dibêjin, tesîra kevneşopiyê li ser jinê heye. Li vê derê jina ku herî zêde ketibe bin tesîra kevneşopiyan, em rexne dikin û hesap  dipirsin. Em dibêjin tu çima xwe azad nakê û vê ortamê azad nakê? Ji vî milî ve lêhûrbûn kûrkirin, nakokî naskirin, jiyan tehlîlkirin, jê encam derxistin girîng e.

Dervayî vê, hev û din fêmkirin jî pir girîng e. Ne ku em xwe bixin şûna hev, empatiyeke ji rêzê bikin. Divê em bi qarekterên xwe, hev û din nas bikin. Ez bi xwebûna xwe, dixwazim te fêm bikim. Tu bi xwebûna xwe, min fêm bike. Ji bo xortekî, fêmkirina jinê; cihê ku lê sekineye jî hejandin e. An na em ê cihê xwe bisekinin û bibêjin, ger hûn dikarin werin û min biguherînin. Hem weke jin, hem jî weke zilam carna helwestên me ber bi vê ve diçin. Bi awayekî kole jiyan dike, lê dibêje ez wisa jiyan dikim, dest nedin min. Di van mijaran de divê em lêhûrbûnên xwe kûr bikin.

**Hevalê X..:** Divê têkoşîna me bi kîjan rê û rêbazan bidome? Divê em hinekî li ser çareseriyê û avakirina wê jî nîqaş bikin. Serokatî, di paraznamayê de qala hebûn, zeman û bûyinê dike. Têkiliya hebûn, zeman û çêbûnê û têkiliya wê bi bîrewerî û zanebûnê re, qetina ferqiyeta wê ve digire dest. Ya me jî hebûnek çêbûye, tespîtek hatiye çêkirin. Em vê di rastiya dîroka jin de jî dibînin, di rastiya Kurd de jî dibînin. Şîroveyek hatiye pêş xistin.

Lê ya girîng divê mirov di paşerojê de nefetise. Ger em di paşerojê de bifetisin, em nikarin pêşerojê ava bikin. Rast e, em ê paşerojê bidarizînin, lê em ê di niha de darizandina wê bikin. Tiştê ku ez dibînim, em her bi paşerojê ve sînordar dimînin. Lê em ê niha çi bikin? Dema ku Serokatî şaristaniya kapîtalîst rexne dike, îro alternatîfa wê datîne.

Mijareke din ku mirov girîngiyê bidê û li ser bisekine, têkiliya deshilatdariyê ye. Ez ji bo xwe bibêjim, ya esas xwebûn e. Çareserî di vê derê de ye, divê em di vê çarçoveyê de nîqaş bikin. Foucealt dibêje, “*pêwîst e mirov bi xwe re bikeve têkiliyê.*” Ew gotin bala mirov dikşîne. Bi xwe re ketina têkiliyê tê çi wateyê. Em ê xwe di zeman de çawa ava bikin? Dema ku em dibêjin, em, an jî xwe; em çiqasî aîdî xwe ne. Ger em lêpirsîna vê bikin, di dîrokê de çi aîdî me ye, çi ne aîdî me ye, em ê wê jî bibînin. Hem weke mirov, hem jî weke zilam, ez dixwazin tiştên aîdî xwe bibînim.

Bi awayekî şênber dema ku ez li aynikê mezî dikim, ez çiqasî xwe dibînim. Ji bo zilam, ev yek xwe gihandina asta arîfbûyinê ye. Gelo em ê çiqasî xwe bigihînin wê astê? Ger em nikaribin xwe bigihînin wê astê, em nikarin bi jinê re jiyan bikin. Ew heqîqetek e. Hem ji milê hezkirinê ve, hem jî ji aliyê dan û stendinê ve wisa ye.

Ji aliyê kûştina zilamtiyê ve, ez carna ji xwe mikûr têm. Carna nêzikatiyeke min a qederperest jî derdikeve. Ez çi dikim, nikarim ji nav derkevim. Lewma 5 hezar salin, tiştekî wisa hatiye jiyan kirin. Hevalan qala fêmkirina jinê kirin, bi rastî jî hev û din fêmkirin pir girîng e. Derûniya şoreşgerekî, an jî hevalekî xort, mîlîtanekî Apoger pir girîng e. Ez ji vî milî ve zehmetiyan dikşînim. Tu dibêjê, min gelek tişt derbas kirine, lê tu careke re dibînê ku derketiye pêşiya te. Tesîrê pergalê ew qesî li ser

me tesîr kiriye ku mirov carna qederperest nêzik dibe. Mirov dibêje, pergalê li ser me ew qesî tesîr kiriye, em nikarin tesîrên wê di nava bîst salan de derbas bikin.

Ew nêzikbûn jî dihêle ku mirov dev ji xwe berde, li hemberî xwe têkoşîn neke, ji pergalê re xizmet bike. Ya esas jî, bersiv dayina pirsa Serokatî ku dibêje, "*em çi bikin, çawa bijîn û ji kû destpê bikin?*" Divê em bi verişîna pergalê destpê bikin. Ew qirêjî ji nava xwe derxistin pir girîng e.

Têkiliya zayendî jî wisa ye, ketiye her derê. Divê em vê yekê ji xwe mikûr  werin. Di têkiliya zayendî de jî ew deshilatdariya zilam, bi awayekî eşkere diyar dibe. Nietsche dibêje, "*ferqa têkiliya zayendî, ji têkiliyên dîtir tune. Ji ber ku ajoyên zayendî, dixwazin li ser mejî û fikir tehekûmê çêbike."* Li ser evînê jî dibêje, *"evîndar, ne ew kesê ku hez dike ye, yê ku dixwaze bixe mal û milkê xwe ye. Dixwaze tiştekî ji her kesî biparêze û bixe malê xwe.*" Bi rastî jî wiha ye. Yê ku herî zêde li ser heqîqetê lêhûrbûn kiriye, Foucealt e. Lê azweriyan pir mezin dike. Dibêje, *"ez dixwazim ji azweriyê bimirim.*" Jixwe bi wê dimire. Yê ku herî zêde deshilatdarî baş pênase kiriye ew e. Lê kûraniya deshilatdariyê di hemû çavkaniyên civakê de nabîne.

Ferqa Rêber Apo jî, ew e. Ger mirov ji her alî ve bigire dest û di xwe de nebîne, ew xefleteke mezin e.

Ango tu tenê şîrove dikê. Ew jî dibe lafazantî. Ji ber wê ez qala xwebûnê dikim. Ger mirov di xwe de çêneke, ti wateya wê tune.

Dema ku Rêber Apo qala Zîzek kir, ez cara ewil ketim kûraniya wê. Serokatî dibêje, "*ez dixwazim bi jineke re felsefe nîqaş bikim.*" Li ser vê lêhûrbûna min jî çêbû. Mirov çawa dikare bi jinê re jiyan bike, felsefîbûyin çi ye? Ew jî xwe gihandina ew asta arîftiyê çêdibe. Ez nikarim ji xwe re bibêjim, ez arîf im. Jixwe ti kes ji xwe re nabêje ez rêber im. Civak dibêje, rêberê min. Weke hevalên xort jî, bêyî ku em xwe bixapînin, divê em bikevin lêgerîna arîftiyê û jiyaneke hevpar jiyînê esas bigirin.

**Hevalê X…:** Em ji civakeke ku deshilatdarî di hemû şaneyên wê de cih  bûye tên. Hevalan jî nîqaş kir, mirov di nava van nîqaşan de rastiya xwe jî dibîne. Kesayetên me bi piranî nexweş in. Tiştên ku vê pergalê di me de dane rûnişkandin, aîdî vê pergalê ne. Lê em îro hewil didin pergaleke din ava bikin û taybetmendiyên wê cuda ne. Taybetmendiyên pergala deshiltdar, ji bo pergala me weke nexweşî ne. Mirov dikare wisa pênase bike.

Ew cihê ku em niha lê jî, cihê dermankirina van nexweşiyan e. Her yekî/ê me xwediyê nexweşiyên cuda ye. Nakokî derdikevin, di hinek mijaran de hev û din fêm nekirin û hev û din qebûlnekirin ji ber vê ye. Her yekî/ê me herî kêm 20 salan di nava vê pergalê de jiyan kiriye. Jixwe malbat prototîpa wê pergalê ye, dibistanên wan hene. Li ser me jî tesîrên wê pir in. Ger em bibêjin, me

taybetmendiyên wê pergalê li gel xwe neanîne, rast nabe. Ji bo ku em guhertin û veguhertinê de gavên xurt biavêjin, divê beriya her tiştî em rast nêzikî xwe bibin. Di her yekî/ê me de ew  qirêjî hene.

Weke alternatîf jî Serokatî paradîgmayeke nû danî holê. Em jî vê yekê weke şikestina seyemîn ku divê li dijberî zilam çêbibe bi nav dikin. Lê vê paradîgmayê û gelek tiştên ku di çarçoveya şikestina seyemîn de tên ser ziman qebûlnekirinek heye. Dibe ku em hatibin tevlî partiyê bûbûn û em nikaribin her tiştî bînin ser ziman jî, lê qebûlnekirinek heye. Em dibêjin, "*em ê şer bikin, em fedaiyên Rêber Apo ne, şehîd rêberên têkoşîne me ne*." Em van gotinan her tînin ser ziman. Lê di hundirê me de çi tê jiyan kirin? Ez di şexsê xwe de lêpirsîna vê dikim.

Niha qebûlkirina me çiqasî xurt be jî, di koşeyekî de hin tişt nehatine qebûlkirin. Ez bi xwe nikarim gerdûna jinê fêm bikim, di min de asteke wisa tune. Min di vê mijarê de xwe timam nekiriye. Min hê jî bi awayekî giştî xwe fêm nekiriye, lê ez ê çawa xwe fêm bikim. Ne gengaz e ku heya ez xwe fêm bikim, ez jinê bigirim dest û fêm bikim. Ew fikirandina min a herî saf û paqij e. Lê di pratîkê de bi aweyekî zêdetir çort derdikeve holê.

Mesala di dema tasgiyegeriya Osman-Botan wan de, di nava hevalên jin de jî nêzikatiyên çewt derdikevin. Hev û din qebûlnekirin pêş dikeve, li hemberî hevalên xort jî nêzikatiyên şaş çêdibin. Lê Hevalê Cuma dibêje, "*ez rica dikim, hûn dîsa dest bi têkoşîna xwe ya zayendî bikin.*"

Çima? Niha cihê ku rengê jinê tune ye, cihê ku taybetmendiyên civakî jê têne windakirin e. Lewma di nava civakê de risteke jinê a bi vî rengî heye. Cewhera civaka exleqî û polîtîk jin e. Em bifikirin ku di nava vê civakê de jin tune ne; wê demê dê ji civakbûnê derkeve. Taybetmendiyên jinê pir cuda ne, weke xwezayê ye. Di asta ku tu xweza û gerdûnê fêm dikê de, tu dikarê jinê fêm bikê. Lewma reng û reng e.

Niha em gel jineke ku niha tevlî partiyê bûye nikarin bijîn. Em hev û din qebûl nakin. Lewma her yekî/ê me çîrokeke me ya jiyanê heye. Rawastgehên me yên şikestinê hene. Ew hevala jin rastî hin kiryarên zilam bûye û di tevlêbûna wê de tesîra vê çêbûye. Min jî hin qarekterên pergalê qebûl nekirine û ji ber vê tevlê bûme. Tevlêbûnên vê dawiyê, bi piranî wisa ne. Ji ber vê yekê em hev û din qebûl nakin. Ji ber ku bîrdoziya azadiya jinê jî tam fêm nekiriye, li gorî xwe nêzikbûnek çêdibe. Di nava demê de bi perwerdê û nîqaşan ew nêzikbûn derbas dibin. Lê dem dixwaze.

Ger em ê vî karî bi ser bixin, divê em şêwaza wê bigirin. Em niha dikarin, li gel hevaleke ku bi rastî jî dixwaze meseleyê mirov bide fêmkirin nîqaş bike û bi seatan jî wê guhdarî bike. Dê ew nêzikatî di mirov de guhertineke jî bide çêkirin, lê bi hinek şêwazan nêzikbûn heye, mirov nikare qebûl bike. Hem weke hevalên jin, hem jî weke hevalên xort nêzikbûnên me yên bi vî rengî hene. Dema ku nêzikatiyeke çort derdikeve holê, ew

bertek ava dike. Lê bi rêxistinî nêzikbûn, di kesê hemberî te de jî kêfxweşiyê ava dike. Hevaltî jî li ser vê esasê ava dibe.

Bêgumûn nakokî û rexne wê her hebin, dê radîkalîzm jî hebe. Lê ji bo ku em bikaribin li gel hev hevaltiyeke bikin, divê di navbera me de kêfxweşiyek hebe. Dema ku mirov hev û din bibîne, divê hundirê mirov de tiştek bikele.

Her wiha divê jin, heya dawî li hemberî zilam têkoşîneke dijwar bimeşîne û divê zilam jî li hemberî vê rêzdar be. Ez ji bo xwe jî vê yekê dibêjim. Divê zilam jî li hemberî xwe têkoşîneke bimeşîne û feraseta zilamtiyê di xwe de bikûje. Bi hev û din nedîtîve hatinê û weke biyanî nêzikbûna hev, em nikarin bigihêjin encameke. Serokatî di dahûrandinên xwe de dibêje, min bi tespîta nakokiya di navbera jin û zilam de ev têkoşîn da destpêkirin. Dibêje, "*berê ji bo hev dimirin, lê niha nikarin li gel hev jiyan bikin. Lewma mirina wan a ji bo hev, ne rast bû. Nakokiyek bû, bi deziyekî bi hev girêdayî bû, dema ku min kişand dest min ve hat.*" Dibêje, "*heya ku nakokiyên xwe yên hundirîn çareser bikin, jin û zilam êdî nikarin li gel hev jiyan bikin.*"

Li ser vê esasê dema ku ez jî hevalên jin mezî dikim, ez ji xwe şerm dikim. Lewma tesîra tiştên qlasîk hê jî li ser min heye. Tesîra kevneşopiyê li ser min heye. Dibe ku em çavekî xirab jî hevalên jin mezî nekin. Lê mirov

aliyekî xwe yê nebaş jî hîs dike. Ji bo ku em bigihêjin encameke rast û ew xirabiyên di nava xwe de paqij bikin, divê em şêwaza wê bigirin. Bi şikandina hevaleke jin, ez nikarim wê qezenç bikim. Yek jî ger em sibê biçin nava civakê, em bi kîjan rêbazê nêzikî jinên di nava civakê de bibin?

Em dibêjin, "*soz namûs e*." Bêyî ku em xwe biguherînin, ger em biçin nava civakê, em ê qut bibin û biçin. Wê demê soza me li kû dimîne. Ti wateya wê jî namîne, ji bo jinê jî derbasdar e. Divê em hev û din pêş bixin, divê em li hemberî hev têkoşîn bidin, lê şêwaza wê jî girîng e. Divê mirov ji hev bide fêmkirin. Bi hay û hoyê tiştek naye çareserkirin. Divê her nîqaşeke me, li ser me tesîreke hejandinê çêbike.

**Hevala X…:** Dema ku em şikestina yekemîn û di destpêkê de bin ketina jinê digirin dest, em dibêjin parçebûn çêbû. Heval jî hinekî bi parçe digire dest. Heval dibêje, *"ez dikarim bi jina zana re bibim yek*" baş e, jina zana re her kes dikare bibe baş. Lê jina ku biçek ûslubê wê kêm be dûr disekinim. Wê demê heval çawa dikare xwe pêş bixe? Xortek çawa dikare bi jina zana re bibe heval û jinek çawa dikare bi zilamê zana re bibe heval?

**Hevala X…:** Di 2002'yan de kongre çêbû, piştî wê em weke hevalên xort û hevalên jin li ser esasê guhertina zilam, me perwerde dît. Hevalên xort gotin, em hevalan azad nabînin, lê em rêveberiyê azad dibînin, têkiliya me jî

wê bi rêveberiyê re hebe. Em avahiya hevalan jî esas nagirin. Ew nêzikatiyeke serdestiyê ye.

**Hevalê X…:** Girêdayî van pirsan, wisa rûhevkirin çiqasî rast e? Ew di encama zîhniyeteke çawa de derdikeve holê?

**Hevalê X…:** Hevalan qala parçebûnê kirin. Em dibêjin parçe, kirina yek. Dema ku parçe dibin yek, heqîqet derdikeve holê. Ew mijar jî bi heqîqetê ve girêdayî ye. Jina azad jî, heqîqet bi xwe ye. Kesayeta ku Rêber Apo dixwaze pêş bixe, kesayeta çêker e. Ew kesayet tiştekî xirab nake. Kesayet û civaka ku Rêber Apo dixwaze derxîne holê, bi vî rengî ye.

Weke min got, dema ku em ji pergalê tên qirêjiyên me hemûyan hene. Di mezikirina jin, dayik û xûçkê de gelek kêmasiyên me hene. Lê dema ku em hinekî li ser tiştên ku Serokatî dibêje lêhûrbûn dikin, di navbera jinên di nava civakê de û di navbera hevalên jin yên vê derê de ferqek heye. Her wiha di navbera jinên ku tevlê dibin û hevalên têgihiştî de jî ferq heye. Hevala ku nû tê, gelek tişt ji pergelê li gel xwe anîne. Tesîrên civakê li ser hene. Lê hevaleke ku 20 salin di nava vê têkoşînê de cih digire hin tiştan derdixîne zanistiyê, tehlîl dike û hinek tiştan fêm dike.

Ji ber vê yekê tiştên ku em hevaleke nû re parve bikin û hevaleke kevn re parve bikin, pir cuda ne. Tiştên ku em li vê derê nîqaş dikin, em nikarin li gel şervanên nû parve

bikin, wê me bigirin. Min bi xwe van tiştan jiyan kirine. Ger di nava hêzên me yên leşkerî de, tu biçê gel yekîneyeke hevalên jin nîqaş bikê, tu nikarê nîqaşê bigihînê encamê. Ger tiştekî şaş, an jî kêm bibêjê, hema refleks tê nîşandan, mirov hema xwe paş ve dikşîne. Tu nixwazê bikevê polemîkê, tu naxwazê wê bişkînê, ew naxwaze te bişkîne. Di zîhniyetê de guhertineke teqûz çêneba. Piraniya me de wisa ye. Lê hevaleke ku hinek tişt di xwe de dabin rûnişkandin hebin, tu dikarê seatan li gel nîqaş bikê. Tu dikarê nêzikatiyên xwe yên şaş jî bi wê hevalê re nîqaş bikê. Tu alîkarî dixwazê. Ew jî li gorî wê ji te re nîqaş dike.

Ji ber vê yekê ez dibêjim, tiştên ku mirov ji hevaleke nû bigire cuda ye, tiştên ku mirov ji hevalên kevn bigire cuda ne. Bêguman tiştên ku em ji hevalên nû jî bigirin hene, lê ne yek in. Partî weke şîrekî spî ye, dema ku nêzikbûneke pergalê di şexsê me de derdikeve, hema xûya dike. Lê bi demê re li hemberî wê têkoşîn tê dayin û guhertin çêdibin. Ji bo jinê jî derbasdar e. Ger di şexsê jinê de jî kêmasiyek derkeve, hemû hevalên jin bi vê yekê xwe lêpirsîn dikin. Ez parçe û bi çînî nagirim dest. Lê di navberê de ferqek heye, çîn cuda ye, ferq cuda ye.

**Hevalê X…:** Ne tenê ji bo heval Ş…, ji bo giştî jî derbasdar e. Di pergalê de olperestî, zayendperestî, netewperestî, zanistperestî li ser civakê û mirov deshilatdariyê ava dike. Ew deshilatdarî piranî jî li ser

zayendê tê ava kirin. Divê li hemberî xwe, em hinekî vekirîbin. Divê em kesayetiyên xwe veneşêrin. Dibe ku carna di rêbazên hevalên jin de jî kêmasî çêbibin û guhertin jî dernexîne. Lê divê em weke zilam bişkên. Ger em neşkên, rêbaz û nêzikbûn çi dibe bila bibe em naguherin.

Serokatî dibêje, min zilamtiya xwe kûştiye, ez dixwazim bikûjim. Ew şikestineke. Lê em parastina çi dikin, ew gurura çi ye? Ger em ew zilamtiya xwe şerm nekin, ji wê nerevin, em wê tarûmar nekin, wê parçe parçe nekin, em li ser wê esasê hişmendiyeke di xwe de ava nekin, em guhertinê çawa çêbikin? Em hem pergalê seranser digirin dest, hem jî em seranser nêzikî xwe dibin. Pêwîst nake ku mirov weke hevalên nû hevalên kevn; hevalên jin û hevalên xort parçe bike. Dibe ku hevaleke nû rabe û biaxife; dibe ku danehevên wê jî pir tunebin, lê axaftinên wê yên radîkal dê bibin sedem ku guhertinek çêbibe. Divê bibe sedem ku refleksên me derkevin holê û em xwe nas bikin.

Divê mirov hem rêxistinê, hem jî hev û din perwerdekirinê wisa bigirin dest. Dibe ku hevaleke bi salan têkoşîn dabe û di xwe de şêwazek dabe rûnişkandin, dibe ku hevalek jî nû be û di xwe de şêwazek neafirandibe. Lê dibe ku nêzikatiyên ew hevala nû bibe sedem ku mirov de guhertinek çêbibe. Niha hevalên xort yên nû jî hene, carna pir mîsoger jî nîqaş dikin. Lê em bertek nîşanî wan nadin. Sekna ku em di vê derê de nîşan

didin, nîşaneya zayendperestiyê. Em çawa nêzikî xwe û jinê dibin nîşan dide. Dema ku hevalekî xort, tiştên mîsoger bi awayekî bê rêbaz bibêje, em dikenin û derbas dibin. Lê hevaleke jin be, em hema bertek nîşan didin. Zayendperestî di vê derê de veşartî ye.

Me di nava civakê de jî kar kiriye, em di nava tevgerê de jî mane. Sedema ji nava tevgerê revînê û çûna civakê çi ye? Dixwaze biçe û wê pergalê jiyan bike. Tasfiyegerî li ser kîjan esasê derketin, xwestin di nava me de li ser esasê zayendperestiyê jiyaneke ava bikin. Di bingeha zîhniyeta wan de ew hebû. Çima di nava civakê de sedhezaran kes tevlî me nabin, lewma bingeheke mezin a zayendperestiyê heye. Wate nadin jiyana me. Dibêjin, heval hûn çawa wisa jiyan dikin. Jin û mêr bêyî ku têkiliya zayendî pêş bixe, nikare bijî. Tiştê ku dibe sedem ku fêm kirin çênebe, şoreş pêş nekeve; ketin û rev çêbibe ew tişt e. Di bingeha hemûyan de zayendperestî heye.

Çima em wisa nagirin dest? Em dibêjin Osman û falan kes xayin in, lê aqliyet û zîhniyeta ku ew kes birine xiyanetê çi ne? Em seranser derbas dibin, em kûr nakin, lewma em ditirsin ku bişkên. Bila em bişkên, ma pergalê çi me de hiştiye ku em diparêzin. Di nava rêxistinê de pirsgireka esasî ew e. Ji sedî heftê pirsgirekên di nava me de derdikevin, bi mijara zayendperestiyê de tên jiyîn. Her wiha bi piranî ji bo bûyerên wisa civak, li hemberî me sar dibe. Têkiliyên zayendî ne, zayendperestî ye û li ser wê pêşxistina deshilatdariyê ye.

Ger em vê mijarê zelal nekin û çareseriyê di xwe de ava nekin, şoreş jî pêş nakeve. Kurdistan jî naye azadkirin. Wê ketin her berdewam bikin, dê dijmin her bi hêvî be ku vê şoreşê ji holê rake. Ger mirov wisa nêzik bibe dê baş bibe. Bi rastî jî pêşxistina teoriya azadiya jinê, fersendekî mezin e. Lewma em sedî heftî enerjiya xwe didin, pirsgirekên navxweyî. Lewma ger wisa nebe, hêzeke ku me bike malê gel û şoreşê çênabe. Divê mirov parçe neke û li ser vê esasê hemû hevalên li vê derê ji xwe re weke alîkar bibîne.

**Hevalê X…:** Heval Ş… mînaka Serokatî da û got, "*Serokatî dibêje, ez dixwazim li gel jineke zane felsefe nîqaş bikim."* Lê Serokatî mirovên zayif jî li gel xwe digire û bi wan re jî nîqaş dike. Serokatî her dibêje, "*mirovên lewaz bişînin gel min ku ez pê re mijûl bibim.*" Divê em weke hevalên xort vê yekê bizanibin, ger îro di jinê de bertekek li hemberî me hebe jî, di encama nêzikbûnên me de ye. Di encama kiryarên me yên 5 hezar salan de pêş ketiye. Cihê ku em di vê derê de hevalên jin lêpirsîn bikin, divê careke din em ji xwe vegerin. Li hemberî vê nêzikatiyê jî têkoşîn pêwîst dike.

**Hevala Dilzar:** Heval Ş… negot, "mirovên lewaz." Lê çînî girtina dest wisa ye, heval şibandinek çêkir, lê wisa hate fêmkirin. Encama axaftinên Heval di serê hevalekî din de tiştekî wisa derxist holê. Qesî ku dikare bila heval Ş… bibêje, min nexwest wisa bibêjim û niyeta min ne ew bû.

**Hevalê X…:** Dema ku em nirxandinan bikin, divê em bizanibin ku em hemû hevalên hev in. Ger em bi şaştiyan biçin ser şaştiyeke, dê encamê wê jî dîsa şaştî be. Dibe ku şêwaz û uslûbê hevaleke jî şaş be, lê divê em xwe lêpirsîn bikin ka em çawa wê bidin fêmkirin. Bi awayekî cuda nêzikbûna hevalên nû û hevalên kevn jî pir şaş e. Kadroyên bîst salan jî direvin û diçin. Lewma di hinek mijaran de xwe tepisandibûn, lê baş dahûrandin nekiribûn, li ser kêmasiyên xwe girtibûn. Herî dawî jî di cihekî de teqiya û reviyan û çûn. Her wiha hevalên salek û du salin tevlî partiyê bûne û çalakiyên fedaî pêş dixin hene. Dema ku mirov raporên wan mezî dike, bi rastî jî her raporek manîfestoyek e. Bi kûrtasî divê em di vê mijarê de şêwaza Serokatî esas bigirin.

**Hevalê X…:** Pirsgirek îro civake, civak ji civakbûna xwe derketiye. Ger mirav wisa negire dest, jiyana mirov di xeteriyê de ye. Lewma mirov bê civak nabe. Ger mirov bibêje, ez ji hevalekê hêz digirim û hevaleke jî hez nakim, rast nabe. Dibe ku carna ûslubê me jî kêm be. Ger yên zane, aliyên lewaz yên civakê timam nekin, dê her kêm bimîne. Jixwe wateya zanîneke şexsî jî tune ye. Ger, gerdûn, jiyan û giştî civak naye azadkirin, ti wateya zanebûna me tune ye.

Jin vê yekê zêdetir tespît dike. Ji ber vê ger jineke zane hebe, divê hemû jinan zane bike. Bi ev taybetmendiya xwe jin çêker e û komî ser hev dike. Ger jineke zane hebe û rêxistin ava nekiribe, derdora xwe zane

nekiribe, jixwe di wê derê de lewaztî heye. Heman tişt ji bo zilam jî derbasdar e, yek jî weke zilamekî em nikarin bibêjin em dixwazin li gel ew jina zana nîqaş bikin.

**Hevala X…:** Ne tenê hevalê Ş…, gelek hevalên xort hene. Carna di şaştiyên xwe de israr dikin. Dema em dîrokê dixwînin, em hin  tiştan fêm dikin û li gorî wê heqîqetê derdixînin holê. Dîroka ku  hatiye nivîsandin, heqîqet parçe kiriye, ji wateyê derxistiye. Wê demê divê em dîrokê rast bixwînin. Heval dibêjin, carna em hin tiştan weke qeder dibînin. Serokatî di hemû paraznameyên xwe de dubare dîrokê tehlîl dike. Em jî dema ku her careke dixwînin encameke baştir jê derdixînin. Lê dema ku em dîrokê her careke tehlîl bikin, divê di me de qederperestiyê pêş nexe, divê alternatîfa pêşerojê nîşanî me bide. Divê mirov wisa negire dest.

Ya din jî ji ber ku dîrok parçe bûye, em jê tiştekî fêm nakin. Nirxandinên Heval Ş… jî parçe bûn. Rast e, rastiya xwe tîne ziman. Lê rastiya xwe ku tîne ser ziman, weke tiştê esasî dibîne. Di wir de hêleşaşî heye. Divê mirov nîqaş û sererastkirinan re jî vekirî be. Ger heval jina zana û jina lewaz dibînin, ji bo ku hemû jin zana bibin û di şexsê wan de civak zane bibe û pirsgirekên xwe derbas bike, divê mirov biçekî xwe biêşîne. Lê heval xwe naêşîne. Dibêje, ez yên zane re heval im, lê yên ku ne zane ne ez alaqaya xwe pê naynim. Lê ne wisa ye. Jixwe karê me di vê derê de destpê dike.

Mesela Serokatî mirovekî zane ye, lê em nikarin bi Serokatî re mijûl bibin, ew hêza me tune. Lê divê em lewazî û kemasiyên xwe ve mijûl bibin. Li hemberî rexneyan bertek nîşan dayin, ji koletiyê tê. Ji nezanebûnê de israrkirin, di koletiyê de israrkirin e. Heval Ş… di jiyanê de jî wisa nêzik dibe, bi awayekî nêzikî hevalên jin dibe, bi awayekî nêzikî hevalên xort dibe; bi awayekî nêzikî hevalên rêveberiyê dibe, bi awayekî dîtir nêzikî hevalên dîtir dibe. Ew nêzikbûn parçe dike. Ew taybetmendiyên çîna navîn in, di cewhera heval de ew tune ne, di bin tesîra wan de maye. Rêbaza me diyalektîk û giştî ye. Di nava xwe de ava dike, çêdike û pêş ve dibe. Lê di vê nêzikbûnê de çêkirin dernakeve, tenê pê re meşîn heye. Ew jî çareseriyeke derbasdar e, ne mayinde ye. Kêlî divê dîrokê jî temsîl bike. Divê her tişt di kêliyê de bikaribe were înşakirin, an na em kêliyê ji tiştên dîtir cuda bigirin dest, em nikarin bigihêjin encamên rast.

Ya dîtir jî, hevalên jin di perwerdehiyên xweser de her tiştekî vedikin. Kîjan heval be, di şexsê xwe de nêzikatiya bavê xwe ya li hemberî dayika xwe vedike. Ev di jinê de bêbawerbûnê, encixandinê, bêvîniyê, şikestinê çêdike. Îro jî zehmetiya wê dikşînin. Her hevaleke jin di şexsê xwe de vê yekê dibîne. Divê di vê derê de hevalên xort rista xwe bibînin.

Serokatî dibêje, “*min du çivîk kûştin, ez li hemberî wan rexnedayina xwe didim.*” Lê em hemberî rexneyekê jî ne vekirî ne. Me birînên mezin ku dermankirina wê pir zehmet e, di rihê jinê de vekirine, lê em qesî mîsqeleke bi rexnedayin nêzik nabin. Ji bo wê yekê heval pir zû rekleksan raber dikin. Mesela hevala jin ku weke nû û bê uslûb tê pênasekirin, gelo çi jiyan kiriye ku ew qesî radîkal diaxife. Fêmnekirina wê heye. Dibe ku hin guhertin hebin, lê di şêwaz de bavê min û birayên min û hevalên li vê derê ji hev û din pir ne cuda ne. Li hemberî vê yekê dema ku rexneyeke hevalên jin derdikeve, li hemberî wê yekser parastinek pêş dikeve.

Dibe ku di rêbaz û uslûb de kêmasî hebin, lê her gotineke hevalên jin rastiyeke îfade dike. Teqez di bin wê de rastiyek veşartî ye. Ne tenê hevalê Ş…, di jiyanê de gelek hevalên xort, li hemberî rexneyan dibêjin teqez ez vî tiştî di xwe de nabînim û ez nikarim derbas jî bikim. Ew nêzikatiyeke deshilatdariyê ye. Ger em dixwazin bibin mirovên mezin û dostên mezin, divê biçekî em xwe bibînin. Divê em bi fikrekî jiyanî û felsefî binêrin. Ger em bibêjin falan heval nû ye, Serokatî nas nake, parazname nexwendine û min rexne bike jî ez guh nadimê, rast nabe. Jina herî nezan jî, ji aliyê deshilatdariya zilam ve tiştekî dîtiye û refleksek wê heye.

Hevala Dilzar: Dibe ku hevaleke jin carna rêbazên şaş biceribîne. Rast e, mirov di rêbazê de pirsgirekan jiyan dike. Lê pir zêde pirsgirekên rêbazê anîna ziman û heval di bin tûndiyê de hiştin ne rast e. Gelek heval ji bo ku bê rêbaziyê jiyan nekin, gavan neavêjin. Divê em di vê mijarê de baldar bin. Bi taybetî di mijara hevalên ciwan de divê mirov bawerî bidê.

**Hevalê X…:** Di mirovên civakê de mantiqek pêş ketiye. Dema ku diçe qarekolekî, dibêje di destpêkê de ez fermandarê qereqolê re biaxifim, ger ew nebe es ti kesî din mûhatap nagirim. Mînakên Heval Ş… hinek dişibin wê. Geler ji vî alî ve dîqat bike.

Mesela, nirxandin piranî li ser nêrînên hevaleke jin a nû hate kirin, cihê wê hevalekî xort di uslûb û rêbazê de şaştiyan bike, em ê çawa nêzik bibin. Yek jî ew hevalê xort çawa nêzik bibaya, dê bigota serê min jî biçe, ez cardin di perwerdehiyê de neaxifim. Kî em weke hevalên xort wisa jî nêzik dibin. Çima em ew qesî dikevin parastinê? Ger hevaleke jin a nû jî hebe, divê em pê re bibin alîkar.

**Hevalê X…:** Nakokiyên wisa werin nîqaşkirin, baş e. Jixwe nîqaşkirina van tiştan me zelal dike. Ji ber vê bi parastin nêzik bûn û ew yek wekî ku ne hevaltî be nirxandin jî ne baş e. Lewma heval dibêjin, “*em hevalên hev in, divê em wisa nêzikî hev nebin*.” Jixwe ji ber ku em hevalên hev in, em wisa nêzik dibin.

Hevalan behsa çûyina perwerdehiya PAJK'ê ya guhertina zilam kirin. Wê demê me pê henekên xwe dikirin. Niha perwerdehiyên wisa pêş bikevin, kîjan hevalê xort dixwaze biçe? Di destpêkê de ez wê wêrekiyê nîşan nadim. Lê rastiyeke heval Fîkrî Baygeldî heye. Çima em wê ji xwe re esas nagirin û her nêzikatiyên şaş ji xwe re dikin mînak.

Di malê de me bi awirekî xwe, jinek dikûşt. Divê em tahrîbatên vê li ser jinê bibînin. Dixwaze bila hevaleke nû be, dixwaze bila hevaleke kevn be. Yek jî çima em her tiştî ji jinê hêvî dikin ku ma em jî mîlîtan in û xwediyê angaşteke şoreşgerî ne. Çima em ji aliyê lewaz yê jinê re têkoşîn kirinê, weke peywira xwe nabînin? Mirov ji vî alî ve jî bigire dest, dê baş bibe.

**Hevala X…:** Şêwaza diyalogê ya Sokrates heye. Pê re dibêjin, doxûrtma-vejandina peyvan. Diyalektîk jî hinekî wateya xwe ji vê derê digire. Sokrates dibêje, "*tiştên ku di hundirê mirov de veşartî û mirov pê nehesiye, ez derdixînim holê.*" Di hundirê me de jî gelek tiştên ku derneketine holê hene. Dibe ku ne cewhera me be, lê bi demê re bi tesîrên cuda di hundirê me de çêbûne. Nîqaşên me hinekî van aliyên me yên veşartî jî derdixînin holê.

Parçekirin, gelek diyardeyan derdixîne holê, lê ji ber ku nikare bîne gel hev, nagihêje encamê û tiştên xeletî çêdibin. Hevalan weke mînak arîfbûyin pênasekirin. Lê arîf di nava ya giştî de xwe dihelînin. Xwe bi parçe nagirin

dest. Ger heqîqet giştî be û ez jî perçeyekî vê heqîqetê me. Ango heqîqeta min û ya hevalên jin bi hev ve girêdayî ye. Em di nava hev de ne. Dibe ku cudahiyên me hebin, lê em giştî û yek in. Her wiha bi çînî girtina dest jî, mirov ne di zanebûna wê de be jî heqîqetê parçe dike. Ji ber vê em li dijî kirde û bireserê derdikevin. Gotina hevala kevn û hevala nû, hevala zana û hevala ne zane jî; yek bireser, yek jî kirde girtina dest e. Divê tehlîla van kûr bê kirin. Ew nêzikatiyên me bingeha xwe ji kû digirin, bi taybetî divê em di vê derê de kûr bibin, ew jî zayendperestî ye.

Ger em ji xwe re dibêjin, em biyaniyên xwe ne. Wê demê divê di me de hinek şikestin çêbibin. Li hemberî hewildanên wê zilamtiyê jî divê şikestin çênebin. Lewma tiştê ku tê şikandin ne cewhera me ye, tesîr û kesayeta ku di me da hatiye avakirin e.

Hevala X…: Bi piranî di me hemûyan de, pirsgireka rêbaz û uslûbê heye. Li hemberî wê dema ku bertekek çêdibe jî, em xwe paş ve dikşînin. Lewma di me de pêşderazîbûnek çêdibe û em difikirin ku êdî mirov bi wî/ê hevalî/ê re kîjan nîqaşê bike jî, dê bigihêje heman encamê. Tiştê ku em li ser lêhûrbûn bikin, ne nûbûyin û kevnbûyina hevalekî/ê ye.

Tiştê ku em li ser lêhûrbûn û lêpirsîn bikin, em di têkoşîna zayendî de çiqasî bi israr in. Heval Ş… dibêje, ez li gel hevaleke nû nikarim nêrînên xwe bînim ziman, kêmasiyên xwe vekim. Lewma bertek derdikeve. Divê

heval bi xwe dahûrandina tahrîbatên hezaran salan jî bifikire û li gorî wê rê û rêbazên nîqaşê bibîne, ne ku jê bireve. Ger dahûrandineke kûr çêbûbûya, dê li hemberî bertek, an jî rexneyeke heval hema xwe paş ve nedikişand. Heval dizane ku divê têkoşînek were dayin û guhertinek were kirin. Lê di gav avêtinê de heval heman wêrekiyê nîşan nade.

Di civakê de du zayend hene. Ger di wê civakê de pirsgirekek hebe, pirsgireka herdu zayendan e jî. Di nava civakê de nêzikbûna jinê, pîvana esasî ye. Serokatî wisa dinirxîne. Lê em ê vê nêzikbûnê çawa sererast bikin. Li ser vê esasê hev û din guhertinê de em çiqasî dikarin ser bikevin? Rast e, di rê û rêbazên me de redkirina çort pir zêde ye. Em nikarin zemîna şerkirinê ava bikin. Ger di vê yekê de em dizanin ku hevala li hemberî mirov teng nêzik dibe, wê demê divê tu wê teşvîqî rastiyê bikê. Dibe ku yekî/ê din vê yekê nebîne. Di wê kêliyê de tu dibînê. Ger tu mûdahale nekê, zirareke ku em didin rêxistinê ye jî. Lewma tu wî/ê kesî/ê di halê xwe de dihêlê. Ji bo guhertina wê têkoşîneke nameşînê û wê hevalê naxê xizmeta rêxistinê.

Ger di navbera zilam û jinê de têkiliyeke azad were jiyîn. Divê zilam xwe ji hemû ferasetên deshilatdariyê û tahakûmê rizgar bike. Jin jî divê zîhniyeta xwe ya koledar bide aliyekî. Ew zîhniyeta koledar, carna di bin gotinên radîqal de jî tê veşartin. Dibe ku zilam û jina di nava

civakê de û hevalên li vê weke hev werin destgirtin. Rast e, serî rakirinek heye, têkoşînek heye. Lê di kîjan astê de ye? Ger em negihînin asteke jortir û negihînin encamê. Dê em ê dîsa bizivirin destpêkê. Wê me paş ve bikşîne. Wê demê di mejî de xwesteka ew pergala deshilatdar heye, lê di ziman de em cuda xwe didin nîşan. Ew nakokî di me hemûyan de heye.

**Hevalê X…:** Serokatî civaka me weke "*bûyina evîndarê kûjerê xwe*" pênase dike. Ne parçebûyin, di vê civakê de tunebûyin heye. Ez di nava civakeke wisa de mezin bûm. Di nava wê civakê de rabûn û tevlêbûn jî girîng e. Ew gavek e, serî rakirinek e. Lê têrê nake.

Bêguman di kesayeta min de jî parçebûyin heye. Ew yek li ser nirxandin û jiyana mirov jî tesîr dike. Pergal di destpêkê de rastiya me, ji me dide bîrkirin, pişt re jî me dişibîne xwe. Tesîra vê li ser me jî heye. Serokatî dibêje, "*divê mirov vê yekê ferq bike û fêm bike.*" Em jî niha hewil didin ku beriya her tiştî fêm bikin û ferqa xwe ya ji pergalê daynin holê. Ez jî li ser vê esasê nêz dibim. Li hemberî nirxandinên hevalan, ecizbûnê min û bertekên min jî çênabin. Her hevalek nêrînên xwe tîne ser ziman. Bêgûman divê nakokî û pevçûnên fikrî jî hebin.

Me xwe ji hinek tiştan rizgar nekiriye. Dibe ku teng mezîkirin, şaş axifîn û uslûb de şaştî kirin hebin. Lê mirov hev û din sererast dike. Dibêjin, *"gotina xweşik mar ji kûnê derdixîne.*" Ger mirov jiyanî bigire dest, zimanê me

jî carna dijbertiyê û nebaşiyê ava dike. Ez di ûslub de çêkernebûyin û şêwaza ku nade qezençkirin rexne dikim. Ew ji bo me hemûyan derbasdar e. Divê em bi şêwazeke çêker tevbigerin ku em bigêhêjin armanca xwe. Sê tiştên esasî; şêwaz, uslûb û tempo ne. Tiştê ku ji partiyê dide qezençkirin û windakirin jî, ew hersê tişt in. Ew hersê tişt jî hev û din tesîr dikin.

Ez nabêjim hevalên ku nû tên, nezan in. Lê dema ku şêwazeke şaş derdikeve mirov sar dibe. Sedema revan jî, yek weke hevalan gotiye, lê yek jî ji ber şêwaza me ye. Em bi şêwazeke rast têkoşîn nakin û mirovan qezenç nakin. Divê em têkoşîna herî mîsoger bimeşînin, lê divê şêwaza wê jî rast be.

Ez têkoşîna jinê pîroz dibînim. Ger hewildaneke vegerîna cewhera xwe hebe jî, ez pir kêfxweş dibim. Lewma divê ew jî li gorî heqîqetê be. Hevalên jin li gorî vê têkoşîneke didin. Dixwazin qirêjiyên pergalê li ser xwe biavêjin û pergaleke nû û alternatîf ava bikin. Mirov li hemberî vê rêzdar nêz dibe.

Hevalan qala çareseriyên derbasdar pêş xistinê kirin. Rast e, ger mirov di çareseriyê de rêbaz û şêwazeke mayinde ava neke, mirov nikare bigihêje armanca xwe jî. Ji ber ku hevalên me yên pêşeng, di rêbaza Serokatî de xwe pêş xistin, encamên dîrokî derxistin holê û ew qesa nirx ser xistin. Lê em hê negihêştine asteke wisa. Her wiha

kîjan feylezof dibe bila bibe, kîjan zanist dibe bila bibe, dema ku di teoriya azadiya jinê de şaş be, kêrî tiştekî naye. Ger wisa be civakê tune dihesibîne.

Hevalê X…: Heval careke din hin îzah kirin, lê xwe di hinek xalan de kîlît kiriye. Bi awayekî giştî di van mijaran de, li ser perspektîfên Serokatî bisekine dê baş bibe. Bila hinekî din hewildana fêmkirinê nîşan bide. Divê bi taybetî heval li ser parçekirina heqîqet, jiyan, civak û diyardeyan bisekine.

**Hevala Dilzar:** Heqîqet yekpare ye. Lê ne ku em her tiştî weke hev bikin. Di nava rengîniya heyî de kombûyin û yekîtî, giştîbûnê ava dike. An na giştîbûn, ne ku her tişt şibandina hev e. Divê her kesek û tiştek jî xweserbûna xwe biparêze. Ger li hemberî heqîqetê dibe asteng, divê ew parçe werin sererastkirin. Giştîbûn, di nava hevsengiyê de tevgerîn û herikîna parçeyan e. Di nava heqîqetê de jî rêbazên bê sînor hene, di rêbazan de dewlemendî heye. Rêbaz, di kêliyê de şênberbûyina hemû zanebûnên te ye. Ew carna Tirkî dibe, carna bi Kurdî dibe, carna bi awirekî dibe. Rêbaz, heqîqeta mirov e. Rêbaz, ne tenê uslûb û nêzikbûna hevalekî/ê ye.

Her dem gotina nerm esas girtin, ne dewlemendiya rêbazê ye, ne rêbazeke qezenç dike ye jî. Mesela Îskender bi şûr girekan vedike, lê yek jî heye ji bo ku wê girêke veke ew qesa ked dide. Divê tu sedema avabûna wan

girêkan bibînê û wê ji holê rakê. Ew hemû rêbaz in. Dewlemendbûyina rêbaz, azadbûyin û mezinbûna mirov nîşan dide. Heqîqeta mirov diyar dike. Parçekirinê mirov wisa bigire dest, wê baş be.

Em dibêjin, niyeta min baş e. Lê mesele ne ew e, divê mirov bi ew niyeta xwe baş tiştan bikaribe bidahûrîne, pê re çareseriyê ava bike û derbas bike. Xwe azadkirina rasteqîn bi vî rengî dibe. Ger di zîhniyetê de parçetî hebe, dê teyisandina xwe li ser her tiştî bike. Lê ji bo ku ew parçebûn ji holê were rakirin jî, divê mirov li ser rêbazê pir lêhûrbûn bike. An na mirov dikeve nava bêrêbaziyên mezintir. Divê li ser vê lêhûrbûn bike, da ku bikaribe rê, rêbaz û şêwazên rast bibîne. Ji vî alî ve xwendin û lêkolîn kirin jî girîng e.

**Heval X…** got, xwendina feylezofên şaş mezî dikin pêwîst nake. Divê mirov yên şaş jî bixwîne û jê encaman derxîne. Lewma ew kesên ne ji rêzê ne, li ser jiyan û pergalê, zîhniyeta civakê tesîr kirine. Ger tu baş nikaribê tehlîl bikê, tu nikarê tevdîrên xwe jî bigirê û alternatîfa xwe jî baş pêş bixê.

Heval dibêjin, em li hemberî dayika xwe deyndar in, hundirê me de maye. Divê em yekser li hemberî wê rexnedayin bidin. Lê divê dayika xwe jî tenê weke kesekê negirin dest. Ger li hemberî dayika xwe te kêmasî kiribe, ew li hemberî hemû jinan e, li hemberî hemû aliyê me yê civak û xwezayê ye. Li hemberî dayikê rexne dayin girîng

e, lê di zemîna PKK û PAJK'ê de jî mirov dikare rexnedayina xwe bide. Ya herî girîng jî, asta ku te ew zîhniyeta ku pê dayika xwe êşandiye de guhertin bikê, tu di wê astê de rexnedayina xwe didê. Wê demê di rêka bûyina kûrê pîroz yê dayikê de jî, mirov pengaveke diavêje. Dê dayika te jî wê hîs bike. Bes tu xwe ava bike.

# HEVJIYANA AZAD

**Hevala Dilzar:** Em derbasî mijara hevjiyana azad dibin. Jixwe bi jineolojiyê ve girêdayî ye. Em dikarin li ser esasê vegotin û nîqaşên ku pêş ketine, hevjiyana azad jî hinekî din şênber nîqaş bikin. Jixwe me beşa paraznameya Rêber Apo ya hevjiyana azad ji xwend, li ser wê esasê em di destpêkê de dikarin hin tiştan jî bibêjin.

Moderniteya Demokratîk, di cewhera xwe de moderniteya jinê ku hevjiyana azad tê afirandin e. Mijara hevjiyana azad, mijareke cîdî ku ne tenê ji aliyê şexsî ve were nirxandin e. Cîdîyeta wê, ji ber civakîbûn û dîrokîbûna wê ye. Mirov çiqasî rojane bigire dest jî, divê mirov ji dîrokê qut neke. Lewma jiyan, ji kêliyê pêk naye. Çawa ku Serokatî dibêje, jiyan di kêliya ku tê jiyîn de naye fêmkirin; em jî dikarin bibêjin, jiyana ku em niha dijîn û hîs dikin, di cewhera xwe de tiştên ku me berê jiyîn e. Em di navbera xwe, jiyan û dîrokê de têkiliyeke pir xurt ava dikin. Înkarkirina vê têkiliyê, înkarkirina hebûna xwe ye. Ev jî, nêrîn û nêzikatiya ku lîberalîzm dixwaze ye, an jî berovajîkirin û rêderxistina jiyanê ye.

Hevjiyana azad, ji aliyê têkoşîna me ya azadiyê ve xwedî girîngiyeke dîrokî-civakî ye. Ya ku vê girîngiyê pêk tîne jî, civakbûyina Moderniteya Demokratîk e. Ev rewş, di mijara Moderniteya Demokratîk de hin pirsên nû li me dike. Ger tiştên ku em dijîn, jiyanîkirinên me yên dîrokê

bin, kesayetiyên me ku em dijîn jî, teyisîneke manewiyeta civakîbûna dîrokî ye. Ev rastî di mirov de civak, di kêliyê de veşartîbûna dîrokê ye. Her wiha dema ku jiyan ji van herdu tiştan tê qutkirin, wê ji xwebûnê derkeve.

Jixwe peyva jin û jiyanê, tê wateya şînbûyin, zêdebûn, hênasegirtin, coş û herikînê. Tevî vê jî ger, ev herdu peyv îro weke pirsgirek derdikevin pêşiya me, ji ber ku îro jiyan gihêştiye asteke naye jiyîn. Bi taybetî di Kurdî de peyva jînê, ji aliyê têkiliya jin û jiyanê ve pir watedar e. Jiyan, di şexsê jinê de tê şênberkirin. Tevî pergala dewlet-bajar-hiyerarşiyê jî, heya roja me ji ev rastiya xwe tiştek winda nekiriye. Têra xwe civak hatiye xirabkirin. Li holê ne xweza, ne civak û ne jî jiyaneke were jiyîn maye. Her wiha ji aliyê cewherî ve ne jin, ne jî merek ji holê hatiye hiştin. Ji ber vê yekê divê di hîmê lêgerîna hevjiyana azad de, xweza û civak hebe. Ger wisa bibe dê ev lêgerîn, hênaseyeke azad biafrîne. Jixwe bêyî ku şînbûyin û zindîbûna jiyanê çêbibe, dê çawa şanezî û kêfxweşî hebe.

Da ku di înşaya Modernîteya Demokratîk de, hevjiyana azad were afirandin divê nêrîneke nû ya jiyan û civakbûyinê pêş bikeve. Divê teqez were zanîn ku di jiyan û civakbûyinê de, evîneke mezin heye. Jiyan bi evînê bersivandin, heqîqeta ku jiyanê xweşik dike û wateyê diafrînê ye. Weke kapîtalîzmê di serê me de ava kiriye, civakbûyin ne pirhejmarî ye. Civakbûyin li gel hevbûyin û yekbûyin e, ev yekbûyin kelecaniya pîrozbahiyan dide

mirov. Ango civakbûyin, ji vî alî ve cejn e. Kesên ku civakbûyina xwe pîroz dibînin, vê yekê bi coşa cejnê dikin yek û pîrozkirina vê weke şert dibînin. Hevjiyana azad a Modernîteya Demokratîk jî, li dijî ezezîperestiya kapîtalîzmê, afirîneriya civakbûyinê û yekbûyinê îfade dike. Nirxên ku ev hevparbûyin ava dike jî, qesî ku mirov dike mirov, mirov dike hebûna bi şans ku xwediyê wateyê ye.

Weke mîlîtanên têkoşîna azadiyê, dema ku em şêwazên têkiliyên xwe, civakbûyina ku me afirandiye, pirsgirekên ku em di nava vê civakbûyinê de dijîn û têkoşîna xwe ya hundirîn mezî dikin, nêrîneke çawa ji me re çêdibe? Ger em vê yekê weke neçarî û tiştekî bi zorê were kirin bibînin, rast nabe; ger wisa be ev mijar ji serî ve girtina dest şertekî şoreşgeriyê ye. Têkiliyên ku em dijîn, têkiliya me ya bi Serokatî ve, nirxên têkoşînê ku derketine holê, wateyên ku di nava zehmetiya têkoşînan de derdikevin holê, ma ne peyvên gerdûnê ku ji xwe re zimanekî digerin in? Dervayî vê em dikarin çawa pênase bikin? Gerdûn dixwaze, bi me xwe îfade bike. Ev rastiya ku Serokatî her tîne bîra me, teyisina mejiyê azad ku di me de çêdibe ye. Ji ya herî biçûk, heya ya herî mezin ger em diyalektîka têkiliyan ya PKK'ê binêrin; ne zehmet e ku em têbigihêjin ku ev têkilî hêrikînên jiyanê diafrînin.

Her cureyê têkiliyê mijara sosyolojiya azadiyê ye. Divê em weke hêrikîneke ku di kêliyê de jiyanê diafrîne têkiliyan binêrin.  Tevî ku hevjiyana azad, şêwaza îfadeya nû ya civakîbûna azad be jî, dema ku em vê têgehê dibihîzin jin û azadiya jinê tê bîra mirov. Her çiqasî azadî bi herdu zayendan ve girêdayî be jî, hîmê hevjiyana azad jin e. Ger civakbûn, qada ku exleq û polîtîka mirov azad dike be, ji ber rastiya ku ev azadbûyin bi awayekî xurt di neolîtîkê de pêk hatiye, jin dibe diyardeya esasî ya hevjiyana azad jî. Ji ber ku civakbûna, me dike mirov li derdora jinê hatiye avakirin û bi pergal bûye, civakbûna nû ku tê wateya rizgariya demokratîk û jiyana azad jî, wê li derdora jinê were avakirin. Da ku ev yek pêk were, divê em li ser Moderniteya Demokratîk lêhûrbûn bikin û civakbûyina vê şênber bikin. Li gel vê yekê divê têkiliyên jin û mer jî werin nirxandin, lê divê ev têkilî her li ser esasê civakbûnê werin destgirtin.

Tenê weke têkiliya di navbera du zayendan de fêmkirina hevjiyana azad, hêleşaşiyek e. Di asta xwecihî û gerdûnî de ger bikaribin yekîtiyeke ava bikin, dikarin hebûnê biafrînin. Nêzikatiyeke dijberî wê, tenê ji mirovan re qefes û kemînan ava dike. Qesî ku mirov girêka kor ya di kesayeta xwe de çareser dike, divê mirov têbigihêje ku vê girekê di asta gerdûnî de rê li pêşiya kîjan pirsgirekan vekiriye. Pergalên serwer, li ser vê esasê xwe li ser pişta mirovan ava kirine. Dijberî vê, azadbûyina di kesayet de, di asta ku kolektîf dibe û bi nirxên gerdûnî ve dibe yek de

vedigere heqîqetê. Kesek çawa dikare dîrok û civakê temsîl bike? Mirov xwediyê potansiyeleke wisa ye. Tevî vê jî Modernîteya Kapîtalîst mirov xistiye rewşeke wisa ku, hê jî mirov nikarin potansiyela civakbûyina xwe derxînin holê. Ji wê jî wêdatir ev potansiyel, di nava van ezezî û şexsperestiyan de dihelin û dibin çavkaniyeke ku vê pergalê xwedî dikin. Jin û merên ku di xwe de yekîtiya nirxên gerdûnî kolektîf dikin; dibin çavkaniya estetîk, çêkerî, cazîbeya azadiyê, afirîneriya mêjî, xweşikbûna fikrî û exleqî ya azadiyê. Yên ku dikarin tiştekî wisa re xwe bikin çavkanî, dikarin bibin avakêrên hevjiyana azad jî. Lewma dema ku ew bi vî rengî gaveke biaêjin jiyanê, têk naçin, nakevin kemîna nexweşiyên pergalê. Lewma asta wan a azadiyê, ew qesî xurt e ku nahêlin mîkrobeke biçûk a pergalê bikeve laşê wan. Serokatî jî, mînaka vê ya herî xweşik e.

Dema ku formgirtina zîhniyeta hîmî ya Modernîteya Demokratîk esas tê girtin, divê mirov bi rêka têkiliyên zayendî xistina asta girêdanbûna pergalê ya jin û meran bidahûrîne. Her wiha divê mirov bizanibe ku di cewhera xwe de jin û mer, dijberî wê ne amûrên vê pergalê ne, kesên azad yên civaka exleqî û polîtîk in. Dê bi vê zanêbûnê wateyeke civakî biafrînin û evînê pêk bînin. Paradîgmaya me ya nû pênaseya evînê jî dike; da ku mirov bikaribe bibe evîndar, divê di destpêkê de mirovbûyin çêbibe. Bûyina mirovê azad jî, bi demokratîkbûyin, ekolojîkbûyin û azadîxwaziya jinê ve

girêdayî ye. Di Moderníteya Kapîtalîst de evîn, weke hesteke sewalî lê hatiye. Di sewaltiya ku em di vê derê qalê dikin de, dervayî kêliya ku tê jiyîn, tu kêliyên din nayen fikirîn; zindîbûneke ku ji wateyê hatiya qûtkirin e. Lê şoreşên ku hatine jiyîn jî nîşan didin ku ferqeke mirov heye. Sewalîkirina evînê, civaknebûyinê îfade dike. Di hestên evîna du kesan de potansiyela hin wateyan hebe jî, li beramberî êrîşên Moderníteya Kapîtalîst, ev hest jî tune bûne. Ji ber vê ger êrîşa herî mezin li ser civakbûna me be, divê beriya her tiştî em berpirsyariya afirandina civakbûna xwe bijîn. Divê em bibin evîndarên civakbûna xwe û bi afirandina wateyeke evînî, divê em potansiyela ku di me da hatiye tunekirin, ji nû ve zindî bikin.

Dijberî ve weke xweşikbûneke biyolojîk mezîkirina jinê, tê wateya ji destpêkê ve kûştina potansiyela di hundirê me de. Jixwe ew jî nabe evîn. Dubarekirinên milyonan mirov, îro vê pergalê li ser piyan digire. Tenê nîvê van mirovan, ev dubarebûna ku di kesayeta xwe de çêdike lêpirsîn bike, dê ev pergal birûxe. Dibe ku ev yek weke ûtopyayeyeke were dîtin, lê rastiya me ye. Mesela têkiliyên jin û meran ku di nava PKK'ê de tên jiyîn, em bigirin dest; ji ber ku ev têkiliyên ku milyonan mirov dubare dikin, di astekê de derbas kirine, di şexsê xwe de herikîna pergalê jî dane sekinandin. Dijberî wê di nava me de tasfiyegeriyên herî mezin jî, di demên ku têkiliyên jin û meran ketine asta têkiliya zayendî de hatine jiyîn. Dijmin jî baş dizane ku diyalektîka têkiliyan ku Serokatî ava kiriye, parastina rihê PKK'ê ye.

Serokatî, heya ku gihêşt asta hevjiyana azad, di çarçoveya azadiya jinê de dahûrandinên pir kûr kirin û hem ji bo jinê, hem jî ji bo zilam hevjiyaneke azad çawa dikare were jiyîn pênase kiriye. Xîtaba Serokatî ku ji bo jinan dibêje, “ez li gel we û yê we me” heye. Ev yek hesta rûmetê û berpirsyariyê dide hemû jinan. Bersivdayina vê jî, di kesayeta me her yekê de derdikeve. Divê jin ne ya ti kesî be, divê jin vî mafî nede ti kesî. Divê bizanibe ku di nava ev pergala mûlkiyetê de, dema ku vî mafî bide yekî, divê bizanibe ku mirina wê ye. Têkiliyên mûlkiyetê, ne tenê bi pereyan û serwetan pêş dikevin. Bêguman madîyatgerî jî divê were derbaskirin, lê mûlkiyet ne tenê ew e. Kombûyinên me yên madî tune, lê kombûyinên ku çanda şer-deshilatdariyê ava kirine hene. Mesela fermandarek, hevalên di bin fermandariya xwe de dikare aîdî xwe bibîne. Gelek heval vê yekê xwezayî jî dibînin. Em dikarin mînakên vê zêde jî bikin.

Her wiha têkilî û nêzikatiyên kevneşop ku li gel mûlkiyetê pêş dikevin û li ser herdu zayendan jî tesîr dikin hene. Mesela hêleşaşiya zilamê bi hêz û jina lewaz heya ku naye hilweşandin, em nikarin nêrîna nû a Modernîteya Demokratîk ava bikin. Li gel vê yekê pergalên deshilatdar her zayendekê di nava wê de jî parçe dike û têkiliyeke hiyerarşiyê pêş dixe. Bêguman ev afirandineke pergala dewlet-deshilatdariyê ye û hê jî derbasdar e. Derbaskirina vê, bi avakirina hevjiyana azad gengaz e. Carna di nêzikbûn û têkiliyên hevalên me de jî heman tişt

derdikeve. Dema ku li gel hevalekî/ê têkilî tê danîn, hilbijêr nêzikbûn çêdibe û ev hiyerarşî esas tê girtin. Ji bo ku ev yek were derbaskirin, divê em ev zîhniyeta dubendî ku her tiştî weke bireser û kirde digire dest derbas bikin. Da ku ev nêzikbûn bişke, divê herdu zayend jî kêlî bi kêlî lêpirsîna xwe bikin. Divê em kêlî bi kêlî nêzikatiyên hêsan, hatine fêrkirin, ji rêzê û li gorî berjewendiyan e derbas bikin. Mesela hê jî hevalekî xort zû bi zû naye rexnekirin, lê hevaleke jin bi rehetî tê rexnekirin. Dîsa bi piranî di zilam de, cih bi cih jî di jinê de xwe kirina navenda her tiştî heye.

Her wiha heya ku em bawerî bi zayenda xwe naynin, hîskirin, parvekirin, guhdarkirin û yekbûyinê di nava xwe da ava nekin; dev ji azadiya jinê berde, em nikarin di derheqê jinê de tiştekî jî bibêjin. Ger em dixwazin van taybetmendiyên pergala serwer derbas bikin û hevjiyana azad ava bikin, beriya her tiştî divê em bawer bikin ku jiyaneke hevpar û azad gengaz e. Divê em bi pîvanên civakbûna Modernîteya Demokratîk nêzikî her tiştî bibin. Bi rûxandina ya heyî, vegerîna cewhera xwe şert e. Divê weke mer û jin, em nêrînên xwe ji nû ve biafrînin. Divê em ti kesî/ê weke bireser û amûr nebînin. Divê em ji diyalektîka xweda û evd derkevin. Dijberiya wê têkiliya ku li ser esasê hevjiyana azad pêş bikeve ye. Jixwe ev têkilî jî yekalî nabe, divê heman hest were jiyîn û parvekirin.

Dema ku zehmetî û pirsgirekên jiyanê bi hev re tên bersivandin, divê pêwîstî jî bi hev re werin peydakirin. Yên ku tenê xwe weke navenda çareseriyê dibînin, jixwe navenda hemû pirsgirekan e. Dibe ku bi serê xwe karek kirin, wisa xweşiya me biçe; lê ji aliyê civakî ve ti nirxan neafrîne û ne xwediyê ti wateyê ye. Jixwe dewlet jî di bin angaşta bi xwe çareserkirina pirsgirekên civakê de deshiltdariya xwe xurt dike. Di têkoşîna şoreşgerî de nêzikatiyên bi vî rengî dê bi avakirina dewlet û deshilatdariyê encam bibin.

Em dubare bikin, heya ku feraseta milk-kirina jinê naye derbaskirin, azadî pêk naye. Her wiha jina ku tê sînordakirin û bi cihekî ve tê girêdan, ji aliyê din ve mer jî bi cihekî ve girê dide. Ev yek derxistina zanebûnê ya mer, ji bo azadiyê gaveke şoreşgerî ye. Di vê mijarê de serkeftîbûyin, derfeta înşakirina jiyana azad jî derdixe holê. Ger jin bikaribe gavên xwe afirandinê xurt biavêje, ji aliyê hest, fikir û civakî ve dikare bibe ya xwe. Ger hêza xwe parastinê bikaribe di xwe de pêş bixe, ti kes nikare bi hest û nêzikbûnên parastinê nêzikî wê jinê bibe. Divê jin xwe ji ew rewşa hebûna divê were parastin derxîne. Lewma mirov tiştê ku diparêze, aîdî xwe dibîne û dike milkê xwe. Derûniyeke wisa di mirovan de heye. Ji vê rewşê derketina jinan, wê asta wan ya azadiyê jî diyar bike. Lewma rêgezeke esasî ya hevjiyana azad jî, xwe ji rewşa milkbûyinê û parastinê derxistina jinê ye.

Hevjiyana azad ya Modernîteya Demokratîk, pergala jiyanê ya yekane ku jinê ji ew nasnameya bi aloz derxîne ye. Bi alozîbûyina jinê çi ye? Çima aloziyên vê pergala deshilat tevî ku rastî hemû xirabiyên wê tê, jin jiyan dike? Çima nasnameya zilam, weke ku di nava aloziyê de ye naye pênasekirin. Di vê derê de tiştê girîng, fikra ku enerjiya herdu zayendan jî li gorî zemîna civakî beralî dike ye. Di dema ku jiyana azad tê înşakirin de, tevlêbûna qadên wan û enerjiya xwe bi jiyanê ve kirina yek a herdu zayenden jî girîng e. Ger ev enerjiya di jinê de form bigre, jixwe hebûna azad ava dibe. Li ser vê esasê yekîtiya azad a herdu zayendan, heqîqeta gerdûnî ava dike. Da ku jin enerjiya xwe bi awayekî rast tevlî jiyanê bike, divê ji bo vê rêbaz û amûrên guncav peyda bike. An na hebûna ev nasnameya bi aloz her bidome.

Mijareke din ku hevjiyana azad gengaz dike jî, li gel jinê zêdebûn e. Weke jin, divê em mijara zêdebûnê bigirin rojeva xwe û li ser wê lêhûrbûneke kûr bikin. Em zêdebûneke çawa dixwazin? Em di zêdebûna biyolojîk de amûrek in, em ê xwe çawa ji vê rewşê derxînin? Lewma ev zêdebûna biyolojîk, tê wateya komkûjiyeke ku li ser jinê tê meşandin. Ji vî alî ve her gaveke ku ji bo azadiya zayend tê avêtin jî, li dijberî komkûjiyê sekneke îfade dike. Divê li dijî zêdebûna biyolojîk, zêdebûna civakî û watedar were hilbijartin. Ger em di qada lê de bi cihanîna peywirên înşaya Modernîteya Demokratîk, bi têkilî û sekna xwe ya jiyanê wateyê diafrînin, di nava wê civakê

de berheman diafrînin, ger di wateya civakbûyina xwe ya nû de em PKK'îbûn û PAJK'bûyinê şênber dikin, em dikarin di wê derê de qala zêdebûneke civakî û watedar bikin. Divê jinên ku di têkoşîna azadiyê de rista pêşengtiyê digirin ser xwe, zêdebûna civakî û ekolojîk esas bigirin. Divê her hevaleke me, li qada xwe ya xebatê, divê rista dayikbûnê bide xwe. Jixwe şoreşger dê û bavên hemû zarokan e. Ger em ji pêşeroja wan xwe berpirsyar dibînin, ji bo wan têdikoşin û şer dikin, ew jî parçeyekî ji canê me ne. Zêdebûyineke bi vî rengî, li gorî heqîqeta me ye. Civakbûyina PKK'ê, civakbûyina me ya nû ye. Da ku em jî ev civakbûna xwe zêde bikin, divê em rêbazên rast û encamgir yên vê zêdebûnê bibînin û şênber bikin.

Ji aliyê jinê ve, tiştê ku divê ti caran dev jê bernede, rista pêşengtiya civakê ye. Ger jin bê rist be, ew mirina wê ye. Estetîk, xweşikbûn û enerjiya jinê û heqîqeta wê ya gerdûnî, di nava pergala kapîtlîst de tê parçekirin û tunekirin. Di vê derê de divê were dîtin ku jin, hêzeke şaristaniya demokratîk e. Ev hêza şaristaniya demokratîk çiqasî xwe bigihîne asta ku dikare hilbijêra xwe ya azad kirinê, dê ew qesî xweşik bibe, wate bigre û di şikestina seyemîn de rista xwe bîlîze.

Her wiha bi mijara hevjiyana azad ve girêdayî, mijareke girîng jî evîn e. Fereseta evînê ya Modernîteya Demokratîk, platonîk e. Di vê mijarê de jî nêzikatiyên bi hêleşaşî hene. Ji vî alî ve dîroka PKK'ê, dîroka evînên

platonîk e. Kesên ku yekîtiyeke ku di fikir û çalakiyê de digihêje lûtkeyê dijîn, li gel wan kesên ku dijî, dikare hevjiyana azad jî pêş bixe. Evîna fikrî ya Rêber Apo jî, di çalakiya afirandina evîna mirov û welatê azad de digihêje lûtkeyê. Weke mîlîtanên azadiyê, em jî dikarin xwe weke fêkiyên vê evînê pênase bikin. Em fêkiyên evîna platonîk ya Serokatiya xwe ne. Tenê kesên ku bûne evîndarê azadiyê dikarin têkoşînê bivelîdînin. Em jî mîlîtanên ku ji dayika azadî velidîne.

Weke encam jî em dikarin bibêjin, jinbûyin; afirandina civakbûnê ye. Ketina xeta şoreşa jinê ku tê de cara ewil çand, ziman, dîrok, exleq, polîtîka, komînalîzm û hê gelek nirxên dîtir yên mirovahiyê hatine pêş xistin e. Ji vî alî ve jinbûyin, mirovbûyin e. Ger weke jin û mer, em dûrûşmeya “jin, jiyan, azadî” qebûl dikin, divê em li ser felsefeya vê dûrûşmeyê lêhûrbûn bikin û bi gihêştina kûrbûyina wateyê em qûrama jiyanê ava bikin. Li gel vê yekê divê em bizanibin ku rastiya jinbûyin-jînbûyinê jî, heqîqeteke hevjiyana azad e. Jinbûyin, jiyanîbûyin e. Fêmkirina vê, fêmkirina hevjiyana azad e. Jinbûyin, li gorî xwezaya wê jiyankirina kesayeta hevjiyana azad e. Yê ku mer azad bike û bike mirov jî; jina ku jinbûyinê ser dixe ye.

Di vê mijarê de; çend heval, bi taybetî jî hevalên jin dikarin bi awayekî şênber û kurt nêrînên xwe bînin ziman.

**Hevala X…:** Di astekê de vegotin û nîqaşên waneya jineolojî çêbûn. Lê kûrkirinek û berfirehkirinek jî pêwîst dike. Serokatî dibêje, ger jineolojî rista xwe bîlîze, divê hemû civakê bigre nava xwe. Divê cihê zanista teng û yekalî maye, jineolojî derkeve pêş. Jineolojî tenê ne ji bo jin, femînst û Kurdistaniyan e. Îro em dixwazin milyonan mirov di vê zîhniyetê de perwerde bikin û jineolojiyê li ser wî esasî belav bikin. Em dixwazin cewhera jin û civakê ku ber bi windabûnê ve çûye, lê her cewhera xwe parastiye, ji nû ve zîndî bikin. Em dixwazin li ser wê esasê civakê berv bi aşitiyê, wekheviyê, demokrasiyê û jiyaneke xweşik ve berin. Lewma civaka heyî û zîhniyeta wê tenê zayendekî derdixîne pêş, di nava wî zayendî de jî tenê derdorek nunertiya wê dike. Ji bo wê jin û zilamê heyî, bê vîn e. Vîn û nasnameya wan naye qebûlikirin.

Mesela ger dayikên me di nava siyaset, aborî, civak û tendûristiyê de cihê xwe bigirtana, dê rewşeke çawa derketa holê. Ji ber ku civak, li derdora dayikê tê honandin mînaka wê didim. Ger jinê li ser esasê zanisteke giştî, di nava hemû warên jiyanê de cihê xwe bigirta, teqez em îro ne di rewşeke wisa de bûn. Ger wisa bûya, hem weke jin, hem jî weke xort em ê zêdetir zanebana û di nava jiyaneke baştir de bana. Îro jî jin zêdetir jiyan û civakbûyinê re mijûl dibe. Ger xwediyê zanebûn û zanisteke giştî ba, dê civak ne di vê rewşê de bûya.

Hin guman jî tên jiyîn; mesala zilam dibêjin, ger pêşiya wan vebe, gelo nabe ku jin deshilatdariyê ji dest me bigrin? Dema ku em qala pêşeng, zanist û vîna gel dikin, em qala deshilatdariyê nakin. Mînaka vê ya herî şênber jî malbata me ye. Dema ku dayik di nava malê de pêşêngtiyê dike, deshilatdarî dernakeve holê, li ser nirxên civakî pêşerojeke xweştir derdikeve holê. Mirov vê yekê dikare pîvanên civaka herî peyabilind jî bixe. Ango pirsgirekeke jinê ku di nava malbatê de, an jî civakê de bibe deshilatdar tune ye. Lê dema ku ferzkirinek tê ser jinê, hinekî hêrs dibe û xwezî bi zilamtiyê tîne. Ew jî tesîra pergala li ser jinê ye.

Ji bo vê jineolojî, ne parçe ye û ne aîdî zayendeke û derdorekê ye. Her wiha ne dûr e ku ti kes nikaribe xwe bigihînê ye. Tiştekî rihî û exleqî ye. Yên ku bixwazin dikarin vê exleqê pêş bixin. Divê her kes jî Jineolojiyê weke zanista xwe bibîne û xwe ji bo pêşxistina wê berpirsyar bibîne. Ya exleqî û wîjdanî ew e.

Îro ji ber çi pirsgirekên derûniyê ew qesî zêde bûne? Lewma pirsgirekên civakî û exleqî hene. Ji ber vê jî derûnî weke nexweşiyeke dikeve rojeva civakê. Lê dema ku hemû pirsgirekên civakê werin çareserkirin, dê pirsgirekên derûnî jî dernekevin. Ji ber ku di nava civakê de hebûneke azad, bi vîn tevgerîn tune ye, nexweşî hene. Ew nexweşî jî hem li ser jinê, hem li ser zilam, hem li ser zarokan tesîr dikin.

Jin û xortên ku têkoşîneke xurt dane û ev feraseta azadiya jinê pêş xistine hene. Mesela Hevalê Fîkrî Baygeldî, weke hevalan jî got ji aliyê PAJK'ê ve weke endamekî azadiya jinê tê qebûlkirin. Lewma di xwe de her tişt çareser kiriye. Tesîrên pergala heyî li ser xwe avêtibûn. Her wiha di dîrokê de jî mînakên civakên ku jin pêşengtiya wê dikin hene. Ango hevjiyana azad ne xeyal û tiştekî ku pêk naye ye. Îro jî da ku ev zîhniyet û şêwaza jiyanê pêk were, hewildan pêwîst dikin. Di bingeha wê de jî akademî hene. Akademî ne tenê cihên teoriyê ne, ji avakirina zîhniyet û civakeke nû, rêvebirineke demokratîk a civakê berpirsyar in.

Mesela di nava PKK'ê de hevparbûyin û wekheviyek pêş ketiye. Tu nizanê ku kî bijijk e û kî erdnezyarek e. Tu nizanê ka kê xwendiye û ke nexwendiye. Lewma pêşketin li ser esasê hevparbûyineke, bi awayekî komînal û li ser esasê zîhniyeteke hevpar çêdibe. Çi jin dibe çi jî mer, niha hevalek li Ewpora bijî û biaxife jî, li Efrîqa bijî û biaxife jî yek e. Lê di zîhniyeta berjewendî û lîberalîzmê de ne wisa ye. Tebaqa hene û her kes ji hev û din cuda ye. Lewma jiyana wan hemû bûye berjewendî û kar. Mesela îro di nava civakê de dermanê gelek pirsgirek û nexweşiyan heye, lê di destê hin derdoran de bûye tekel û li gorî berjewendiyê tê karanîn.

Di encamê de li herêma me di nava civakê de pirsgirekên pir mezin hene. Lê divê weke jin û xort em rista xwe bîlîzin da ku hem zîhniyetek rûne û hem jî pirsgirekên heyî çareser bibin. Lê bi taybetî hevalên xurt di vê mijarê de rista xwe nalîzîn, an jî weke karê xwe nabînin. Divê qet nebe zilamên di nava civakê de perwerde bikin. Serokatî ji hevalên xort re digot, hûn dibêjin em berxwedêr in, em leheng in, em şerker in; lê hûn her tiştê xwe didin ber ajoyên xwe. Ji bo hevalên jin jî digot, hûn dibêjin em kole ne, em bindest in, em bê vîn in; lê tiştê ku hûn anîne vê derê çi ye, divê ew ked û cewhera xwe hûn bibînin. Digot, xwe fêrî siyaset, şer ûhwd bikin, da ku hûn nebin mînetdarê ti kesî.

Dema ku mirov behsa têkoşîna jinê dike, behsa azadiya jinê dike; hinek kes hene ku hema tiştên xerîzî û deshilatdariyê tên bîra wan, dibêjin her tişt ji dest çû. Lê em her tiştî li ser esasê rêgez û pîvanên exleqî digirin dest. Deshilatdarî di pêşengtiya jinê de tune, milkiyet tune ye. Jixwe diyardeyên ku jin û civak xistine vî halî ew tişt in. Serokatî dibêje, jin diyardeya esasî yên jiyanê ne, zilam jî vê yekê timam dike. Di nava gelê me yê Êzîdî de tiştekî xweş heye, jin dibêjin zilam mêvanên malê ne. Bi rastî jî zilam xwe mêvanê mal û jiyanê dibîne. Tenê ew mînak gelek tiştan nîşan dide.

Ji ber vê yekê divê em hemû pirsgirekên xwe û civakê, bi wêrekî nîqaş bikin. Da ku em çareseriyên wê jî bibînin. Her wiha divê em teng negirin dest û her tiştî bi cihekî ve jî girê nedin. Li gorî berê, îro me astek girtiye. Berê me nedikarî em gelek tiştan nîqaş jî bikin. Tiştê ku em lê şerm bikin, ne nîqaşkirina van tiştan e. Divê mirov ji paşverûtiyên xwe şerm bike. Ger em jî weke Serokatî bi wêrekî nîqaş bikin û pirsgirekên xwe derbas bikin, dê di nava şoreşê de şoreşek pêk were û ji bo mirovahiyê jî dê tesîra reformeke çêbike.

Serokatî ji bo jinê teoriya qutbûn û berdanê dike. Ji bo zilam jî qala kûştinê dike. Qutbûn ji zîhniyeta zilamtî û deshilatdariyê ye, tu dev jê vê nêzikbûn û ferasetê berdidê. Her wiha zilam jî, di şexsê xwe de qarekter û taybetmendiyên zilamtî û deshilatdariyê dikûje. Ew pîvan ji bo me hemûyan derbasdar in. Di çarçoveya jinelojiyê de jî divê pîvanên me yên redkirin û qebûlkirinê şênber bin û li derdora van rêgez û pîvanan ya nû were afirandin. Ger pîvana me deshilatdarî be, jixwe hem weke jin, hem weke zilam em ê berovajîbûnan jiyan bikin. Hemû hewildanên me jî jixwe ji bo derbaskirina van pirsgirekên civakî ku di encama nêzikatiyên deshilatdarî de derketine holê ye.

**Hevala X:** Di nava PKK'ê û PAJK'ê de ji aliyê azadiya jinê ve têkoşînek meşandin heye, di nava paradîgmaa me de azadiya jinê cih digre. Lê em zanistên civakî jî digirin dest, parçebûna zanista heyî û mezîkirina

zanistê ya îro em rexne dikin. Ji ber vê divê mirov tiştekî jî bixwe cihê wê û alternatîfa wê dayne. Em zanista pozîtîvîst, nêzikatiya wê ya dîrokê û civakê rexne dikin. Zanista pozîtîvîst bi zîhniyeta mêr hatiye pêş xistin û yekalî ye, ji ber vê yekê em dîroka jinê jî tam nikarin derxînin holê. Em nikarin cewher û berhemên jinê yên dîrokî zelal bikin. Ji ber vê yekê pêwîstiya me zanisteke alternatîf heye. Em vê jî weke jineoljî pênase dikin.

Ji ber ku jineolojî zanisteke jinê ye, naye wê wateyê ku dê parçe be û yekalî  be. Ger di roja me de em dixwazin bigihêjin heqîqeta jinê, di nava vê heqîqetê de jin jî heye, zilam jî heye, civak jî heye. Lewma li cihekî ku jin tunebe civak jî tune ye. Em bi awayekî çort bigrin dest jî, îro zêdetirî civakê ji jinê pêk tê. Dema em rastiya civakî ya jinê lêkolîn dikin, jixwe di heman demê de em lêkolîneke civakî dikin. Ango em digihêjin rastiya civakê. Ji ber vê yekê jineolojî, weke zanisteke civakî dîtinê de jî divê em pir zehmetî nekşînin.

Heya niha dema ku em femînîzmê digirin dest de jî, em dibînin ku di asta ku zanebûn û ferqkirinê çêdibe, têkoşîn jî pêş dikeve. Di rewşa vê têkoşînê de jî, pergalên alternatîf derdikevin holê. Niha em di derheqê jinê de pir kêm tiştan dizanin. Ev dane û zanebûnên me jî pir sînordar in, hê jî di van daneyan de jî nakokî derdikevin. Em van daneyên kêm jî dinirxînin û hewil didin li ser wê esasê heqîqetê derxînin holê. Lê yek jî divê em bifikirin ku em

gihêştine dane û agahiyên jinê ku di dîrokê de hatine veşartin, wê demê alternatîfa me jî zelaltir bibe. Diyar e ku wê demê jiyan jî watedartir bibe. Ji vî alî ve jineolojî pir girîng e.

Yek jî divê mirov jineolojiyê weke ji nû ve nivîsandina dîrokê bigre dest. Hê jî dîroka bindestan, dîroka jinê nehatiye nivîsandin. Em li ser esasê hin daneyan dixwazin dîrokê bidahûrînin. Serokatî jî peywireke wisa datîne pêşiya me û dibêje, "divê îcar jin vê dîrokê binivisînin." Li ser vê esasê jî dê hevjiyana azad pêş bikeve.

Ji bo ku em bikaribin jineolojiyê rast fêm bikin, divê em nasnameya mêr û jinê jî rast fêm bikin. Divê hem mêr jinê baş nas bike û risteke bide wê; hem jî jin mêr baş nas bike û risteke bide wî. Da ku em pênaseya hevjiyana azad jî bikaribin pêş bixin. Di rewşa heyî de hev û din pênasekirinê de jî em zehmetiyan dikşînin. Divê em rast pênase bikin û tenê ji aliyê biyolojiyê ve negirin dest. Jixwe rexneyeke me ya esasî li ser derdorên femînîst ew e. Nêzikatiya mêr a li hemberî jinê û têkiliya di navbera wan de piranî ji aliyê biyolojiyê ve digirin dest. Lê em baş dizanin ku di bingeha wê de nêzikatiyeke bîrdozî û mejî heye. Wê demê divê em tenê jinê, ji aliyê biyolojiyê ve negirin dest. Jixwe di biyolojiya jinê de jî ferq û cudahiyên mezin hene.

Jin lêhûrbûneke civakî ye. Heya ku em girêdana wê ya civakbûnê ve fêm nekin, em nikarin rista jinê jî bibînin. Gelo tenê ji bo ku jin hêza xwe bibîne, em ew qesî derdixînin pêş? Ne wisa ye. Di nava civakbûnê de em ristekî didin jinê. Serokatî pênaseya enerjiyê dike, enerjiya jinê weke herikbar dinirxîne. Jixwe giştîbûna enerjiya mêr û jinê bi hev re girtina dest, nirxên mezintir derdixîne holê. Lê enerjiya jinê çima herîkbar e. Ger enerjiya wê herîkbar be, bi awayekî xwezayî rista wê ya civakî jî zêdetir diyarker e.

Her wiha ji aliyê hestan ve nêzikbûn û jiyanê ve têkiliyeke wisa danîna holê jî girîng e. Ji vî alî ve jin, diyardeya ku hevsengiya jiyan û civakê ava bike ye. Ger em bi vî rengî bigrin dest, dê em ê fêm bikin ku divê ka çima jin pêşengtiya civakê bikin. Divê mirov tenê li ser esasê bindestbûna jinê jî, jineolojiyê negre dest. Ger em nikaribin çawaniya jinê û taybetmendiyên wê derxînin holê, em ê her bi psîkolojiyeke mexdûriyetê nêzikî jinê bibin. Lê ne wisa ye. Risteke jinê ya di nava jiyanê û şoreşan de heye. Mesela di nava malbateke de ger dayik nebe, ew malbat jî tune ye. Di heman demê de ger bav jî nebe, malbat nabe.

Ji ber vê yekê cihê ku em weke dahûrandina kesan bigrin dest, divê zedetir em weke lêpirsîna zanisteke bigrin dest. Em ê vê zanistê çawa pêş bixin, çima di vê zanistê de rista jinê diyarker e, Serokatî çima vê peywirê

dide jinê? Pê ve girêdayî hevjiyana azad, dê ji aliyê mêr û jinê ve çawa were pêş xistin? Bersiva van pirsan hemûyan di nava têkoşîna me de heye. Hevalan qala têkoşîna 40 salî û asta ku hatiye girtin kirin. Ger asteke wisa jî derketibe holê, divê êdî mirov jinê bi awayekî dîtir bigre dest û binirxîne. Ji vî alî ve divê mêr jî bikaribe xwe bi awayekî rast bidahûrîne, lê divê bikaribe risteke jî bide jinê.

Bi rastî jî hevalên xort risteke didin jinê, an na? Ger em têkoşîna xwe weke şoreşeke jinê digirin dest, divê risteke bidin jinê. Dervayî vê jî divê em bikaribin jinê pênase û nas bikin. Jixwe di waneyên me yên pêş de jî dê were nîqaşkirin û dahûrandinên me jî wê çêbibin. Ji ber vê jî ger em bikaribin di navbera jin û jiyanê de têkiliyeke rast pêş bixin, em ê sedema derketina zanisteke weke jineolojiyê jî baştir fêm bikin. Peywira jineolojiyê jî tenê ne lêkolînkirina dîrokê, nivîsandina pirtûkan û ev pirtûk di refan de rêzkirin e. Peywira zanyaran tenê ne ceribandineke zanistî kirin û encamên wê nivîsandine. Divê ceribandina ku dikin, xizmetî hevjiyana azad bike. Ger civak nikaribe wê ceribandinê kar bîne û nekeve xizmeta civakê kêrî tiştekî naye. Ji vî alî ve sînorên peywirên jineolojiyê jî berfireh in. Mirov tenê li ser esasê çend lingên weke akademî, aborî, tendûrîstî ûhwd jî nikare binirxîne. Divê jineolojî, di hemû mijarên ku civakê eleqeder dikin de lêkolîn bike û rastiyan derxîne holê.

Mesela me aliyê akademiyan girt dest. Serokatî qala ensûtiyan dike. Navbereke li Tirkiye ensûtî hatibûn vekirin, kesên ku ji van ensûtiyan re derbas bûne, piranî bûn rewşenbîrên welat. Her wiha di van ensûtiyan de tenê perwerdehiyeke teorîk nedihat dîtin. Akademiyên me jî hê negihêştine wê astê. Akademiyan de hem proje û kar derdikeve holê, hem jî teoriya wî karî çêdibe. Mesela li gundekî ensûtiyek hebe, xebatên bi pirsgirekên wî gundî re têkîldar jî digre dest. Di akademiyên me de ew alî lewaz in. Ew jî weke kadro bi lêhûrbûnên me ve girêdayî ye. Ne tenê ji aliyê akademiyên jinê ve, ji aliyê hemû akademiyên me ve wisa ye.

Yek jî akademiyên jineolojiyê, tenê jinê pêş naxin. Lêhûrbûna xwe li ser esasê pêşketinên civakî dikin. Li gel mezinkirina zanebûnê, çareseriya xwe jî diafrînin. Ew jî bi lêhûrbûnên me ve girêdayî ne. Divê di mijara jineolojiyê de, di paradîgmaya jinê de em zelal bibin. Zelalbûyin tenê ne bawerkirin e jî. Em hemû bawer dikin, lê em ê çawa jiyaneke li gorî wê bihonin. An na dê jineolojî yekalî û sînordar bimîne.

# ENCAM

**Hevala Dilzar:** Weke encam jî em dikarin vê yekê bibêjin. Ya rast gerîn; heq û heqîqeta xwe gerîn e. Riya heqîqetê meşeke şoreşê ye. Bi zîhniyetê destpê dike, bi fikir xwe şênber dike, bi hestan rih dide van fikiran û bi vegerandina nêzikatiyê tê dîtin. Di kêliya ku em dibêjin, "*di vî karî de xeletiyek heye*" de, em ketine lêgerîna heqîqetê. Ketina ferqa her şaştiyeke, dê rastiyeke velidîne. Di bingeha hemû kişif û dîtinan de jî, qesî ku tu dibêjê ya nû ew e, gotina ya nû ne ew e jî girîng e. Lewma şaştî, an jî nebûyina tiştekî fêmkirin, di nava xwe de redkirineke jî dihewîne. Ger di nava wê keşfê de çalakiyeke duyemîn jî pêş bikeve, dê wadedartir bibe. Kêliya ku ya şaş tê dîtin, dema ku mirov berê xwe dide ya rast e.

Hemû waneya me li ser esasê mehkûmkirina zîhniyeta heyî ya deshilatdar û lêgerîna nû bû. Ji ya nû gerîn, dev ji ya kevn berdan e. Pir bi êş e ku her roj bi hezaran mirov, bi milyonan fikirên xweşik, ji ber ku nikarin dev ji ya kevn berdin, nikarin azad bibin. Şerta ewil ya lêgerînê, wêrekiya rîska ya kevn ji holê rakirinê nîşan dayin e. Dibe ku di ew kêliya kaosê de mirov nikaribe ya nû jî bibîne, lê her di lêgerîna wê de bûyin û rîsk girtin wêrekiya herî mezin e. Dîroka mirovahiyê bi wêrekiyên wisa dagirtî ye.

Lêgerîn, bi ya heyî bes nedîtinê destpê dike. Divê were zanîn ku mirovahî van tiştên ku tên jiyîn heq nake. Divê

lêgerîn li ser vê esasê be. Bêguman ev lêgerîn jî ne takekesî ye; divê mirov civaka ku di nav de jiyan dike, rastiya mirovahiyê û çanda dîrokî binêre û bigihêje encameke ku em tiştê tê jiyîn heq nakin. Ev yek dîtin û jê bawerkirin, vesîleya lêgerîna heqîqetê ye.

Her lêgerîna mafekî civakî ye. Tiştên ku hatine windakirin, yên heyî, rewş û kesayetiya heyî, xeyala encama lêgerînan… hemû bi hev re kaoseke diafrînin. Ev rewşa heyî jî her aloziyan diafrîne. Dema ku mirov berê xwe dide fikir hesteke nû, aloziyek çêdibe û di encamê de nasnameyeke nû derdikeve holê. Ji ber ku her şoreşek, di heman demê de aloziyeke jî di nava xwe de dihewîne, di rewşên wisa de pevçûn, çûyin û hatin û tevlîhevî jî çêdibin. Di vê wateyê de ne ku ew lêgerîn ebedî berdewam bike ye, bi lêpirsîna ya kevn û heyî destpê dike û heya ku gihêştiye ya rast, an jî hatiye windakirin. Mirov dikare bibêje lêgerîn di vê derê de destpê dike. Mafên ku hatine windakirin, an jî tunekirin; dibe sedem ku lêgerîna mafan, lêgerîna heqîqetan bide destpêkirin. Bi rê û rêbazên rast jî, gihêştina encamên vê lêgerînê çêdibe. Her wiha şert û merç jî li ser vê encamê tesîr dikin.

Rêbaz, avakera heqîqetê ye. Tevî bêrebaziyê, mirov nikare qala lêgerîna heqîqetê bike. Em di serdemeke wisa de ne ku her roj tiştekî nû tê înşakirin, tê ceribandin, xilaskirin û avêtin. Mixabin ku yek jî wan nikare tiştê tê gerîn bibîne û bigihêje encamê. Her tiştek divê hebûneke

bi rih ku di aşê hegemonyayê de tê parçekirin. Divê li gel kêlî û rojê, mirov rêbazê weke forma heqîqêtê ya ebedî jî bigire dest. Tenê weke amûreke nirxandin rêbazê, dê bibe bêrêbaziyeke mezin. Bi giştîbûneke jiyanê xwe îfade dike, weke ku her kêliyeke jiyanê diyar dike; pêşerojê jî xeyal dike, diyar dike û rê ve dibe. Divê her rêbazek, risteke dîrokî bigire ser xwe. Ger mirov rêbazê, bi kêliye ve sînordar bike; dê zanebûn ji demê were qûtkirin, kêlî were berhewakirin û bêwatekirin.

Gelo kes an jî derdoreke ku di lêgerîna heqîqetê de ye, dikare bi rêbazeke teng tevbigere? Yên ku azadîxwaziya jinê dixin navenda heqîqeta xwe, gelo dikarin jiyana xwe ya rojane ji azadîxwaziya jinê qût bigirin dest? Bêguman wisa nabe.

Her çiqasî ya dijber were angaştkirin jî, em di serdemeke ku lêgerîn pir kêm pêş dikevin de ne. Her lêgerîneke bi wate û biryar, bi xwe re rêbaza rast jî derdixîne holê. Dibe ku hûn di lêgerîna ya herî xweşik de bin jî, lê ger hûn nikarin rêbaza rast pêş bixin, dê ew lêgerînên we herî zêde li serê we bibin bela. Pirsa lêgerîneke çawa, dê rêbazê ava bike.

Di dem û cihên ku yek rêbaz li ser serwer e de, qala rêbaza nû kirin, weke kafîrtiyê tê nirxandin. Jixwe ev nirxandin  serweriya dogmatîzmê nîşan dide. Li cihên ku ol serwer e, derketina dervayî rêbaza yekane û teqûz kafîrtiye; lê cihên ku zayendperestî serwer e derketina dervayî vê rêbazê, bênamûstî ye. Li cihên ku nijadperestî

serwere jî, ev lêgerîn dibe xiyanetgeriya welat; jixwe gelek mînakên vê di pergala Komara Tirkiye de hene. Divê naye bîrkirin ku di bingeha wê de zîhniyeta serwer û rêbazên wê yên despotîk hene. Xwedayê gadar yê her serdemekê, her li ser kar e.

Dogma, xwedayê me yê gadar e. Nahêle ku hûn tiştekî bikin, her tiştî bi xwe dike. Dê her kedeke em didin, wê li gorî berjewendiya xwe kar bîne û tune bike. Lewma dogma ne aîdî roja me ne. Her ku ûmrê dogmayan dirêj bibe, bi hêz dibin. Ger em di lêgerîna heqîqetê de, ji van dogmayan rizgarbûnê nexin bingeha rêbaza xwe, dervayî koletiyê em nikarin gaveke biavêjin.

Tiştê ku dogmayan ava dike, tîrbûyina fikir û hestên ku hê venegerîne fikir e. Hest jî, di cihekî de fikir e. Her yekê wan şênberbûyineke mejî ye. Mejî, dîtin û tiştên ku tên dîtin ji aliyê civakî ve bi watekirin e. Hest ji fikir cudakirin, heqîqeta mirov parçe dike. Sezgî, tîrbûyina fikir û rewşa fikir ku bi hestan rih girtî ye. Ti caran radestbûnê qebûl nakin. Lewma li dijberî formgirtinê, pir şiyar in.

Em di serdema zanistê de ne. Di vê serdemê de zanist her nû dibe û ji ber vê jî di her kêliyeke de mirov ji zanebûnên xwe guman dike. Em di serdemeke ku herî zêde heqîqet û rêbaz nêzikî hev bûne de ne. Di serdemeke wisa de xwe gihandina zanistê, derxistina holê ya zanistê, îfadekirin û jiyankirina zanistê, divê hemû ji nû ve werin lêpirsînkirin û nûkirin.

Em dixwazin çi bizanibin? Em zanebûneke çawa dixwazin? Em dixwazin bi çi rengî xwe bigihînin zanebûnê? Bersivdayina van pirsan, avakirina pergaleke nû ya zanistê ye.

Em neçar in ku şêwazeke nû ya zanistê ava bikin. Divê şêwazeke zanistê ku heqîqeta mirovahiyê bi wate dijî, vê heqîqetê bi jiyan û civakê ve dike yek were avakirin. Divê em zanistên ku tê de rêbaz û heqîqeta xwe digihîne hêrikînên rûbarî ava bikin û divê em civakê bigihînin van herikînan.

Şêwaza me ya zanistê ku em dixwazin derxînin holê û lêgerîna me ya rêbaz û heqîqetê, dê civakî û li ser esasê civaknasiyê be. Ew jî weke jineolojî tê pênasekirin. Ger em bi vî rengî pênase bikin, em bawerin dê armanca me baştir were fêmkirin. Jineolojiya ku em weke zanista jin û jiyanê pênase dikin, li dijberî zanistên heyî hebûna xwe îspatkirin, dê şerekî mezin yê heqîqetê be. Divê bi zanebûna vê em dest bi înşaya zanistê bikin.

Me li ser vê esasê çarçoveya jineolojiyê hinek vekir û nîqaş kir. Fêmkirina vê waneyê jî, hinekî fêmkirina vê zanistê ve girêdayî ye. Armanca me jî ew bû. Nîqaş cih bi cih ket mijarên dîtir jî. Lê tiştê ku diyar bû, di asta ku Serokatî çarçoveya wê datîne de, me xwe kûr nekiriye û em negihêştine wê astê. Jineolojî çi ye, armanca wê çi ye, dixwaze çi bike, divê çawa were pêş xistin? Di vê mijarê de pirsgirek hene.

Em carna dibêjin, xebateke nû ye, lê ne wisa ye. Encama têkoşîna 40 salî ye. Jixwe 6-7 salin di bin navê jineolojiyê de xebat tên meşandin. Dema ku em her sal vê waneyê dibînin, hevalên me dibêjin mijareke nû ye. Ji ber vê divê em nirxandin û pênaseyên Serokatî bi awayekî qut û bi xwe ve girêdayî negirin dest. Jixwe jineolojî di heman demê de mûdaxaleyeke bi vî rengî fêmkirina me ye jî. Ango mûdaxaleya feraset, civak û dîrok parçekirinê ye. Ger ji vî alî ve nêrîneke giştî hebe, dê nêzikbûna azadiyê jî xurtir bibe.

Hevalan hinek pirs jî kirin, di nava nîqaşên hevalan de jî hinek hatin bersivandin, mirov dikare hin tiştan lê zêde bike. Armanca jineolojiyê; bi jinê ve girêdayî di nava civakê de pirsgirek heye, em dixwazin ew pirsgirek were dîtin û çareserkirin. Dîtîna wê hewildaneke, çareserkirina wê jî xebateke dixwaze. Dîtîna wê xebatên lêkolînê, lêhûrbûnê, lêpirsînê û xwe perwerdekirinê dixwaze. Ew xebat jî wisa ne razber û li ser masê ne. Xebatên xwe ji erkên dîrokî re amadekirinê dixwaze. Çareserkirin jî, xwe rêxistinkirinê û xebatên qadê vê girêdayî, xebatên pratîkî dixwaze.

Em jineolojiyê weke zanista Modernîteya Demokratîk pênase dikin. Ji ber wê jî em dikarin bibêjin, armanca jineolojiyê, li gorî paradîgmaya Rêber Apo jiyan avakirin e. Vê yekê jî em weke têgîna hevjiyana azad pênase dikin. Hevjiyana azad, têgîna dawî ku Serokatî danî ye. Lê beriya wê çi heye? Beriya wê xwe ji nava pergala koledar

derxistina jinê heye. Hem ji aliyê şêwaz, nêzikbûn, tevger, feraset ûhwd ve, hem jî di her gava ku diavêje de xwe ji wê pergalê qutkirin e.

Gava duyemîn jî guhertina zilam e. Mesela Serokatî "projeya guhertina zilam" pêş xistibû. Di bin bana PAJK'ê de perwerde jî hatin darxistin. Dibe ku encamên wê pir xurt nebibin, lê ceribandinên baş çêbûn. Bi taybetî ji bo dîroka me ceribandinên baş bûn. Di demên pêş de ji bo guhertina zilam, bi rê û rêbazên baştir em dixwazin van tiştan pêk bînin. Em nabêjin, teqez bila komek hevalê xort were û di bin bana PAJK'ê de perwerde bibîne, em ji aliyê şêweyî ve nanirxînin. Em dixwazin çanda deshilatdariyê ku di zilam de tê jiyîn biguherînin. Me di vî milî de çiqasî pêşketin çêkirine û em çiqasî gihêştine armancên xwe, ew mijara nîqaşê ye. Divê weke kar û projeyeke sereke ku Serokatî daniye pêşiya me, divê em nêzikî vê yekê bibin.

Perwerdehiyên me ji bo vê dibin wesîle, her wiha jiyana me ji bo têkoşîna zayendî wesîleyek e. Ji van milan ve em dixwazin xwe bigihînin armanca avakirina hevjiyana azad. Hevalan jî bal kişand ser, em dixwazin di civakê de guhertinên bingehîn çêbikin. Lê beriya her tiştî em dixwazin di nava civakbûna PKK'ê de vê yekê pêş bixin. Ger em guhertin û nûbûneke dixwazin, divê em rih, zanebûn û zimanê wê ava bikin. Ger em wê yekê nekin, em nikarin ji civakê re jî bibêjin vê yekê pêk bînin. Ger em bibêjin jî, ji propagandayê derbas nake. Lewma li gorî wê me jiyana xwe vesaz nekiriye.

Hevalan gotin têkoşîn ji kû ve destpê dike? Bêguman di me de destpê dike. Ger jin pêşengê vî karî be, divê guhertinê di xwe de çêbike. Divê xwe weke pêşengê vê zanistê ava bike û li gorî wê jî xebat bimeşîne. Piştî wê jî divê guhertinan di civakê de çêbike. Em dibêjin şikestina seyemîn dijberî zilam çêdibe. Ango şikestin di zilam de çêdibe, lê ger yê ku pêşengtiya vê şikestinê bike jin be, divê destpêkê xwe ji ew rewşa koletiyê derxîne. Divê xwe ji form û qalibên deshilatdariyê rizgar bike. Milekî vê hundirîn e, divê mirov dahûrandina xwe bike, paşverûtiyên xwe bibîne û dev jê berde. Ya dîtir jî di asta ku sekneke jina azad ava dike de, divê vê yekê ji zilam jî bide qebûlkirin. Ew jî bi serê xwe têkoşînek e.

Di nava me de jî zayendperestî pir heye. Mesela ger hevaleke jin tiştekî biçûk şaş bike hema bertek tên nîşandayin; lê dema ku hevalekî xort şaştiyan jî bibêje, em guhdarî dikin û qebûl jî dikin. Ev tesîra zayendperestiyê di asta herî jor de em jiyan dikin. Me di perwerdehiyan de jî mînakên vê pir dîtine. Jin di her kêliyeke de, ji ezmûnan re derbas dibe. Ji bo çi ez vê dibêjim, divê hevalên jin bi vê zanebûnê tevbigerin. Lewma pêşketina jinê mînak tê girtin. Jixwe em zehmetiyên van tiştan di jiyanê de jî dibînin. Mesela tiştên ku di paraznameyên Serokatî de tê gotin jî naye bawer kirin, lê dema ku hevalekî xort tiştekî dibêje jê tê bawerkirin, êdî ew bûye fêrbûyinek. Dema hevaleke jin mînakeke dide, em pir bi guman nêzikî dibin.

Ew mezîkirineke deshilatdariyê ye. Ne ku ew di şaneyên me de heye. Lê ji ber ku em bi feraseta vê pergalê hatine mezinkirin, fêrbûyineke wisa di me de çêbûye.

Mesela di malbatê de bav, gotinên dayikê biçûk dibînin. Lewma tesîrên pergalê hene, tesîrên Îslamiyetê hene. Divê mirov van biçûk nebîne. Ev tesîr wisa dikin ku êdî tê fêmkirin ku jin di nava civakê de ne tiştek in. Ger ew kesa ku tu aniyê dûnê, di her kêliyeke de weke ne tiştek bibînê, bêguman dê di mejiyê te de algiyeke wisa rûne. Îro gelek hevalên xort jî van nêzikbûn û fêrbûyinan ji bo xwe rast nabînin. Dixwazin hin guhertinan bikin. Lê guhertin û derbaskirina ev feraseta ku ji zarokiyê ve di mejiyê wan de hatiye rûnişkandin ne hêsan e, lêhûrbûn û hewildaneke mezin dixwaze. Di destpêkê de divê mirov biryareke bide; gelo em ê li gorî zanista ku Rêber Apo ava kiriye tevbigerin, an na? Ji vî alî ve biryar dayin pir girîng e.

Têkiliya jineolojiyê, bi zanista civakê ve; em dibêjin zanista jin û jiyanê ye. Ger civak jî di nava jiyanê de be, civaknasî jî di nava jineolojiyê de ye. Ger yê ku civaka exleqî û polîtîk re pêşengtiyê dike jin be û li derdora nirxên jinê ev civak were avakirin, zanista jinê jî wê zanisteke civakî ye. Em bi vî rengî nagirin dest; ji ber ku jin di nava civakê de parçeyekî mezin e, jineolojî jî beşeke civaknasiyê ye. Ger em di nava pergalê de alternatîfeke li dijberî pergalê bin, em dikarin li ser zanistên deshilatdar

vê yekê ferz bikin; em ê bibêjin, ji ber ku parçeyekî mezin yê civakê jin ava dike, divê ji bo jinê jî zanistek hebe. Lê mezîkirina me ya civak û jinê ne bi vî rengî ye. Jineolojî bi xwe zanista civakê ye. Lewma civakbûyin, bi nirxên jinê çêdibe.

Niha nîvê cîhanê hebên dijî deprasyonê kar tînin. Pirsgireka wê derûnî ye. Lê tiştê ku em dixwazin bibêjin; ew yek weke zanisteke derûniyê girtina dest, me nagihêjîne çareseriyê. Mesela di paraznameyên Serokatî de, hezar carî sosyolojî derbas dibe, lê yek carê psîkolojî derbas nabe. Ango Serokatî çawa nêzikî rihê mirov dibe û derûniyê çawa digre dest? Em dixwazin weke çareserî vê fêm bikin. Mesela kesên ku xwe weke nexweşên derûniyê ketine digirin dest û terapî dibînin hene, an dayika xwe re şer kirine, an nizam di zarokatiyê de çi hatiye serê wan. Li Bakur hin saziyên me ku weke piştgiriya jinan dikin jî hene. Serlêdanên wan çêdibin. Piranî jinên ku rastî derstdirêjiyê û tûndiyê tên diçin wan deran. Pişt re ew weke pirsgirekeke derûniyê tê destgirtin. Zilam di nava malê de bi guman nêzikî her tiştê jinê dibe û terorê li ser jinê dimeşîne. Jin ji ber vê diçin van saziyan alîkariyê dixwazin, lê ew ne pirsgirekeke derûnî ye. Pirsgirekeke civakî heye, ew zilam dibe sedem ku jin bikeve rewşeke wisa. Ne pirsgirekên şexsî û rihî ne.

Ne ku em derûniya mirovan înkar dikin. Ji gelek tiştan tesîrbûyin çêdibe, zehmetiyên derûnî tên kişandin. Lê çavkaniya van pirsgirekên ku weke derûnî tên binavkirin, civakî ye. Ji ber ku jiyana heyî ne li gorî civaka exleqî û polîtîk e, ji ber ku ferd ne azad in, ew pirsgirek derdikevin. Dîsa pirsgirekên aboriyê, di nava civakê de ti caran nebûne pirsgirekên derûniyê. Lê ji ber ku di nava pergala deshilatdariyê de, nêzikbûneke wisa heye, tesîr li ser derûniyê dike. Mesela zilamek, bavê gelek zarokan e. Nikare dabara malê bike, derve dibîne ku yên dewlemend hene, lê ew zehmetiyên aborî dikşîne. Îcar weke sedema pirsgirekên xwe yên aborî, malbatê dibîne û li ser wê malbatê şikence dike. An jî hêrsa xwe dîsa ji malbatê û jinê derdixîne. Bi hezaran bûyerên bi vî rengî hene. Em dizanin ku pirsgirekên aborî jî di nava civakê de hene, hevnekirin heye ûhwd. Lê tiştên ku weke pirsgirekên derûnî tên bi navkirin, ji sedî nod û neh civakî ne. Ji ber vê em çareseriya wan jî bi awayekî civakî digirin dest. An na yên ku pirsgirekên bi vî rengî dijîn, tenê bi axaftinê hundirê xwe vala dikin, weke tedavî jî vê yekê dibînin. Lê em ê heya kû hundirê xwe vala bikin?

Mirov pirsgirekên bi vî rengî dikare bi bajarbûnê ve girê bide. Mesela hinek jin hene li ser înternetê çewlîkan ava dikin û baxçeyan diçînin, sewalan xwedî dikin. Mirovan fêrî van tiştan dikin. Cihê ku di înternetê de ji xwe re çewlîkan ava  bikin, bila çend metre ax bikolin û biçînin. Ger wisa bibe, jixwe pirsgirekên derûnî dê werin

jiyîn. Dema wisa dibe tesîra xwe li ser hevjiyana azad jî dike, ya rast ji hev û din jî qut dibin. Bi salan li gel hev jiyan dikin, lê ji hev û din qut in. Ew jî pirsgirekên derûniyê ava dike. Ango di rih de ger yekbûyinek çênebe, li gel mirovekî/ê jiyîn bê wate ye. Têkiliya wê bi hevjiyana azad ve tune ye. Dema ku di nava vê têkiliyê de azadî tune be, dê ji xwe re pirsgirekan bîne. Dê jineolojî, van pirsgirekên ku weke derûnî tên pênasekirin jî lêkolîn bike, lêpirsîn bike. Lê di çavkaniya vê de jî deshilatdariya zilam û pergalê dibîne û li gorî wê jî çareseriyê ava dike.

Di nava hevjiyana azad û jineolojiyê de risteke mezin a akademiya jî heye. Ew qesî derfetên me hene, çavkaniyên me hene. Tevî vê jî em akademiyan pêş naxin. Çima? Lewma hem jin, hem jî xort; xebatên siyasî zêdetir bala me dikşînin. Em nikarin vesazbûna hevalekî/ê ji bo akademiyan bikin. Dema tu dibêje, qada bîrdoziyê; xwe perwerdekirin û li gorî wê jiyankirin, pir zehmet tê dîtin. Hêleşaşiyeke wisa heye. Ji ber vê rexne di cihê xwe de ne. Her wiha bi vesazkirina çend hevalan jî ev kar bi ser nakeve. Serokatî dibêje çi, divê ji şivanekî heya profekî divê her kesek di nava akademiyan de cih bigre.

Pîvanên me yên akademiyê, ne weke yên pergalê ne. Divê dayikeke ku karê malê dike û xwendekarekî zanîngehê werin gel hev û bi hev re nîqaşa vê bikin. Lê em niha ne di wê astê de ne. Em nikarin civakê bînin gel hev. Me bingeheke wisa ava nekiriye. Cihê ku em herî

zêde pêşketine jî, em 10-15 keçên ciwan dîtin û cuda perwerde dikin, dayikan cuda perwerde dikin. Em nikarin bînin gel hev. Lê Serokatî dibêje, hemû ferdên civakê bînin gel hev.

Jineolojî berê weke yekeyeke hatibû rêxistinkirin. Lê niha komîteyeke berfireh hate rêxistinkirin û li gel wê jî akademî heye. Mesela ew akademî dikare hemû akademiyên me yên xweser û giştî de risteke bîlîzin. Dikarin hemû waneyên bi jinê ve girêdayî ew diyar bikin. Dikarin lêkolîn bikin û çavkaniyan amade bikin. Ne tenê li çiyê, li gelek qadan akademiyên jinê hene, lê bê tesîr in. Akademiya jineolojî dikare van çalak bike. Mesela dayikên me ku tedaviya xwezayî pêş dixin, dikarin di van akademiyan de perwerde bidin. Ne ku yên perwerdê bidin divê dîplomaya wan hebe. Bêguman em tip û dermanên ku îro pêşketine jî red nakin. Lê ji bo qada rêxistina tendûristiyê qadeke azad pêwîst e. Tu weke kes di nava wê pergalê de xwe pêş bixê jî, tu nikarê alternatîfeke ji bo civakê pêş bixê. Tu neçarê ku li gorî avakirina xwe, tu pergal û rêxistinan jî ava bikê. Divê ev hemû di nava giştîbûnê de werin dest girtin. Bi kurtasî divê akademiya jineoljî û akademiyên jinê yên heyî jî tevlî hev nebin, risteke wan a cuda heye.

Xaleke girîng heye, dema ku em nîqaş dikin ku paradîgmaya Serokatî fêm bikin, carna ji êniyeke din mezîkirin çêdibe. Ew di nîqaşan de dibe pirsgirek. Jixwe

em li dijî parçe fikirînê ne û em nabêjin bila her kes jî bibe yek renk. Lê di bin navê parçebûn çêdibe de, êniyeke cuda avakirin ne rast e. Ger pîvana me cewhera paradîgmayê be, em carna ji cihekî dîtir ji paradîgmayê mezî dikin. Ew şaş e.

Di mijara jineolojiyê de hevalên jin, piranî vê têgînê û zanistê pêş dixin. Lê em dixwazin ji hemû hevalan bidin fêmkirin. Armanceke me ya bi vî rengî heye. Rêkeke vê akademî ne, lê rêkeke din jî rêxistinbûna vê û di jiyanê de têkoşîna vê pêşxistin e.

Ya dîtir perwerdekirina zarokan û civakê, qadeke bi jineolojiyê ve girêdayî ye. Serokatî got, "*bi taybetî jî divê hûn li ser perwerdekirina zarokên keç bisekinin.*" Ew fermana Serokatî ye. Ya din jî Serokatî, şoreşê pênase dike. Şoreş, ne ji nû ve avakirina civakê ye. Em dixwazin astengiyên pêşiya civaka exleqî û polîtîk rakin. Niha deshilatdariya zilam, pergala ku li ser vê deshilatdariyê pêş ketiye astengî ye. Saziyên dewletê astengî ne. Em dixwazin van ji holê rakin û li cihê wan tiştên li gorî herikîna civakê daynin. Ew jî dibe pênaseya nû a şoreşê.

Jineolojî, mijareke zîhnî ye. Bi salan e em nîqaş û têkoşîn dikin. Berdelên pir giran jî hatin dayin. Mirov dikare di waneya Dîroka Tevgera Jina Azad de jî nîqaş bike, lê hemû bi hev ve girêdayî ne û şoreşa zîhnî ava dikin.

Femînîzm jî, hemû tevgerên jinan nagire nava xwe. Her wiha em jineolojiyê weke tevgereke pênase nakin. Em xwe weke baskeke femînîzmê, an jî zanisteke femînîzmê jî nagirin dest. Serokatî got, "*jineolojî dikare ji femînîzmê zêdetir armancê pêk bîne.*" Ger wisa be, femînîzm têrê nake; divê jineolojî ji wê firehtir bibe. Xebatên ku heya niha hatine meşandin, mirov dikare ji gelek aliyan ve rexne jî bikin. Lê pêvajoyên ku em jiyan dikin, pêwîstiyên cuda derdîxînin holê; ev tişt konferansa jineolojiyê de jî hatin nîqaşkirin. Hevalên ku di yekeya jineolojiyê de cih digirin, hemûyan rexnedayina xwe da, lê rexne jî kirin. Gotin, çima ji bo jineolojiyê vesazbûn çênabe. Lê pêwîstî pir in û her hevalekê jî mirov nikare vesaz bike. Pirsgirekên bi vî rengî jî hene. Jixwe tevgera me ya xweser jî li ser van disekine.

Lê divê em vî karî tenê ji vê yekeyê û komîteyê re nehêlin. Divê hemû hevalên jin, hem karên xwe yên dîtir bikin, hem di nava xebatên giştî de nunertiya jinê bikin, hem jî xebatên xwe yên bîrdozî, xebatên jineolojiyê divê pêş bixin.